ereb şemo

# DIMDIM
roman

Institut kurde de Paris

STOKHOLM 1983

Sv. [redacted]
K. K. [redacted]
Karlb[redacted]
113 27[redacted]

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque

# ereb şemo

# DIMDIM

## roman

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque
Reçu le 31/05/2018

INSTITUT KURDE DE PARIS
Bibliothèque
Offert par Joyce BLAU

Institut kurde de Paris

Weşanên Roja Nu


Navnişan'
BOX 4038
141 04 Huddinge/Sweden

Weşanên Roja Nu

1. Ronak, Diwana çara, Cigerxwin, Stokholm 1980
2. Zend-Avısta. Diwana pênca, Cigerxwin, Stokholm 1981
3. Kılam û Mıqamed Cımeta Kurda, Cemila Celil, Stokholm 1982
4. Şefaq, Diwana şeşa, Cigerxwin, Stokholm 1982
5. Zozan, Casımê Celil, Stokholm 1982
6. Hevi, Diwana hevta, Cigerxwin, Stokholm 1983
7. Tarixa Edebyeta Kurdi - I, Qanatê Kurdo, Stokholm 1983

Institut kurde de Paris

ISBN 91 7672 008 x
Bokförlaget Roja Nu
Copyright Zina Şamilov
Printed in Sweden
Robert Olsson Tryckeri AB



Ev romana Ereb Şemo cara pêşin sala 1966'a lı Êrêvanê bı tipên kirili, sala 1974'a lı Moskvayê bı tercûma Rûsi û sala 1975'a ji lı Bexdayê bı zaravayê sorani, bı tipên erebi çap bûye.
Me ji ev romana gıranbıha jı tipên kirili guherand tipi latini û pêşkêşi xwendevanên Kurd dıkın.

Institut Kurde de Paris

## PÊŞGOTIN

Ev romana nişan dıke wan rojêd tariqa kurda, wextê Kurdıstan haleki pır gıranda bû.

Ali padşê Turkiaê (Rom), ê ku bı zora sılaha zevtkır Ermenistan, Sûriya, Mezopotamya, Erebstan, Mısır û derkete nivada Balkana, lı wêderê ji zevtkır Bolgariya û dewleteke çûk Albanya (Arnavut) paşê padşê Turkiaê ew eskerê xweyi gıran bı sılaha û cebırxana şande ser Kurdıstanê şêr. Ewi dıxwast erdê wani qedımi, ê kal û bavê wan zevt û wana ji bıke destayê xwe, usa çawa ew dewletê, ku me jorê nişan dan.

Aliê dın şahê İranê eskerê xweyi şerê qurnada qalbûyi dışande ser Kurdıstanê şer, weki xwera zevtke. Lê mıxlûqetê kurda bı efati û mêrxasi şerdıkır lı hemberi wan herdû dewletê mezıne û gırane wi çaxi.

Pey gele şerara padşê Turkiaê û şahê İranê ditın, ku ew usa cûda-cûda nabe nıkarın tışteki vi mıxlûqetê mêrxas bıkın. Wana sala 1639'a peyman hevra gırêdan û Kurdıstan nav hevda parevekırın, lê ew parevıkırınê ji tu kar neda wan.

Ev romana qısedıke şerê wi wexti ser kela Dımdımê û nişan dıde, çawa kurda şerdıkır lı hemberi wan zevtçiya û xweydıkırın erdê kal û bavê xwe. Serkarê wi şeri – ne mir bû, ne beg bû, ne ji axa bû, ew kurdek bû, navê wi Xano bû. Kela Dımdımê ewi çêkır, mıxlûqat jêra dıgot: "Xanoê Çengzêrin".

Institut kurde de Paris

Mıxlûqetê kurda gele beyt, çirok û serhati gılidıkın derheqa wi şerê efati û mêrxas.

Derheqa şerê ser kela Dımdımê û efatia kurdaye mêrxas gele seferêd Evropaê û rohılatzana (oryantalista) ji nıvisine.

Em her dıdın nexşeki wan şerê kurda, ê ku wana dıkır gele qurna, sal û zemana bona azabûna xwe jı zulma zevtçiya û ew nasekının nıha ji şerdıkın bona azabûna xwe...

NIVİSKAR

Institut kurde de Paris

"Rojêd çetın wê bêne bir.
Kurdê bıqetinın kırê tiya, zıncir,
Azaê wê bıstinın bı mıxlûqetê hevgır"...

(Jı beyta Sebıqi Kıbir)

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# S E R Ê  E W L I N

## ÇARSÛ

Rewayi şagırt û hogırê xweyi eziz İSKOÊ USIV dıkım.

Institut kurde de Paris

Bıhar tımê dereng dıhate vıra, lê isal serê çiyaêd bılınd hê berfêda spidıkır, bıhara kela Dımdımê idi ketıbû qedemê xwe, berf lı vıra helya bû, tıştek nemabû, her lı geliyê kur û newalada mabû, ew ji ew berf bû, ku zıvıstanê bê ew geli usa tıjidıkırın, weki heta germa havinê nedıheliya. Van roja ehılê kelê karê çandınê dıkırın, weki çandınê bıharê bıkın: hıneka ji ida axpinêd xweye dora mala nan lê dıçandın. Wê sıvê pılte ewr jı serê çiya derket, ser kela Dımdımê heve baranê reşand, toz-xûbar erdêda kuta û disa vekır. Teva xweş vê bıharê disa pencê xwe da erdê. Vê baranê bin-boxza hewaê dıha pakkır. Barana usara em kurd dıvên "Dewata gûr û rûviyê"...

Jı germa vê bıharê ku usa dı qıjıland, ew çemê gelida, ê bınatara kelê şêlû bûbû, kef dıda, geli tıji kırıbû û gumreh jorda dıhat, kevır lı ser riya xwe hol dıkırın, dıbırın. Te qey dıgot eva ne ew çemê havinêye bı ava zelale temız jı kaniyêd jorıne kur derdıkevın, tenê bıniya kelê, tev hev dıbın, dıve çemeki mezın, tıji mesiyê elebalıx û dıke gure-gur dıkışe dıçe...

Van rojan teva bıharêye germ, ku dıqıjıland, jı wê germê darêd kuçêd kelê şin dıkırın, belgê xweye ber vekırı-

bûn û siya xwe hazır dıkırın bona mırovatiyê. Lê darêd qeysiya lı baxada ida kulilk dabûn, cina ji berê wan dara gupık dabûn, karê rezê xwe dıkırın. Jı nivro şunda av usa radıbû, weki dıhat dıgıhişte aşê gelida. Evdiyê xweyê aş herro ew û aşvanê xweva, Mehmûdê Merekani, sıvê zû berbanga radıbûn, dıçûne gêli, çımki şevê hênıke, berf nahele, wana kevırê mezın dıdana kêleka aş, weki pelêd avê aşê wi nehedımine. Bona vi aşi tefekuri dıkşand hemû ehlê kelê, çımki xêni wi aşi nêzik tu aş tunebûn. Xêni wê yekê, hıngi Mehmud Merekani bûbû aşvan, ewi kevrê aş pak tuj dıkır, naneki rındi hur lı vıra dıhêran. Tema rokê bı hukmê Xano gele zılam hatıne komeka Evdi û aş pak mehkem kırın.

Jı wê hewa xweş wan roja sıvê şefeqê hetani evarê çarsiya kelê tıji mexluqet bû, kırin û fırotan bû. Dıkançiya dıkırıne gazi; " Werın, ha werın! Werın ha werın! Malê xasi arzan bıkırın!"...

Çarsiya kelê tıji mexluqet bûbû, ne ku gundi û koçerbûn. Gele mexluqet hatıbû jı Adrbêcanê, jı Wanê, jı sera Mexina (asori) û jı welatêd mayin. Hıneka eşyayê xwe anibûn dıfrotın, hınek ji hatıbûn jı vıra mal dıkırin, dıbırın. Gımin jı çarsiya kelê dıhat. Ew yek kıvş dıkır, weki çiyayêd Kurdistanê û mexluqetê wi xılas bûn jı vê zıvıstanê, sarê û sermê. Gışke eşq bûn. Bıkırçiya dest dıkırıne destê dıkançiya, dıhejandın, qimet dıkırın malê, ku wê bıkıriyana, lê dıkançiya ji ew qimetê ku gotıbûn kêm nedıkırın...

Lı çarsiya kelê hebûn qawexane. Van rojêd usa germe xweş, xudanê qawexana texte derxıstıbûn ber siya dara û qawe dıfrotın. Mêrê kal dıhatın çawa vedıxwarın û qısedıkırın derheqa rojêd derbaz bûyi. Rojeke usa eşq hıne kal rûnıştıbûn derheqa halê Kurda qıse dıkırın. Nav wan kala da hebû yeki heveki pışt kuz, fêza burya çevê wiyi çepê dewsa bırina şure kûr hebû. Gava ewi xeberdıda çevê xwe carna dıgırt û vedıgırt, ew bırin ji wi çaxê dıhate gırtınê û vedıbû. Xêni wê bırinê guhê wi çepê nivi qe tunebû. Wan

bırina şadetiya wê yekê dıda, weki evi mêri gele rojêd oxırmêd gıran derbaz kıriye nav şera û dewa, mıqabılı zevtçiye erdê Kurda. Navê wi kali İskender, bû. Lê Kurda jêra dıgotın - İsko. Wexta ewi fincana qawe xwe vexwar, heveki rabû ser çoka, got:

-- Ev qısa ku ezê wera bêjım zuda qewımiye. Wi çaxi ezi hê sıvık bûm, lê ida xorteki epêce mezın bûm, berê sımêlê mın ji ida çawa dıvên, xudabûn. Saleke mın temam bûbû, weki ez xulamê Mırad begê bûm, jı eşira xalta Mırad begê axê mın eşira mıllara dıjmınti dıkır. Ew çar sal bûn, me ser hevda dıgırt, şer dıkır, meri jı hev dukıştın, hevdu talan dıkırın. Welıyê Dıyarbekırê komek dıda begê eşira mılla. Dıgotın, weki weli çek-silaha ji dıde wana. Çı xema weli bû, ewi dıgot: "Bıra Kurd hevdu qırkın, ew yek mera xêre"... Lê eşira Mılla bı me nıkarıbû, me hertım zora wan dıbır. Careki cab hat, weki padşê Romê çend hezar mêr bı şerkariya Şukıri paşa şandiye Kurdıstanê zevtke. Ew cab nav Kurdada zu bela bû û me ji bıhist. Eşirêd ser riya Şukri paşa karê xwe kırın, weki dıjmınê zevtçira şer bıkın. Lê Şukıri paşa ku gıhişte wan gunda, ewi ew gund dane ber topan, xıravkırın. Raste orta me û eşira Mılla tunebû, lê gerekê rasti bê gotınê, gava ku wana bıhist Rom tê ser Kurda şer, wana ji karê xwe kırın zevtçiyara şerkın. Begê wan qasıdê xwe şande cem Mırad begê me, got:

--Heyran, ida roja xıretêye, bese weliyê Dıyarbekırê me beri hev dıde, lazıme em dest bıdıne hevdu û lı dıjmınxın. Cabeke dınê ji hat, weki Şukıri paşa ew gundêd Kurda ser riya wi, ê ku qe şer ji nakın, lê dıde ber topa; jın, zara, kal, pira qırdıke, keçêd bedew û jınêd cıwane rınd jı dıbe hêsirê. Rojekê begê me û begê eşira mılla rasti hevdu hatın û her yek bı gıre-gırê xweva, soz dane hevdu, weki hemberi Şukıri paşa şerkın û nehêlın ew lıngê xwe bavêje welatê me. Cmaeta herdu eşira cuk û mezına ew yek qebulkırın...

Eşira mılla heveki nêziki Diyarbekırê bû, lê emê jı



Institut kurde de Paris

Diyarbekırê gelek dûr bûn. Wextê qasdê eşira mılle cab ani, weki Şukıri paşa idi hatye serê sinorê eşira wan, em çûne hewariya wan. Lê Mırad beg xwexa mera nehat, ewi bırê xwey çuk, Zoro beg şand. Mêrxasiya Zoro begê nav Kurdada zuva eyan bû. Pak tê bira mın Zoro begê wi çaxi carna dıgote me cahıla:

"Xêni mêrxasiyê û culetiyê mêrê şerkar, gerekê şerada bı fêl û delkbe, bê fêl û delkiyê û fesala şêr, tenê merıv bı mêrxasiyê nıkare zora dıjmın bıbe."

Ezi nav wi şerida bûm. Zoro begê berê ewıl çend hıcumêd berk kırın serê wi. Paşê qestana jı ber vekışiya, guva revi. Şukırê paşa bı leşkerê xweyi gıran va da pey me. Lê wextê ew hate lı çiyayê me, me aliki, eşira mılla ji aliki lı wan baletebûn, qırkırın ûkesaran dılê xwe wanda şkênandın. Wi çaxi ez ketıme nav koma siyarê Romê. Mın du hev jı wan kuşt, lê yeki şur avit, weki serê mın bıfırine, mın mırtala xwe da ber şurê wi, şur şımıti lı vi guhê mın ket, rapêçkır bır, mın şurê xwe dılê wi da nıkand, ew kuşt û jı nav wan derketım. Wi çaxi mêr hebûn, mêrxas hebûn, lê mêrê *usa nıha tunene. Şukıri paşa ji paşda revi, çû, idi ne*hate ser me şer.

Wê roja usa xweş Qûrşidê bazarbaşi hespê xwe siyar bıbû, çend xulamê dorê, nava çarsiyê dıgeriya. Dikançi, ku çev wi ketın gotın: "Ne bı xêr wê disa çı bêje?" Ewi hukmi ser dıkançiya, xana û hemûşa kır, got:

– Ne mın hê du roja berê gote we: "İda bıhar hatiye, germe, wan cewêd pêş dıkana, pêş xana paqıjkın." lê we paqıj nekıriye. Ezê sıvê disa bêm weki paqıj nekırıbe ezê cırmeke gıran jı her yeki bıstinım. Paşê nebêjın ciye bela sebeb me cırm dıke.

Ewi ew hukım wa bı dengeki bılınd got, weki kuçêda gışk bıbhên û derbaz bû, çû taxa hostexana. Ev tax hında sura kelê, fêza çarsiyê avakarıbûn. Vıra ne ku tenê ciyê hostexana bû, lê vıra hoste jın û zarava dıman, her yeki jı wan pış hostaxana xwa, holıkek çêkırıbû û jın zarê xwe va

Institut kurde de Paris

têda dıman.

Ev taxa hostexana usa hatıbû çêkırınê, weki meri dıhate çarsiyê erhede wê ber wan hostexanara derbazbûya, çımki jı wan hostexana wêda ida sura kelê bû, merıv nıkarıbû ciki dınêra derbazbûya. Du cêrge hostexanebûn, berê wan hevda bûn, ortêda kuçe bû. Berê derê hostexanekê texta dereva çêkırıbûn. Ser wan derava danibûn, yanê dardakırıbûn ew tışt, çı vê hostexanê çêkırıbûn. E, gelo çı çênedıkırın lı van hostexana? Hebûn hostexana lı kiderê çêdıkırın qeydê lıngê hespa, nelê hespa, kera, qantara û bona ga. Hebûn hostexana çêdıkırın xurû, fıraqêd jı mis (paxır), stilêd mezın, beroş, testêd bona hevir, qasık, sini, bolme, mısin û tıştêd mayin. Ev fıraqe gışke qelakırı ber tevê dıbırıqin. Hebûn hostexane silaha, lı vıra çêdıkırın, xençer, qeme, şur, mertalêd pola, serê rımaye sê parsu, zıri, serkum. Ev serkum şerkara dıkıre serê xwe, weki şûrê dıjmın serê wan nebıre. Hebûn hostexane, ê ku çêdıkırın zınê kawe nıqışandi bı belgiyê rınd, weki siyar, ku geleki riya dur dıçe, mehekê ji, jı hespê peya nebe acız nebe. Zengu, gemêd hespa hevsarêd kawe neqışandi, palanê guhdırêja qantıra û deva ji çêdıkırın.

Tımê sıbê şebeqê hıla bajar jı xewa hıngurê ranebıbû, lê duyê agrê hostexana idi dıkşiya. Zarêd şagırte pıfıkçi, pıfıkê dıxıstın, agırê komırê gurdıkırın, çımki gele wext lazımbû hetani hesın nav agırê gurda sor bıkın, weki ew nermbıve, paşê bıdıne ser kêmutêd hesınê mezın û ber çakûça çêkın çı lazıme, bona frotanê. Lema ev hostexane vedıbûn hıla ne çarsu, ne dıkan, ne ji wan pê venebıbûn. Lê xevata van hostexanada sıvê sebeqê idi gumreh dıçû. Hebûn hostexanêd bıçûk têda dıxebıtin du-sê meri, lê hebûn hostexane kiderê dıxebıtin heyşt û deh meri şagırt, xêni hosta. Merıv ku dınhêri rengê wan, ê ku hostexanada dıxebıtin, pozê wan, suretê wan teniyêda reş dıkırın, çımki ewe tımê ber agır, dû û teniyê bûn...

Merıv ku dıhate taxa van hostexana, ewê hinnebıbû,

zu acız dıbû û jı wan teqe-teqa, reqe-reqa çakuça û mêkuta, yanê ji jı wan pır işkêd agırê dıpekyane her çiya...

Ev hostexane pırê ê kurda bûn jı Sılêmaniyê, Diyarbekırê, Dumuşqê û jı aliyê mayin, lê vıra hostexanê ereba û ermeniya ji hebûn. Gava Qurşût hate vıra ewi dit ber derê hostexana koziya şewata komırê zıvıstanda heta nıha kom maye, ev hêrs ket û kıre qujin:

-- Ezê çend cara bêjme we, weki hun kuçêd xwe ber hostexanêd xwe paqıjkın? Hetani kengê ezê hiviya webım?...

Ev gihişte yeki jı wan da nava qamçiya û gota xulama: "Vi bıgrın binıne dıwanxanê"...

Raste, bajarê kela Dımdımê, mınani bajarêd qedımiye mayin hewqes ne mezın bûn, lê ev bajar ji idi bıbû bajareki epecê mezın û çı bêji têda biter dıbû. Jı welatêd dur ji bazırgan dıhatıne kelê, eşyayê xwe xerit dıkırın û dıçûn. Mexlûqet ji jı hemû welata dıhatın kırin û fırotan dıkırın.

Bajarda gele kuçe hebûn. Hebûn du çarsi û weki dın meydana dêwêr. Lı wê meydanê pez, dewar û hespêd Kurdaye kıhêl dıhatne frotanê. Jı hemû welatêd dur dıhatın hespê kurda dıkırin û dıbırın. Bekırê esnafê hespê Kurda wa qıse dıkır:

- Hespa Kurdaye kıhêl guhê wane kıne û bıçûkın, sımê wane gulovere ne mezının, singê wane fırene, serê wan bıçûkın, stuyê wani kêre, ew hesp tımê jarın qe kunabın, merıv tıre alıf kêm dıdne van heywana, ev hesp ji debrê kêm dıxun, karın gele roja bê av û bê debır teyaxkın. Kıhêlê kurdara yeke riya kevıre zınar, çiya, geli, yanê ji qum-qumasıtan. Tu ruhberê çarpê ji jı ber beza wê xılas nabe, hetani karêd xezala ji xılas nabın, ew heywan geleki femdare, hergav siyarê xwe xwedıke... Lema jı hemû welata tên bı hewas dıkırın û dıbın...

Bajarda hebûn cûre-cûre dıkan. Dıkanêd etarada hebûn mori, bışkok, derzi, têl, qeytanêd reng-rengi, qotık, desmalê ser desta, tılık, temezi, bercênik, torêd stuyê jın

Institut kurde de Paris

û keça û gele tıştêd mayin. Hebûn dıkanêd parçe. E, gelo parçe kijan welati lı vıra tunebû, bıgre jı Keşmirê, Hindistanê, qenawızê Afganistanê û İranê, qedıfê Besrayê û çitê Hurımstanê.

Cêrgeke hostexana gışke dençi bûn, lı wan hostexanada ris reng-rengi dıkırın, bona xaliça, emeniya, zilya, bera, xurca, pıştêd jına û tıştêd mayin. E, çı tunebû? Hebûn dıkanêd emişfrotanê, hebûn dıkan têda dıfrotın genım, cev, garıs, nanê pêxamber, nok, nisk û hebêd mayin...

Vi bajarê kelê da hebûn gele xwarınxane. Lı van xwarınxanada sıvê hetani êvarê ser darê darçıra yanê ji ser komırê hazırdıkırın, cure-cure xwarın. Cem van xwarınxana tımê bin-boxzê xwarına usa xweş dıhat, meri ku nêziki wan dıbû, weki qe ne bırçibûya ji, medê wi vedıbû, çımki lı vıra çêdıkın; qeliyê, tolme, kıfte, qeliya sêlê, qeliya şıvana nav hurê pêzda çêkıri, tas kıvav, kıvavê şişa, rışte, savarê goşt û bırınç, bişi, şılık, helise, gulolik û xwarınêd mayin. Lı wan xwarınxanada nan dıxwarın meriyê dewlemend, tucar, dıkançi, çewdar, mezınêd eşira û qebila, xweyêd karvana, ku hatıbûne kelê bona malê xwe bıfroşın, xweyê xana. Lê vıra meriyê usa ji hebûn, ê ku xwera nedıditın herne xwarınxana nan bıxun. Ewana meriyê pır dewlemendbûn, xweyêd embarêd mezıne tıji, eşyayê xaş bûn. Vana mal dıkıri tomeri, paşê dıfrotıne dıkane disa bı tomberi. Xwarına wana: teştê, fıravin û şiv, xweyê xwarınxana dışandıne cem wan bı destê qulıxdarê xwe. Carna ji bona wana hazırdıkırın, ew xwarın çı wana xweva pêşta dıgotın çı dıxwaze: teştê buxwe, fıravinê û şivê. Ev xwarın nav dıkırın xwarna "razlıxya dıl". Vıra hebûn xwarınxane bona kesiba. Lı van xwarınxanada hazırdıkırın jı seri û lıngê pêz û dêwêr serpê, jı nav dılê pêz û dêwêr, çawa dıgotın: hûr - pızûr, qeliya rûviya û dılhınav hazırdıkırın, pelewa jı gars, avsir û gele tıştêd mayine arzan. Lı van xwarınxanada tımê tıji meriyê kesib û fıqare bûn. Hınek jı wana jı welatêd dûr hatıbûn. Wana bıhistıbû xêr û bereketa kela Dımdımê, lema

Institut kurde de Paris

hatıbûn. Nava wanda ew meri ji hebûn, ê ku jı zindana yanê ji jı ber xenıqandına şahê İranê û padşê Romê bı tehreki xılas bıbûn û revibûn, hatıbûn. Nava wan meriyada hebûn ulmdar, xwendekar û aqılbend.

Lı vıra bajarê kelê, bın bandûra Xanoda keseki zor wana nedıkır, çı mıleti ji bûya...

Hınek jı wan dıçûne mêşe dar dıbırin, bı pışta danin çarsûê dıfrotın, yanê dıçûne mêşe dar dışewıtandın dıkırıne komır danin dıfrotıne hostexana, xwarınxana û mala. Hınek jı wana bûbûn avçi, av bı meşka dıbırne mala û kiderê lazıme dıfrotın, hıneka ji xwe ra hembali dıkırın. Ewana bı dıleki şa û aza nan xwera dest dıxıstın. Lê wan meriya pak xwedıkırın pergal û qanênêd Kela Dımdımê. Û herkê dıditın nav wanda meriveki nepak–cesûs derdıkeve, destxweda wana cab dıda dıwanxanê û ew nepak dıgırtın. Lı wan xwarınxanada hergav tıjidıbûn meriyêd kesibe–fıqare,ê dıleki dıkırın, xwera nan berevdıkırın. Lı vıra komdıbûn gele dewrêş ji...

Kelêda hebûn gele fırne. Van fırınada dıpêtın nanê sêlê, loşê tendurê bokkan, totık, kloç, kade, mırtoxe, şılık, bişi û curêd mayin. Carna bı lez şagırtêd hostexana dıhatne fırnê û bı perê poleki nanaki loşi germ dıkırin û usa dadıbelandın dıxwarın te qey dıgot evi ev nan qe neçût. Hema dadıbeland û dırevi, dıçû hostexanê. Qurşût jı taxa hostexana hate hında xanê Musa. Rex vê xanê hebû xwarınxaneke pır mezıne du qatê. Xweyê xwarınxanê kurdê jı Cızira–Bota bû. Navê wi Bedır bû. Ewi ku dit Qurşût siyari ber deri sekıniye destxweda derket, temenebû, got:

– Keremke, maqul mın qeliya sêlê hema hêşka hazırkır jı goştê berxa pare, kavıra yeksaleye, beri nan bıxwe disa here, ez zanım şuxulê te gelekın, wexta te tune tu nıkari geleki bısekıni. Lı vıra ji Qurşût ber dêri dit koma xweliya jı koziya dara xuna pezê şerjêkıri, kıderê tıji mêş bıbûn, lê ewi lı vıra qe nekıre qujın û şer-dew nekır. Jı hespê peyabû, xulama hesp bı darê baxva gırêdan, çûne hundur xwarın-

xanê, têr qeliya sêlê xwarın û çend tas şerbeta şırın serda vexwarın û siyarbûn çûn, qe negotın mali ava...

Qurşûtê bazarbaşi iro bajar gışki gerya û hate ber derê şkevta, ku têda top çêdıkırın. Xano hosteki zana anibû, ew fıle bû, navê wi Xaço bû. Ewi lı vê şkeftêda top çêdıkırın. Ew şkevt qedexe bû herkes destûra wi tunebû bê vê şkevtê. Lê destûra Qurşût hebû bıhata heyata şkevtê. Dema ew hate ber derê şkevtê, ewi xulamê xwe ber dergê şkevtê hiştın, xwe jı hespê peyabû, hesp cem xulama hişt tenê çû şkevtê. Ew şkevt tımê qerewıl lê hebûn, wana zanibû destura Qurşût heye, lema destur dan ew çû. Lê Xaço çı dûrva dit Qurşût wê tê, ew xwexwa pêşta çû û got:

- Qurşût, tu ser çeva hati, çı hukmi dıki? Keremke bêje?

— Xaço can, ez tu hukmi nakım, lê hê duh Xano gote mın: "Qurşût here cem Xaço pırske, çıqas hesın lazıme bona xweta wi, wê iro bazırgan bışine bona hesın?"

Xaço merıki aqıli delk bû, ewi xweta xwe tımê bı fesal dıkır. Sora xwe kesira ne dıgot, ew heveki fıkıri û got:

- Şuxuleki mın ji ferz lı Xano heye, ezê gaveki şunde xwexwe herme cem wi û bêjmê çıqas hesın lazıme, weki bıkırın, binın...

Jı vıra Qurşûtê bazarbaşi ber bı dergê Musılê *) çû. Ew hıla negihışte derge, dengê zengılê bazarganê tucara hat. Qurşût sekıni, pak guhê xwe da ser, weki pak bıbnê, ew ku sekıni, dengê zengılê deva şınge-şıngeke zelal lı wi tesele bû. Wê şınge-şıngera şabûn kete nav dılê wi, çımki hergav, wextê tucarê dereke dıhatıne çarûsê û eşyayê xwe dıfrotın, wana hergav baca wi û pêşkêş dıdanê. Xano qedexe kırıbû, keseki tu bac yanê gumrık jı tucarê dereke nedıstend, ewi nedıhışt sinorê wi, yanê nêziki sinorê wi tu kes

*) Sê dergê kelê hebûn, yek aliyê Musulê, ê dınê aliyê Tehranê, ê sısya aliyê Wanê.



Institut kurde de Paris

dengê xwe bazırganara bıke, tucar serfınyaz dıhatın û eşyayê xwe dıfrotın. Lema bazırganêd tucarêd welatêd dur dıhatne kela Dımdımê, malê xwe dıfrotın û lema tımê vi bajarida çı eşya bêji hebû, bıgre jı bajarê Hındıstanê, Afganistanê Şamê, Helebê, Stenbolê, Romê û İranê dıhatne vıra. Lê Qurşûtê bazarbaşi dızikava bê Xano, bê kevç nedıma, bona vê yekê bû dengê zengıl, ku kete ruhê wi, ew şabû û lez ajote ber wi dergeyi, ew ku bı xulama va jı sura kelêye bılınd devayi mezın, nêzıki deh qeyntere deve sekınine û bazırganbaşi mezınê dergevanra xeberdıda.

Xweyê bazırgan lı deveki pêsir reş siyar bû, ridaneke dırêje lêye, qaputeki sıpi lêye, şereke sıpiye lı sêriye, egaleke reşe ser şerêda lı sêriya.

Ew egal bona vê yekêye, weki şer jı sêri nekeve, Şere ewqase mezın bû, dıhat dıkete ser mılê wi, ew jı bona vê yeki, weki tev lê naxe. Şıvqelıneke dırêje serikêva destda bû, ewi qulap-qulap qelın dıkşand û du ser xwera berdıda. Xulam û dûajo deva gışke sıhıhe dorêbûn. Kıvş bû, weki tucar kurdi nızanibû, lê dilbendê wi pêra hebû, ewi dıgote dilbendê xwe, dilbend bı kurdi wedıgerande mezınê dergevanara. Qurşût nedıxwast dur bısekıne, ajote nêzıki bazırganbaşi, sılav dayê, got: "Merheba" tucar sılavê wi vegırt. Qurşût erebi baş nızanibû, lê ew çend salbûn bazarbaşi bû ewi heveki serederi zımanê ereba dıkır. Tucar bawer dıkır, weki evê sılav da wi ew ji erebi hındık zane. Lema vegeriya ser dilbendê xwe bı erebi gotê, lê dilbend welgerande kurdi:

— Tucar dıbê eva bazırganê Dumuşqêye, navê mın İbn Betutiye. Mın zuda jı tucara derheqa bajarê kela Dımdımê bihistiye, gotıne mın weki Xanoyê Çengzêrin mêreki maqule, zefi zaneye û rehme, tucara hızdıke. Eva cara ewlıne mın bazırganê xwe ani cem we. Weki ez bıvinım, mal lı vıra pak tê fırotanê. Ezê tımê bême bajarê we...

Qurşût bı dengeki devken, got:

Bêje tucar tu ser çeva hati, keremke, çı malê te heye

nava demeke kında gışkê bê fırotanê. Çarsiya kela Dımdımê hergav tıji mexluqete, ne ku tenê kurd lı vıra hene gele Asori, Fıle û Adrbêcani. Çı hûr-mûrê jı welatê dereke tê gışk tê fırotanê, tucar eşyayê xwe paşda nabın...

Wextê Qurşût usa bı dengeki bengzeki xweş xeber dıda, tucar zurbıbû lı wi dınhêri û xulamê Qurşûtê bı çek-silahe dınhêri, dılê wi da mıyaser bû, weki hema ev xwexwe Xanoyê çengzêrine, vegerya ser dilbendê xwe, bı erebi got, dilbend disa welgerande kurdi:

– Tucar dıbê: " Ez zef şame, weki berê ewlın ez ber dergê vê kela mezıne eyan rasti Mir Xanoyê çengzêr hatım. Helbet ev bextê mın bû"...

Qurşût got:

– Bêje tucar, ez ne Xanoyê çengzêrinım, ez bazarbaşime, lê, çawa tucar got, Xanoyê Çengzêrin rasti ji meriki mêvanhıze, ê ku dılê sax têne cem me.

Rengê tucar heveki xeyiri, ewi şermkır, weki ev gıliyê zêde gotın...

Qurşût hukm kır, ser mezınê dergevana, weki wi tucari bıvne çarsiyê lı Xana Musa bıhêwırinın. Xwexwe got ajot çû. Ew xan teze hatıbû avakırınê, xaneke zefe mezıne rınd bû. Wê xanêda çend çevi hebûn, her çevik cure-cure derê wan vedıbûn berbı çarsiyê. Û gava, tucar destpêkır eşyayê xwe dıfrot ciki dınêda nedıbır, her derê çeviya ku malê wi têda, vedıkır û destpêdıkır dıfrot...

Wextê bazırgan hat, lê hıla negihışte xanê, Musayê xweyê xanê ku dengê zengıl bihıst destxweda tê derxıst, weki ev dengê bazırganê tucarane, lez derkete pêşiya wan.

Ew meriyê, ku Qurşût bazırganra şandıbû, xwe gıhande Musa, gotê:

– Apê Musa, Qurşût ev bazırgana şandiye cem te, weki tu xana xweda rınd ci bıki.

Musa gotê:

– Sevê xatırê Qurşût ezê ciki rınd bıdme wi...

Musa erebi rınd zanıbû, ew hate cem tucar erebi pê-

Institut kurde de Paris

ra xeberda. Tucar bı şıvqelna xwe, hêdika stuyê devê xıst, got:

– İx, ix, ix...

Devê hêdi berê ewlın bı lıngê pêşın çok da erdê paşê herdu lıngê paşın, fesal lı erdê ix bû. Tucar jı devê peya bû. Sılav dane hevdu.

Musa da pêşiya tucar ew bıre wê çeviyê, ya ku wê bıda wi nişani wi da. Tucar ku fıreya xanê dit, der ave û dexlê, ku wê eşyayê xwe lê dayne dit, got:

– Weleh, eva xana jı xana Bexdayêye lape mezın kêmtır nine, hela çêtıre ji... Hela bınêr zexire ji têda heye bona xwarın çêkırınê.

Ewa derkete ber dêri, hukmê ser xulama kır, weki eşiya bıkşinıne xanê. Xulama berê ewlın deve gışk kırne heyatê, dane ixkırınê, bû ere-era deva ixbûn. Paşê xulama destpêkır eşiya vekırın û kışandına xanê.

İdi nêziki nivro bû. Qurşût berbı mala xwe çû, lê qestana lı kuça mala Mexsud lê dıma, wıra çû. Wexta ew nêziki mala wan bû, Dilberê lı ber dêri bû, ewê ji wê roja teva xweş, xaliçe, emeni, zili, kulav derxıstıbûn derva jı tozê û xubara zıvıstanê paqıjdıkır. Cejna serê salê nêzik dıbû. Ewê usa bı hewas xebatêda mıjul bıbû, qet bawer nedıkır, weki Qurşûtê bazarbaşi xulamava kuçan wanda tên. Şıveke çopılmeyê destda bû, ewê lı xaliçeke mezın dıxıst, toz jı xaliçe quloz dıbû.

Qurşût ku çev lı Dilbera bedew ket, kızin jı dılê wi hat. Dest bıre sımêlê xweye tenıke nazık bada, kolos qotkır û qure-qure lı xulama dengeki bılınd hılat, weki Dilber bıbhê:

– Hûn jı minani deveçiya lı ser hespa dılokın, merıv tırê hûn ne jı eşira Beroderanın, ne şervanê Xanoyê Çengzêrinın, zû xwe bıghinıne hev!

Bavê Qurşût hıla hê saxya xweda ew zewıcandıbû, paşê Qurşût disa çend cara zewıcibû, sê jınê wi hebûn. Dılê wi ketıbû Dilbera çev buru belek, ew çend carbûn meri



Institut kurde de Paris

dışandıne mala Mexsud, weki Dilberê xwera nişanke û tıştêd usa hêja dışandne nişaniya wê, ê ku lı wandera tûnebûn. Ew malêd xas tucara jı welatêd dur pêşkêş jêra danin. Lê ew nişaniyêd bıha nıkarıbûn dılê Dilberê bıkıryana, ne ji bavê Dilberê bıdana tımamkırınê, xwezgıniyê wê hergav bı wan nişanava paşta vedıgeriyan. Mexsudê bavê Dilberê dıgote wan xwezginya:

– Sê jınê wi hene, ez Dilbera xwe nadme ser sê hêwya, bıra, bıra here jıneke dınê bı wan bertila peydake...

Rasti ji Dilber keçeke zefe bedew bû. Bejneke nazık tenıke minani sûravêlka lêbû. Dêmê wê gulover bû, te dıgot hive, lı suretê çepê, nêziki xevava wê, xaleke lê bû. Ewê xala gerdana wêye spi çile-qerqaş û sûretê wêyi sori minani sêva, ne ku Qurşût tenê din dıkır, lê kijan meri çev lı wê horiyê dıket dindıbû, jı wê bedewiya wê. Gele xortêd delale jı ehlê kelê, kurêd maqulê eşira Berodera ser Dilberê bengi bıbûn û xwezgini dışandın, lê Dilberê ew dılnedıkırın... Xêni wê bedewiyê, gava Dilberê xeberdıda, xulqeki usa şırin lebû, te qey dıgot ne meriye gogerçine qube-quba wêye. Ewê çevê xwe kıl nedıda. Lê meriyê nenas ku Dilber dıditın, ew çev-buruyê wêye reşe–qeytani dınhêrin, bawernedıkırın, weki ew çevê xwe kıl nede. Tımê bist û çar guliyê hunaye dırêje ser pıştêda dadılıqıyan. Bona kawiya guliyada bı qeytana sor kespıkê berê darda kırıbûn. Weki çev lı guliyê wê nakevın, çend nıvıştê melle jı quranê nıvisi bona tılzımê, guliyê wêda dardakırıbûn. Kımbereke zive-zêr kıldayi lı pıştê bû. Lı seri taseke zive şırıkıri bû. Bercênikê wê topa stûyê wê, mori û karabarêd wêye delal singê dınıxamtın. Aliyê rastê xızêmeke şırıkkıri bêvlêda bû, şırkê xızımê dıhatın dıketıne ber pışta wê, heta bazın ji şırıkkıribûn. Lıngada tımê kondrê Wanê bûn...

Wextê Dilber nışkêva çev Qurşût ket, ewê bı edetê kal û bava, berê guhast, pışta xwe da wi. Lê Qurşût Qestana hespa xwe ajote nêzıki wê, got:

– Ruhê mın, çıqas tu berê xwe jı mın bıguhêri, lê tu-

yê nêcira mın bi, bermaliya mala mınbi.

Ew gıliyêd Qurşût lı Dilberê xweş nehat, ewê şerm da aliki, idi berê xwe da wi, hema mêrani bı eks got:

- Tu neheq bı wê gumanê dıfıkıri ez ne nêçira teme, bese, sê nêçira te mala teda hene, ewana nıha hıviya tene, here cem wan...

Dilber hêrs bû, got:

-- Riya xweda here, ez ne nêcira devê te teme...

-- Weleh, herkê bı perava, herkê bı zorêva, ezê te bıvme mala xwe.

- Çıma periyê zêde mêrara guneye, ne quranê ew izin daye me, mêra...

Dilber hêrs bû, got:

– Riya xweda here, ez ne nêçira devê teme...

– Weleh, herkê bı pereva, herkê bı zorêva, ezê te bıvme mala xwe.

-- Nebi te tırê, weki tu bazarbaşiyi, tu kari qiza ji zorê bıvi? Tu zani çar bırê mın hene, ewê te mina ruviya postkın, pak bıde aqılê xwe.

Dilberê ev gıli gotın û revi çû mal...

Gerekê bê gotınê, weki dılê Dilberê zûda ketıbû Şebabê kurê Adi. Ew çend çarbû wana lı çolê, wexta bındarûkê soz dabûne hevdû, hevra sondxwarıbûne, weki ewana hevdu bıstinın. Ew yek jı aliyê gele cahılada xuya bû, dê û bavê Dilberê bıhistıbûn. Ewana ji ne hemberi hızkırına hevbûn, çımki ewana jı alikida qebilekêbûn. Aliyê dın da ji Mexsûdê bavê Dilberê û bavê Şebab, Adi bramakê hevbûn. Wexta diya Mexsûd çıbû rehmetê, mırıbû, diya Adi şirê bıstanê xwe dabû Mexsûd, ew mezınkırıbû. Ewana hê zarotiyê da hevdu hızdıkırın çawa bıramak. Û çaxê, herkê keseki tışteki xırav bıgota yeki jı wan, ewana pışta hev dıgırtın, nedıhıştın, weki kesek gıliki tel bêje wan. Xêni wê yekê herdu bona xweykırına kela Dımdımê ketıbûne şera û lı wêderê ji bıratiya wane xunê testiq bıbû. Mexsûd û Adi ew çend carbûn derheqa herdu cahıla xeberdabûn, qayiliya

xwe dabûne hevdu û şuxul mabû her ser wê yekê, weki payizê dewata bırê Dilberê bıkın, paşê Adi bı edet xwezginyê xwe bışine mala Mexsûd.

## SERÊ DUDA
## ÇÊKIRINA MEÇÎTÊ

Kela Dımdımêra meçit ji hatıbû avakırınê, Meçiteke usa kaw hatıbû avakırınê te qey dıgot hevalcêwiyê meçita Stenbolêye. Dema hışyarkırına meçitê kuta bû û mınara wêye bılınd hazır bû, weki melle rabe ser wê bılındayê û dua bıke, mexluqet bê nımêje. Lê melle hê tunebû, Xano xwexwe rabû ser mınarê, ewi jorda ne ku bajarê kelê dit, ewi gelek best, geli, newal û çiyayêd dûr – gışk pêva hatıne xwanêkırınê. Gava ku ew pêya bû, ewi gote hosta:

–Hoste Nadır, seva vê çêkırına teye zane û rınd tu layiqi, weki ez çengê zêr bıdme te ji. Lê gerekê tu çar qubêd mınani vê mınarê bılınd avaki. Ez dıvêm tu pak zani, weki Şah Abas Şıhye, ew me soniya hıznake, hertım eskerê gıran dışinıne ser me şer. Wan qubada tımê qerewılê şevê û rojê wê bısekının, gava ku dıjmın hatın, ewê bıvinın, cabê bıdıne me.

Hoste Nadır gote Xano:

– Maqul, ne ez ji sunime, ezê qubene wusa çêkım, weki te lı bajarê Bexdayê ji neditıne û qerewılê jı wan bılındaya herçar aliyê kelê, wê pêva xwanê bıkın.

İdi payiz bû. Terewıl, qulıng, reşêle, dumeqesk û êd mayin zuda fırıbûn çûbune Beriyê, ciyê germ kiderê zıvıstanê berf qe nekeve, hergav germe. Raste payiz bû, lê hewa hê xweş bû. Sıbeke payizê bû. Ezmanê şin safi bû jı ewra. Pençê tevê zuda dabû deşt û zozana, her bajarê kelê bın siyêda bû, çımki çiyayê Dımdımêyi bılınd nedihışt zû tev tıkeve serê kelê. Ehlê kelê wê sıbê geleki zû rabıbûn. Çımki

Institut kurde de Paris

rınge--rıngeke usa qewin jı çiya dıhat, gışk hışyar kırıbûn. Wexta himê kelê kolan, lı wêderê avayê xaniyê kevn derdıketın. Karapêtê hostê kelê got: "Kıvşe lı vıra berê ji meri hebûne, lê jı dest hejandına çiyê gışk wêranbûye".

Wê sıva xweş melle Reşit minani hergav rabû ser mınarê bı dengeki bılınd eşaret kır, weki wexta nımêjêye. Dengê meleyi ziz ketıbû wan çiya, newala û berê zınara, te qey dıgot eva ne melleke, eva gele mellene lı wan çiya, newala û geliya azandıkın. Kubra wiye huleyi xweş geleki dur merıva dıbihıst û ew gundêd dora kelê, wextê ew dengê melle Reşit dıbihıstın, wana ji wi çaxi destbı nımêja xwe dıkırın...

Ehlê kelêye mêr, hema ku vê sıbê, bıhistın dengê melle Reşit, mısinê xwe hıldan û berbı meçitê çûn. Wê gavê Xano ji çend xulamê dorê berbı meçitê dıhat. Cmaetê ku dit Xanoye, xwe dane aliki, rê dane wi, weki ew pêşiyê here meçitê. Gerekê bê gotınê cmaeta Berodera gışka Xano hızdıkır, çawa mêrxas, çawa meriki rast û rehm. Xano beri gışkara derbaz bû, çû meçitê. Ew çû ser kaniya karêzkeri, ya ku anibûna heyata meçitê, bona destnımêjê, çend çeviyê wê hebûn, xule-xula ava sar bû jorda dıhate xwarê. Cihê ku ewi lı nımêj dıkır cuda bû...

Ew du sala zêdetır bû mecit hatıbû avakırınê, lê melle tune bû, têda nımêj nedıbû. Ew çend carbûn melle dıhatne cem Xano, weki qulıxi meçitê bıkın, lê Xano ew qebûl nedıkırın. Mellek carekê jı kerbelaye hat, navê wi Memedeli bû. Yeki kurnuk bû. Suretê wi xurya usa kırıbû, te qey dıgot teyroka bıharêye gumreh lı zevıya teze çandi û teze tapan kıri xıstye, qul-qulki kıriye û pey wê yekêra cina genım lê şinbûye, lê cina ji qe şinnebûye, hema usa sêrek dıgıhije. Pırça ruyê wi ji usa têl-têli sêrek bû. Melle çawa edet bû, rûyê xwe hınekırıbû, lê têlê rûyê wiya sêreke hınekıri, ew kırıbû eliwat. Kê melle dıdit berxweda dıgot: "Bisimılah, ev çiye?" Berê xwe dıguhast û dıkeniya. Melle

nêziki Xano bû, qe sılav ji neda Xano qure-qure, got:

– Şah Abas ez şandıme cem we, weki ez qulıxi vê meçitê bıkım...

Xano bı avrûnê tuj deqekê lı melle nıhêri, paşê got:

– Vıra welatê Kurdane, ne çiyê Şahê İranêye, weki ew melle bışine, xêni wê yekê em kurdın û dinê me cudaye - um sunine ne şıhine, mera lazıme, weki melle me ji Kurdbe û sunibe. Lê tu ecemi bıcehıme jı van dera...

Bû pıqiniya cmeata sekıni kenya. Lê melle ku dit fırştengbûna Xano, qe dengê xwe nekır. Çellê xwe hılda kereker fızırand, derket çû..

Lê mellê ku iro lı mınarê ebabeti xwedê dıkır Kurd bû, ewi ji eşira Muqırya bû. Yeki sıvıki cahıli zerin bû. Wextê nımêj kuta bû, mexluqet idi bere-bere jı meçitê derdıketın wi çaxi du sıyara ajote ber dergê meçitê, sılav dan, paşê pırskırın:

– Xanoyê Çengzêrin lı vıre?

Çend mêra hevra gotın:

– Belê, ewi lı vıre, wê nıha jı meçitê derkeve. Hespê wan kefêda mewıcibûn, ew yek kıvş dıkır, weki siyar ciki dur û lez hatıne, ne qasıdê xêrêne, çımki ew lêzbûna ku wana ajote ber derê meçitê jı edet der bû, ne şuxulê şerietê bu ji...

Xortê pêşin koloseki devetûki sêri bû. Dora kolos şer-semaqi lê pêçabûn pêşiya şerêye dırêj dıhatın dıketne ser mıla. Gava ku xort xeber dıda û serê xwe dıbır dani, rişiyê şerê pêra dıhejiyan, kawiya rın dıda suretê wi. Rımeke movıkkıri destê rastêda bû, serê rımê qotıke pêva darda kırıbû, merıv tırê ew nışanek bû, çımki ew qotık lı serê rıma xortê dınêda tunebû. Xort qayişa rımê jı zenguyê derxıst, weki lıngê wi rehetbe. Şureki kevan lı kêlekêda dardakırıbû. Qalıbê şurê wi bı bazınê zıvkıri bû. Qevza şur ji ziv bû, lê bı zêr kıldabû û ber tevê dıbırıqi. Merteleke Şa-

miyê *) gulover lı mılê çepêda bû, dora devzendıka mertalêye gırtınê bı têlê sor, spi û kesk nıqışandıbûn. Ew yek eyan dıkır, weki cahılekê bı dıleki hub pê tıli-pêçiyê xunandıbû, ew qeytan. Ser arxalixê wida zıri lêbû. Ewi zıri sıngê wi heta navıkê jêrtır û namıla wi hettani kembera pıştê hıla heveki jêrtır xweydıkır. Jı derbêd neyara. Mılê zıriyê dırêj bûn, dahatın dıketne ser zenda wi û jı derba xweydıkırın. Piştoke ber pışta widabû, tetkê piştoye kevan jı ber pıştêda xwanê dıkır. Hespê bın wida bozi xalixali bû. Kes nızane çend roja rê hatıbûn, lê disa hespê boz rehet nedısekini, erd pêkol dıkır, dizgin dıkşand, hire-hira wi bû, lê-lê bû ser surêra banzde here heyata meçitê...

Meriyê ku jı meçitê derdıketın bı dıleki hewas lı wi xorti û hespê boz dınhêrin. Siyarê dınê ji bı rım, şur, mertal û qeme bû, çek-rıhalê wiye xılmet nişandıkırın, weki ew jı nısla kesibane. Dıvek ew xulamê wi maquliye..

Xano pey xılasbûna nımêjêra lı heyata meçitê çend meriyara xeberdıda. Gava gotna wi, weki du qasıdê ne nas ber derê meçitê pırsa wi dıkın: ew hêdika berbı dergê meçitê hat kaleki destê xwe dırêj kır, gote wan xortêd xerib:

— Ewi hani bılınd Xanoyê Çengzêrine tê.

Xorta dit mêreki bejnbılınd, çendeki mezıni lê, wê wêda tê, xulamê wi dorêne. Ebaki spi lêye, ser ebêda qaputeki qawerengi lêye, avitıye ser mılê xwe. Pısteke Kermane lı navkêlkê pêcaye, xencereke ber pıştêdane. Qewza xençerêye jı hestiyê spi ber pıştêda xwenêdıke. Wextê ewi gava dıda ber erdê te qey dıgot ew ci bın lıngê wida tıtewın. Sımêleke dırêje palık lê bû, sımêlê wi çurbûn, çevê wi gır, buruyê wiye sıxe kaw dalıqıya bûn. Lı suretê çepê dexmek hebû, ewê bırinê, birdani rojêd oxırmêd gırane derbazbûyi. Xano ku nêziki wan bû, got:

— Merheba, xortêd delal, hûn xêr hatıne, çı qewımiye? Hûn jı kijan eşirêne?

*) Şamiye — yanê lı bajarê Şamê hatiye çêkırınê.

Institut kurde de Paris

Herdu xorta jı banzdane erdê, sılava wi vegırtın, temene bûn. Ew xortê ku çek-rıhalê rınde lê, got:

– Çı xêre, maqûl, Em jı eşira Şıkakanın, eva çend roje serbazê Şah Abas ketıne nav me, xerc kom dıkın, lê ev ne xercê hema talan dıkın, çı berdıkeve rapêçdıkın dıvın, herkê nanbe, herkê hasılbe, herkê dewarbe, heta nıvinê mala ji dıbın. Weki yek ber wan xeberde, yanê bêje ku ezi kesibım tışteki mın tune, weki ez xerc bıdım, serbazê Şah Abas wi davê nava qamçiyê û zopa usa dıkutın, weki ida jı erdê ranebe. Gelek jın, zarêd hûr, pir û kal têne zêrandınê. Gıre-gırê rûspıyê eşira me, em şandıne cem te, weki tu komekê bıdi me, emê şerkın hemberi wan.

Xano ku ev gıli bihıst, kete mıtala, fıkıri bû, ewi zanıbû, weki ew nıkare here, çımki hoste Nadır gerekê destbı çêkırına çar quba bıke. Xêni wê yekê Xaçoyê hostê topa ew sê meha zêdetır bû, çûbû bajarê Wanê, weki hesın bine, lê hê nehatıbû, hiviya wi bû. Yekê ji kete bira wi, çawa eşira Şıkaka qe dest ber xwe hılneda hemberi Şahê İranê, wextêda şernekır, got:

– Aliki hûn neheqın, mezınê we neheqın, wextê Şah Abas eskerê xwe şande nava we, we qe dengê xwe nekır, hela serda qurban şerjêdıkırın. Lê gava ku Şah Abas esker dışandıne ser me, we qe disa dengê xwe nekır. Lê keremkın em herne diwanxanê.

Xano dem û dezgê wi xurtıra, fıresatê wi, zımanê wiyi Maqulra tıxminkir, weki ew xort jı serwêrane dıbek kurê begê eşira Şıkakane. Ewana hêdika berbı dıwanxanê dıhatın, Xano dısa got:

– Sultanê Romê, Şahê İranê me Kurda beri hev dıdın, em hevdu qırdıkın, paşê ewana stuyê me siyardıbın û metalan dıkın. Dêmek neheqi medane ji, femdariye, xortê delal?

– Belê, maqûl,–xort got.

Ewana ku hatne diwanxanê, Xano şande pey kurê

xweyi mezın, ew ku hat, gotêda:

– Sêvdin, lao êla Şıkaka ketye tengasiyê, çawa heve mıletê meye, eşırın, pênsıd xortêd cahıl hılde here.

Xort jı ciyê xwe rabû, temene bû, got:

– Maqûl, em zef razine, xwedê me rojekê te nede şermê...

Hema usa wê rojê pênsıd xortêd eşira Berodora jı Kela Dımdımê derketın, çûne hewariya ela Şıkaka....

## SERÊ SISYA
## HEMZE ÇAWIŞ

Rojek mabû, weki cejna (eyd) serê salê bıkın. Wê cejnêra em Kurd dıbên "Nevroj".

Ehlê kela Dımdımê karê xwe dıkırın, weki wê roja eziz bı eşq derbazkın. Pez serjêdıkırın, qeli, helıse, kıfte û xwarna mayin çêdıkırın, fêki amade dıkırın, kuloçê serê salê dıpêtın, nışanek - gustul, yanê mori yanê ji perê ziv dıkırne nava kuloç, wextê kuloç parvekırın, weki ew nişan jı neferê malê kêra ket - dêmek dewleta wê malê serê widane.

Şevekê beri roja cejna serê salê gerekê erhede çûk û mezın avê xwekın, herne hımamê, weki paqıj têkevne sala nû. Hınek kınçê nû dıkırın, weki hergav û hersal kıncê wane nû hebın. Wan roja lı çarsiya Kela Dımdımê, kes nızane jı ku tên, tıji dıbın feldar, derwêş, koçek û melle. Wan roja kara wan zefe, çımki gele cahıl têne cem wana velıka vedıkın; gelo wê dılketiyê xwe bıstinın, yanê na, hıneka ji cem mella jı quranê nıvışt dıkırın, weki dılketiya ser xwe bengi bıkın, Mella qestana hêdika guhê wanda dıgotın:

– Tu gerekê vê nıvıştê bıvi bın şêmika mala bavê keçıkê çelki, ewê xwexwe bıde pey te, bê. Lê gereke tu bıki, weki kesek nebine.

Xort dıgote melle:

– Weleh, ezê işev usa ber şêmika wanda nıvıştê çelkım, weki tu bende nevine..

Wan rojêd eziz herkê zureta kê tunebû, yanê kurê wi tunebû, ewi ji dıçû cem mella koçeka û dewrêşa fêl vedıkırın û nıvışt cem mella dınıvisin, weki ewledê wi hebe. Hınek nexaş ji dıhatın bona sılametbûna xwe, nıvışt dıkırın. Nêzikbûna wan rojêd eziz, gımin jı bajarê Kela Dımdımê dıhat, lı çarsûyê dıkana, xanada, meydana dêwêr gele eşya, mal, dewar dıhatıne fırotanê, çûk û mezın, kesib dewlemend karê xwe û roja eydê dıkırın. Lı kuçan, çarsiya, berê derêmala, ser serê xaniya û lı axpîna agır dadıdan, cahıla dora agır govend dıgırtın û dılistın. Ew eyd û eşq derbaz dıkırın ne ku tenê lı bajêr, usa ji eşq derbaz dıkırın lı hemû gunda, lı qıjla heta şıvana ji, ê ku ber keri û suriyê pêz lı çolê bûn, ew eyda dıkırın...

Temi dabûne qerewılêd bırcêd kelê, weki wan rojêd eziz hışyarbın, dıjmın lı ser wanda nışkêva negıre, çımki ew çend car bûn şahê İranê hemû mecal, rê û meni dıda xebatê, weki bı tehreki Kela Dımdımê zevtke, mexluqêtê wê têke bın destê xwe, xwera bıde xebatê û rê berbı kuraya Kurdıstanê veke. Lê wan hemû caran ji eskerê wi dıhate qırê, Kurda rev lı eskerê wi dıxıst û peşmurde dıreviyan dıçûne İranê.

Bıbû edet: hersal wê roja 21 ê meha Adarê, mıclisa eşira Berodora lı dıwanxana Xano rûdınışt, cejn dıkırın. Wê rojê dewlemendên kelê, dıkançı, tucar, çewdar û êd mayin dıhatıne dıwanxanê, hızûrê Xano bımbarekiya eydê dıkırın û hevdayi dıdan. Wê rojê Farızê çawdar, xwayê çend hezar pez û garanêd dewara sed pez da, got:

– Ez vi sed pezi dıdım bona eskerê Xano, ê ku me jı zulma şahê İranê xweydıke.

Wê rojê Musayê xweyê xana mezın deh zêr dan, got:

- Ez van deh zêra dıdım, weki em rehet û bırati dıjin

Institut kurde de Paris

lı Kela Dımdımê saya Xanoyê Çengzêrin.

Wê rojê hedayi anibûn ne ku tenê ehlê bajêr, gele hedayi anibûn mezınêd qebila jı qeza û gunda. Kê dıhat lı dıwanxana Xano rûdınışt, kêf dıkırın,. Qawe, xwarın, fıncanêd şerbetê, pelaw, qeliya sêlê, kıvav û fêki tıji lı ser texte bû. Lı saz dıxıstın, dengbêja û aşıqad kılamêd mêraniyê û rojêd çûyin dıgotın, hıneka beytê Feqiyê Teyran dıgotın, hıneka ji jı Ahmedê Xanê "Mem û Zinê" dıgotın.

Diwanbaşi derda hat, gote Xano:

-Maqûl qerewılê meye jêrın merik gırtıne, anine. Em çı ji wi dıpırsın, ew caba me nade, dıbê: "Çı gıliyê mın hene ezê her Xanora bêjım".

Xano pırsi

– Çı mılete?

Diwanbaşi cab da:

– Kurde.

– Bıhêlın bıra bê...

Wextê ew meriyê nenas hate dıwanxanê, duyê cıxara û qelına avite bêvlê wi. Ew deqekê sekıni, paşê got:

– Selam elekum, cejna we piroz be, tımê salêd usa derbaz kın...

Xano got:

– Tu ser çava hati.

Ci nişani wi da, got:

– Keremke rûnê.

Nan anine ber wi, ewi bı medeki xweş nan dıxwar, bı xarına wira kıvş bû, weki ev çend roje nan devê wi neketiye. Wextê ewi nan xwar kuta kır. Xano gote wi:

– Qurba bı qeydê me eşire: "Berê nan xwarın, paşê pırs - hewal dıkın". Bêje tu kiyi? jı kijan eşirêyi, çı lı serê te qewımiye, weki tu lı vê roja eziz jı mala xwe derketiyi, te daye ser rê, hati cem me, bêje şermneke, çı qewata me heye emê bıdıne te. Kê xwe jı eşira Berodora gırtıye bê alikari nemaye...

Ev mêrkê nenas fıncana şerbetê jı ser texte hılda ve-



Institut kurde de Paris

xwar, got:

– Navê mın Hemze Çawışe. Ez jı Diyarbekırê jı eşira Xaltame. Mı qulıxi padşê Romê dıkır, eva deh sal heyebûme çawışê esker. Mın gele xortêd cahıl hini telimê dıkır, weki dıjmınê dewleta Romê belavkın. Padşê Romê hertım em dışandına şer hemberi mılletên mayin. Padşa qumandara û melle wan dıgotıne me:

– Eva mılletana ne islamın, gawırın, dıjmınê islamêne, gerekê em, jına, kala, pira, û zara qırkın, malê wan ji talan kın, ne guneye helale...

Çawa eskerê helal mın hemû hukmê wan dıqedand, me çı bêji dıkır, me dil ji dıgırt dâni...

Melle û qumandarê Romê dıgotıne me:

– Islam gışk bırê hevın...

Me ew gılıyêd wan bawer nedıkır, lê gava ku eskerê Romê vegeriya berbı welatê mın, destpêkır kuştına zara, kala, jınêd pir û talan kırın, xıreta mın qebûl nekır... Kete bira mın temya kal û bavêd me, ê ku zarotiyêda dıgotıne me:

"Sultanêd Romê, paşê wan dıjmınêd mıletê Kurdın". Mın temul nedıkır idi ez nıkarıbûm nav wanda bımama... Ez jı bajarê Stenbolê, jı nav eskerê wani lapi xas "Yeniçeri" revim. Mın zûda bihıstıbû, weki Xanoyê Çengzêrin bûye gumana Kurda, welatê kal û bava jı Şahê Îranê û Padşê Romê xweydıke. Lema eva şeş meh heye ez revime lı serê çiyayêd berf û geliyêd kurva hatım qulıxi te bıkım, qulıxi welat bıkım û heyfa jın - zarêd Kurda kal û pira hıldım. Maqûl, mın gelek eskerê siyari bona Padşê Romê hinkır, nıha ez hatıme cem te, ezê bı geleki helal bona te esker hini telimi bıkım...

Hemze Çawış gıliyê xwe kuta kırın. Xano got:

– Lawê mın, ew şirê ku diya te daye te, lı te helalbe. Tu jı mınra ser şeş kura–kura hevtayi, –ewi destê xwe dırêji meclisi kır,– eva gışk ji tera bırane. Lê gerekê ez jı tera bêjım, bıra ev meclısa mın ji şahadbe herkê tu sıdqeki sax

Institut kurde de Paris

û helal hati cem me, em tera bırane, lê weki tu hati bona mıxenetiyê, usa bızanbe tu xêrê nabini. De idi here, kurê mın, bıra vi lıbasi jı te bıxın û bışewıtinın, lıbasne dınê bıdne te, bıra bin û buxza Padşê Romê nav meda tunebe.

Xano gote kurê xwe:

– Lao Hemze Çawış bıve zexırexana kınca bıra deste kıncê teze bıdıne wi.

Ebdıleziz kurê Xanoyi ortê û Hemze Çawış jı diwanê derketın. Ewana ku derketıne derva Baro, mezıneki jı eşira Takorya bû, zûda hatıbû gihıştıbû eşira Xano, got:

– Eva meriya xwedêda hat gihışte me, evê geleki kêri me bê.

Cewzo, serkarê esker got:

– Welleh ezê bıvım, bıra eskerê cahıl hini telımêke...

Ew çend rojbû Hemze Çawış cahıl hini telimê dıkırın. Deng zû bela bû, nav hemû olkêd eşira Berodora, weki çawışeki Kurd jı Stenbolê hatye cahıle telima eskeriyê dıke. Herro cahılêd dıhatıne cem Cewzo, pırsdıkırın:

– Apê Cewzo, kengê hûnê me ji komkın bona hinkırına telimê, em ji dıxwazın hinbın?

Ewi caba wan dıda:

– Leznekevın, van roja ezê wera bêjım. Beri ewlın emê wana hıldın, ewê ku hespê wan hene, lê ew cahılê ku hespê wan tune, em hıla nabne ber telimê.

Jı cejna serê salê çend meh darbaz bıbûn. Hemze Çawış ida pênsıd cahıl hini talımê dıkır. Cahıl bere-bere zêde dıbûn, lê ewi ew cahılê ku jı olka û gunda teze dıhatın jı wana taxbûrêd cure-cure pêkdıhani û hindıkır.

Rojeke havinê bû, nanê çandi ida gihiştıbû, kêlendi, melendi û dest ketıbûne nav genım û dıdurtın. Sıveke zû bû. Hemze Çawış derkete derva; qıbe–qıba kevotka bû, lı berê zinara jı nav zevyê dırûyi ji dengê kartika dıhat, kıvş ku wana cûcûkê xwe derxıstıbûn, lema usa şa dıbûn. Ewi wê rojê çıqas cahılê wiye telimê hebûn, hılda derkete pış kela



Institut kurde de Paris

Dımdımê û şırovekır:

– Hûn pêviste bızanbın, weki eskerê siyari şerada çawa cihê xwe dıgre. Siyarê hespê pêviste rınd bızanbe çawa hespê wê wextê çetında bıde xevatê weki kê wê yekê nızanbe, siyarbûna wi bê fedeye, bê kêre û zû wê bê kuştınê...

Ewi hespê xwe ajot, meydaneke gumreh jı wan durket, paşê hespê xwe vegerand û bı bayê berbı wan hat, wi bayê hespêra ewi şurê xwe usa çepo-rasto usa çeleng, kaw dıxebıtand, meri ecêbmayi dıman. Paşê meydaneke dınê ji çû. Ewi çûyina hespêra zinê hespê vekır, qe heya nebû, paşê disa tengê zın şıdandın, gote cahıla:

– Ezê nıha bıcerıbinım, çıka kê jı xwe zû dıxebıte. Berê emê cida zinê hespa jê bıkın û lêkın, siyarbın û peyabın, çıka kê jı we telim rınd hinbûye, zû van şuxula dıqedine. De hazırbın...

Wexti ewi hukım dıkır, cahıla zinê hespa jê dıkır, paşê disa lê dıkır, siyarbûn û zûtırê peya dıbûn. Wana gışka usa zû ew yeka dıkırın, hewasa Hemze Çawış wê telima wanra dıhat û dılê xweda dıgot:

– Şıkır, hûn zılamêd Kurdanın ne ê Tırkanın, ê ku dıhatne telimê newêrbûn nêziki hespa bıvın û nızanbûn çawa zinkın me ew hin dıkır, û nivê emrê me wanra dıçû.

Ewi bı dengeki bılınd got:

– İda hûn pak hini hıcûma xevata şûr, mertala û rıma bûne, pak dıxebıtın û karın dıjmınê kurda qırkın.

Paşê ewi cahıl kırıne du tira, hınek hini xevata şûr, mertala û qema dıbûn, hınek ji bı rıma û tir-kevanbûn. Hezar cahıli zêdetır pak hini van telima bıbûn. Lê Hemze çawış nedısekıni, ewi herro cahıl dıbırıne çolê bı wan telımava mıjûl dıbûn. Carna ewi qestana heta êvarê cahıl nedıbırıne nanxwarınê.

Ewi fıkra xweda dıgot:

"Bra hini bırçibûnê ji bıvın, weki rojêd oxırmê gıran bıkarın bê nan berxwebıdın".

Institut kurde de Paris

Hemze Çawış bı razılıxya Xano çend şagırtê xweye rınde-zane şandıbû gundêd duri kelê, weki cahılê wan gunda hini telimê bıkın...

Xano hersal payizê dıçû nêçirê, ewi dıgot:

– Nêçira havinê bê kêre, çımki wi çaxi çêjık, çuçukê wan hê vırnine, guneye lêxın. Lê payiza karêd xezala, golıkêd gakûviya, kudkêd hırça idi epêce gıvrık dıbûn, goştê wan xweşe, her wê çaxê gereki merıv nêçirê bıke.

Raste, payiz bû, lê roje hê xweş bûn, tevê hê rınd erd germ dıkır. A, rojeke usa sıve zû bû, Xano û çend meriyê xweva çûne nêçirê. Wê rojê ewana lı nava mêşe heta nivro, wextê tevê qıjıland nêçir dıkırın. Paşê hatıne ser wê kaniyê, kiderê hergav hêsa dıbûn. Ber dereke mezında bın siya wêda Koçoyê kal, pısporê nêçirê, kareke xezala postkır, hıne goştê wê hurkır, bı pıncara binxweşva kıre hûrê wêyi şuşti. Hur ji goştva dani çela kolayi û kurma agır ser dani. Ew goştê mayin ji kıre kıvav, got:

– Hûn keremkın, heveki qewati bıkın, heta qelya şıvana hazır dıbe...

Nêçira iroyin, minani hergav, pak bû. Kuştıbûn sê karê xezalê, du golıkê gakûviya û nêriki bıznayi mezın. Wextê qeli jı hazırbû, wana destbı xwarına qeliyê kır. Gava du-sê çiti xwarın, Xano got:

- Emrada, tu xwarın jı xwarına çolê medetır û xweştır tune û ew ji qeliya şıvanabe.

Gışka got: "Eşed bıla usane"...

Gava ku nan xwarın, ku ta kırın, rabûn cendekêd nêçira xwe lı qantıra barkırın, dane xulama û berbı mal şandın.

Rêva wana hevra xeberdıda, kijan teji bina xwe nêçirê hıldıde, zû pêşibıri nêzirê dıgre, dıde sekınandın, heta nêçırvan xwe dıghine wan. Kijan teji jı bizeke, ewqas xwe nade pey nêçirê û pêşibıri nêçirê nake...

Serekê nêçirvana, Koçoyê kal, got:

– Jı zarotiya xweda heta nıha ez nêçirvanê dıkım, lê gerekê bêjım, çıqas nêçirvan pısporbe, lê bê teji nıkare



Institut kurde de Paris

pak nêçirê bıke, çımki teji binê zû hıldıde û zane nêçir kijan ali çû, rêçê nişani meriya dıde...

Yeki bı eks got:

- Apê Koço, lema te da pey tejiyê, tu çûyi ev bızınê pir kuşt ani, goşti wi ji nayê xwarınê...

Ev gıliyê eks, rengê kalê da xeyirandınê, kıvş bû ew berxwe dıket. Xano yek texmin kır, ewi Koçoyê kal hızdıkır, ber dılê wi da hat, got:

- Ev nêçira, jı van nêçira tevi baştıre, struyê wi emê diwanxanêda dardakın, çıqas maqulêd eşira bên û tucarêd welatê dereke ji bên, wê ecêbmayi bıminın. Xwe Koço bona goştê wi ew nekuştiye? Rasti bêjım struyê usa mın emrda qe neditiye. Lê ez nızam em çawa hışk bıkın û çêkın, weki bedewiya serê wi xırab nebe.

Eva gıliyana lı Koçoyê kal xweş hatın, ewi got:

- Ezê gazi Bengzadıkım, bıra ew hışk bıkın û çêkın, ewana vi şuxulida hostane...

Van xeberdanada wana qe texmin nekır, çawa idi nêziki kelê bûne. Nışkêva dengê gele meriya hat, paşê kenê geleka lı Xano tesele bû, bû minani hewarzekê, çend denga hevra gotın "Eferım, eferım"...

Xano pırsi:

- Ev çı dengın û kenın?

Xulama gote Xano:

- Ev dengê cahılane tê, pış wi qujmeyi, lı rasta Qendilê, Hemze çawış cahıla hini telima eskeriyê dıke...

Xano xwest here wêderê. Ewana wêda çûn. Gava ku ewana jı gêli derketına serê qujme, ecêbmayi man, çımki hatıbûn vıra gele cahıl û ehlê kelê û jı gundêd nêzik, iro cerıbandına telimê bû, ya ku eva salekê zêde heye hindıbûn. Ew cêrıbandın tışteki usa hevas bû, weki meriyê ku wêderê sekınibûn keseki jı wan texminnedıkır, çawa Xano bı çend siyarava hate cem wan. Nav wan meriyê ku temaşedıkırın hebûn gelek kal, ê ku Xanora gele şerada mêrani kırıbûn û fêrız derketıbûn hemberi eskerêd İranê û Romê.

Institut kurde de Paris

Xêlekê şunda wana ku Xano ditın, hatıne cem wi û temene bûn. Xano sılava wan vegırt, got:

— Çawane, ez dıvinım kırê sera têne we?

Kal kenyan. Yeki jı wan got:

— Ne xırab bû, weki me bavita ser şah Abas, lê em hatıne temasa telıma cahıla dıkın...

Xano pırsi:

— E, qe telıma wan çawane?

- Tu kêmasiya hinkırına wan tune, hıla bınêr çı nenera dıkın? Weleh Hemze çawış zabıteki zaneye.

Cahılê hıneke siyar bûn, hıneke bı şûr mertal, qeme, sekınibûn. Vıra hebûn tir-kevanci, ewe peyabûn, dûr sekınibûn. Meydana telim cêrıbandınê ne ciki rasti duz bû. Cina hezek bû, qamuş lê şindıbû, cina kevır bû, cina ji tumê darê mêşe bûn. Kıvş bû Hemze Çawış qestana ciki usa bıjartıbû, weki hemû cina cahıl bızanbın çawa bıxebıtın. Hemze Çawış dûr sekınibû. Ewi bı dengeki teqıl, got:

— Hazır!!

Esker, gışk kip sekıni, paşê ewi got:

- Hıcumi ser dıjmın!...

Wi dengira cahıla ajote ser hev, idi te dıgot ev şereki rastiyê hevdu qelıbin lı wan hezeka, çewa tumê dara û kevıra. Hemze Çawış kıre gazi:

— Usıv, Rostem, merıv rımê usa nagre. Rıma xwe bı xurti kêleka xweva bıgıvêşın. Ez dıvinım rımêd we minani darê gavana, pê çêleka dajon, vi ali, wi ali dıhejın. Çıma hûn çêleka dajon? Birnekın hûne şerdanın...

Meriyê ku temaşe dıkırın kenyan. Wan telimada hınek usa zû û zırıng hini fesala gırtına meriya bıbûn. Xano dit çend xorta werıs avitıne stûyê meriya gırtın, lê çend hev jı ewê gırti hahanga qeme avitıne werıs jı stuyê xwe bırin û xılas bûn. Ew yek jı Xano xweş hat.

Hemze çawış disa bı teqıl kıre gazi:

— Bese, paşta vekışın! Hêsa!...

Paşê ewi xortêd peya bı tir-kevan dane cêrıbandınê.

Institut kurde de Paris

Wana tir kevanê xwe rastkırın û beri tumê dara dan. Vıra ji telimeke hewas bû...

Çend telima şunda Hemze çawış ew ji dane sekınandınê û paşê gışkara, got:

– Ez vê cêrıbandına telima we iroyin razime lê gerekê bê gotınê, lê nav weda hê hınek hela hene ne bı dılê mının, hıla çekan pak nagırın, rınd nadne xevatê. Wexta şerda ewê bênamûsbın û dıjmınê wan bıkuje. Hıla bınhêrın, gerekê şerkar çawa rımê bıgre xwe, wextê here hıcumê û çawa rımê bıxevıtine.

Hemze çawış hespê xwe zengukır û hespê çılape kır çû, ew tik ser pışta hespê bû, lê wexta hespê wi vegeriya û bı bayê xwe berbı cahıla hat, ewi rıma xwe qayim kêleka xweva gıvaştıbû, xwe ji ser pışta hespê usa teland, te qey dıgot, hesp vala tê, rıma xwe ji lı pêşiya dırêjkırıbû. Û gava ku ew nêziki cahıla bû, merıv tırê titkê mêrê kulêye, çawa wi dıkete nav dılê meriya. Heta cem cahıla û kip hespê xwe da sekınandınê...

Sehetekê zêdetır hebû. Xano lı cahıla mêze dıkır. Telima Hemze Çawış geleki lı wi xweş hat. Ew vegeriya berbı meriyê dora wi sekınibû, got:

– Ev cahılêd bê hesp ezê jı revoyê xwe hespa bıdme gışka, bıra ew ji siyarbın. Lê eferım Hemze çawışra, mêrık hosteki zaneye...

Paşê ewi gote mıraxurê xwe:

– Adi, iro serwêrê revoçya bışine bıra revoyê hespa bine nêziki bajêr. Ew cahıl ji bıra bên, xwera hespa bıgrın...

Hemze Çawış dereng texmin kır, weki Xano cımaetêdaye, bere-bere berbı cahıla tê. Xano idi nêziki tir-kevançiya bû, bı ken wanra xeberda, got:

– Hûn çıma hespa şiyarnabın peya tên?..

Xorteki dênê wi ber devê qımer bıbû, lê porê wi çûr bû, çevne gıre sute lê bûn, wa qure-qure got:

– Maqulê me, tu bavê eşirêyi, weki hespê me hebûna, em ji wê siyarbûna, hespê me tune, yek ezım qantıreke

me heye, ezê çı siyarbım?...

– Ewê ku hespê wan tunene, –Xano got,– sıvê ber êvarê werne cem Adiyê Mıraxur, herne nava revoyê hespa her yek jı we hespekê xwera bıgre. Lê her yek jı we gerekê werısa xwera bıve, weki hûn bıkarıbın, hespa bıgrın, çımki ew hespe tımê terxanın, hini meriya nebûne. Hûnê xwera hinkın.

Cahıla ku bihist ev gıliyê Xano şabûn, rengê wan cahıla minani gula parwede, ken hate ser lêvê wan.

Jı şabûna keseki dengê xwe nekır, her kes disa ewi xorti got.

– Em gışk xulamê tene, emê jı minani mezına kal û bava şerkın bona welatê kurda.

Xano got:

– Emre we dırêj be...

Hemza çawış hat nêziki wi bû, eskeri temen gırt, destê xwe da ber enya xwe û sıngê xwe ber Xano daxul bû, got:

– Tu ser çava hati, maqûl...

- Lawê mın tera qewetbe..

– Ez xulamê teme..

– Ew telima ku tu dıdi cahıla tışteki zef rınde, mın xweş tê, weki hınek jı eşirên me kurda xayinti mıletê xwera nekırıne, ne şahê İranê, ne ji padşê Romê nıkarıbûn bıhatana ser welatê kurda, lê heyf xayin navmeda hene...

Xano heveki pêşta çû nava siyara, Hemze çawış pey wi bû, ewi bı desta nişan kır, weki gışk sılava mezınê xwe bıgrın û daxûl bın. Ewi hê berê ew hinkırıbûn, çawa sılavê bıdne mezına, çımki ew çend carbûn Cewzoyê serkarê esker dıhata nava wan û esker sılava wi vedıgırt.

Xano ku nêziki wan bû got:

- Selam elêkum!

– Ser çeva hati, maqûlê me,– û gışk daxûl bûn...

Xano mina teyrê atmece lı cahıla gışka nıhêri ewi herdû kurê xweye çûk ji nav wan siyaranda dit, paşê got:



Institut Kurde de Paris

– Kal, bavêd me gotıne me û mera kırıne weyset, weki em welatê xwe xweykın. Gotne me şah Abas û padşê Romê tımê dıxwazın me tene bın destê xwe, lê heta nıha wana nıkarıbûye erdê me jı me bıstinın. Mın guman heye ewê disa nıkarıbın, hûn ji gerekê wi weyseti xweykın...

Wexta telim kuta dıbû, cahıl tımê dıketne cıridê, kılam dıstran û bı kêf dıhatne bajêr. İro ji Hemze çawış gote cahıla:

– Xortêd siyar wê têkevne cıridê, lê zılamêd peya, wê govendê bıgrın, bıreqısın.

Eva xeberdana cahıl gışk şakırın. Ewi destê xwe bılınd kır, nişani da weki sazbend def û zurnê xın. Dest bılındkırına Hemze çawışra sazbend femkır, def û zurnê hevra lêxıstın, merıv bı hewas dıbihıst dengê wan. Lê ecêb ew bû, gava ku hespa bihıst qeydê cıridê, bû hire-hira, erd pêkol dıkırın, dızgin dıkşandın, listıka şıridê dıxwastın. Lê ew şırida nıha ji ez mina şıridêd berê, bê qeyde bûn. Şırida nıha bı hesab dorbıdorbû; qelfek, şiyar hevra dajotın û ser pışta hespa nexşê kowiyi sıyariyê nişan dıdan, qelfek ji dajotıne ser hev bı şur, mertal û rıma hevra dıketıne mecalê, jı durva te qey dıgot, evana rasti hevra şerdıkın, wê hevdu hûrxweş bıkın...

Xortêd tir û kevançi iro bı dıha eşq û şabûn dıreqısin; kaw-kaw çok dışkênandın. Çımki Xano gotıbû wan, wê sıbê hespa bıdne wan...

İdi êvar bû. Ro pış çiyava qulibıbû. Hemze çawış hukm kır:

– Bese, berbı qışla hêdi hêdi û fesal!

Xano meriyê xweva dûr sekınibûn heta cahıla cırid û reqas kuta kır, esker ku cêrge-cêrge fesal û hêdika çûne kelê û çûn pış qujmeva qulıbin, lê Xano hê sekınibû, ketıbû mıtalene kûr, ewi fıkır dıkır, derheqa kurda û ew zulma ku şahê İranê û padşê Romê dani serê kurda, jın, zarêd wan û kulfetê wan...

Jı hevalêd wi yeki bı dengeki bılınd dıgot:

Institut Kurde de Paris

· Weleh ev telim tışteki rınde bona me.

Ew deng te qey dıgot Xano jı xewê rakır, fıkra wi heta bırinê ewi, got:

– Te rast got, de em ji herın malêd xwe...

## SERÊ ÇARA

## DEWRÊŞÊ SÊRÊ

Rojeke havinêye germ bû. İdi tirmeh kutabûne bû, ew meha havinêye navinbû. Bax û baxçêd lı gundêd dorhêla kela Dımdımê xemılibûn bı cure-cure êmiş-fêki; sêva, hurmiya, şılora û êd mayin. Dıkanêd çarşiya kelê tıji fêki bûn. Jı nav baxa herro bazırgana seveteda êmiş bı berê merkeba, qantıra û deva dıbırne nava koçera, lı serê çiyayêd bılınd, dıfroti bı pereti yanê ji bı rûn, penêr û hıri dıguhırin. Wexteke usa xweş bû.

Rojekê jı wan roja bûn, lı çarsiya kela Dımdımê, deh dewrêşê xerib derketıbûne ortê. Nav wanda qırıntebû, defê sıpi teze ketıbûne rûyê wi, lê ê dınê ravsere bûn, ancax bist û pênc heta si sali hebûn. Gışk qepezeng bûn, te ku tıli-pêçiyê wane nazık, qefesêd wan û dest piyê wane tıjıne kok dınhêri, xuya dıbû, weki ewana tu cara xevat nekırıne, hema usa terxan xwera dıgerın. Nav wanda yeki lapi cahıli tunsız hebû, emrê wi ancax hıvde-hıjde sali bû.

Ehlê kelê ecêbmayi dıman cê coqa dewrêşa ê ku nava wan da qe tunebûn û heta nıha qe nehatıbûne vıra. Wana rojekê jı çarşiyê, yanê jı meydana dêwêr frotanê dıketıne reqasê û zıkrê. Evara ji lı wana meri tıji dıbûn jı reqasa wan û işatê wan dınhêrin. Ew kırınê wan hewasike mezın kırıne vi bajari. Reqasa wana usa kaw bû û bı dezge bû, weki çûk û mezın dıçûne temaşa wan. Lê wextê dıketıne zıkrê ew lap tışteki nediti û meşqûl bû. Duda fiqê dıxıst û pêra dıreqısin. Herçê mayin bı hukmê dewrêşê mezın bı telimi mina-



Institut kurde de Paris

ni esker dıreqısin; kaw çeplê xwe hevra teqıl hıldıbırin û paşê dadıxıstıne jêrê. Ew reqaseke usa kawe rındbû, weki hemû kes bı meşquli dıhatıne temaşa wan. Wextê mıhekê ji disa bı hukmê dewrêşê mezın sazbendan mıqamê wê listıkê dıquhast û nışkêva çepo-rast dızvırine dor hev, merıv tırê ev ne merine, evana ew zıvırokê darının, ê ku bona zara dıkırın, weki zarê çûk pê bılizın. Ew mehek bû wan dewrêşa tıştê nû nişan dıdan, ew dewrêşê heveki kal carna agır ji dıkıre devê xwe, gışk ecêbmayi dıman; çawa devê wi naşewıte. Lê carekê evarê dereng meri idi lı kuçê kêm rasti hev dıhatın, çarsû ji hatıbû dadanê, weki telala zuda kırıbû gazi, weki derê dıkana dadın û derê dıkana gışka gırtıbûn. Wê evarê Qursûtê bazarbaşi ji mınani hergav xulamê dora wi, lı kuca çarşiyê dıgeriya weki tu xırabi tunebe. Ewi texminkır, weki dewrêş lı ber hostexana silha sekınine û dora xwe dınhêrın. Ew şık bırê û fıkıri:

''Evana vê evarê dereng lı vıra çı dıkın? İdi meri ji lı kuça tunene, weki icatê xwe nişani wandın''.

Paşê ewi dit, dewrêşê çûk jı hostexanê derket û ew gışk lez hevra çûn. Qurşût metal bû, pey wanra ew ji çû hostexanê. Hostebaşi ne lı wêderê bû. Şagırte tenêbûn.

Wana ji idi dezge û hacetê xwe paqıjkırın, karê çûyina mal dıkırın. Qurşût ku deri vekır, hate hostexanê, gışk sekının. Wana pak zanıbû weki Xano rehetiya bajêr spartiye Qûrşûtê bazarbaşi, tırsa wi tu kes nıkare xırabiyê bıke û newêre. Wana zanıbû weki Hesenê Avfroş destê wiyi çepê Qurşût daye jêkırınê, bona dıziyê, lema Hesen ji şerma wi desti dıke çêva xwe vedşêre, weki kesek nızanbe ewi wextekê dızi kırye. Wana usa ji pak zanıbû, mıclısa Xano zûda qanûn xuya kıriye, weki ki dıziyê bıke, wê desteki wi jêkın, bıra gışk bızanbın, weki ew dıze..

Qurşût berê lı wan nıhêri, paşê pırsi:

– Xostebaşi lı kuye?

– Xostebaşi ne lı vıre, çûye mala xwe, –xorteki bejn bılınd got.

– Ew dewrêşê cahıl, çıma hatıbû cem we, çı jı we dıxwast?

Ewi tıştek nedıxwast, ewi her pırsi: "em çı cure çekan amadedıkın û çıqas meri lı vıra dıxebıtın?" Disa wi xorti got.

Qurşût jı xostexanê derket, berbı mala xwe çû. Ewi têdernexıst, weki ewana ne meriyê xêrêne, lema kesekira ne got derheqa wê yekê.

Dengê derheqa listık û icatê wan dewrêşa nava gundê dora kelê bela bıbû. Ehlê wan gunda herro bı qelfe-qelfe dıhatıne bajêr, listık û ecêbêd dewrêşa temaşe dıkırın, gışka bı hewas listıka wane kawe-kubar dınhêrin. Lê gava ku ewana bı hukmê dewrêşê mezın nışkêva dısekının, paşê wan dewrêşa keşkulê xwe jı stuyê xwe derdıxıstın, dırêji mıxlûqet dıkırın û dıgotın:

– Ya xwedê, ya ekber, kê tımayê nake, zêreki bavêje vê kaşkula dewrêşa, xwedê keşkuleke wa wê tıji zêr bıde wan.

Keseki na-na nedıkır, gışka bı sıdqeki sax pere jı kısıkê xwe derdıxıstın û davitıne keşkulê wan. Hemû icatê wan lı gışka xweş nedıhat, çımki wana kurdi pak nızanbû û xeberdana wan minani xeberêd zıvtyê şah bûn, ê ku wexteki kurd dıdane ber qamçiya û zulm lı wan dıkırın. Xuya bû ewana ne kurd bûn...

Carekê Xano, Cewzoyê seresker û çend meriyê wiye guman hatne şkevtê. Wê rojê gerekê topê nû rakırı bıhata cêrbandınê. Wextê ewana nêziki şkevtê bûn, Xano jı durva dit, weki dewrêş jı ber derê kelê çûn. Ewi gote mêrê dora xwe:

– Ew dewrêş çı lı vandera dıgerın, vıra perê bajarê mıxlûqet ji vandera tune, weki ewana icatê xwe nişandın?

Jı meriyê dora Xano keseki caba van gıliyê wi nedan.

Gava ew nêziki dergê şkevtê bû, Sevdinê kurê wi mezınê qerewılê şkevtê bû, hate pêşiya bavê, Xano jı kurê xwe pırsi:



Institut kurde de Paris

– Lao, dewrêşa lı vıra çı dıkırın? Ewana çûne şkevtê?

Sêvdin ber bavê telimi sekıni, got:

Na, keko*) ewana ber derê şkevtê bûn, qerewıla ji dengê xwe wanra nedıkır. Ez lı qerewıla hılatım: "Çıma beri wan nadın? Çı şuxulê we vıra heye?" Yeki jı qerewıla got:

Maqûl, bı edetê me, islamê, heqe dewrêşa heye hemû ciyan serfınyaz bıgerın, ne gunene, weki em beri wandın?

– Hema hêşka ez lı wan hêrs bûm, ewana çûn.

Ev gıliyana ku kur got, Xano rusa bû, sekıni. Ewi têderxıst, weki ewana meriyê xırabiyêne, cesusın...

Ewi xulamek lez şande pey Qursûtê bazarbaşi, weki ew zû bê. Xano ku jı derge derbaz bû hate heyatê. Xaço pêşiya wida hat, got:

Keremke, maqûl, tu ser çeva hati.

Xano caba wi da:

– Çevê te dınêbe. Xaçoyê hostebaşi. Ez zef jı te û hostatiya te razime. Tu zani Kurd û fıle dostê heve zemanê kevnın. Eva kela mın ji disa xaçparêza çêkır. Em usa hini wi bûn, me kurdi gazi wi dıkır: "Qero"

Xaço got:

– Maqûl ez wi hosteyi nas dıkım. Bavê wi hosteyi lı ada bera Wanê kılisekeusa çêkır. Te qey dıgot kelaye; Padşêd Romê çend cara bı qeyık çû ser wê kılisê şêr, bı topa lêxıstın lê nıkarıbûn tıştek wê bıkırana...

Xano destê xwe kıre destê Xaço û çûne şıkevtê ewi dit, weki ev topê ku teze hatıne rokırınê jı topêd berê geleki mezıntırın. Ewi jı Xaço pırsi:

– Tu hazıri, weki em iro van topa bıcêrıbinın?

Raste xeber da û topa dınhêri, lê ew dewrêş qe jı fıkra wi dernedıketın. Xaço gote Xano:

---

*) Gele zarêd kurda bavê xwera şırinaya dıvêjın "Keko" yanê "Ede".

— Emê topa roja iniyi bıcêrıbinın.

— Bıra roja iniyêbe, wê rojê mıxlûqetê gelekê bê bajar.

Ewi ev gıli gotın û hostexanê derket, wi wextê Qurşût teze hate ber derge. Xano Qurşût heveki xewlekır û gotê:

— Mın gazi te kıriye derheqa wan dewrêşa. Tu zani ewana ne meriyê xêrêne. Ez gava hatım dınê, weki her me xostexanê, ewana lı vır bûn. Lı vê kuça duri bajêr mıxlûqet ji kêm heye, çı şuxulê wan vıra heye? Tu zani eva çend carın ew kafırê şah Abas cesusa dışine cem me, weki sura me pê bıhese. Tu zani ev çı merine?

Qurşût got:

— Carekê, eva heftêk heye, idi evar bû, çarsu û dıkan hatıbûne dadanê, mın ew dewrêş ditın berderê hostexana silaha. Dewrêşê cahıl ji jı hostexanê derket, wextê ev çûn, ez ji şıkbıri bûm, ez çûme hostexanê hostebaşi ne lı wırbû. Mın şagırta pırsi:

"Ev dewrêş çıma hatıbû cem we?

Ewi çı dıxwest?" Wana got:

— Qe tıştek ji me nexwest, ewi her jı me pırsi: " Hûn çı sılahê lı vıra çêdıkın?"— û çû.

— Lê çıma te hetani nıha ne gote mın?, Xano jı pırsi. Xano wê sehetê hukm kır:

— Here wana bıgre, bavê zındanê, pırske jı wana "Kê ew şandıne nav me û çı meremi ew hatıne nava me? Meniya hatına wan ese bızanbe". Tu dıvini bı çı delka ewana hatıne nav me, çawa me gışka dıxapinın. Hebe-tunebe ew cesûsê Şah Abasın. De zû here hê ewana cıkida neçûne...

Qurşût hahanga lı hespê xwe siyar bû, xulamava ajot çû çarsiya dewrêş lı wêderê nebûn, ew lez çû meydana dewêr, dewrêşe ne lı wêderê bûn ji. Qurşût tırsya fıkıri:

"Dıvek ewana revin". Ewi berbı her dergeki xulamek şand, weki bêje dergevana nehêlın dewrêş jı kelê derkevın, herın. Herkê tên bıra wana bıgrın û bışinın cem mın.

Eva gıliya mınani bayê bıharêyi gur nava bajêr da be-

Institut kurde de Paris

lav bû, hevra dıgotın " Wê dewrêşa bıgrın" hıneka dıgot: " Wana sêr kırıne u jı zêrxana Xano pere dizine" Herkesi tıştek jı ber xwe derdıxıst û beladıkır. Xelilê beytararê revoyê hespa lı kuçêda rasti Qurşût hat ewi ji Xelil pırsi:

– Xelil, te ew dewrêşê ku icata nişani meriya dıdın neditiye?

– Belê, maqûl, ez hema jı cem wan têm.

– Ew lı kune wan bı dengeki rıcav Qurşût pırsi:

– Ewana lı xwarınxana Elekperê adrbêcanda kavırek serjêkırıne, kıvava, qelya sêlê dıxun.

Qurşût şa bû, weki ewana cikida neçûne hê lı vırın, û lez ajote ber derê xwarınxana Elekperê adrbêcan. Alekper xorteki qemer bû, orta Qurşût û Elekper xweş bû, çawa ku ew derda hat û sılav da wana, Elekper got:

– Pey, tu ser çeva bêy keremke maqul.

Qe xema dewrêşa ninbû, wana qe sılava Qurşût ji negırt, mırçe-mırça devê wan bû. Çitiyê goştê kavrê destê wanda bû, wana hestu dıkotın.

– Maqûl, keremke pêşta were,– bı dıleki şa û ken Elekper gote Qurşût.

– Ez zef razime, Elekper can suxulê mıni lez heye, wa bı dengeki resmi Qurşût caba Elekper da. Elekper ecêbmayi ma, wi lewzê Qurşût, çımki Qurşût qe usa Elekperra xebernedıda. Qurşût çû derva gote xulamêd xwe:

– Emê dewrêşa bıgrın. Hûn gerekê defekê wan, fiqê wan û keşkûla wan jê bıstinın, emê wan bıvne zindanê. Hıngi Qurşût xulam dıdane serwextkırınê xêlek derbaz bû.

Ew xulamê ku çıbûne cem dergevana ew ji hatın. Qurşût çend xulamava vegerya hatın xwarınxanê, gote:

– Geli dewrêşa, we fıravina xwe kuta kır, yan na?

Dewrêşa qe dengê xwe nekırın ewana ku jı xwarınxanê derketın, hema wê deqê derwêş gırtın bırne zindanê.

Ew çend rojbûn dewrêşa zindanêdabûn, wana inkar kır, weki ew ne cesusın. Qurşût her evar dıhate cem Xano û dıgot:

– Ewana inkar dıkın namukurın, weki ew cesusın.

Xano gote Qurşût:

– Tu wana sıvê, wextê meclısa rûspiya kom dıbe, bıne dıwanxanê...

İda roj hatıbû teştiya mirani, meclıs lı diwanê kom bıbû. Vê sıvê hatıbûn ne ku tenê endamê mıclısê, usa ji hatıbûn gele mezınêd eşira û qebila. Gışkava diyar bû, weki wê iro dewrêşa bıdne sıcûdê, çawa cesûsê Şahê İranê. Lê gele kala bawernedıkırın, dıgotın "Dewrêş herro edebati xwedê dıkın, rojê pênc cara nımêjê dıkın, gazi xwedê dıkın, ewana tıştê usa bêxwedêtiyê nakın".

Xano tıxminkır, weki gelek bawernakın...

Nışkêva derê dıwanxanê vebû, dewrêş hatne bınpiya dıwanxanê, sekının destê wan pışta wanava gırêdayibûn. Xano hukm kır:

– Destê wan vekın!

Destê wan vekırın.

Xano lı wan nıhêri got:

– Pêşta werne orta diwanxanê.

Dewrêşê kali lı pêşiyê bû, ew çend rojbûn zindanê da bûn, rengê wan xeyiribû, te qey dıgot nexweşiya hal ketıne. Ewana hatne orta dıwanxanê.

Xano got:

– Eva mehek zêde heye lı vi bajarê meda hûn dıketne zıkrê û sımayê, we dılist, dıketne mıhekê, de têkevne mıhekê û rasti bêjın kê hûn şandıne bajarê me? Hûn çı meremi hatıne? Rast bêjın.

Jı dewrêşa keseki dengê xwe nekır, her kalê got:

– Seva dindara teye maqûl, emê têkevne zıkrê def û fıqêd me jı me stendıne, bıra binın bıdne me, em çend listıka nişani wedın. Lê keseki em neşandıne.

Şandın hacetê wan anin, dane wan. Kalê xwexwe def da destê yeki û fiq da du dewrêşa, Paşê kalê qasekê lı wan nıhêri, lêvê wi çû-hatın, merıv tırê ew tıştekі dıvêje wan. Dewrêşê mayin zûrbıbûn lı wi dınêrin, nışkêva kalê

Institut kurde de Paris

got: " Ho, ho, ho, ho".

Def û fiqêd wan hevra lêxıstın. Dewrêş ketne reqasê. Kalê lı pêşiyê bû. Lê reqase wane iroyin dıha kawe rındbû. Xano ser meriki kêleka wi rûnıştıbû, xwar bû, got:

– Evana dıxwazın van icata û fıstıka jı destê me xılasbın.

Paşê kalê jı wan qetya, heveki dûrket û bû "hube-huba"wi, te qey dıgot pıfkê dıxe, icar dewrêşa destê hev berdan, xwe wi ali, vi ali bırın-anin û hevra dıgotın:

– Hub inşala, hub inşala, hub inşala...

Paşê bû waqe-waqa wan mınani beqêd golê ava. Kalê dur sekınibû, lı wan dıkıre gazi û bı teqel dıgot: "Aha, aha, aha"....

Sehetek hebû ewana hema usa dızvırin û porêd wane dırêj dıçûn-dıhatın, bı teqıl wanra dızvırin. Eva listıkana û tıştê usa Kurdada tunebûn, lema gışka bı hewas lı wan listıkên wan dınhêrin...

Xano ew dane sekınandınê, got:

– Bese hûn têkne waqe-waqa û hub-hub, rast bêjın hûn jı kêderê hatıne? Kê hûn şandıne? Seva çı hûn şandıne?

Mıclısa gışk ker bû. Devê dıwanxanê vekıri bû, pıste-pısta dengê jına jı ber dêri dıhat. Jı dewrêşa disa keseki dengê xwe nekır, her kalê got:

– Em dewrêşê xwedêne qulıxdarê Mehmet pêxamberın, lı welatê Islamê kiderê em bıxwazın, destura me heye em bıgerın, bı keşkula lava dıkın û idarê xwe dıkın. Keseki em neşandıne, bawerkın...

Qurşût pêşta hat, got:

– Herkê hûn dewrêşê xwedêne û rast dıbêjın, lê çıma hûn dıçûne hostexanê ku sılaha têda çêdıkın û we dıpırsi: " Hûn çı cure silaha lı vıra hazırdıkın?" Hûn çıma çûne derê skevtê, ne skevte duri bajêre, mexluqet lı wêderê tune weki hûn bıreqısın. Rast bêjın hûn çı dıgerın?

Pey van pırsara bû pıste-pısta mıclısê, xuya bû hıneka



Institut Kurde de Paris

lêlêbû şurê xwe bıkşinın hema lı vıra wana qet-qetikın. Ew rûspiyêd heta nıha gunê wan lı dewrêşa dıhat pey wan gıliyêd Qurşûtra bı avrûnê usa tuj lı wana dınhêrin, te qey dıgot lı dıjmınê xunê dınhêrın. Hıneka ji bı dengê bılınd dıgotın: " Vanra çı pırs-pırsyar lazıme, vanra kuştın lazıme, hema vê sehetê" Dewrêşê kal dit, weki ida ew hatıne eyankırınê. Ewi qestana got: "Ho, ho, ho" fıq û defık lêxıst û destbı listıka kırın, lê icar dengê kalê û lêxıstına sazbenda ne mınani gava dınê bû, ne usa zelal, teql û kaw bû, te qey dıgot hestuyê qavırê gewriya kalêda maye, deng tenê jı kalê dıhat. Xano got:

— *Bese, me ew listıka weye delk êva meheke ditiye.* Em pak zanın hûn cesusın, heta nıha me gele meriyê mınani we eyankırıne; hım bı dılqê dewrêşa, hım bı dılqê mırtıvê parsekçiya, hım ji dılqê mella. Lê ew meriyê ku rast navêjın em wana dıkujın, lê ew meriyê ku rast xwe mukurıne nava meda henę û pak ji dıjin.

Xano hukmi ser diwanbaşi kır, weki herın gazi melle Qadırkın, bıra bê vıra û bêje van dewrêşa çawa ewi rast got û çawa dıji.

Çend deqe nekışand melle Qadır hat. Ew meriki jarıki û zefi bılınd bû. Pêça serê melle usa mezın bû, merıv tırê serê wi tune, her ew pêçe ser mılê wiye, çevekê wi tûnebû. Derheqa wi çevê wi nav mexlûqetêda awa qısedıkırın:

"Xwedêgravi, wextekê dılketike wıyê bedew hebûye. Navê wê Beyaz bûye. Lê rasti ji ew nav lı wê dıhat. Ew kulfeteke usa bedew bû, weki lı wê hêlêda jınê usa bedew tûnebûn. Ewi û Beyazê dızikava hev dıditın. Kes nızane çı tehri mêrê wê pê dıhese, weki ewana dızikava hevdu dıbinın. Ewi çendeki xwe lı wan teland û rojekê ew lı mala xweda melle dıgre. Bona namûsê, bı qeydê eşiretiyê, gerekê ewi melle bıkuşta û Telaqê jına xwe ji bıda. Jına xwe berda, lê malê wi tunebû, weki qeleneki dın ji bıde, jıneke dın ji derdıxe, weki ew careke dın pey jınê xelqê neçe û ida ew çevê wi çepê jına nevine".

Melle Qadır ku hate diwanê sılav da cmaetê û Xanora temene bû. Xano got:

– Melle Qadır, bêje çawa Şah Abas tu şandi nav me bona cesûsiyê bıki, wextê me tu gırti, çawa te rast xwe mukuri, me tu azakıri û çawa nıha dıji? De bêje!

Berê melle Qadır bı çeveki dora xwe nıhêri, paşê lı dewrêşa nıhêri û destpêkır got:

– Wezirê Şah Abas rojekê gazi mın kır û gote mın:

– Ezê te bışinıme nava Kurda lı Kela Dımdımê. Tu melleyi, kesek şıkê nabe te. Tu gerekê heri wêderê hemû surêd wan pê bıhesi, çıqas eskerê wan heye. Jı ku çek-silaha tinın. Nav wanda dıjmınayi, teyfeti heye, yan na? Tu ku vegeriyayi hati ezê zêra bıdıme te. Mın nıkarıbû ev gıliyê wezirê Şah Abas neqedanda, aliki ji rasti bêjım, wexta ewi besa zêra kır, tımayê ez mecburkırım. Gava ku hûn pêhesyan, weki ez cesûsım, we ez gırtım. Ez rasti xwe mukurim. Nıha ji dewleta xwedê serê Xanoyê Çengzêrinbe, ez pak dıjim...

Jı mıclısê kaleki rûyê wi spi, minani berfa serê çiya, jı ciyê xwe rabû, gote Xano:

– Lao, ê ku hatye hêlına me bıhedımine, wira çı pırs? Çı lava kırın? Xêni vê yekê, ew ku mıxenetiyê dıkın wanra her lazıme qırkırın. A meriyê wa bûne sedemê Kurdıstanê.

Mıclısê gışki hevra gote Xano:

– Maqûl, eşed bıla ev gıli rastın. Vana gerekê vê sehetê dardakın!

Xano hukmi ser Cewzo kır:

– Destê wan gırêdın, bıvne zindanê, sıvê telala nava bajêr û nava gundêd nêzik belav kın, bıra cmaet bên meydana dêwêr fırotınê emê dewrêşa dardakın.

Çend zılama wê deqê destê wan pış wanva gırêdan û Cewzo hukm kır:

– De herın!

Dewrêşê cahıli çûk kurin ketê gırya, got:

– Mın nevne zindanê, destê mın vekın, ezê wera rasti

Institut kurde de Paris

bêjım em kine...

Destê wi vekırın û jı dewrêşa xewlekırın, dewrêşê mayin bırne zindanê, lê evi got:

– Eva du sala zêdetır heye dê û bavê mın jı kesibtiyê ez dame elama dewrêşa, weki bı dewrêşi, abûra xwe em bıkın. Nava wê elamêda her ev dewrêşê mezın Kurd bû û ez ji hatım ser wanada zêdebûm, em bûne du Kurda. Ew elam nêzıki sêsıd mêri zêdetır heye, gelek ecem bûn, lê hebûn jı mılletê Afgana, Adrbêcana ji. Dewrêşêd mezıne kal ida zewıcibûn, xweyê kulfet, jın, zar bûn, weki ewana bıçûna kiderê, kijan welatê dur, lê gerekê salê deynê xweyi elamê bıqedanda, erhede salê çend tuman pere banya bıda. Vê bıharê carekê evi dewrêşê mezın dızikava gote mın:

– Em gerekê herne Kela Dımdımê.

Rasti bêjım şabûn kete dılê mın, çımki mın gelek bihıstibû derheqa Kela Dımdımê û ew şerê ku Xanoyê Çengzêrin dıkır. Lê kalê got:

– Berê çûyina me gerekê wezirê Şah, reqasa me û listıkêd me bıvine, paşê vê destûrê bıde, em herın.

Ew du meha zêdetır hebû, me disa destbı reqasê mehekê kır, dıketne sımayê ji, du meha şunda, em çûne hızura wezir. Evarê dereng bû. Me destbı reqas û listıkê xwe kır. Kalê ji agır dıkıre devê xwe. Wezir bawer bû ku em pak dızanın û gote me: "Herın". Em gerekê hemû surê we pêbıhesyana û bıhatana fırotana wi. Ewi soz da me, weki em ku hatın, wê gelek zêra bıde me. Rasti wezirê Şah Abas em şandıne.

Xano got:

– Dewrêşê qırbıkın, lê vi cahıli bıhêlın, dest nedıne wi.

Hema wê rojê lı Kela Dımdımê û gundêd nizek telal çûn kırne gazi:

– Ha werın, ha werın! Sıvê zû werın lı meydanê, hunê bıvinın cesûsê Şahê İranê wê sêpıyada dardakın, ha

werın!...

Rojtıra dınê lı meydanê, kıderê ceza dıdane meriyê netebıti, dıza û kaçaxa neh dewrêş darada xenıqandıbûn. Ew çend rojbûn ehlê êla Berodera dıhatın, dıditın...

## SERÊ PÊNCA
## DEWET

Rojêd xweşe hênık lı Tehranê salê du cara hebûn. Carekê hê bıharê mehêd Adarê, Nısanê û çend rojêd mehêd Gulanê. Wan rojêd bıharê kulilk vedıbın, belgê baxa şindıbın, lı baxada fêkiyê zûgıhişti idi haya, tev ji hê evqas naqıjıline, hênıke. Cara duda ji payizê hênıke wextê mehekê zêdetır idi rojêd payizê derbazdıbın, germ dışkê, darêd baxa belgêd xweye ber teva havinêye hışkbûyi davêjın, belgêd teze şindıbûn, lê baxada disa kulilk vedıbûn û merıv heyran-hıjmekare lı kuçêd Tehranê bıgere û baxada ji kêfbıke.

Rojeke jı wan rojêd xweşe payizêye hênık Şah Abas dewata xwe kır. Ewi keça Şahê Afganstanê Zelêxa çardesali xwera xwestıbû. Dewet lı baxê Delmeda dıkır. Ew xasbaxçê Şahê İranê kevn bû. Kêf, seyrenge û şabûneke usa bû, weki bajar pêva dılerızi. Xwendi hatıbûne teklifkırınê, wezir, xanê qeşkayê, xanêd olka. Ewana destvala nehatıbûn, her yeki jı wan pêşkêşê xasê gıranbıha anibûn. Wê şayêda hatıbûn teklifkırınê hıne begêd Kurda ji, çawa xwendi. Ewana ew beg bûn, ê ku xayınti mılletê xwera û welatê kal-bavê xwera kırıbûn, hatıbûn ketıbûne bın destê şah Abas...

Wexta ewana hatne baxê Delme, xwendi idi usa tıji bıbûn, weki ci tûnebû meri lê rûnıştа. Bı hukmê Şah Abas wê deqê textek hında dergê baxçe rastkırın û begêd Kurda pêşta hatın rûnıştın. Xwendiyê İranê û wezirêd wan çav Kurda, kelosê wane bılınd bı şer û şemaqi lê pêçayi, ebêd



Institut kurde de Paris

wane bê mıle û nexşkıri şur, mertal û rımêd movıkkıri ketın, kenyan yeki jı wan got:

— Çawa Şah Abas layiq dit ev hırçêd mêsa teklifkır û ani dewata xwe..

Ev gıli Osman-xan bıhist û dılê wi nehat. Osman-xan eslê xweda Kurd bû. Zuda bavê wi cem bavê Şah Abas şêwrdar bû, dıgotın şêwrdarê minani bavê wi bı hış û kur fıkırdar tunebû qe cem tu padşa, Bavê wi mırıbû, lê nıha ew ji mınani bavê xwe şêwrdarê Şah Abas bû. Vê gavê xireta wi qebûlnedıkır, weki wan xana derheqa wan begêd Kurda usa gotın û pêkeniyan, çımki gele cara ji usa bû bı wi ji kenyane? Kete bira wi gıliyêd lelê wi, ê ku zarotiya wi da gotıbûne:

- Osman xan,ez xulam, dıvên:"Xiret avitıne ber kelb, ewi ji qebûlnekıriye û xiret xweykıriye". — Xiret kubariya mêrane.

Wê evarê begê Delmeda ewqas ışıq hatıbû vêxıstınê, te qey dıgot nav rojêye? Seyrange, kêf, eşq, şayi xwarın peleseng bû, ciki listıkvana dılistın, ciki lagırdçiya tıştê usa dıgotın û dıkırın, weki merıv nıkarıbû nekeniya, ciki pelewana ser şıritê qulopani dılistın. Aligırê wan ji merıv dıdane şakırınê û kenê. Ciki nêzik, lê başqe pış perdeke bılındda, jınêd wezira, xana, bazırgana, jınêd dewletiya û jınêd şah Abas Feyze xanım û Zelêxa çardesali kêf dıkırın. Çawa edetê wan, ew jın dorbıdor saz hıldıdan, derdıketne ortê, saz dıxıstın, dıstran, dıreqısin û bedewiya, kawiya stranê û reqasê nişan hev dıdan. Şah Abas rûnıştıbû ciki bılınd jı kêderê gışk pêva dıhate xwanêkırınê. Ewi pak dıdit çı dıqewıme lı hemû ciha û pış perdê nav jına. Ewi dit Zelêxa wıye xılfine çardesali, minani cucuka-gogercina saz hılda, derkete orta jına, bı tıliyê xweye nazıke malmûlye tenıke çûk (çawa ew xweva) lı têlê saz xıst, zıngin jı saz hat û bı dengeki minani bılbıla xweş nerm û nazık stra:

Institut kurde de Paris

Kevotka cahıle nezane,
Teze jı hêlınê derket xwera bıgere...
Lê teyreki sereyi atmece
Ew gırt, bıre hêlina xwe...

Ewê ida nıkarıbû bıstra, jı çevê wêye bıçûkê cahıl hêsır barın ser sûretê sorda hatın. Ewê saz da ber sûretê xwe, weki kesek nebine, kelogırıbû, bezi çû aliyê perdêyi dınê, nav bexda xwe veşart. Hêwya Zelêxê, Feyze xanım, ser jına wezireki da xwarbû, ya ku kêleka wê rûnıştıbû, got:

– Dılê wê belengazê ketıbû kurxalê wê, lê bavê wê bı zorê gırt da şah Abas, her bona wê yekê, weki şah Abas aliki olka Belûcistanê bı mıxlûqetva pêşkêşi bavê wê kır.

Ew çend roj bûn bona usa kêf, eşk û şabûn bû. Sıveke du fil anin. Xwendi bı şaşmay û meşquli lı fila nıhêri. Lı her fileki merik lê sıyarbû û ajotın hatne nav xwendiya. Bıbnêd wane dırêj dıgihşte hetani erdê, qılêd wane spiye kêr jı ber çenêd wanra derketıbûn, merıv saw jı wan heywana dıgırt. Dıgotın ew fil padşê Hındıstanê pêşkêşi şah Abas kırıne. Lıstıka wana ji ew bû: wana bı wan bıbnêd xweye dırêj fıncanê şerbetêye tıji hıldıdan, bılınd dıkırın û usa fesal disa dadanin ser texte, weki dılopeke şerbetê jı wan fincana nedırıjya. Carna ji bıbnê xwe dırêji xwendiya dıkırın, kê zanıbû nan dıdane wan, wana nan hıldıda bı wan bıbnêd xwe û davitne devê xwe û dadbelandın. Jı xwendiya, yeki nezan, çiti goşt da fil, fil ew goşt usa avite wi, weki goşt lı kıncê wi ket kıre leke. Meriyê zane gotın:

–- Çıma hûn heywan dıdıne eşandınê? Çıma hûn nızanın fil ne heywane usanın, ew her nan, berê dara û emiş dıxwe...

Paşê fılek rabû, çû ber textê kurda sekıni û bıbnê xwe dırêji yeki wan kır. Bu pırqiniya xanê ku jı olka hatıbû kenyan yeki jı wan bı eks got:

– Hıla bınhêrın, fil pızmamê xwe naskırın, çûne cem meriyê xwe, neçûne cem meriyê dınê? Disa pırjin kete mê-

Institut kurde de Paris

vana kenyan. Yeki tucari kal, jı ciyê xwe rabû, got :

– Hûn wê heywanê dıkenın, lê pak bızanbın jı fil aqıltır û helal xwey naskıri tu heywan tunene. Lı Hindistanê fil xweyê xwe xweydıke jı hemû deba, heywana.

Raste kêf eşq bû, lê ela Berodera, ku lı çiyayê Dımdımê cibıbûn, qe jı fıkra şah Abas dernedıket, wana riya berbı Kurdıstanê zevtkırıbû û nedıhışt ew here kuraya Kurdıstanê... Ew hivya cesûsê xwe bû, ê ku ewi zûda şandıbûn. Ewi bir ani:

"Vê payizê çı tehri hebe, gerekê deh dewrêş(*) bên û hemû surê wi pê bıhesın û bên mıra bêjın, lê wexta hatına wana derbaz bıbû gelo çıma nehatın?"

Şah Abas wê fıkrêda bû, nıskêva wezirê dıwanê hate cem wi, ser wida xwar bû, guhê wida tıştek got. Rengê şah Abas xeyiri, ew jı cihê xwe rabû, derket, çû. Ew yek mêvana gışka texminkır, hınek jı cihê xwe rabûn, herın. Lê wezirê diwanê, got:

– Şah heveki ecız bû, ne eva çend roj û şevın vê kêfê û seltenetêdane, ewê heveki hêsabê bê, hûn çıma radıbın, keremkın, herkes cihê xweda rûnê û kêf, eşqê bıkın saya şahê şah û kulfeta wiye teze, belki xwedê û hızret Eli bedena wi şinbıke, kureki bıdê, hûn zanın kurê wi tunene...

Melle û seydê wêderê rûnıştın, destê xwe bılınd kırın û hevra gazi xwedê kırın, ziyareta meşedê û kerbelayê kırın, weki kurek şah Abasra bıve...

Şah Abas ku hate ciyê xewle, nemameki Xano hat gote şah Abas:

– Xano deh dewrêş gırtıne wê dardake, bıxenıqine... Lê zef nekışand zû ev cab nav mêvana hat xuyanê, weki Xano ew dewrêş gırtıne û gerekê bıxenıqine. Şah Abas şande pey wezırê eskeriyê. Wezirê eskeriyê ku hat, şah Abas ew bır xewlekır û jê pırsi:

---

*) Şah Abas deh dewrêş çawa cesus şandıbû kela Dımdımê...

– Te bihistiye, dıvên, coqa dewrêşa wi seypısanê Kurd Xano gırtiyê û dıxwaze dardake. Jı nemamê Xano bıhist. Wana got: "Berê ewi telal şandın lı hemû ciha eyan kırın, weki cesûsê şah Abas gırtıne, yeki jı wan xwe mukurye û gotıbû: "Şah Abas, em cesus şandıne kela Dımdımê". Û hema wê rojê ji pêş gışkava lı çarsuyê dardakırıne.

– Lê te çıma negote mın?

– Şahê şah saxbe, çawa mınê taqetkıra, van rojêd ezize eşq û kêf ev caba nexêr bıgota te. Ev yek jı devê mın zêdebû...

Şah Abas wa bı hêrs got:

De, zû esker hazırke, hema nıhada bıra Sılêman-xan here ser kelê şêr, kela wi xıravke, wi ji dil bıgre, bine...

– Şah saxbe, ez xulam, were em vî şuxuli nıha bıhêlın, hetani bıharê, nıha ne ew wexte, lı wi çiyayi berf zûda ketye...

Şah Abas xeyidi, purçiyê xwe kır û bı hêrs got:

– Ev çı gıliye? Eskerê şahê İranêra wexta lazıme, berf çı tevaye? Ez hukım dıkım bıra zû Sılêman xan esker hılde û here...

Wezirê eskeriyê ku dit fırşkê şah Abas rabûne ewi got.

– Belê, ez xulam, ezê sıvê esker bıdıme Sılêman xan û rêkım ser kela Dımdımê.

Lê paşê şah Abas ku çû nav mêvanada rûnışt, fıkıri û dılê xweda got:

"Gıliyê wezir rastın, rasti ji nıha nepake ez esker bışinıme ser kela Dımdımê şêr. Pak dıbe, weki em bı tehreki hemû surê wi bızanıbın. Ezê Sılêman xan hema usa bı qesta mêvaniyê bısınme cem wi, bıra Sılêman xan bı çevê xwe kelê, dorberê wê bıvine û fıkra wi kurdi ji pêbıhese. Paşê ezê lêxım".

Du roja şunda Sılêman xan bı eskerê çek-sılahkıri gerekê jı Tehranê berbı kela Dımdımê rêketa. Cab dane şah, weki eskeri hazıre, wê ida rêkeve. Şah Abas gazi Sılêman

Institut Kurde de Paris

xan kır, bıre cem xwe û gotê:

– Tu eskerê gıran xwera nebe. Sed mêri zêdetır nebe.

Tu here mala wi çawa mêvan- çawa rêwi, pak kelê, dorberê wê, rê û baniyê wê bıvine. Pêbıhese fıkra wi kurdi çiye? Dıxwaze xerc û olamê bıde, çawa hemû reat an na. Paşê were, emê bıharê tışteki bıkın. Kurdek ber şah têkeve hucetê (lecê), usa dıbe? De ida here, riya te bıra vekıribe.Sılêman xan idi wê rojê rêneket. Ewi êvarê gazi Bekırê begê kurd kır, gotê:

– Bekır beg, ezê sıvê herme kela Dımdımê bıvıme mêvanê xanê kurda, ez wan riya nızanım, nebeledım, tu werê mera belediyê bıke...

– Ser çevê mın, kengê dıxwazi ezi hazırım!

– Emê sıvê berbangê rêkevın...

– Sılêman xan, hergê tu rısqetê bıdi, ezê kıncê eskerê İranê xweykım, weki ew mın nas nekın.

– Ew kêfa teye, çawa dıxwazi usa ji bıke...

Sılêman xan ku ji Tehranê rêket ewravi bû, rûyê ezmin ewra usa gırtıbû, weki pırtıkek jı ezmanê şin nedıhat xuyanê Sılêman xan serê xwe bılındkır, lı ezman nêhıri, got:

– Şıkır, hewa hênıke, emê pak herın...

– Xan saxbe, –Bekır begê got,– lı vıra raste hewa hênıke, xweşe, lê lı çiyayê Dımdımê nıha ida berf û barane.

Eşira Berodera eşireke pır mezın bû. Ewana dıman ne ku tenê lı çiyayê Dımdımê lê gele qebılêd wan gundê xwe lı qontırê van çiyayê Dımdımê çê kırıbûn û çandın dıkırın, bınya wanda ji qıjlebû, ew qıjle ji disa eşira Berodera zıvıstanê kerêd pezê xwe lê dıçêrandın. Hetani bıharê, çımki lı van dera berf qe nedıket. Lê ew çend roj bûn beri hatına Sılêman xan berf hevek lı qıjla ketıbû. Wexta hatın gihıştne quntara çiyayê Sılêman xan got:

– Lema dıvên Kurd meriyê çiyane, emê hê lı Tehra-



Institut kurde de Paris

nê bûn Bekır beg zanıbû lı vıra ida berf ketye.

— Belê, ez xulam, em zanın dek-dolavê hewayê, çımki em tımê ber hewaêne û hê zarotiyêda texmindıkın guhastına wê lema ji, weki Kurd lı tevê bınhêre, yanê hivê bınhêre û ezmin bınhêre, ew ida zane çı guman dıde ew roj û rojtıra dıııê, wê sayibe, yanê baranbe...

— Weleh eferım we kurdara, kesek minani we wê yekê nızane. Mılkê bavê mın zefe. Ezi hê calııılbûm, rênçberêd me gışk ecembûn. Nav wanda her yek Kurd bû. Ew zûda bı mal û jın-zarê xweva hatıbû gihıştıbû me. Gava dıbû nan dırûn, keseki minani wi nızanibû, kengê rojê xweşbetevbe, kengê wê baran—şıli—şılopebe. Rehmetiyê bavê mın şêwra xwe her lı wi dıkır û zef ji jê hızdıkır...

— Ez xulam, -Bekır begê got,— ew çawa mala kurde tenê hatıbû gihıştıbû we; her teyrek bı refa xwe dıji. Herkê ez hatım gihıştıme şahê şah mın qebila xwe ani, lê bawer bıke herkê ez tenê mala xweva bıhatama, mın nıkarıbû teyaxkıra, çımki her teyr bı refa xwe dıji...

Sılêman xan heveki fıkıri, got:

— Ewi kurdi mêr kuştıbû lı gundê xweda ewi belengazi xûn ji dabû. Lê ew qebila ku mêr jê hatıbû kuştınê, qebileke zore qewat bû, wana dew kırıbû û berê wan ew Kurd jı eşira xwe derxıstıbû. Lê çawa dıvên edetê we kurda: "Meriyê ku jı eşirê berdanê derxıstın, ida tu eşir û tu qebilêd kurd wi hılnadıne nav xwe" a bı vi teheri ew hatıbû gihıştıbû me û cem me dıma...

— Femdariye, ez xulam...

Sılêman beg ku gihişte qontıra çiyayê Dımdımê berf idi gelek bû. Jı gundêd kurda cab dane Xano, weki mezıneki ecema bı sed eskeriva berbı kelê tê. Wexta jê dıpırsın:

— Hûne herne ku?

Ew cabê dıdın:

— Emê herne mêvaniya xanê kurda.

Xano destxweda femkır, weki eva ne tıştеki paqıje, vıra şahê İranê bona fend-fêlan vana dışine cem mın. Ewi

rabû dusıd eskerê xwe hılda û pêşiyêda çû. Xano lı gundeki deştê rasti Sılêman xan hat. Lı wêderê gele hurmet jêra kırın. Ew çend rojê ku Sılêman xan lı wêderê bû şev-ro bager-tipi bû. Cinar nıkarıbûn here mala cinar. Sılêman xan tırsya, nızanbû çı tehri vegere Tehranê. Ewi got:

- Heydan, xwe ev çiye merıv lê bêji, ev cehnemeye. Ez qe nızanım çawa vegerım...

Bekır begê bı zımanê farızi gote Sılêman xan:

— Ez xulam tu arxayinbe, talasa mekşine, ezê te rêke usa kesera bıvım, weki em zû bıghêjne Tehranê...

Xano zımanê farısi zanıbû, ewi ku bihıst ev gıliyê Bekır begê ecêbmayi ma. Fıkra xwe got.

"Ev eskerê İranê jı ku zane riya usa rındi?"

Lê ne Xano, ne ji keseki dınê nasnekırın, weki evê usa dıvêje Sılêman xan, arxayin dıke û guman dıde xan, kurde. Wextê Sılêman xan pey pırs û pırsiyara ket, derheqa wan û jiyina, Xano cab da:

- Şahê şah saxbe, pırtıke erde, me xwera avakıriye, em xıraviya keseki nakın, çıma erdê şah hındıke?...

Çend roja şunda bagerê dani, bû sayi û tevê ji da. Sılêman xan destûr jı Xano xwest, razdıliya bona hurmetê gotê û rêket.

Wextê ewana rêda dıhatın Bekır begê ciki da pêşiyê, jı rê derket, hema berojava hat. Wêderê bona hespa hêsabû, çımki berfa wan beroja bê paqıj kırıbû, erdê berf hındıkbû...

Bekır beg epêce dûr çend eskereva lı pêşiyê bû, ewi usa hêsa ew anin. Sılêman xan şandıbû, weki ew usa serfınyaz hate ser "Kaniya Bûkê". Wê deqê ser kaniyê kareke xezala av vedıxwar, gava wan eskera kara xezalê ser kaniyê dit, ewê ji dit siyar berbı kaniyê tên, ewê nışkêva çılapekır, revi berê xwe da hevrazê çiyê. Ew eskerê ku kêleka Bekır begê bûn lı karê kırıne qûrtin û gazi kırın. Hema wê qûrtıniyıra bû xuşıniya şepê jorda hat. Ew şepe usa zû dıhat te qe dıgot baye usa wê zu tine. Ewê ber riya xwe;



Institut kurde de Paris

kevır-zınar ji radıkırın dani. Ew sıyarê ser kaniyê û Bekırva qe mecal neditın, weki bırevın vekışın- gışk berfêda û kevırada usa hatın nıxamtınê, weki qe yek jı wana û ne hespê wanê xuya nedıkır. Te qey dıgot kesek lı vıra tune, lı bın wê berfêda nêziki si mêri bı hespva qırbû. Sılêman xan ecêbmayi ew qewmandın dit û mecbûr bû paşta vekışe.

Ew kani zıvıstanê qe nedıqerımi. Havina ji ava wê kaniyê geleki sar bû. Derheqa wê kaniyê nava cmaetêda wa qısedıkırın:

"Zûda, wextekê zıvıstanê bûkekê wê rêda tinın, wextê têne ser wê kaniyê, bona eşqê dengbêj despêdıke bıstrê, hema ku ew devê xwe vedıke û dıqıre, nışkêva dıve xuşıniya şepê, jorda dışıqıte tê, lê usa zû tê, wekê pênci siyarê bukê, bûk, du berbû, defçi û zurneçi berfa kurda dınıxême, jı wan qe yek ji xılas nabe. Mala zavêda ji karê xwe kırıbûn, pez û dewar serjêkırıbûn, her tışt hazırkırıbûn û hıviya bukê bûn. Bûk gerekê wê rojê banyana. Dısekının hetani evarê, lê bûk wê rojê nehat. Wana tırê mala bavê bûkê siyar bernade. Hivya wan dısekının, lê rojtıra dınê disa bûk nehat. Roja sısya çend mêr siyar dıbın û dıçıne mala bavê bûkê, weki pêdıhesın çıma bukê naynın. Gava ewana têne nava wi geli, kiderê "Kaniya Bûkê" lê hebû, dıvinın ew geli şepê usa tıji kırye û xıtmandiye, raste-duz kıriye usa ji berf lodkıriye, weki merıv nıkare ser wê şepêra derbazbe. Qe rê tune. Ewana dızvırne mal û rêke dınêra dıçıne mala bavê bûkê. Lı wêderê pêdıhesın, weki bûk wê roja ku siyar hatıne pey bûkê, hema wê rojê bırıne. Geleki lı bûkê dıgerın, dıçıne nava qebila û eşira, lê bûkê navinın û usa dıminın, her wexteke bıharê, ida ketıbû meha havinêye ewlın, koçer têne ser wê kaniyê dıbinın, ecêbeke reş i çınyazê meriya û cendekê hespa. Cabê dıdıne meriyê wan, ewana ji tên meriyê xwe nas dıkın. Melle dıvê:

"Hûn wana gerekê hema lı wêderê ji hedkın, çımki xwedê lı eniya wan usa nıvisibû, weki ewana wêderê ruh



Institut Kurde de Paris

dan".

Çawa melle dıvêje, hema usa ji dıkın; lı wêderê nêziki pênci mezeli dıkolın û wan cınyaza çeldıkın...

Lema nava hemû eşirada bıbû edet, rojêd zıvıstanê kê lı vê rêda dıhatın, gava ku her wê kaniyêra derbaz dıbûn, devê xwe dıgrın, qe xebernadın hetani jı kaniyê derbaz dıbûn û jı geli derdıketın, paşê devê xwe vedıkırın û xeberdıdan. Lema vê kaniyêra dıgotın "Kaniya bûkê"...

A ser vê kaniyê bû ew eskerê İranê, tebıyetê xezeb jêra ani... Şah Abas ser wê gumanê bû, weki Sılêman xanê wi, wê hemû surêd Xano û kela wi pêbıhese, bıharê esker bışine ser wi şêr, kelê zevtke. Xano û eşira wi têke bın destê xwe, xercê gıran, olamê jê bıstine û xezna xwe tıjike...

Meha sıvatê ida xelas dıbû. Vê mehê lı deşta İranê jı tebiyetê qewata xwe nişandıda. Carna ba radıbû, baran ji pêra dıhat. Evarê wexta Sılêman xan eskerva tevi nava bajarê Tehranê bû, xunaveke baranê gırtıbû ser bajarê Tehranê û nerm dıbari, ba ji pêra dıhat. Wexta nımêjê bû, lı ser hemû mınarêd meçitêd bajarda melle radıbûn, bı dengê xwe bılınd bang dıkırın, cab dıdane cımaetê, weki bêne meçitê edebetiyê bıkın.

Şah Abas ji karê xwe kır, weki here meçitê, lê wezirê diwanxanê, nêziki wi bû, got:

– Şahê şah saxbe, Sılêman xan hatye û itmaz dıke, weki tu desturê bıdi ew bê hızura te.

Şah Abas ku bıhist navê Sılêman xan şabû, çû dewsa xwe, ser kursiyê şah rûnışt, got:

– Berdın, bıra bê.

Sılêman xan hate diwanê, çawa edet bû, sê cara temene kır û nımzi erdê bû. Şah Abas ci nêziki xwe nişandayê. Sılêman xan çû rûnışt, paşê şah Abas pırsi:

– De bêje, te kela pak dit, tıxminkır, jı kijan eli merıv dıkare dorhêlê jê bıstine, lêxe û kelê zevtke...

– Şahê şah saxbe, –Sılêman xan got,– ewi qe nehışt ez bıghijme kelê, hela hê riya du roja ma, weki em bıghêj-



Institut kurde de Paris

ne kelê, ew xwexwe pêşiya meda hat. Mın dıxwast ez herme kelê, lê ew çend roj bûn, dıbûn bagerne usa, merıv nıkarıbû jı sermê û berfê derketa derva. Weleh ew ne cihê meriyane, weki lê bıjin. Weki Bekır begê rehmeti nebûye, em jı wêderê xılas nedıbûn.

– Çıma tu dıbêji Bekır begê rehmeti? –Şah Abas pırsi. Sılêman xan qısekır çı qeziya hate serê wan û çawa nışkêva şepe jorda hat û çend eskerê wi lı wi bın berfêda man. Ewi serda zêdekır, got:

– Pak zû ezi ne lı pêşiya sıyarabûm, weki ez rex Bekır begê bûma, ezê ji bın wê berfêda bımama.

– E, qe kurd Xano çı dıgot?– Şah pırsi.

– Ewi dıgot "Pırtıke erde, me xwera avakıriye, em zırarê nadne keseki, çıma erdê şahê-şah hındıke, ew çı jı me dıxwaze?..

Şah Abas kete fıkra, Sılêman xan hıviya wi bû, çıka çı dıbêje.

– Bıharê ezê eskereki gıran bışinme ser wi û kela wi xıravkım...

## SERÊ ŞEŞA

## QISA XANO

Gava serê pêz dıkeve û pez dızê, kurd wi wexti hesab dıkın idi bıhare. Rasti ji usane, çımki pez dızê wi çaxi, kengê ida germe, hewa xweş dıbe, roj dırêjdıbın. Herro tev dıde, erd germdıbe û destpêdıke şinkaya teze lı dolga derdıkeve. Lê wi çaxê ku serê pêz dıkeve û pez dızê, ehlê eşira Berodera kulfet dışinın dolga, weki mıqati berxê vırniye teze zayibın. Mala Mexsûd karkır Dilbera keça xwe bışine dolgê, kurê xweyi çûk ji pêra danin. Hela hê sıve bû, Dilber hespê siyar bû, berê gaki ji pêra fıraq û nıvin danibûn. Bırê wê ji ser barê wi gayi siyar bıbû. Wextê wê ida rêketana, dê temi da keça xwe, gotê:

Institut kurde de Paris

– Lao, nıha wexta xılındor û lorıkane. Şıvan û duajo xılındor û lorıka hızdıkın, tu usa bıke wextê dotınê her mikê hındık bıdoşi, weki şir berxwara bımine. Lê ez nevêm tu şıvana bırçi bıki, tu gerekê wan miyêd pêşiyê zane usa bıdoşi, weki guhanê wanda tımê şirê xiç bımine bona berxê vırin, çımki ew berxê wextêda ku têr şirê xiç dumje, zû qewat dıgre û ew berx ber nexwaşiya xurt dıbe. Çetıni ji çend rojên ewlının. Lê wextê pez gele za, tu ida her mikê çend dılopa bıdoşe besi wan gışkane...

– E, dayê çıma eze zarım, yan teze dıçıme dolga, yanê ji ez femnakım? Ez nahêlım miya usa usa bıdoşım, weki guhanê wanda şir nemine. Ezê xwexwe miya bıdoşım, xılındor û lorıka wanra hazır bıkım, usa bıkım şıvan têrbın, berxê vırni ji bırçi neminın...

– Erê ronaya çevê mın, de ida here tera oxırbe...

Dê nêziki keça xwe bû, paçkır, paşê çû kurê xwe ji paçkır û ewana rêketın, çûn..

Wexta ewana jı surê kelê derbazbûn, Dilberê ga da pêşiya xwe, xwexwe siyari pey rê dıhat, çımki lazım bû, weki ewê ga bajota.

Dilber ku hate dolga jı kerê miyêd wan, teze deh mi zabûn. Lê pey hatına wêra ida herro mi dızan. Hebûn ro pênc-şeş mi dızan. Wê salê miyêd Mexsud geleka cêwi dani. Şıvana bı daqırdi dıgotıne Dilberê:

– Eva pênarê teye miya hatye, lema mi isal cêwi dızên, lê wan sala wextê diya te dıhate ser pêz, miya kêm cêwi dani...

Dilber dıkenya dıgot:

– Cinarê me ji dıvêjne mın: "Dilber, lıngê te ku lı deriyê me dıkeve, pêparê te tımê mera xêre..."

Şerşıvan yeki kal bû. Ewi got:

– Keça azep, tımê pêparê wê xêre...

Rojekê Dilberê gote şıvana:

– Brano, hûn sıvê hetani evarê lı çolêne, ber baranê û surêne. Evara têne dolgê serda ji xwera xwarınê çêdıkın,

mıra şerme, xwe ez nehatıme ber berxwê vırni bısekınım, çawa diya mın, ezê ji usa wera teştê û şivê hazırkım û werın reheti bıxun.

Şerşıvan lı Dilberê nıhêri got:

— Lao, rasti bêjme te, wextê me dit diya te nehat, me go: "Welleh halê me çetın be, lê xwedê emrê te dırêjke".

Dilberê idi zanıbû, kijan mi zaye. Rojtıra dınê ew sıvê berbangê rabû, bra ji rakır xwera bır, weki wextê dotınê komekê bıde wê, serê miya bıgre. Ewê hahanga jı her mike zayi heve şir dot, çaber dada, xwarın wanra hazırkır. Heta şıvana û duajoyê wan ser çevê xwe şûştın. Ewê taştiya hazır ser sıvra raxısti dani, got:

— Brano, keremkın teştê bıxun.

Şıvana bı medê taştê xwarın. Şıvana gışka razılıxya xwe gotın:

— Em zef jı te razine bona hazırkırına vê xwarına te, çı dılê teda sêwırye, belki xwedê bine sêri. Weleh xwarına ku tu hazırdıki, merıv ku dıxwe, merıv tırê, --eva ne xılındore,— eva goştê berxaye, hatye çêkırınê...

— Apo, -Dilberê gote serşıvan,— wextê diya mın xwarınê hazır dıke, ez pak dina xwe dıdmê, carna ji diya mın dıvê: "Lao, tu fılan xwarınê çêke". Lema ew xwarına ku ez çêdıkım usa teme...

— Xwezla wê malê tu lê bıvi bûk,—serşıvan got.

Şıvanêd cahıl zanıbûn, weki Dilber dılketya Şebabe û herdu ji hevdu hezdıkın, yeki jı wan hêdika got:

— Wê bûka mala Adi be, evintiya wê û Şebab zûda havraye.

- De belki xwedê bine sêri, weleh Şebab xorteki hêjaye nav cahılê meda...

Wextê navê Şebab hıldan, Dilberê şermana destê xwe da ber rûyê xwe û berê xwe guhart...

Qurşûtê bazarbaşi pêhesya, weki isal Dilber şandıne dolga ser pezê zayi. Ewi qestana jıneke xwe hılda, çı lazımbû bona dolgê barê gaki tıjikır, ew û jına xwe hespa siyar-

bûn û berê xwe dane dolga, çûn. Wexta ew hate dolga xwe, ew du roj bû bûn dıqacqıci, weki Dilberê bıvine. Lê nızanbû, çawa bıke û çı meniyê bıgre weki here dolga wan, wê bıvine. Dolga wi dûri wê dolgê bû ku Dilber lê dıma. Ewi dıl kır ku "weki ez herım, Dilberê jı mın pırske".

"Çıma tu hati dolga me? —ezê bêjım: "Berxê meye vırni telef dıvın. Cinar dıvên weki serşıvanê we hekimê wi şuxuliye"...

Qurşût bı wê fıkrê hespê siyar bû û ber bı dolga Mexsûd çû. Xêlekê şûnda ew hate ser konê wan.

Dilberê wi çaxi ne lı kon bû. Ew çûbû kaniyê avê bine. Lı kon keseki mezın tunebû, xêni bırê wêyi çûk. Gede destxweda Qurşût naskır, got:

– Apê Qurşût, keremke peyabe, were kon. Çıma usa pışta hespê sekıniyi.

Qurşût fıkra xweda got:

"Mina bavê xwe hurmete".

Ew jı hespê peya bû, hespê xwe sıngê ber derê konva gırêda, çû hundırê kon. Raste hundurê kon tu tıştê navmalê pak, xaliçe û emeni tunebû, lê Dilberê nava kon û ew stêrê xweyi çûk, usa kaw xemılandıbû, merıv heyran-hıjmekar bû lê bınhêre. Bona ku hundurê kon kaw bê xuyanê, ewê çit perde ji vegırtıbû.

Dilber lı ser kaniyê zef nema, zû vegerya, ewê hê dûrva dit: hespeki ber derê konê wane. Dilber fıkıri û xwexwe xwera got:

"Xwedê bıde ya bı xêr! Gelo ev kiye?"

Lê wextê ew heveki nêzik bû, ewê dit, weki ew ne hespa wane...

"Dêmek ev siyar ne jı mala meye" —Dilberê nêha xweda got.

Gava ku Dilber hate ber derê kon, cêrê avê dani û çev Qurşût ket, şaş ma û usa purçiyê xwe kır, te qey dıgot ev gula bıharêye delal, şexta zıvıstanê nışkêva lêxıst, lema

rengê wê gulê usa zû çılmısi. Dilberê Qurşût hıznedıkır û qe nedıxwast rûçkê wi ji bıvine. Dilber ku hate kon, Qurşût got:

- Wey, tu ser çeva bêy...

Dilberê qe caba wi neda. Lê Qurşût disa destpêkır xeberda.

- Ez hatıme cem şıvanê we, berxê me vırni nexweşi ketye nav, gırdıbın, dıvên serşıvanê we tılızma wê nexwaşiyê zane. Lema ez hatıme, weki ew mıra bêje wê tılzımê.

-- Bra ew nexweşi hema usa nav berxê wedabe, lı cem wė bımine, –Dilberê bı hêrs got,– çıma tu nızani şıvan vê navrojê lı mal ninın, ew lı çolê ber pêzın...

Qurşût idi meniya xeberdanê gırt, got:

– Dilber, tu neheqi usa ji mın dûrevi. Weleh ez geleki te hızdıkım û mêreki minani mın ji navini. Ah mın aniye kımbera qaş kıri, ziv zêrkıldayi, xızêmê zêre şırkkıri, guharê zêr, du qol zêrê seriya. E, ez çı bêjım, gelo çı mın hazırnekıriye bona te, lê ev ne malê zivkırê kela mene. Ev gışk mın jı bajarê Bexdayê daye aninê bona te, weki tu xweki û ehlê kela Dımdımê lı te bıvinın û ecêbmayi bımının.

Dilber jı van gıliyê Qurşût sor bû, got:

-- Tu meriki bê namûsi, weki tu bı namûs biyani, tu iro nedıhati û teyê bıfıkıryayi: "Ez xweyê sê jıname, eva çend care ne keçık dıldıke, ne ji dê û bavê wê naxwazın. Ez çı rûyi herme cem wê". Bênamûs, ravê bıcehme jı konê me derkeve, yan na ezê cabê bışinıme kelê, bırê mınê wê te çiti-çiti kın. Here tu ne mêrxasi ji, weki peya bıdi, her tu kari mêraniyê lı meydanê bıki û jı tucara gumrıkê bıstini. Rave, bıra çevê mın idi lı te nekeve!...

Paşê Dilber vegerya ser bırê xwe, pêra kıre şer, got: "Çıma te ew hışt ew bê kon?"

– Dilber can, ezê herım, lê tuyê poşmanbi, ez zanım, gotına mın, tu bûyi momtacê kûrê Adi. E, gelo ew kiye?... Qurşût kiye? Nav-dengê mın lı Tehranê, Bexdayê,

Institut kurde de Paris

Musılê, Stenbolê eyane. Lê ew kiye? Ew gedeke, nızam çıma tu xwexwe bextê xwe dıterıbini!

Wextê ewi usa xeberdıda. Dilberê hêdika guhê bırêda got:

– Zû here hespê wi veke, bıra hespê wi bıreve, here.

Dilber sekınibû, pışta xwe dabû wi, qe cabê gıliyê wi neda. Qurşût ku gıliyê xwe kutakır, jı kon derket, berbı hespê xwe çû, lê hespê wi tunebû, çırkın jı dılê wi hat, vi ali nıhêri, wi ali nıhêri lê hespê wi tunebû, ew tırsya. Dılê xweda got: "Dıvek hespê mın hıneka dızi bır". Lê paşê dit hespi wi jêrê besta bınya dolgêda dıçe. Qurşût peya da pey hespê xwe, çû. Keçêd cinaran ew yek ditın, dıkenyan, hınekan ji qestana bı dengeki bılınd dıgotın, weki ew bıhıhê:

– Pey, la purkurkırê, eva bazarbaşiyê me Qurşûte, Dilberê çı eceb ani serê wi maquli. Wê peya pey hespê xwe ketiye. Gelo bona çı Dilberê ev yeka ani serê wi?

Hınekan ji dıgotın:

– Mısteheq wira ewi qe nedişt em eşyayê xwe bıfroşın, dewa qumrıkê lı me dıkır...

Qurşût ev kenê keça û ev gıli dıbihıst, jı şerma serê xwe kırıbû ber xwe dıçû...

Roja dınê Dilber ser kaniyê rasti Nena xûşka Şebab hat. Ewê wêra gılikır, çawa Qurşût hate konê wan, çawa payê xışır-embaretê xwe dıda û çawa ewê bırê xwe hin kır, ew çû hespê wi berda û çawa Qurşût pêş hemû cınarava peya pey hespê xwe çû. Herdu keçık dıkenyan. Nenê got.

– Ew çı meriki alçaxe, çend carê dê û bavê te gotne, weki em keça xwe nadıne te, te ji çend cara jêra gotye, lê disa tê. Xweyê sê jına, zar ji hene. Kureki wi aqılê mıni bıri qasi bırê teyi çûk heye.

– Tu çı dıvêji, Nenê? Kurê wi jı bırê mın geleki mezıntıre. Ewi idi dıçe hini telima eskeriyê dıbe. Ewi betırpêrar cem melle Reşit xwendın kutakır, lê bırê mın hê dıçe



Institut kurde de Paris

xwendınê.

– Çı meriki zefi alçaxe, bê namûse, –Nenê disa got,– ewi tırê ew bazarbaşiyê tışteki pır mezıne. Çıma ew nızane nav meda mêrxasi rewşa mêrane, lê ne tucari, ne ji kırin-frotan, ew ne mêraniye...

– Erê, mın bir kır bıgota te, –Dilberê got,– ewi dıgot: "Tu zani ez kime? Nav-dengê mın lı hemû bajara xuyaye. Lê kurê Adi kiye? Gedeke...

Nenê kenya got:

– Weleh, ewi rast gotye, lı wan bajara wi nas dıkın ne çawa mêrxasê şera, wi nas dıkın çawa Qurşûtê bazarbaşi. Çıma tu navini Xano qe wi nave şera dıvê: "Her tu çarsûyê bıparêze, meydana dêwêr, ciyê pêz-dêwêr û ker têne frotınê, weki kes kera neve".

Herdu keçık disa kenyan...

Raste, idi ewlê bıharê bû, serê pêz ketıbiyê, mi dızan, lê ewê salê ne minani salêd ewlın bû, ew bıhare dılsari bû. Wan salêd ewlın gava ku serê pêz dıketê –mi gışk dızan, şayi bû, hıneka def-zurnê û tulumê dıxıstın. Şabûn dıkete nava mexluqet. Pızmama û cinara gazi hev dıkırın, hıneka bolıne yanê siniyêd mezın tıji pelaw, qeli yanê ji mırtoxe dıkırın, dışandıne malêd hevdu. Sıvê hetani evarê rıngıniya def-zurnê û tulumê bû. Cahıla govend dıgırtın du-sê roja dılistın, kêf eşq, henek dıkırın. Hınek cahılêd laqırdçi kulavê şıvana jê dıdızin, vedışartın, paşê dıgotın:

– Tu çawa şıvani, weki te kulavê ser mılê xwe wundakıriye, sıvê tuyê kerê pêz ji wundaki.

Û dıkeniyan, şa dıbûn, wan rojê ku serê pêz dıketê, şıvan ji fırnaq dıbûn, çımki wan rojan şıvana jı berxêd vırniyê teze zayi xwera berxêd rınd dıbıjartın, dıkırne destek idi mezın dıbûn- dıbûne kavır, şıvana xwera dıbır û xweyê wan kavıra qe dengê xwe nedıkır, çımki ew edet û deba kurda bû.

Wan salêd berê ew şabûn dıbûn ne ku tenê lı dolga, lı

Institut kurde de Paris

gunda û bajara ji dıbû. Lê vê bıharê ne qa wusa şayi bû, geleke dılşkesti bûn, çımki vê payiza çûyi eskerê şahê İranê, lı van qıjla gele mêr kuştıbûn, gele jın dê û bav hê reşe serê wan bû, dewsa şayê dıçûne ser mezelêd mıriyê xwe û nıfri dıkarın şahê İranê û padşê Romê, ê ku nahêlın kurd bı reheti bıjin...

Vê bıharê, raste sazbend tunebûn, lê zedê serê pêz disa kurda gışka çêkır, çımki wi zedira tê hesavê zêdeye dewleta wan, pez dewarê wan û hebûna wan. Lema ji disa gışka zedê serê pêz çêdıkırın û dışandıne malê hevdu, hevdu teklif dıkırın. Lê mêvana ku nan dıxwar kuta dıkır, wexta çûyinê minani wan salêd berê dıgotne xweyê malê: "Eva mala şênbe, geleki, hezar carê zêdebe, pezê te hebûna te".

Xweyê malê ji dıgote wan:

– Eva mala weye, hûn ser çevan hatıne, tımê derê vê malê bona we vekıriye, hûn ser çavên mın hatıne, bıra pez û dewarê we ji, hebûna we ji zêdebe.

Nenê temûl nekır, ewê cav şande malê, weki Şebab nesekıne zûtırê bê. Temi qasıd kır, weki ew bêje Şebab:

– Herkê serê wi lı wıra şılkıribe, bıra bê vıra kurke. Mala Adi ku ev gıli bihıstın gışk ketne tefekuriyê û tırsiyan, dıgotın:

– Gelo çı qewımiye?

Jı qasıd pırsi:

– Gıdyo, em bextê tedane, rast bêje, zarêd me lı wêderê sılametın?

Ewi sond dıxwar, dıgot, weki gışke saxe-sılametın.

– Lê gelo Nenê çıma wa bı lez gazi Şebab dıke? –diya wan dıpırsi.

İdi ber evar bû. Şebab karê xwe kır hespê siyarbe, here bavê gotê:

– Lao, nıha idi derenge, işev malbe, sıvê berbangê siyarbe, tûyê evarê tari lı wêderê bi.



Institut kurde de Paris

Lê Şebab nesekını, şûr-mertal avite mılê xwe, tir-kevan hılda û lı hespa xwe siyarbû, çû.

Evarda hetani berbanga sıvê, Şebab qet ciki ji peya nebû.

Şebab ku xwe gihande Dolgê, sıve teze safi dıbû. İdi wite-wita çıvika bû. Wextê ew nêziki kon bû, bû ewtiniya kelba xwe avitıne Şebab. Ewi navê kelba hılda: "Qafreş", 'Qelo". Kelba xweyê ewe nas kırın, kerbûn. Dengê kelbara şıvan şıkbırê, weki kelb dıewtıne meriya, ewi tir-kevan hılda û lez jı holkê derket. Ewi dit Şebab ber derê kon peya bû û hespê xwe sıngê pêş konva gırêdıde. Kelb ji dorê dıçın, tên, dêlê xwe dıhejinın, merıv tırê ewana hatına Şebabra şadıbın...

– Şebab sılav da serşıvan û pırsi:

– Hûn saxe-sılametın?

– Şıkır xwedê, em gışke saxe-sılametın.

– Lê çıma Nena xûşk cab şandiye, weki ez bı lez bêm.

– Weleh ez nızanım. Em û pez ji şıkır sax-sılametın... Şebab çû kon. Xûşka hê nava cidabû. Aliki lıhêfê jı ser xûşkê ketıbû ser kulêv. Guliyê wêye reşe dırêj jı ser belgi ketıbûne erdê. Şebab hêdika lıhêf avite ser xûşkê, paşê hêdika çû lı ser serê xuşkê, gulıyê wê fesal hılda dani ser belgi û ser xûşkêda xwar bû, sûretê xûşkê paçkır. Jı serma sıvê xûşk vecınıqi, hışyar bû, çevê xwe vekır ewê dit bıra ser wêra sekıniye, berê tırsya, lê paşê kete bira wê, weki ewê cab şandiye bıra bê. Ewê got:

– Şebab, weleh mın bawernedıkır, weki tuyê wa zû bêy. Mın tırê tuyê evarê dereng bêy. Bêje: "Bê tu wa zû ani, yan bagerê?"

- Ne te xwexwa cab şandıbû, weki ez bı lez bêm, ez ji duh hema, cab gihişte mın, siyar bûm û qe ciki nesekınim hatım. Bavê mın û diya mın ji tırsyan. Bêje, çı qewımiye? Mın jı serşıvan pırsi, ew dıvê: "Şıkır ew sax-sılametın"...

– Erê, weleh emê saxe-sılametın. De tu jı kon der-

keve, ez rabım kıncê xwe xwekım, paşê bêjme te, çıma mın gazi te kırye.

Şebab derket çû hoza berxê vırin. Mi idi gışk zabûn. Hoze tıji berx bûn. Ewi lı berxa nıhêri. Berxe gışke hê mexelbûn. Çevê gışka mınani çevê zarê çûkê colanada gırtibûn û dıkenyan. Şebab dılê xweda got: "Weleh ew ji minani meryanın". Şebab ku deri vekır heveki pêşta çû, gışk hışyar bûn û bû kale-kala wan.

Serşıvan destpêkır Şababra gılikır, çawa isal miyê wan dupayê wi cêwi zaye. Paşê ewi desteka(*) xwe gırt ani cem Şebab got:

– Şebab can, hıla bınhêr ev berxa kewe kur du gupıke stukûrêdanın minani wi beranê meyi kewi kur du gupıke stukura widanın ji. Mın ev berxa kew kıriye desteka xwe.

– Lı te helalbe, tu hêjayi,– Şebab got.

Hetani ewana nav berxada bûn, Nenê hahanga rabû, ci hılda, ser çevê xwe şûşt, çû zûtırê çend mi dot, çaper dada û zûtırê taştê hazırkır, paşê çû gazi şıvana û Şebab kır, weki bên taştê bıxun. Ewana hatne kon, destexana paqıje spi ser kulêv raxısti bû, gışk rûnıştın taştê dıxwarın. Şebab şiv nexarıbû gerekê bı medeki rınd taştê bıxara, lê meşquliya şeva çı xuşkê gazi wi kıriye, nan ber wida nedıçû. Ew dıfıkıri:

"Gelo seva çı ewê gazi mın kırye û çı sure weki ew mınra navêje?"

Ew nesekıni û jı xuşkê pırsi:

– Nenê xuşkê can, rast bêje te çıma usa bı lez gazi mın kırye. Nenê kenya, got:

– Bra can, tu taştê bıxwe, te isal xılındor û lorık nexwarıne, bıra şıvan ji taştê bıxun herın, paşê ezê bêjım...

Ew gıliyêd xuşkê wa sur Şebab dıha da hewaskırınê.

---

*) *Destek ew berxwe yanê kavır e, ya ku şıvan, yanê kurê malê xwera duruf dıke.*



Institut kurde de Paris

Ewi nızanbû çawa nan dıxwe. Şıvana zûtırê taştê xwarın û derketın, çûn berx beri miya dan. Vê sıvê bû kalıniya berxa û miya ew deng kete merıv heyran-hıjmekar bû bıbihısta. Raste, ela Berodera hınek idi bıbûne reat, lê du-payê dewar xweydıkırın. Nan çandına wan, her bona xwarına wan bû. Mezınê wan dıgotın:

– Nan çandın hemû pake, lê xêr û bereketa heywanê çarpê zêdeye. Em kurd bê goşt û şir nıkarın bıjin. Mêrê ecem bı pıncara bostana ji dıkare bıji...

Gava berx têrbûn, şıvan heveki dın ji sekının, lê paşê berx û mi jı hev veqetandın, ajotın û çûn. Pey çûyina şıvanara xuşkê Şebab ra gıli kır :

– Duh na pêr mın Dilber ser kaniyê dit, ewê mınra qısekır, weki Qurşût hatye dolga wan û payê xışır-embaretê xwe daye û gotye Dilberê, weki bıve bermaliya wi, Dilberê beri wi daye.

Şebab ku bıhıst ev gıliyê xuşkê, hêrsa wi rabû, dest bıre ser qewza qemê, got:

– Ezê herım wi kuçıki bıkujım çiti-çiti kım...

İdi qe nesekıni, çû hespa xwe siyarbû. Xuşkê xwe avête berê, weki ew neçe. Lê Şebab hesp ajot, çû.

Dolga Qurşûtê gelek dûrbû. Şebab ku gihişte mezelê qıjlê idi nivro bû. Hespa wi duh jı êvarda heta nıha bırçi bû. Ew jı hespê peyabû, gem jı devê wê derxıst û destpêşkır. Bıre nav mezelê bıçêrine, çımki çêre lı wêderê bole. Ewi hespa xwe çêrand, heta nava mezel. Kete bira Şebab, wexta ew diya xwera dıçû ser mezelê wane lı kelê, dê yeko-yeko jêra şırovedıkır. Nıha ji ewi xwexwe fıkra xwe dıgot:

– Ev kumeytê berani stu kêr, kıvşe mezınê qebilekêye, yanê ji mêrxase. Ew mexberê şêr ser hatıbû çêkırınê, kıvşe mezınê eşıreke mezınbûye û geleki şahi İranêra şer kırye û zor daye wana. Ev mezelê ku hesp ser heye ev ji kumeytê mêrxasane, lê ev mezelê çolan ser ev bê mıraz bûne û hê zar ji neketıye destê wan.

Şebab çû kûraya mezel, ewi kumeyteke mezıne bı qube hatıbû avakırınê, dit. Ewi nızanbû meniya vê kumêyte çiye. Çıqasi da aqılê xwe, dorê çû hat, tıştek nekete bira wi...

Bıhara vê deştê idi ketıbû qedemê xwe, bin û boxaza vêder merıv jê têr nedıbû. Şebab jı wêderê hesp çêrand hate jorê, ewi dit, fêza wida ser kevıreki bılınd şıvanek rûnıştye, pezê wi lı dora wi jı hev belabûye dıçêre, ew ji xwera bılûrê dıxe. Şebab guhê xwe da ser, weki bızanbe kijan qeydeyi lêdıxe. Ewi bihıst û xwexwe hêdika ew qeyde alı wa stra:

— Bêjıng bırê, bêjıng bırê
Bêjıng ser bavêda xıravkırê.
Zu cabê bıde malê,
Pezê bavê te dıza bırê...

Kete bira Şebab, çawa vê qsêda tê gotınê: "Axê şıvanê xwera kıre bêbexti, keça xwe neda şıvan". Ev serhati ser wê qewmandınê hatye gotınê. Şebab ku hespê xwe heveki çêrand, paşê hespê xwe şiyar bû, çû. Ew ku gihişte dolga Qurşit idi wexta jı nivro dageriya bû.

Bınya dolgê çemeki çûk dıkşiya, lı keriya çêm zaro holmaçk dılitztın, ew nêziki wan bû, pırsi:

– Zarno, konê Qurşûtê bazarbaşi kıjane?

Keçıkekê got:

– Apo, konê Qurşût ê hani jorıne, –ewê destê xwe zarın wi alida dırêj kır, nişani Şebab da...

Şebab ajot çû. Lê negihişte kon ew fıkıri "çı bêje Qurşût" ewi bıryar da, bêje:

– Tu ne mêri, tu bênamûsi, herkê tu mêri û bı namûsi, derkeve pış kon û em mêrani hevra xeberdın, weleh ezê cendekê te lı van qıjla minani cendekê eskerê İranê çawa par payizê mın raxıst, ezê te ji usa bıkım...

Bı van fıkırada Şebab qe tê dernexıst, çawa hespê wi



Institut kurde de Paris

ber konê Qurşût sekıni. Jıneke qemere kofi kêle qure, stuyê wê tıji mori-mırcan, destê wêda bazınêd baxdayi, berbı wi hat, got:

– Brao, keremke peyabe çıma ser pışta hespê sekıni?

– Xuşkê, ez peya nabım, bêje mêrê xwe, bıra jı kon derê şuxulê mın pê heye.

– Brao, mêrê mın ne lı vıre. Ew duh çû qelê, qe nızam çawa ew vê riya dûr peya çû, ew qe peya negeryaye...

Ewê ku ev gıli gotın, sınca dılê Şebab bı tehreki xırab bû. Ew heveki sekıni, fıkıri. Jınıkê disa wekıland:

– Brao peyabe ha nepake, tu mêvani hema naneki, avekê...

- Zef razime xûşkê. Tu dıbêji: "Mêrê mın peya çû". Çıma peya çû, hespê wi çı pê hat?

– Brao, Qurşût çûbû van dolga nızam mala kê. Hespa xwe tewılandıbû, weki bıçêre, lê wê têrmaşê tewl qetandıbû û revibû çûbû. Ewi kırıbû-nekırıbû nıkarıbû bıgırta. Hespê berê xwe dabû kelê û çûbû. Bırê te hema usa peya dereng tari westyayi hate mal. Wê şevê mal ma, lê sıvetırê zû rabû çû. Kes nızane ew belengaz çend rojada û çawa peya gihışte kelê...

Şebab vegerya hate dolga xwe û xuşkêra gılikır...

Nenê got: "Pey, mın birkır tera qısekım. Wexta ew usa hatıbû konê Dilberê, ew bırê xweyi çûk hinkırıbû, hespa wi jı sıngê kon vekırıbû. Hespa wi revi çû. Ew ku jı kon derket, hespa wi tunebû, keç û jın pê kenyan. Ewi serê xwe kırıbû ber xwe çû".

Ew çend roj bûn Şebab cem xûşka xwe bû. Lê rojekê qasıd hatın lı hemû dolga geriyan. Hukmê Xano belavkırın, weki roja iniyê wê bıve şêwreke gıran. Şebab ku bihıst ev hukm idi qe nesekıni, hespa xwe siyar bû, çû kelê. Wexta ew hate kelê nivro nêzik bû. Ajote ber deri, lê bavê gote kur:

– Lao, pake tu hati. Cmaete gışke hazıre lı dıwanxanêye, nıha wextê mın tune, tu here, ezê paşê bêm...

Şebab çawa qumandarê sedlıkê, hema usa bı çek-sılahava çû. Ew ku hate dıwanxanê, cmaet tıji bıbû, ci tunebû meri lê rûnê. Hınek ser deravê bın piya diwanxanê, ser çoka rûnıştıbûn, hınek piya sekınibûn. Ewi heveki xwe pêşda da, lê ci qe tunebû, weki meri piya ji bısekıne. Her şeş kurê Xano ji lı wıra, bınpiya dıwanxanê sekınibûn. Bavê destur nedabû, weki ew rûnên, sê xulama kevır, heste destada agır vêdıxıstın, dıda ser qelnê mezına. Hıne kalara ji qelnê wane tıtûn dadıgırtın. Diwanbaşi derda hat, got:

– Maqul, hıne mezınêd qebilê me jı hêlêd dûr hatıne, gışk vıra ci nabın. Em herne baxçê, ida bahare hewa xweş e... Beri ewlin Xano rabû, pey wira cmaet rabû û derketın.

Wextê ewana hatne baxçê, lı wêdere sed kulavi zêdetır, raxıstıbûn. Ser kulava balgiyê tenık û nerm danibûn. Bona mêvan bıdne ber pala xwe. Gava nêziki kulava bûn, Xano got:

– Keremkın rûnên.

Lê kesek rûnenışt heta Xano xwe xwe rûnenışt...

Têlê spi teze ketıbûne sûretê wi, lê kê Xano didit, keseki bawernedıkır, weki evi, hê usani cahıle, heftê pênc sal emr kırye. Xano lı cmaetê nıhêri. Gışke ker bûn lı Xano dınhêrin û dıxwastın bızanbın ewê çı bêje. Lê Xano tıştek negot. Ew hiviya bavê xwebû. Xêlekê şunda kaleki bejnbılındi minani Xano wêda xuyakır. Necaxeki mezini-terıki ser mıla bû, destiyê necaxê wi anegori dırêjaya rımnivekê hebû. İdi tıştek pêra tunebû. Ew meriyê xeribe jı eşira Şıkaka, ê ku wê gavê mêvanê wan bûn, tê derxıstın, weki ev bavê Xanoye, çımki cendekê wi û bejn-bala wan mina hev bû. Her cadûbûn ew bû, bav idi lapi kalbû. Rûyi wi sımêlêd wi lape spi bûn, lê hê ser qeweta xwebû.

Gava ew nêziki wan bû, beri gışka Xano jı ber bavê xwe rabû, paşê cmaet gışk rabû. Ew çû fêza kur rûnışt.

Xano dest bıre sımêla, heveki bada, got:

– Ev qısa ku ezê iro wera bêjım zûda qewımiye. Hûn

Institut kurde de Paris

cahıl pak nızanın. Lê lazıme, weki hûn ji bazınbın. Gelek jı ahıla vê qısa mın zanın. Ezi cahılbûm, tenê angori vi xortibûm, –ewi destê xwe dırêji xorteki kır.

Wi çaxi ez revoçiyê Nasır begê bûm. Revoki pır mezın bû. Çarsıd hesp bûn. Du payê wi mehin bûn. Navi wi revoyida çar hespê nêr hebûn. Ew her çar hespê nêr revo xweydıkır jı gura û çawa ji pêşikêş. Nav wan hespê nêrda yek hê wexta çenûbû, mın hini xwe kırıbû. Mın nan dıda ser destê xwe dırêj dıkırê, qeydê cıridê dıfitand, ew dıhat nan bı lêvê xwe fesal hıldıda. Carna mın xwe dıdayê û lê siyar dıbûm. Rojekê nanê mın xılas bû. Ezi hında kevya berê bûm. Du roj bûn kesek nêzik tunebû, weki mın revo teslimi wan bıkıra, ewana teselikın, heta ez dıçûm nan tinım. Roja sısya mın revo lı kevya berê hist û ez çûme mal, weki nan xwera binım, heta ez hatıme mal, heta mın nan hılda, heta ez vegeryame kevya berê, revo lı wêderê bû. Ez rûnıştım mın bina xwe stend û paşê rabûm terkeseri wan çiya, geliya bûm, hespa geriyam. Çı serê we bışinım, ew çend rojbûn mın hesp neditın...

Carna ez dahatme ser wan fıkra "Gelo dıvek çeta ecem revo bır". Çımki wan sala gele çetêd ecem hebûn. Wan çeta davite ser kerêd pêz, ser naxırêd dêwêr, bı zorê dıbırın Carekê ji ewana ser mında hatın, lê tu xêr neditın, mın du mêrê wan kuştın û idi ewana ser mında nehatın. Nasır beg pêhesya, weki revoyê wi undabûye. Rojekê Nasır begê gazi mın kır, ez çûme cem, ewi gote mın:

– Xano, isal çend sale tu revoçiyê hespê mın bûyi û pak ji te revoçi dıkır. Wexta çeta İranê avite ser te, te mêranike usa kır, weki ewana idi ser teda nehatın û berbı eşira me, Berodera ji nehatın. Bêje çı tehri revoyê hespê mın undakır?

Çawa qewımibû mın usa ji gılikır.

Ewi pırsi:

– E, te revo vi aliyê berê hıştın, yan aliyê dın hıştın?

Mın caba pırsa wi da:

– Beg saxbe, mın revo tevekê berê aliyê me hiştın, ezê çıma bıvme hıdudê İranê bıhêlım, ez ne bê hışım!

– De weki tu usa bı hışi, here du roj tera molet, weki tu revoyê mın dı nav du rojada nebini û neyni, usa bızanbe ezê postê te bıghurım, tıji xwê bıkım. De idi xeber nede, here!

Rasti ji Nasır beg meriki zulmkari bê isaf bû. Ewi gelek rencberê xwe bı kûtanê kuştıbû.

Ez çûm, mın revo nedit. Ez ida vegeriyam, hema usa lı çolê bûm. Rojekê Nasır begê gazi bavê mın kır û gotê:

– Weki kurê te revoyê mın neyne ber derê mın, usa bızanbe, ezê postê wi bıgurum, tıji xwê bıkım, mala we ji çûk-mezınava bışewıtinım.

Nasır begê ev gıli gotın, lê wi qe neşêkırand, ew çend car bûnqaçaxa çeta İranê davıtne ser mal û eşira me, mın û bavê xwe şer dıkır, me nedihışt tışteki jı keri-suriyê wi bıvın. Meriyê kela mezın Wanê, bıra bêjın, ez rast dıbêm an na. A, meriki wa bû Nasır beg, wan çend rojê ku ez lı serê çiya şev û ro dıgeryam, usa westiyam, weki idi nıkarıbûm saskarbûma. Nava rojê bû. Serê çiyaki bılınd, nêziki hıdûdê İranê bû, mın serê xwe dani, ez xewra çûm, razam. Mın xewn dit, weki mın bılûrê dıxıst û revoyê hespa hat. Ew pêşikês daye pêşiyê û raste-rast berbı mın tê. Jı şabûna ez hışyar bûm. Mın hesp neditın. Mın femkır, weki xewn bû. Lê kete bira mın ez neheqi bılûrê naxım, weki ez bılûrêxım û hespê pêşikêş bıbhê, ku hebe wê bê, mın bılûr jı paşla xwe derxıst û qayim qaydê cıridê lêxıst. Mın usa lı bılûrê xıst, weki dengê bılûra mın kete berê çiya û hemû geliya û newala belav bû. Carna mın bılûr jı ser lêva xwe hıldıda, guh dıda ser û dıbıhist, çawa dengê bılûra mın lı wan çiya dıwekıle û dûr dıçe. Careke dın ji mın bılûr jı ber devê xwe hılani û guhê xwe da ser, mın hew bihist hiriniya hespê nêri pêşikêş tê ewê ku mın hini xwe kırıbû. Lê ki ali ew hirin hat, mın texmin nekır. Wexta hıriniya wi kete guhê

mın, mın jı şabûna dıha qayim lêxıst û gelek dırêj kır, paşê mın disa guh da ser. İcar rınge-rınga sımê hespa hatın. Çarsıd hesp xwe nehındık bûn, lê disa mın texmînnekır. Jı ki ali dengê sımê wan tê. Vê cara ku mın bılûr disa da ser lêvê xwe heveki lêxıst, mın hew nıhêri: hespê çali komeyti nêr lı pêşiyêye, hespê dınêyi nêr, wê lı paşiya revo tên, te qey dıgot evana merine, revoçine, yek lı pêşiyê tê, rê nişan dıde, ê dınê ji qestana lı paşiyê tên, weki hıne hesp paşta nemînın û zırar ji negıhije wan. Ewana hatın bınatara mın, ber zınêr sekınin. Ew hespê ku mın hini xwe kırıbû, serê xwe bılınd kır, guhê xwe belıqand û lı mın nıhêri, te qey dıgot ew bı fıkra xweda dıpırse:

– Tu çı dıxwazi? Em sax û sılamet hatın?...

Mın hevana nên jı pışta xwe ani, vekır, ewi dit hiriniya wi berbı mın hat. Çıqas nanê mın hebû- gışk mın dayê. Paşê mın ew gırt, lê siyarbûm. Da pêşiya revo, ez hatım ber derê Nasır begê sekınim. Revoyê wi mın teslimi wi kır, got:

– Revoyê te mın temam anin, lê ez idi navme revoçiyê te. Bese çend sala ez helal xebıtim...

Ewi kır ku zorê mın têke revoçiyê hespê xwe, lê zanibû weki zorê jı mın têke revoçiyê xwe, tu xêrê jı mın navine, her wê zırarê jı mın bıvine. Lema jı mın vegerya, destê xwe jı mın kışand. Wê havinê ku ez cem wi derketım, payizê Nasır beg nışkêva mır. Nexweşiya wi tunebû. Dıgotın:

– Ewi "Qelya şıvana" gelek xwarıbû, rûciyê wi lı hev pıçıkibûn, lema mır.

A bı vi tehri xwedê pêsira cmaeta me jı Nasır begê xılas kır. Ewi cmaetêra nepak bû, zor dıda cmaeta xwe. Çend cara dıbû şerê me û İranê, yanê eşira, lê ew xwe qe nedıhate şera, minani begêd eşirêd kurdêd mayin, ewi em dışandın, lê gava ku me zor dıda dıjmına, exturme jı jı dıjmın dıstend danin, ewi gışk rapêçdıkır xwera dıbır, tıştek nedıda me. Me xun dırêt, ewi kar dıdit. Pey mırına

Nasır begê, bıharê em derketıne zozanan. Lı zozana bû şerê me û eşira Şıkaka. Şerê me ser zozanabû.

Meha hezıranê idi nivi bûbû, gul sosın kulilk dabûn. Hêşnayê davite hetani çokê, em ida arxayın, şuxulê xweda ketıbûn. Lê eşira me minani iro hazırbû qewmandınê şerara, çımki hergav şerê me û İranê, Romê yanê ji eşira bû. Sıvekê, wexta cab hate me, weki eşira Şıkaka ser meda gırt. Bavê mın hılda rım û gurkebendê xwe, got:

— Lao, iro roja xiretêye, em nıkarın bısekının, were tu siyara hılde hema vırda pêşiyê lê bıbıre, lêxe. Ezê meriya hıldım herme hında "Kaniya Tırş" pıştê jê bıstinım û emê lêxın.

Me usa ji kır. Wi şerida me beri eşira wan da, gele mêrê wan kuştın. Wana sond xar idi nehatın ser me şêr û heta nıha ji ewana idi nayêne ser me şêr. Paşê hıla çend cara ji me komek da wana, wextê şah Abas ew talandıkırın. Paşê wextê em û eşira Şıkaka lev hatın em pêhesyan, şah Abas gotıbû wan:

— Ew zozana ku Berodera lê danye, mın daye we, herın wê zozanê jı wan bıstinın.

Xano ker bû, te qey dıgot tıştekî tine bira xwe, paşê disa despêkır, got:

— Pey wi şerê me û eşira Şıkakara hema wi çaxi rojeke bıharê bû gıregırê eşira me û mıclisa rûspiya kombûn, gazi mın kırın, gelek jı we şıkır saxın û hûn şêde wê rojêne. Xano lı cmaetê nıhêri got, —wana ku gazi mın kırın, ez çûm. Pêş cmaetêva serhıngê kali sed sali gote mın:

— Xano hıla wextê Nasır beg sax bû, raste ew begê me bû, lê wi çaxi ji te mêrxasi eşira me xweydıkır jı hemû qewmandınêd çetın û şera. Em dıxwazın were tu bıve mezınê eşira me...

— Mın gıliyê wan paşta nexıst. Ev çetnaya eşira me, mın hılda ser xwe. Jı wê bıharê hettani vê baharê dûz çıl bıhar derbaz bûye. Me kela ji çêkır. Hûn çûk-mezın zanın eva çend care şahê İranê esker dışine ser me şêr. We dit vê



Institut kurde de Paris

payiza derbazbûyi, ewi disa esker şande ser me şêr. Lê bı pışti xwedê û eşira me, me nehişt tu leke bê ser me. Em erdê xwe mıskenê pêşiyê xwe pak xweydıkın. Dıvek ew disa bê ser me şêr, werın em gışk ber erd û ezmin sond bıxwın, heta yek ji me saxbe, em şerkın, erdê xwe nedne dıjmın...

Xano ku ev gıliyê xwe xılaskır, serê xwe bılındkır û lı cmaeta xwe nıhêri...

Gışka sondxwar bı erd-ezmin, weki heta yek ji jı wan saxbe, şerkın. Emrê xwe bıdın, lê xweykın erdê xwe jı dıjmına.

## SERÊ HEFTA

## QASIDÊD ŞEMDİNANÊ

Institut kurde de Paris

Şemdinan mirlıkeke Kurdıstanê cudaye û qedimiye. Ewê mirlıkê qe nedihişt Rom bê nav wana û xwe seri xwe mirlıkiya xwe derbazdıkır. Çend cara padşê Romê esker dışande Şemdinayê şêr, lê nıkarıbû tıştek wan bıkra. Padşê Romê lı wan kete rıkê, eskereki gıran bı top û cebrxane şande ser Şemdınanê şêr. Ew çend meh bû ehlê Şemdinanê û Romê şerdıkırın. Lê icar kurda wan nıkarıbûn. Eskerê Romê zef bû. Mir Sadıq mirê Şemdinanê dit ku nıkare zora dıjmın bıbe, ewi gazi mıclısa xwe kır û hev şêwırin, çawa bıkın, weki mırlikya xwe xweykın jı zeftçiyê Romê. Mir Sadıq gote mıclisê:

– Hûn gışk zanın, heta nıha debr û jiyina xwe em xwexwe pak derbaz dıkın, mexluqê me lı vıra rınd dıjin û razine. Lê padşê Romê, hûn dıvinın, eva çend care esker dışine ser me şêr. Me nedıhişt ew bê erdê me zevtke. İcar ewi eskereki gıran şandye ser me şêr û em wê nıkarın. Gıregırê eşira mın, hûn çı dıbêjın? Em komekê (alikari) jı kê bıxwazın û çawa bıkın, weki ev kafır neyê erdê me zeftneke?...

Gışke ker bûn, qe yeki dengê xwe nekır. Nav wê şêwrêda jı qeleça şêr Qadi beg nû hatıbû. Ew salek zêdetır hebûn mir Sadıq mezıntaya eskerê xwe spartıbû Qadi begê —qebileke pır mezın bû. Ewi jı qebila xwe du hezar mêr bı çêk-silahava û xwexwe ji meznati lı wi eskerê qebila xwe dıkır û ew hemû şerada usa mêrani şerdıkır û bı serfırazi jı şer vedıgeriya dıhat, weki nav-dengê wi lı nav gele eşirada zef nas bû.

Lema mir Sadıq ew kıvşkırıbû mezınê eskerê Mirlıka xwe. Dıve bê gotınê mezına gışka Qadi begê hızdıkır, ne ku tenê bona mêrxasiya wi, wana usa ji jê hızdıkır bona hurmeta wi, merdiya wi û tımê alikariya belengaza ji dıkır. Cahıla jı Qadi begê hızdıkır, çımki, weki dıbû eşkeke cahıla cejna serê salê, dewat û bındarûk Qadi beg hergav nav wan şayiyada bû. Tevara dılist, govend dıgerand. Zıvıstanê ji carna wextê cahıl dıçûne nêçira hırça, wextê hırç dıkete çılê, ew nêçir-nêçireke zef dıjwar û herkes nıkare wê nêçire bıke. Hırç bırçiye. Kê wê çaxê turış bıke here? Çımki hırç wi hûrxweş bıke. Lê Qadi beg natırse, dıçe û hırçê ji dıkûje tine. Lê gava dıbe wextê holê, lı meha adarê roj wi çaxê heveki dırêj dıbe, teva germ ji dıde berfê, lê şe vê sare berf kurşe dıgre. Wi çaxi Qadi beg cahılara derdıkeve listıka holê. Bı çomaxê xweyi dırêj holê jı cahıla dıstine dıve. Dıqevıme, herhê carna hınek cahıl şaşdıkın çomaxeki lı Qadi beg dıxın, lê Qadi beg ne minanu hınek begêd mayin çêr bıke, yanê ji cahıla bıkute. Na ew tışte usa nake, her dıvêje wi cahıli:

— Xorto,— yanê, heyran, weki tu nızani holê bılizi, çıma derdıkevi meydanê, hol dılızi. Here xwera kap bılize.

Gelek wext derbazbû. Keseki devê xwe venekır û caba pırsêd mir Sadıq nede. Wi wexti Qadi beg nav cmaetêda lı bınatara gışka rûnıştıbû, çımki ew dereng hat û ne meriki qure bû erhede here jorê rûnê. Rûspiya kır-nekır Qadi beg jı bınpiya dıwanxanê ranebû û neçû jorê. Qadi beg dit, weki kesek şêwrê nade, ew rabû ser çoka, weki

Institut kurde de Paris

cmaet pak pêva bê xuyanê û mır ji wi bıvine, çımki dıwanxane meriyada kımkımibû, ewi got:

— Mir Sadıq weki tu rusqetê bıdi, ezê gıliki bêjım...

— Qadi beg, lao, tera tımê destûr, keremke bêje...

— Mir saxbe, zûda lı Kurdıstanê hemûşka xuyane, weki Xanoyê Cengzêrın xweyê kela Dımdımê, qewata wi zore, xayınti tucara mıletê xwe kurdara nekıriye, minani hıneka mayin. Par na pêrar, ewi alikarike rınd da eşira Takora. Werın em hewariya xwe lı wi daxın. Ez bawerım; ewê bê hewariya me û emê wê qetlê jı ser xwe bıdne aliki...

Gava Qadi beg ev gıliyê xwe kutakır, mezınêd qebila û gıregırêd Mirlıka Şemdinanê ev şêwra Qadi begê qebul kırın û geleka hevra gotın:

— Mir saxbe, weleh, şêwr jı vê şêwrê çêtır tune. Herkê alikariya Xanoyê Çengzêrin negıhıje me, Romê welatê me zevtke, me gışka talanke, me têxe hêsirê xwe, minani wan eşirêd meyê ku ketine bın bandûra wan.

Mir Sadıq ji got:

— Ev şêwra Qadi begê rasti şêwreke hêjaye, gerekê em idi zef nesenın, hema nıhada qasıdê xwe bışının. Lê bêjın, em kê bışının, weki bıkarbın Xanoyê Çengzêrinra xeberdın û wi bıdne bawerkırınê dıjwariya me...

Jı mıclısê yeki got:

— Were em melle Mıhemet bışının. Ewi xwendiye û zaneye. Qadi begê ew yek qebûl nekır, got:

— Hûnê neheqike mezın xwera bıkın, weki hûn melle Mıhemed bışının. Herkê hûn dıxwazın rastiyê bızanbın, melle Mıhemet dıjmınê mıletê me kurdane. Ewi lı Romê xwendiye û tımê dıvê

— Padşê Romê, padşê islamêye, mera guneye em kurd pêra şer dıkın û diwana wi qebul nakın. Dınya bın dest padşê Osmaniyêdaye, ew casusê Romê nav meda.

Yeki jı nav cmaetê got:

— Neheq em wi jı nav xwe dernaxın, ew çı mellene, şêxê me heye, bese...

Institut kurde de Paris

Wê gavê hatne ser wê fıkrê, weki bırê mir Sadıq Ebdıl Rezaq, şêx Zade û du xulamava bışinın. Ew herdu qeleçyada bûn, şer dıkırın. Mir Sadıq hukm kır, weki zûtırê bışinıne pey wana. Tari idi ketıbû erde, lê mıclis hê bela nebıbû, gışka ditbû zılma padşê Romê. Wana ber çevê xwe ditıbû Rom çı tine serê erebêd Bexdayê. Hıngi wana ew welatê xêr û bereket zevtkır. Mexlûqetê wan reben û belengazın.

Lema gışka vê gavê usa melûl û kerbûn, dıfıkırin, weki ew zulma Romê neyê serê wan. Lê alikiva ji gışka wê fıkrêdabûn, şerkın, bımrın, lê erdê xwe nedın destê wan zulmkara.

Vi şerida û berê ji çend cara jı Stenbolê wezirêd Romê meri dışandıne cem Mir Sadıq weki ew bê rê û têkeve bın bandûra padşê Romê. Weki ew seri paşdê Romêra daneyne: "Emê esker bışinın û welatê wi kaf-kûn bıkın". Lê mir Sadıq caba wan dıda, dıgot:

– Eva welatê kurdane, erdê kal û bavê meye, em berêda lı vırabûne, tu hukumet lı ser mera tunebûne, em nahêlın hûn bên erdê me zevtkın. Heta merik jı me sax bımine, emê wera şerkın...

Kewa sıvê teze avitıbû nava diwanxanê, mir Sadıq heveki ser doşeka xwe, lıbasê xwe qe nedıxıst, hema usa xwewra çû. Lê sehetek ji nekışand, xulama cab da mir Sadıq, weki şêx Zade û Ebdıl Rızaqva hatıne berderê koşkê sekınine.

Mir Sadıq hukm kır weki destûra wan bıdın ew bên diwanxanê. Ewana ku hatın, ewi nehişt ew xeberdın, pırsi:

– Bêjın, lawê mın, qe çı heye, çı tuneye?

– Wê çı hebe, –şêx Zade got, –qewata wana pıre. Duh na pêr wana em dane ber gullan û topan em jı qelaça derketın me xwe da "Nela Hırça". Lê duh me eskerê wi xopand, kıre xeleqê nêziki sed mêrê wan kuştın, lê herro komeka wi tê û top-cebrxana wi ji tên...

– Mın şandiye pey we, –mir Sadıq got,– weki hûn

herne Kela Dımdımê cem Xanoyê Cengzêrin. Bêjne tu bêy hewariya me. Jêra yeko-yeko qısekın: halê em nıha têda. Bêjnê: - ew xwe ji pak zane- ev çend sale Rom bı eskerê xweyi gıranva tê ser me şêr. Lê em beri eskerê wi dıdın û em nahêlın lıngê wi cıleti lı erdê mekeve -Kurdıstanê keve.

Lê icar eskerê bê hesabe, bı top û cebırxanaye lema em pênıkarın. Herkê welatê Kurdıstanê ber dılê wida şırine, bıra esker hılde, bê hewariya me, Romê me hevra qırke û welatê me zevtke. "De herın, wera oxırbe...

Şêx Zade got:

— Mir saxbe, weki em riya kesera neçın, em zû nagıhijne Kela Dımdımê. Sımonê fıleyi tucar gele cara eşya bırye Kela Dımdımê frotye û vegeryaye hatye. Weki tu wi mera dayni, çawa baled, wê zef rındbe...

Mir xulamek şande pêy Simonê fıle. Xulam gazi wi kır, Simon hate hızûra mir, bı eşireti temene bû, sekıni.

—Simon, tu dıvini Rom çı tine serê me, —Mir Sadıq got. —Ewi lı Diyarbekrê fıle û Kurd qırkırın, ew welat zevtkır. Nıha ji wırda tê.

— Belê mirê mın ez zanım, herkê çı lazıme jı aliyê mında bêje, ez hazırım bıqedinım.

-- Mın şandye pey te, weki tu belediyê bıki, riya kesera qasıdêd mın, Şêx Zade û Ebdıl Rızaq bıvi Kela Dımdımê, cem Xanoyê Çengzêrin, weki ew esker bıde bê hewariya me.

- Mir Saxbe, ser çavê mın, -Simon got, -ezê vê sehetê herım û rêke kesera bıvım, weki em zû bıghijne Kela Dımdımê. Xanoyê Çengzêrin meriki qoçaxe, eskerê wi zûda hini telima şêr dıbe. Şahê İranê çend cara hate ser wi şêr, lê ewi eskerê İranê qırkır, nehişt bê welatê wi zevtke. Bajarê Kela Dımdımê da ji gelek tucar eşyayê xwe tinın têde dıfroşın, dıçın...

-- Simon, xwe em te naşinın kırin-frotanê bıki, em jı te dıxwazın, weki tu qasıdêd mın zû bıghini Kela Dımdımê...

Institut kurde de Paris

–Ser çevê mın, -Simon wekıland,- ez dıçım hespê xwe zinkım...

Ehlê Şemdinanê teze jı xewa sıbê radıbûn. Hema wi wixti jı ber derê koşka mir Sadıq pênc siyar berê xwe dane Kela Dımdımê, çûne cem Xanoyê Çengzêrin. Yek jı wan Ebdıl Rızaq bû, Şêx Zade bû, Simonê fıle bû û du xulam bûn.

Wê sıvê hetani tav hate nêzıki nivro ew pênc siyar rêda dıhatın. Qet xeberek jı devê wan dernedıket, hevra xebernedıdan. Te qey dıgot ker û lalın. Her yek jı wan, fıkra wi lı ser welat bû. Nivro şûnda her Simon xeberda got:

– Weki em tımê vê riya bazırganada herın, em panzdeh roja nagıhijne Kela Dımdımê, lê weki em wa kese serê çiyava herın, emê zû bıghêjne kelê.

– De weki usane, em riya kesera herın. -Şêx Zade got, - lema ji mir tu mera şandi, weki tu riya kese nişani me bıki.

Ewana jı riya bazırgana derketın, berê xwe dan çiya û hespê xwe zengu kırın, çûn. Ewana sıvê berbangê hetani tari dıkete erdê qe ciki nedısekının, lê hema ku tari dıkete erdê, ewana jı hespa peya dıbûn. Hesp şevê dıçêryan, lê sıbetırê, wexta tava sıbê teze davit, disa siyar dıbûn, dıçûn. Wana dılezand, weki zû hewariyê bıbne kela Dımdımê...

İda meha havınêye paşın xılasbıbû. Nan wê salê li çiyayê Dımdımê kêm hat. Nanê frotanê çiyê nêzik tûnebû. Herkê nanê kê ji hebû nedıfrotın, dıkırne çela, vedışartın. Mexluqetê êla Berodera dıçû ciyê dûr nan dıkırin. Rojekê kervanê kela Dımdımê berê xwe dane Şemdinanê, weki wêderê xwera nan bıkırın, binın. Ew çend rojbûn karvanê gıran serê çiyava dıhat. Ro teze hate wexta fravinê. Wana ser kanikê danin. Bınatara kaniyê çemek dıkışiya. Xortêd cahıl, ketne çem gelek masi gırtın. Wê cahılêd ga dıçêrandın. Texmin kırın, weki pênc siyar nava mêşada jı serê çiye hema kese jorda berbı wan tên. Yeki

kal serwerê karvan bû. Wan cahıla cab dane kalê, ewi got:

– Lı vi çiyê xali dûri şênlıka, ew çı siyarın? Weleh hebe-tûnebe ewana meriyê xıravın, wê me talankın û gayê me ji wê jı me bıstinın. Werın em çend meri nava av bısekının, çend meri xwe zûtırê nava mêşeda bıtelinın. Şûr û mertalê xwe hazırkın. Ewana pênc siyarın, em bist û pênç mêrê eşira Berodern. Weki em gışk ji bêne qırê, lê nahêlın malê me jı me bıstinın û me talankın.

Hema usa ji kırın, kalê deh meriyava mane nava ga. Çend mêr xwe nava mêşeda veşartın, çend xort ji mane ser kurma agır, mesi dıpetın. Lê gışkê hazırbûn, herkê lazımbe serê xwe ji bıdın, lê nahêlın wana talankın. Her pênç siyar duz hatne nava ga, sılav dan û pırsin:

– Eva karvanê kiderêye? Hûnê kuda herın?

Kalê berbı wan çû, got:

– Em jı eşira Beroderane, Kela Dımdımê, mezınê me Xanoyê Çengzêrine, isal cem me nan nehat, heveki kêmasiya nên cem me heye, emê herne Şemdınanê, kulfetê xwera genım bıkırın. Çend xorta Simonê fıle naskırın û jê pırsin:

– Tu Simonê tucar nini?

– Belê, we ez naskırım, ez ew Simonê fıleme.

Ebdıl Rezaq gote kalê:

– Nan cem me gelek heye, eva çend sale nanê me bêhesap şindıbe, lê hûn nıkarın bıkırın.

Kalê pırsi:

– Çıma em nıkarın bıkırın?

– Cem me şer e, -Ebdıl Rezaq got,- Padşê Romê eskerê gıran bı top û cebırxane şandiye ser me, şer dıxwaze, erdê me zevtke. Cem me şereki gıran e. Padşê Romê cihê Kurdıstanê zevtkır, gelê eşirêd Kurda bı zora şûr bûne destayê wi û xercêd gıran ji jı kurdan dıstine. Hıneke nepake û kıret: axa beg û mirêd kurda xayinti mıletê xwe kırın û çûn bûne destayê Romê. Weki wana ji, minani Xanoyê Çengzerin mezınê Hekkari, Amudyê, Cızira-Bota û Şemdi-



Institut kurde de Paris

nanê şerkırına, ne Rom, ne ji İranê nıkarıbûn lıngê xwe bavitana Kurdıstanê...

Paşê Şêx Zade got:

– Çend cara Padşê Romê meri şande cem mirê me, weki mirê me bıve destayê wi û diwana Romê qebul bıke, lê mirê me ew yek qebûl nekır û eva çend care Padşê Romê esker dışine ser me şêr, me eskerê wi qırdıkır, nedihışt ew bê nav me, lê ijar eskerê gıran şandiye ser me û em pênıkarın. Çıma wera nayê xuyanê Padşê Romê Sultan Selim û Şah Abasê İranê peymanek gırêdan û Kurdıstan dı nav hevda parevekırın. Bı wê peymanê gerekê nıvê Kurdıstanê bıghije İranê, nivek ji bıghije Romê. Lema herdû dewlet dılezinın, weki Kurdıstana me zevtkın û her yek jı wan aliyê xweda hersal ser me da dıgrın...

– Belê, ew yek me ji bıhistye -yeki jı nav wan got.

– Kalê ku dit ev siyar ne meriyê xıraviyêye, ehlê xêrêne, ewi kıre gazi, weki hevalê wane ku xwe veşartıbûn bên.

– Evdıl Rezaq gote kalê:

– Em qasıdê mirê Şemdınanêne, ewi em şandıne Cem Xanoyê Çengzêrin, alikarikê dıxwaze, gelo gelek maye, weki em bıghijne Kela Dımdımê...

– İro du rojê meye em rêvine, - kalê got - lê hûne sıyarın sıvê nivro hûnê bıghijne kelê.

Meri gışk jı nava mêşe derketın, hatne cem siyara, sılav dane wan. Kalê got: "Gelê qasıdêd eziz, hespêd we xûdanêda mewıcine, jı hespa peyabın, bıra hespê we hıneki rıhetbın xortêd me vi çemida gele mesi gırtıne, bıra disa bıgrın. Mesiyê elebalıx çemi tıjye, me ser kurma agır gelek petıne. Nan mera bıxun, paşê ser çeva hatıne, disa riya xwada herın"...

Şêx Zade lê Ebdıl Rezaq nıheri, te qey dıgot, wê nıhêrandınê, ewi jê dıpırsi: "Em peyabın, yanê na?" Lê Ebdıl Rezaq jı hespê peyabû, herçê mayın ji jı hespa peyabûn. Kalê lı xorta hılat:

– Hûn femnakın, hespa jı destê mêvana bıgrın?

Institut kurde de Paris

Ebdıl Rızaq got:

– Bıra xort zehmetê nevinın, hespê me xulamê me wê bıbın heveki lı van dera bıçêrinın.

Ebdıl Rızaq kolosê xwe jı serê xwe derxıst, bı destmalê xûdanê enya xwe paqıjkır. Enya wi hetani tepelıkê teze kurkırıbû. Têmoriya wiye çûre-çeqele kurişki û gulançkêd wiye ser sûretê wida dalıqyabûn, merıv heyran-hıjmekar bû lı wi, temoriya wi çevê wiye sût, bejna wiye delal û sımêlê narınci bınhêre,- Kalê hêdika gote xorta:

- Kıvşê, ev ne meriki rıjye, ew merıveki hêjaye û hêjaki mezıne...

Çek rıhalê Ebdıl Rızaq, zıri ser eba neqışandi lêbû, xencer ber pıştêra bû, tetka xencerê zivkıri ber pıştêra xuya dıkır. Cahılê ku Simon nasdıkırın jê pırsin:

Kırivê Simon tu bı encila İsa pêxemberki rast bêje; ev mêrê wa bedew kiye?

– Eva mir Ebdıl Rızaqe, bırê mirê Şemdinane. Bavê wan eva bist sal zêdatır heye mırye, ewi hê saxbû mirti da kûrê xweyi mezın, mir Sadıq...

-- Lê evê dınê usa bı bejn hırça kine?

– Eva ji Şêx Zadeye, bavê Şêx Zade sed û deh saliye, hê saxe. Carna dıçe mir Sadıqra kışık û teme dılize, navê bavê wi Şêx Şemoye. Nıha ji bı şûr û mertal û bı rıma movkıri dêstdaye û şerdıke lı hemberi Romê. Şêx Şemo dıvê:

-- Dıjmınê mıletê Kurd padşê Romê û Şahê İranêye.

Cahıla mesi kıvavi ser agır çêkırın, kalê got:

– Mêvanêd eziz, keremkın, heveki zıkê xwe têrkın, paşê rêkevın. Qasıda nan têr xwarın û Şêx Zade got:

– Em zef-zef jı we razine. Rasti ji iro çend roje nan devê me neketıbû, nanê me heye, lê nan ber meda nedıçû, iro saya hurmeta we, me têr nan xwar û destûra me bıdın, emê rêkevın. Eme lezın, de bı xatırê we...

Kalê got:



Institut kurde de Paris

– De, ida hûn ser çeva hatıne, lê vê rêda neçın, heveki dakevne gêli, wêderê şıverêke koçera heye, hema wê şıverêda herın, ewê dûz we bine kelê...

Ajotın, çûn. Ebdıl Rızaq lı pêşiyêbû. Wê şevê ewana qe jı hespa peya nebûn, hespa ida rê hıldabûn û bı hevra dıçûn. Kewa sıvê teze avitıbû, wite-wita çıvika bû, jı hêlina xwe derdıketın, fırin çûn xwera rısqeki destxın. Berê-bere ronkaya sıvê da hemû çiya. Tav ji jı pış çiyayê Dımdımê derket. Hespe gelek westiyabûn. Ewana ser kanikê peyabûn, xulama gem jı devê hespa derxıst, hevsar kırıne stûyê hespa û bırın heveki jı kaniyê dûrxıst, weki heywan hınekê hêsabın û bıçêrın.

Ebdıl Rızaq, şêx Zade û xulamanva serçevê xwe ser kaniyê şuştın, qe sehetek nekışand hesp têrbûn, çımki çêre lı vıra zef bûn. Qasıd disa siyarbûn û ajotın.

Ro hê du bejna bılınd bû, wexta kela Dımdımê jı durva heta xuyanê. Jı dûrva kela te qey dıgot hêlina teyrê atmeceye lı ser zınêr çêkıriye, weki çarnıqali wi pêva bê xuyanê. Aliki kelê pışta xwe dabû çiyaki mezın, merıv tırê qestana usa kırıbûn, weki kesek nıkarbe zırarê bıghine kelê û ehlê wê. Sûrekê bê hesabe bılınd dora kelê çêkırıbûn, her sê ciya rê dıçû kelê.

Simon,gote Ebdıl Rızaq:

– Maqûl, herkê tu dıxwazi, ezê tera qısekım jı bo çêkırına vê kelê...

– Simon,tu jı ku dızani çêkırına vê kelê?

– Maqûl serhatiya vê kelê merıveki kal mıra gılikır û zef ji nav û denge.

– De, weki usane kela hıla gelek dûre, bıra hespê me heveki meşa xwe kêmkın, weki ewana ji bina xwe bıstinın, lê tu Simon destpêbıke mera qıseke derheqa çêkırına kelê.

Simon destpêkır, got:

– Ez zûda mal tinım vıra dıfroşım, wê sala ku teze mın perçe jı Şamê ani kelê, bona frotanê, mın kaleki heyştê-nod sali gırt, ewi şevê, wextê çarsû valadıbû, qere-

wıli lı perçê mın dıkır. Evarekê ez hatıme cem kalê rûnıştım, ewi wa qısekır:

– Eva kela ku hate avakırınê ezi idi mêreki ami-tam bûın. Eşira me, Berodera, ew çend salbûn teze hatıbû vıra. Hostê vê kelê hıneka dıgot fıleye, hıneka ji dıgot hurume. Sûra dora kelê, nexşê sûrêda çêkıri, sê dergê hesın û pêpelingê wêye bılınd ewi hostayi çêkır. Ser wan qûbêd bılınde mezın tımê şev-ro qerewıl sekınine. Gava dıjmın tê ser kelê şêr, qerewıl hê dûrva dıbinın, cabê dıdın Xano, weki esker hazırbın bona şêr.

Bınya kelê, dıha jêrê riya sehetekê zêdetır siyari, disa qûbêd usa bılınd hene, qerewıle têdane û qe çevê xwe nabırın bı sırê çarnıkal dınhêrın, lı dıjmın mêzedıkın. Wextê texmin dıkın dıjmın tê, ewana ji zutırê cabê dıdıne kelê. Wê sehetê eskerê Xanoyê Çengzêrin derdıkeve dıjmınra dıke şer û qırdıke, nahêle weki ew bêne kelê. Lema eva çend care eskerê şahê İranê tê, lê nıkare kelê zevtke, eskerê xwe dıde qırê, paşta dıreve dıçe...

- Bı gotına te, nıha ji ew qerewılê qubada me dıvinın? --Şêx zade pırsi.

– Belê nıha ji ew qerewıl me dıvinın. Ewi kali qısekır, weki hostebaşiyê ku ev kela çêkır, ew berê hostebaşiyê şahê İranê bû. Ewi gele kela çêkırın bona şah Abas lı hemberi Romê, ereba, afgana û Hındıstanê. Wextekê ewi keleke zef rınd çêkır, çımki Hındıstanê gele zor dıda İranê, wê kelêda ewi gele tıştê nû çêkırıbû, herkê lazımbe esker têkeve hesarê, bıkarbe ber dıjmın bısekıne, raweste û şer bıke. Ava wê zexira wê û çek-sılahê wê têda ci dıbûn. Şah hate kelê bı çavê xweva bıvine. Ew çû hundurê kelê geriya û hostatiya wê geleki çû xwoşa wi. Pey evarê şah Abas şande pey hosta ew hate cem şah. Ewi gote hosta:

– Ev kela ku te çêkıriye, kelake zef rınde, lê rast bêje mın: "Tu dıkari jı vê kelê çêtır ji çêki?" hostebaşi heveki fıkıri û got:

– Şahê şah saxbe, belê, ez karım hıla jı vê kelê çêtır ji çêkım.

Şah ew merexeskır, weki ew here mala xwe. Lê paşê wextê hostebaşi çû mala xwe, şah fermankır:

– Sıvê, nava rojê wi hostebaşi heyata kelêda dardakın...

Kalê dıgot:

– Meriyê xêrxwaz lı hemû çiya hene, –hema wê sehetê cab dane hostebaşi, weki şah dıxwaze wi sıvê dardake. Wan çend salada hostebaşi gelek zêr destxıstıbû, ew wan zêra xurcıkeke tıji dıde wi meri, ew hespeke zinkıri jêra tine, hema wê şevê hostebaşi dıreve tê cem Xano û qısedıke: hal û hewalê xwe. Xano wi dıhêle cem xwe û dıbêje wi: "Ez ne şah Abasım, ez meriki usa bê insaf nınım, mınra kelê çêke, ezê te minani ronkaya çevê xwe xweykım û heqeki rınd ji bıdıme te". Xano meriki zef dewletiye, keri-sûriyêd pezê wi lı Bexdayê, Mısulê, Şamê, Basrayê û Stenbolê têne fırotânê, hema du-sê revoyê hespi wi hene, naxırê dewarê wi hene, heft qeynter devê wi hene. Ev devê wi dıçınê welat û bajarêd dûr, zexirê û lazımaya bona eskerê wi tinın. Navê wi Xano bû, lê wextê ewi ev kela da çêkırınê, wi çaxi bona çêkırına vê kelê ewi bı çenga zêr da hostebaşi û pala. Jı wê rojê şûnda navê wi danin Xanoyê Çengzêrin. Xêni wê yekê lı welatê İranê meriyê dewletira mılkdara û begara dıvên: Xan... lema hınek ji dıvêjine wi : " Xanê Kurda ".

Gava ku Simon ev qısa xwe xılas kır, ewana idi gihiştıne kelê...

Dırêjaya sûra kelê nedıhate xuyanê. Ew sûr hatıbû çêkırınê jı kevrêd bıri. Weki merıv rabe ser pışta hespê bısekıne, destê xwe dırêjke disa nagıhijne bılındaya serê sûrê. Jı wan qubêd bılınd qerewıla jorda lı Ebdıl Rızaq û siyara dınhêri. Wexta ewana hatne ber dergê hesini mezini û bılınd ser kevırê surê aliyê rastê şıklê hırça lê nıqışandıbûn, aliyê çepê şêr lê nıqışandıbûn. Ebdıl Rızaq hêdi-

Institut kurde de Paris

ka got:

–Ewi mora şahê İranê jê stendiye, axır şêr tûra şahê İranêye.

Ebdıl Rızaq û şêx zade xulamava ku ditın ev hostati, wana bawernekırın qasi Simon. Ewana ku jı sûrê derbaz bûn, çûne kelê hema usa hema usa bı ecêbmayi kuça, avaya, dıkana, çarşiyê, û xana dınhêrın, qe bawernekırın çawa hatne ber koşka Xano. Pış koşkê meydaneke fıre hebû. Lı vê meydanê gele darêd mezın şindabûn. Ber wan darara, xulexula ava zelal bû dıkışya, lı vıra, ber koşkê, gele meri ber siya van darada hebûn. Hıneke hespê wan hebûn. Kes nızane hıviya çıbûn. Hınek ji kıvşbû palebûn, yek jı wan gote meriki, ê jı koşke derket:

– Heyran hostebaşi gote me: "Hûn zû werne ber koşkê, ezê we bazırganara bışinıme karxana hesın, weki hesın barkın, bona topa çêkın. Ka çıma hostebaşi nayê?"

Çend mêr ji cuda ber siya dara guzê rûnıştıbûn, ewana ji hıviya tışteki bûn. Jı kuçê siyarek hate tanga wana pırsi:

– Hûn zûda hatıne vıra?

– Belê em sıvêda lı vırın.

– De, siyarbın, em herın.

Ewana ji hespa siyarbûn çûn...

Jı koşkê mêreki bılınd, qapûteki nav mılla, derket, hate cem Ebdıl Rızaq û şêx zade pırskır:

– Hûn çıma hatıne? Hûn jı kijan qebilêne?

Şêx zade caba pırsa wi da, got:

– Em jı Şemdinanêne. Mir Sadıqê Şemdinanê em şandıme cem Xanoyê Çengzêrin. Şuxuleki meyi bı lez heye, eva ji bırê mir Sadıqê Şemdinanêye, Ebdıl Rızaqe, –Şêx zade berê xwe wi da kır û nışandayê,– em dıxwazın bêne hızûra Xano, çı lazıme emê bêjne wi...

Ewi meri ku ew xeberdana şêx zade û lewzê gotına wi bihıst, femkır, weki ev merine hêjane. Destxweda hukmi ser xulamê ku wêderê sekınibûn kır:

Institut kurde de Paris

– Hûn çıma sekınine? Hespa jı dest mêvana nagrın? Van hespa bıvın tewlê, teslimi Mıraxur bıkın, bêjın: "Diwanbaşi şandiye bıra pak van pespa bıparêze".

Diwanbaşi Simonê fıle naskır û jı pırsi:

– Kirivê Simo, tu ser çeva hati, lê tu çı dıxwazi?

– Ez xulamê çevê teme, –Sımon got,– mir Sadıqê Şemdinanê ez çawa beled Ebdıl Rızaqra û şêx Zadera şandıme. Ev pênc roj û pênc şevın em rê tên. Bona ku em zû bıghêjne kelê, em kese serê çiyava hatın, lema em usa zû gihıştne kelê.

– Diwanbaşi disa lı çek-rıhalê wan nıhêri, got:

– Çıma hûn sekınine? Keremkın, em herne diwanxanê...

Ewi da pêşiya wana, ew bırıne hundur, kiderê Xano û mıclisa xweva rûnıştıbûn. Wexta ewana hatne sıvderê, ditın: sıvdereke fıreye mezıne cargoşe. Erdê sıvderê gışk bı kevrê gewr, sıpi û reş hatıbû nıqışandınê. Banê sıvderê bı kêranêd darê şımşatê hatıbûne avakırınê û usa avakırıbûn, te qey dıgot guliyêd keçanın, kaw hunandıne. Lê ev sıvdarê, gava merıv lê hundır, aliyê rastê ava kaniya bı kêzin anibûne vıra, xule-xula avê bû jı şırka kêzinê dırêjya, dıkete hewzeki çûk. Ew hewz jı kevırê mermerê spi hatıbû çêkırınê. Jı hewzê ji ew av bın erdêra dıkışya dıhate derva, dıkete nav baxê heyatê. Ber wê kaniyê taseke paqıje qelakıri danibûn, ew bona avvexwarınê bû. Xêni tasi lı wêderê, ber kaniyê mısineki bıçûk ji hebû, ew ji bona avdestxanê bû. Lı sıvderêda ber derê diwanxanê çend çiya kulave raxıstıbûn. Lı wêderê rûnıştın xûlamêd Xano û feraşêd wan bona şuxulêd lez, herkê lazımbe, dışandın. Ew xulamê ku wêderê rûnıştıbûn, çev Ebdıl Rızaq û şêx Zade ketın, jı berva rabûn piya. Diwanbaşi gote xulamêd Ebdıl Rızaq:

– Hûn lı vıra rûnên, hetani mezınêd we tên...

Paşê ewi deri vekır û got:

– Keremkın mêvanêd eziz.

Institut kurde de Paris

Pêşiyê Ebdıl Rızaq çû, paşê şêx Zade hat, kesek lı diwanxanê tunebû, lê çawa edetê eşira, wana sılav da, gotın:

-- Roja vê malê xêrbe...

Diwanbaşi got:

– Hûn ser sera û ser çava hatıne.

Ci nişani wan da, ewana çûn rûnıştın, lê Simon neçû, ew bınpiya diwanxanê ma. Diwanbaşi got:

– Kırıvê Simon, tu mêvaneki meyi ezizi, keremke here jorê rûnê...

-- Ew jı mın zêdeye, –Simon got,– weki ez herım cem Ebdıl Rızaq û şêx Zade rûnêm. Lı vıra mınra pake. Lê weki Ebdıl Rızaq destûra mın bıde, ezê herım dostê xwe bıvinım, eva du sale ez nehatıme vıra, nızanım halê wi çawane...

– Simon can, here, tera iznê, here dostê xwe bıvine, lê paşê disa vere, -Ebdıl Rızaq got.

Simon derkete derva. Diwanbaşi ji pêra derket û lı sıvderê jı Simon pırsin:

-- Simon, dostê teyi eziz lı vıra kiye, tu usa heyri wiyi?

-- Dostê mın Qurşutê bazarbaşiye.

- Tu zani mala wi lı kijan taxêye?

Simon ku çû, diwanbaşi çevnebari hışê xweda got:

"Çıqas tucar hene gışk dıçıne mala wi, lema ewi ewqas dewlet komkıriye".

Lê diwanxane geleki fıre bû û banê wê geleki bılınd bû. Pencerê wê bıçûkbûn, gele pencerebûn û gele ronkayi dıkete diwan xanê. Ber diwarda çarnıqal du cêrge deravêd ne zefe bılınd çêkırıbûn û kaw neqışandıbûn. Ser wan dereva kûlavêd xas raxıstıbûn, ser kûlava ji xaliçe raxıstıbûn. Ser wan xaliçêd xas, balgiyê tenık danibûn. Ew bona meriyê meclisê û mêvan bıdne ber pala xwe...

Deri vebû, xorteki cahılı çardesali derda hat, du heb ji kozidangbûn. Ewi qelınek ber Ebdıl Rızaq dani, yek ji ber



Institut kurde de Paris

şêx Zade dani û du kozidanq ji dani ber wana, got:

— Keremkın, mêvanêd eziz. Qelına bıkşinın.

Paşê xorti dest kıre cêva xwe kevır-heste derxıst. Carekê lêda pişo destxweda agır gırt. Ewi ew agır dani ser qelınê wan û paşta vekışya...

Diwanxanêda kesek tunebû, xêni Ebdıl Rızaq û şêx Zade, paşê şêx jı xort pırsi:

— Xortê delal, ca bêje, kê lı vi ciyê bılınd rûdınê?

- Vi ciyê bılınd mezınê me, Xano rûdınê. Lı vandera ji cêrge-cêrge mezınêd qebila, gıregırêd eşira Berodera rûdınên. Lê her yek jı wan angori rutba xwe rûdınê.

— Çawa anegori rutba xwe rûdınên? Qestana şêx Zade pırsi.

-- Mezınêd qebılêd gıran jorê rûdınên, paşê êd mayin.

-- Lê Xanoyê Çengzêrin xweyê çı rutbiye? Bege axaya, yan mire? Ebdıl Rızaq jı xort pırsi:

— Xanoyê Çengzêrin ne bege, ne axane ne ji mire, kurde, lê jı beqa, axa û mira ji zêdetırê û çêtıre.

Lı diwarê diwanxanê gışk Xaliçe pêda dardakırıbûn, çek û sılahe ser wan xaliçada darda kırıbûn, te qey dıgot, eva cebrxaneya Xanoyê Çengzêrine. E, çı tune; gurz-kebend, tir-kevan, cûre-cûre şûr û mertal, rımêd movkırı, pışto, çend hev ji kırasê zıri dardakırıbûn. Nav wan silahada cûreki geleki mezıni ber hebû û heveki kêr bû. Destiyê şûr zivbû, lê bı zêr kıladabûn, tetka şûr temam jı zêr hatıbû çêkırınê û dıbırıqi. Jı wi xorti pırsin:

— Lê ev şûrê hani mezın ê kêye?

— Eva şûrê Xanoyê Çengzêrine, ewi bı vi şûri serê gele mezınêd İranê bırine. Hema ser pışta hespê ewi lı wan dıxıst.

Şêx Zade û Ebdıl Rızaq ecebmayi hevdu nıhêrın...

Fêza wan sılaha, disa lı diwêr ser xaliça bı cergê gele serê deba darda kırıbûn. Vıra hebûn serêd gura, hırça, kurebeşka, xırnıka, şêra, pılınga, gakûvya, bızınêd kûvi, beranê kûvi bı sturiyê wane badayi rûviya û kêwrişka. Nav wan

seriyada hebû serik kesi nızanbû serê çı debaye. Jı xort pırsin:

– Lê ev serê han serê çı debaye?

– Eva serê keftarane. Berê evi keftari mıriyê teze jı mezala derdıxıst, dıbır dıxwar, paşê evi keftari gele zırar da cmaetê me, ewi zarê çûk dıdızin, dıbırın dıxwar. Gelê dê û bava hêsır barandın bona ewladêd xwe. Şev û ro nêçirvan pey dıgeryan, lê tıştek nıkarıbûn bıkrana. Mıxlûqet heta cem Xano gıri derd û kulê xwe jêra gotın. Paşê Xano xwexwe teji hıldan û pey gerya, yê ıza wi hılneda. Payizeke dereng bû. Jına cab ani, weki wana keftar bı çavê xwe ditıne. Rojekê berf teze ketıbû. Xano lakan pêkırın û çend nêçirvanava, ew ji bı lakan bûn, hıldan kelbêd şıvaniyê çûn pey rêça kevtara ketın geriyan. Ew rêç ewan ani ber derê şıkevtê, wextê hatın ber derê şıkevtê, kelb ewtyan. Kevtar jı şıkevtê derket, kelba dorê gırt. Xano nêzıkê derê şıkevtê bû. Kevtar kelb hiştın, rıkêvi Xano kır. Xano sêçetela hesıni kuta devê wi û bı şûr du derba seri wi xıst, kuşt. Serê wi anin hışk kırın û vırda darda kırın. Bı vi tehri, mexlûqet azabûji wi debeyi.

Nışkêva bû teqiniya dêri, deri vebû, Xano derda hat. Ebdıl Rızaq û şêx Zade jı berva rabûne piya. Xano sılav da wana, wana sılava Xano vegırt û temene bû. Xano destûra wan da, ew rûnıştın.

Xano meriki bılındi mezın bû. Anegori wê bılındayê govdeki gıri lêbû. Kê dest-lepê û mıdasê wi dıdit te qey dıgot eva sehbê dewra berêye. Merıv xof jê dıkşand. Lê dêmeki bedewi lê bû. Sımêlê wiye kawe bı palık bûn, usa dırêj bûn, dıhatın pış guhê wi. Xwe ji usa cûr bû, te qey dıgot ewi sımêlê xwe hınekırıne. Bı xeberdana xweva lewzeki usa şırini lê bû meri zû dıbû hızkıriyê wi. Koloseki devetûki sêri bû. Du şerê Diyarbekırê dora kolosê wê gırêda bûn. Rişiyê şera dıhatın dıketne sermıla. Pışteke Kermane lı nava wi pêçyabû. Lı aliyê çepê ser pıştê xen-

cereke bıçûke gırêdayibû, gevza xencerê şirmaye spi bû, ber pıştêda pişto ji hebû. Qevza pişto bı ziv minani tıremera nıqışandıbûn, ebake spiye lêbû, pêsira eba wi bı qeytana reş nıqışandıbûn û kaw lı bejna wi dıhat. Şaleki fıreyi mezın jı çûxrê gewr lêbû, jı guzıka lıngê wi hetani pıziyê qeytaneke sore pêva dırûbû. Lıngê Xanoda konderê Bexdayê bûn. Ew xortê ku qulıxi diwanê dıkır hahanga qalınek bı tıtûnê dagırt, ani ber Xano dani kevır-heste ji cêva xwe derxıst, agır vêxıst, da ser qelna wi û paşda vekışya. Xano qulapeke kûr jı qelna xwe kışand, dû ser xwera berda û got:

– Gotıne mın hûnê ji Şemdinanêne, Şemdian mın her carekê ditiye, ew ji zûda. Ez wi çaxi hê sıvık bûm. Me hıla ev der avanekırıbû. Erdê wê cikê zef rınde. Deşta Şemdinanê û çiyaêd wê xêr û bereketе. Ehlê wê ji gışke dewletine û merine jêhatine...

– Rast dıbêji maqûl, –Ebdıl Rızaq got,– Şemdinanêra dıbêjın: "Çıqlê cenetê", lê Rom mecalê nade me. Eva çend care esker dışine ser me şêr, dıxwaze welatê me zevtke, têke destê xwe. Lê weleh û billeh ewi çend cara esker şandiye ser me, me beri eskerê wi daye, nehiştiye lıngê wi têkeve welatê me. Lê icar eskereki gıran şandiye ser me şêr. Bıharda hetani nıha xûn dırıje û em dıkın-nakın pê nıkarın...

– Padşê Romê û şahê İranê welatê me Kurdıstan dı nav xweda parevekırıne. Gelo mir Sadıq vê yekê pêhesyaye, yan na? Lema şahê İranê vi alida, padşê Romê wi alida, têne ser Kurdıstanê şêr, hıne mezınêd eşirêd me kurda hene, ê ku xayintiyê dıkın mıletê xwera, dıçın alikariya wan dıkın, xulamtiyê wanra dıkın û mıletê xwe ji pêpes dıkın...

– Belê maqûl tu rast dıbêji, –Ebdıl Rızaq got.

Mir Sadıq, ez û şêx Zade şandıne hızûre te. Ewi dıgot: "Bêjne Xano, ez çevê wi radımûsım, em tengasiyêdane, ez bextê mêrê çêdame, bıra eskerê xwe hılde bê hewariya me. Romê Diyarbekır zevtkır, eşira wêderê kıre

Institut kurde de Paris

bın destê xwe. Nıha ji hatye ser me şêr, dıxwaze me ji têxe destê xwe. Herkê ewi zora me bır, ewê careke dın here ser Hekarê şêr. A, bı vi tehri Kurdıstan bere-bere tê zevtkırınê. Em dıxwazın zû werne hewariya me".

Wexta Xano ev gıliyêd Ebdıl Rızaq bıhist, paşê pırsi:

-- Gotıne mın ev şêx Zadeye, lê tu kiyi, bêje?

Ebdıl Rızaq heveki xwe gırt, şermkır, bêje ew kiye, lê şêx Zade got:

— Maqûl, ev bırê mir Sadıqe, ê çûke, Ebdıl Rızaqe.

- Hûn ser çeva hatıne. İro çende hûn rê tên?

— Maqûl em serê çiyava hatın, riya kese, iro pênc roj û pênc şevın em jı Şemdinanê derketıne...

Hetani Xano mêvanara xeberdıda, mıclisa wi bere-bere dıhatın. Sılav dıdane Xano, temene dıbûn û herkes dıçû cihê xwe rûdınışt, cihê her yeki kıvş bû. Nava mıclisa wi da hebûn hıne kalê heyştê-nod sali û zêde. Ewana gışk dıhatın jorê, cihê hurmet rûdınıştın. Herçê dıhat gışke bı çek û silah bûn, ê ku bı rım bûn, wana rımê xwe bınpiya diwanxanê dıhışt. Bona rıma ciki cûda çêkırıbûn, bona gurzkebenda ji disa bınpiya diwanxanê ciki cuda çêkırıbûn. Lê ê ku bı şûr, mertal, yanê qeme, pişto û xençer bûn, bı silahava dıçûn rûdınıştın. Wextê mıclis gışk hatın, diwanxane tıji bû, idi cihê rûnıştandınê ji nema. Kaleki bejnbılınd, govdeki gıri lê, rûdaneke tire spiyê kawe lê, derda hat, gışk jı ber wi kaliva rabûne ser piya. Xano ji cihê xwe rabû. Ew kal neminani ew kalê ku berê hatın, hıneke jı wan kaltiyê ew cıvandıbûn ser hev, idi heveki pışt kûzbûn, lê ew kal minani xortê tiki bılınd û xortani ji çeleng bû, zû fêza gışka kêleka Xano, aliyê rastê rûnışt. Şêx Zade hêdika jı mêrê kêleka wi rûnıştıbû pırsi:

— Ev kalê usa hurmet kiye?

-- Ev kal bavê Xanoye. Gava dıvê şêwra gıran: çawa bıkın? Çı bıkın bona qewmandınên gıran? Ew kal çı şêwrê bıde û şêwra wi tımê alikariyê dıde me.

Lê wextê dıve şer û şınginiya kosemırsya, eskerê şahê

İranê ser meda dıgre, wi çaxi kalê siyarbe û anegori gele cahıla dıke şer. Ew pişto naxevıtine, her rıma movık, kosemırye û mertalê dıde xevatê. Carekê eskerê İranê dora kalê gırt, nêziki bist meri hebû, me got: "Wê kalê bıkujın", lê kalê usa kır, weki her nivê wan bı rev jı destê kalê xılas bûn.

Wexta mıclisa Xano gışk hat, diwanxane tıji bû. Xano heveki serê xwe bılınd kır, lı meclisa xwe nıhêri, jı diwanbaşi pırsi:

– Kese nema, gışk hatıne?

– Belê, gışk hatıne, her nehatiye mezınê qebila "Keşkoya" dıvên: ewi nexwaşe bethali nav cidane.

Xano got:

– Cmaet, ev mêvan qasıdêd mir Sadıqın jı Şemdinanê hatıne, halê wan çetıne, eskerê Roma reş ser wanda gırtiye, dıxwaze welatê wan zevtke, wana têke bın destê xwe. İro roja xiretêye û roja namûsêye, Rom gundê wan xırav dıke, talan dıkın û kulfet zarava dıbıne hêsıriyê, hûn çı dıbêjın. Em herne hewariya wan, yan na?

Jı nava wê mıclisê yeki got:

– Çı şuxulê me pêketye. Şemdinan ku, em ku, ewana dûri mene, em tenê xwe xweykın jı şahê İranê.

Keseki guh neda gıliyê wi, geleka xeverda, her yeki wan fıkrek got. Pey gışka kalê bavê Xano xeberda û got:

– Weki em ji minani hıne bega û axelera xiretê û namûsê bıhêlın, usa bızanbın ew roja ku nıha lı serê wane, wê bê serê me ji. Em gerekê usa nehêlın, hema nıha herın...

Paşê Xano got:

– Ez ji ser wê fıkrême, em gereki hema iro ji du hezar meri hıldın û herne hewariya wan, çımki ev qasidêd wan iro pênc roje jı Şemdinanê derketıne. Kes nızane çı hatye serê wan...

Şêwr kırın kê bışinın. Hıneka got, weki erhede Xano here. Lê hatıne ser wê fıkrê, weki Hemze Çawış du hezar meriva bışinın. Kalê, bavê Xano got:

– Ev çend sale, Hemze çawış bı hezara esker hazırkıriye, rasti ji gerekê ew here wi cihê dûr. Eva şandına wê bıve çawa cêrbandına wi, çıka hinkırına telima wi û mêraniya wi eskeri çawane?...

Hema wê sehetê şandıne pey Hemze Çawış...

Keseki nızanbû ew pencê wext bû mıclısa Xano ew şêwra gıran dıkır. Lê pençê teva ber evarê ida pencerêra ketne diwanxanê; da diwara,kiderê çek û sılahe dardakırıbûn. Jı wan pencêd tevê banê diwanxanê ji pak hatne xuyanê. Şêx Zade serê xwe bılındkır, lı nexşê banê diwanxanê nıhêri. Gışk bı cûre-cûre kevırê sor, spi, qıçık, reş û rengêd mayine kawva hatıbûn çêkırınê. Te qey dıgot eva ne bı destê meriya hatiye çêkırınê. Deri vebû diwanbaşi û Hemze çawış hatne hundur. Ewi sılav da, got:

-- Bı hukmê te ez hatım, maqûl...

Wextê ewi ev gıli gotın, hıneka bihıstın ev gotınêd wi, ber xweda kenyan. Çımki ewana tıştêd usa telimê nızanbûn, lê Hemze çawış ev bist sal bû nava eskerê Romêda hini vê yekê bıbû, wi eskerê xwe ji usa hin dıkır...

Xano wa bı dengeki fesali nerm got:

-- Mın şandiye pey te bona wê yekê, weki tu du hezar esker hıldi heri hewariya Şemdinanê, evana qasıdêd Mirê Şemdinanê, --Xano destê xwe dırêji wana kır,– Romê ser wanda gırtiye, gundê wan, jın-zarêd wan qırdıke...

Hemze çawış ku bihıst ev temıyê Xano rengeki ken hate ser sûretê wi, got:

–"Ax, hêşka ez zanım mırazê mın hate sêri".. Ser çevê mın, ezi hazırım, hema vê sehetê ji ez karım herım...

– Erê, erê- tuyê hema vê sehetê heri, –Xano got,– çımki ida sekınandın nabe, ev qasıdana iro çend roje rêdanın, kes nızane çı hate serê mirlıka Şemdinanê...

Meriyê mıclısê şaş-metal man, wextê bihıstın jı devê Hemze çawış: "Ax hêşka ez zanım mırazê mın hate sêri".. Wana femnedıkır ewi çıma usa got. Lê meriyê ahıle dınya diti femkırın gotın:



Institut Kurde de Paris

– Lema, usa dıvê, ne padşê Romê welatê wi ji xıravkır, gundê wan şewıtand zar û kulfetê wi qırkırın.

Çend zılamêd cahıl lava kırın, weki wana ji bışinıne wê hewarê. Lê Xano izna wan ji da, ewana ew meribûn, ê ku gele derd-kul û zulma Romê dılê wanda hebû. Ewana jı welatê Romê revibûn, hatıbûn cem Xano û xwera star ditıbûn.

Wê evarê du hezar mêr, jı eskerê Xano berê xwe dane Şemdinanê çûn. Wanra çûn qasıdêd mir Sadıq, Ebdıl Rızak, Şêx Zade, Simonê Fılê û xulamêd wan.

Jı kela Dımdımê ku rêketın, Hemze Çawış ah teşkilkır çûyina rê: her şevê sê-çar seheta rıhet dıbûn, hesp fesal dajotın, weki hesp bintengi nebın rêda neminın. Ewi got:

– Hesp ji ruhbere, minani meryanın, weki geleki bintengi bıki zû dımine. Lı welatêd Bulgariyê zabıtêd me usa fesal em serê çiyava dıbırın, weki em bı xwexwe şaş dıman. Ewi mezıni dıgot: "Vi welati xerib her hesp karın me xılaskın". Raste em welatê xeribdanın, eva Kurdıstana meye, lê hespê disa kêri me bên.

Bı vi tehri Hemze Çawış nava şeş rojada gihıştne Şemdinanê, geleki kurda esker sekıni. Ebdıl Rızaq, Şêx Zade û Simonê Fıle û xulamava gerekê bıçûna cab bıdana mir Sadıq. Hemze Çawış zanıbû delk-dolavê Romê û cesûsiya wi, ewi temi da wana, weki hatına esker qe kesekira nebêjın û bıra qe kesek nızanbe kiderê esker hêwırye, bıra dızikava her bêjne mir Sadıq.

Wexta dızikava cab dane mir Sadıq, weki eskerê Xano hatye, ew xwexa rabû çû nav eskerê Xano. Mir jı şabûna qe siyar ji nebû, hema peya çû.

Gava ew heveki hate nêzik, Hemze Çawış pêşiyêda çû, paşê vegerya ser eskerê xwe got:

– Esker hurmet mir Sadıqra!

Gışk mıtim sekının ciyê xweda û zûrbûn lı mir Sadıq nêhêrin. Mir ev yek dit, şaş-metal ma, ewi hê tıştê usa nav kurdada neditıbû. Dılê xweda got:

-- Eva minani eskerê Romê, wextekê mın lı Stenbolê dit.

Paşê Hemze Çawış disa nêziki mir bû, got:

– Tu ser çeva hati mirê delal.

– Na, weleh hûn ser çeva hatıne!

– Mezınê me,–disa Hemze Çawış got,– sılav tera şand, cansaxiya te dıxwaze û dırêja jiyina te û mirlıka te bona Kurdıstanê.

-- Ser çeva, ser sera ê şandi ji, ê ani ji, hûn gışk ser çevê mın hatıne.

Pey van sılava mir Sadıq nêziki Hemze Çawış bû, enya wi paçkır û berê xwe eskerda kır, destê xwe da ber singê xwe, bı dengeki kali got:

– Hûn gışk ser çeva, ser serê mın hatıne.

Wi dengê mir Sadıqra dıhate bıhistandınê şabûn...

Hemze Çawış vegerya ser eskerê xwe, got:

-- Esker, hêsa, tengê hespan sıstkın û destkêş bıcêrinın...

Hemze Çawış, mir Sadıq heveki jı xulamê wi xewlekır, bıre ser kaniyê, devê gelida, rûnıştın û pırskır:

– Mirê delal, ça bêje hale we çawane?

– Halê me wê çawabe; eskerê vi kafıri bê hesab hatye. Van çend rojê ku mın qasıd şandıne bal we, ewi lêxıst, meriyê mın jı destê derxıst, hat kete deşta Şemdinanê. Nıha pıraniya şer lı deştêye. Topê wi hene, weki top ninbûna welehi lı ezmin, bılehi kerim, mın nedıhişt lıngê wi têkeve mirlıka mın...

– Bıbaxşin, navê te xêr?

– Navê mın Hemze Çawışe.

– Tu çi Xanoyê Çengzêrin têy?

– Ez telimçiyê eskerê wime, qe pızmamê wi ninım.

– De, tu ser çeva bêyi. Ez tera rasti bêjım: eva çend care padşê Romê esker dışine ser mın şêr, lê ez eskerê wi qırdıkım û revê pêdıxım, lê nıha esker geleke.

- Hûn zanın çı cûre eskerê wan heye, siyarine yan

peyaye?

– Siyari ji heye, peya ji heye. Topê wan bı berê qantra dıbın. Wê rojê meriyê me gelek eskerê wi qırkırın û çend meri ji dil gırtın. Nav wanda yeki kurd bû. Raste, ewi kurd xebernedıda, lê lawıkê me têderxıstın, weki ew kurde.

– We ew dil kuşt?

– Na hê saxe.

– De weki saxe, tu wi bışine cem mın. Ewê kêri mın bê. Xêni wê yekê, ez xulam, eva şeş roj û şeş şevın em rê tên. Esker westiyaye, gerekê esker hêsabe – têr razê. Sıvê ez xwexa herme eniya şêr, pak bı çevê xwe bıvinım qelaçiyê eskerê dıjmın. Paşê ezê bêjme we, em çı bıkın. Lê beri wê yekê mıra lazıme deh zılamêd jêhatiye qocax, ê ku pak zanın rê dırbe, çiya û baniyê Şemdinanê, ewê bıvne beledê eskerê mın. Wan meriya hazırke, kengê mın got, wi çaxi bışine cem mın.

– Keremke, em herne malê, –Mir Sadıq got.

– Belê, ezê bêm, tu keremke here, vê gavê hıla şuxulê mın heye.

Mir Sadıq ku çû, Hemıze Çawış qerewıl lı hemû çiya da sekınandınê Hukmi ser mezınê sedlıka kır, weki esker gışk hêsabe- razê qerewıla dayne jı her sedlıki, lê her sê sehet şûnda bıra wan qerewıla bıguhêzın, weki ew ji hêsabın, razên. Dewsa wan hıneka dınê qerewılya bıkın. Jı serkarê sedlıka ji gerekê yek jı wan nobedariyê bıke ser qerewılêd esker, paşê ewi got:

– Hûn gerekê pak bızanbın, pêşberi me eskerê Romêye, ê ku bı delka û fêla dıke şer, em gerekê haj xwe hebın, weki ew nışkêva ser meda negrın, me bênamus neke û qırneke...

Eskerê westyayi zû kete xewa şirın, gışk razan her qerewılêd wan lı dora dıçûn-dıhatın, wana baş hevalê xwe dıparêztın, ê ku ketıbûne xewa şirin. Hemze çawış ji ser zınareki rûnışt. Qerewılek ji eskerê wi nêziki wi bû, got:

– Seresker, merik jı cem mir Sadıq hatye, dıvê: "İznê

Institut kurde de Paris

bıde ez herme cem Hemze Çawış, mir ez şandıme".

– İznê bıde bıra bê.

Ew xort hat, bı eşiri temene bû, pante kuta got:

– Ew kurdê ku me dil gırtiye bı hukmê mir Sadıq, me ew ani şkevtê...

Hemze Çawış çû şkevtê dit: Merik destê wi û çevê wi gırêdayi sekınine. Ewi hukm kır dest û çevê wi vekırın. Hemze Çawış jê pırsi:

– Tu jı kijan bêlûkêyi û jı kijan taxbûrêyi?

Dil ku bihıst zımanê Romê xeberdana zelal tırsiya dengê xwe nekır.

– Tu çıma xebernadi, bêje, tu jı kijan bêlûkêyi û kijan taxbûrêyi?

– Bı dengeki hêrs Hemze Çawış pırsêd xwe wekıland.

– Ez jı bêlûka çarame û taxbûra şeşame.

– Ez dıvinım, tu ne tırki, tu ji kurdeki mina mıni. Lê tu xayinê mıletê xweyi. Mın ji bist sali qulıxi padşê Romê kır. Ez çawışeki helal bûm. Em dıçûne ser Ereba, ser Huruma. Wi çaxi qumandara, binbaşi, paşa dıgotıne me:

– Kurd û Tırk bırane. Me ji bawerdıkır. Lê paşê eskerê xwe şande ser me kurda şêr. Gundêd me, bajarêd me, jın û zarêd me dane ber gullêd topa, şûra û rıma qırkır. Zevtkır Diyarbekır, deşta Bışêriyê û Kevanê Kêrê Kaf û kûn kırın. Dılê mın ber vê yekê dışewıti, ez revim hatme nava mıletê xwe û qulıx dıkım...

Pey van gıliyê Hemze Çawışra, dil xwe avite ser lıngê wi, got:

– Rasti, ez kurdım, jı eşira "Hertoşame", navê mın Nebiye. Lê ez ji soz dıdeme te, weki minani te ezê ji mıletê xwera bıxebıtım...

Çı surêd eskerê Romê hebû, Nebi gışk got: çend ordine, çıqas bêlûkın, lı kiderê çıqas top û cebırxane hene. Paşê hêsır jı çevê wi hatın, got:

– Zabıt, ez soz qesemê dıdıme te, ez ji minani te, bo mıletê xwe bı hel'ali kar bıkım...

Hıla Hemze Çawış şkevtêda bû. Cab dane wi weki dused hogeçê xurt, çar ga bona esker anine gelida serjê dıkın. Bı barê deva nanê peti anin. Hıneki dın ji Hemze Çawış Nebira xeberda, paşê got.

— Ez te cem xwe bıhêlım...

Rojtıra dınê evarê Hemze Çawış lı diwana mir Sadıq şêwrkır. Lı wê şêwrê hazırbûn hemû mezınêd qebılêd eşira Şemdinanê û gıregırêd mir Sadıq, ewi got:

— Geli meqûla û bıra ez pak pêhesyam hêzên dıjmın û çek-sılahê wi çıqase. Lı ku hêzên wi çıvyaye. Mezınê wan Osman paşaye, lê ew nızane, weki hêza we zêdebûye, ewi nıha arxayine. İro du roje eskerê mın pak hêsabû. Ezê işev pıştê jê bıstinım û lêxım, serweda bıdım, hûn ji vi alida lêxın. Mın guman heye emê lı deşta Şemdinanê qıra zevtçiya binın, weki ew tobeke ida ser weda neyê.

Ew çend rojbûn teze ketıbû meha payizê, hewa hê xweş bû. Hemze Çawış qumandarêd sedlıka eskerê xwe komkır, gote wan, wê çawa vê şevê lı dıjmınxe. Qumandarê sedlıka eva cara pêşin bû ewana şêwra şerda bûn. Pey şêwrêra her yek jı wan çû nav eskerê xwe...

Şêx Zade hate cem Hemze Çawış got:

— Mir Sadıq, gazi te dıke, weki tu bêy şıvê buxi.

— Şêx Zade, here bêje mir Sadıq dewleta xwedê serê wi: gelek qelya goşt cem me heye, bıra bıbaxşine ez jı esker naqetım. Ez û mirê hıla geleki cem hev rûnên û kasêd şerbetê vexun Here bêje mir Sadıq bıra birneke; eskerê xwe hazırke bona lêxıstına berbanga sıvêra. Ezê usa lêxım, ewe hê xewa hıngorêdane. Wextê ew ser weda tên, hûn ji wi alida lêxın, çawa mın şevê dın wera got:

— Ebdıl Rızaq hema pey şêwra tera çû cem serkarê esker, Qadi begê eskerê me hazırke bona lêxıstına işev.

— Ebdıl Rızaq kiye, ez nasnakım?

— Ebdıl Rızaq ewi ku mınra hatıbû kela we.

Şêx Zade ku vegerya çû, Hemze Çawış hate nav eskerê xwe, got:

Ezê işev bıvinım, çıka hûn çawa hini telima eskeriyê bûne, çawa şerdıkın û çawa navê Xano û eşira Berodera mêrxas bılınd dıkın nava mirlika Şemdinanê û hemû Kurdıstanêda.

Şeve reş bû, ewra ezman usa gırtıbû, te qey dıgot bı kulava nıxamtıne; Hemze Çawış gazi beleda kır, got:

– Hûn sê xort bıdne pêşiyê, me bıvın pış eskerê Romê, ew xortê ku dil, ewê salıxa wera bıde kiderêye kûraya eskerê wan. Hûn ciyê xwe beledın, gerekê hûn me ciyê usa fesalra bıvın, kesek me nehese. Çend hevê jı we cem mın bıminın. De, rêkevın oxırbe.

Çawa evarda Hemze Çawış esker temikırıbû, usa fesal û bere-bere sedlıka siyara pey hev rêketın çûn. Hemze Çawış şebab hıştıbû, gerekê ew paşya esker bıhata. Wextê rêketın Şebab hevalê rex xweda xewna xwe gıli kır:

– İşev mın xewn dit.

– Xwedê xêrke, –heval got.

– Xewnêda mın dit, ez çûme avgerımka gêlida, têkevme avê. Mın kır ku kıncê xwe bêxım û têkevme avê mın hew nıhêri Dilbera mın mısini destda, ew ji tê gêli. Mın xwe veşart pış zınareki û lê mêzedıkım; çıka ewê kuda here. Ew hate ber wi kevırê ku mın xwe veşartıbû. Mın kır ku wê bıgrım û hemêzkım, lê mın xewnêda xwexwe got: "Ezê usa keçıkê bıtırsinım". Lê Dilber vegerya, lı mın nıhêri, keniya, got: "Te tırê mın tu nediti, eze hê hafa gêli bûm, mın tu diti. Ez bextê tedame, xwe bıparêze, xwe xweyke".

Xewnêda mın rahişt ew gırt, mın kır ku wê paçkım, lê hiriniya hespê mın ez hışyar kırım. Mın hew nıhêri: mın zinê hespê xwe, ê ku ber serê mın bû, hemêz kırye. Hêrsa mın rabû, mın kır ku ez rabım hespê xwe bıdım ber şûra, ewi nehişt ez Dilbera xwe baş bıvinım, lê paşê mın da hışê xwe: "Çı gunê wi heywani heye, weki kıre hirini. Lê hespê mın ji tu zani, çıto hespe!

Herdu heval kenyan, lê paşê heval got:

— Weki ewê gotye: "xwe xweyke" izna xwedê tê bêy xweykırınê...

Ew gelek wext hebû esker fesal vê şeva tari rê dıçû. Hemze Çawış carna dajot dıçû pêşiya esker, carna ji dıhate paşiya esker, du sê gıli Şebabra nerm xeberdıda, disa dıçû. Ewi nışkêva bırûsya cıxarekê cem eskereki dit. Hemze Çawış hahanga siyari ajote ser wi, qamçik lêxıst, got:

- Kurê kûçıka, mın hıla duh hûn şiret kırın, weki yek jı we agır vênexın. Tu riya xwedê keti vê şevê bı agır tu me nişani dıjmın dıdi, ewê me gışka bıde ber topa qırke...

Ewi eskeri cıxara xwe vemırand û avit paşê got:

— Hemze Çawış, bıbaxşine mın ew şiret birkır...

Esker hat ber qujmeki sekıni. Ew xortê dil gırti nêziki Hemze Çawış bû, hêdika, qestana, bı tırki got:

— Efendi, pış vi çiyayida eskerê Osman paşaye jı ber vi çiyayi hetani deştê û çiyayê han gışk eskere.

Hemze Çawış kurdi got:

— Nebi can, te em pak anin. Lê ezê nıha mêraniya te ji mêzekım.

Baki nerm jı çiya dıhat, ew ba te qey dıgot qestana hat, ezman jı ewra paqıjkır, bû sayi, jı pış çiya hiva teze derket, berê kevike wê paşê bera-bera mezın bû mina sınike gulover, xuyakır. Hemze Çawış Nebi vır hışt, ew çû mezınê Sedlıkara qısekır, weki hazırbın. Û kıvşkır: Kê lı kiderê û ki ali wê lêxın. Pey van temiyara ew vegerya dewsa xwe. Hemze Çawış lı hivê nıhêri kete bira wi, wextê ewi hê zaro bû pirka wi wira gılidıkır:

— Hemze can hiv û tev xûşk û brane, dılê wan hete hevdu, ew yek guneye. Xwedê pêhesya, ewi ew herdu avitıne jorê, hewa. Nıha herdu pey hev dıgerın, weki bıghijne hevdu, lê dıkın nakın, nıkarın bıghijne hevdu. Xwedê neke ewana bıghijne hevdu, lê weki ewana bıghijne hevdu, koka dınyayê wê bê, erdê welgere mırovatiyê wê bınkeve, kesek namine.

Hiv ku gelek bılınd bû lı erdê heveki kıre ronahi. Sıve

Institut kurde de Paris

ji idi nêzik bıbû. Bawışk dıhate hıne cahıla, Hemze Çawış texminkır, weki wexta xewa hıngorêye kûre. Ewi hukmkır, esker lı dıjmın qelıbi û lêxıst. Vê şevê eskerê Romê sergêji bıbû, minani pezê gêj, ewi nızanbû, ki ali bıreve. Jı ber xewa ewana xwexa hevdu qelıbin. Eskerê ela Berodera hema usa lı wana balete bû, hetani sıve zelal bû, lê hê şınginya şûr-mertala bû, xırpınya rımabû lı ser serê eskerê Romêye zevtçiya. Wextê Hemze Çawış siyari dajote nava dıjmın, çep û rast lêdıxıst pêra ji dıgot:

– Eva heyfa Diyarbekırê, eva heyfa eşira mın, Xalta. Eva ji heyfa deşta Bışêriyê.

Eskerê Romê usa xwe wunda kırıbû, weki lı hev ketıbûn, hevdu qırdıkırın. Aliyê bajarê Şemdinanê eskerê mir Sadıq lê qelibıbû. Tevê dabû deşta Şemdinanê. Merıv ku deşta Şemdinanê mêzedıkır, te qey dıgot ev eskerê Romê cına ketiye, hıneka silahe davitın û dıgotın:"ben teslimem". hıneka xwe davite erdê, weki rım û şûr lê nekeve, lê lı erdê ji rım û şurê kurê kurda lêdıket, ew dıkuştın, hınek dırevyan û dıketne bın lıngê hespan...

Vi şerida çawa cêrıbandın Hemze Çawış dit, weki ew telima ku ewi dabû esker, deya neçû. Te qey dıgot: Ev esker gele şerada qalbûye, usa bı qeyde û qanûna şera şerkır. İlahim têda hebûn cahıl, ê ku Hemze Çawış hinkırıbûn; werıs xerboqe dıkırın û bayê hespêra davitne stûyê meriya, xerboqe dıkete stukura wan û lê dışıdiya, ew jı hespa dıketın û erdêra bayê hespê dıkışyan. Eskerê Romê ku dûrva ew yek dıdit; qıdûmê wi dışkend, dıtırsyan û dırevin.

Nebi ji cem Hemze Çawış dûrnedıket, ewi ji mêranike rınd kır. Ewi nışkêva gote Hemze Çawış:

– Efendi, bınêr, bınatara gunde hınaaşe, çend meri xwe telandıne û hema cewa eşda dırevın. Hemze Çawış û Nebi hevra hıcûm kırınê, ew çend zabıtêd Romê bûn, ewana usa tırsyabûn qe dest jı ber xwe hılnedan, çımki ki ali dıçûn kurd pêşiya wan derdıketın. Hemze Çawış bı zımanê tırki gote wan:

— Eva wera ne Diyarbekıre, hûn kuda herın, hemû ciha kurdın, heta berê kevıra ji meri hene.

Yeki jı wan Nebi nas kır, Nebi ji ew nas kır. Wextê Hemze Çawış ew dil nava gundra anin, jınek nav Xani bû û bı dengeki bılındi xweş kılameke ha got:

— Bırano lêxın, xweyno lêxın, hevra lêxın,
heyfa welat, jın-zarêd kurda hûn jê derxın.
Carekê daketye deşta Şemdinanê her jêrine,
De bıra bê xweykırınê jı qedayê Xanoyê Çengzêrine
Bırano lêxın, xweyno lêxın, hevra lêxın,
heyfa welat, jın-zarêd kurda hûn jê derxın.
Carekê daketye deşta Şemdinanê van zınara,
Têda tê gıriyê Romê, nela-nela van neyara,
Bırano lêxın, xweyno lêxın, hevra lêxın,
Heyfa welat jın-zarêd kurda hûn jê derxın.
Deşta Şemdinanê deşteke raste-dûze.
Eskerê Rûmê ketye xeleqê minani kuçıka kuze-kuze.
Bırano lêxın, xweyno lêxın, hevra lêxın
Heyfa welat, jın-zarêd kurda hûn jê derxın.

Siyareki bı bayê hespê ajote cem Hemze Çawış, got:

— Maqûl, mezınê vi eskerê Romê Osman paşa, vaye vê newalêda, —ewi dest xwe dırêjkır nişanda,— dıreve çend keçên me ji xwera dıbe.

Hemze Çawış çend eskerva rıkêvi wi alikırın. Ewana ku hatne newalê, kesek tunebû, lı jı ber kevıreki keçek derket, bezi hate cem siyara got:

— A, vi ali revin çûn...

Hemze Çawış siyarava çûne geli, lê Osman paşa lı wır tunebû.

Osman paşa jı dest eskerê kurda revi xılas bû. Ew menekê zêde bû lı deşta Şemdinanê û çiyaêd wê kurda eskerê Romê dıgırtın, dıkuştın.

Gele eskerê Romê vi şerida qırkırın, herçê mayin ji revin...

Hıngi Şebab çûbû Şemdinanê sêr gelek wext derbaz-



Institut kurde de Paris

bıbû, qe deng û behs jı wan nedıhat. Kesi nızanbû çı hate serê wan. Dilber ketıbû xem-xeyala Şebab û ber xwe dıket. Carna xwexa xwera dıgot:

-- Xwedê hema sax sılamet vegerya bıhata.

Çend carbûn ew dıçû cem mella nıvışt dıkır. Wana quran vedıkır û lê dınhêrin dıgot:

– Wê van roja sılamet bê...

İda ketıbû payizê, lê ew nehat û tu cab nedıhat. Rojeke inê bû, Dilber çû cem remıldara lape bıryan. Dilber ku derda hat, ewê dit, pireke jarıke porspi, qelıneke dırêje destê wêda, ser kulaveki rûnıştiye, qelınê dıkşine û dû ji ser xwera berdıde. Pirê ku çev Dilberê ket û kıncê wêye xaş dit, şabû, fıkra xweda got:

"Weleh rısqeki rınd hat". Ewê qelın jı devê xwe derxıst, got:

– Pêşta were, keça mın, şerm neke, eva mala remıldara navdare. Kê tê, çı dılê wi dıxwaze meyser dıbe, paşê dıçe.

Dilber pêşta hat, got:

– Roja vê malê xêrbe.

-- Tu ser çeva hati.

Paşê pirê destê xwe dırêjkır, Dilber bır kêleka xwe da rûnıştandınê û got:

-- Şerm neke, bêje tu seva çı hati?

Dilberê dora xwe nıhêri, meriyê dın tune, lê keçeke çardeh sali lı wêderê sekınibû. Pirê bı çeva nişanda, keçık derkete derva.

Dilberê got:

– Ez hatıme cem te xızmeta mın lı te heye, dayka pir.

– Keremke bêje, lê ez zanım tu seva wi hati.

Dilberê ku bihıst, wextê pirıkê got:

"Ez zanım tu seva wi hati" şabû got:

– Erê weleh dayka pir, ez seva wi hatıme.

– De, weki dıxwazi meremê te bê sêri û remıl tera rast bêje, tu pera bavêje ser remılê.



Institut kurde de Paris

Dilberê kisık jı ber pışta xwe derxıst çend perê ziv avite ser desmala pirêye raxısti. Pirê ku dit kısê wêda pere gelekın, ewê got:

– Keça mın, ez ku remılê bona xelqê vedıkım, ew zêra davêne ser destmala mın, lê tu van çend perê ziv dıdi û hındıki dıdi. Herkê tu dıxwazi şuxulê te bê sêri, tımayê neke, derxe çend perê dın ji bavê ser remılê.

Dilberê çend perê dın ji jı kisık derxıst, avite ser desmala wê şıngin jı pera hat. Pirê ew pere komkırın kırıne paşla xwe. Paşê berê xwe jı Dilberê guhast, pışta xwe dayê û bû pıte-pıta lêvê wê, paşê got:

– Keçıkek şuxul xırav dıke, lê ezê usa bıkım. Weki ew ber çevê wi reşbe. Her te hızbıke û ser te bengibe.

Dilber bı şaş-metal Pirê nıhêri got:

– Ez nehatıme, weki hıneka ser xwe bengibıkım.

Pirê ku dit, tê dernexıst, seva çı Dilber hatye got:

– Lê tu seva çı hati bêje?

– Ez hatıme tu remlê bınêri, ewi saxe û wê kengê wê bê.

Pirê disa berê xwe guhast bû pıte-pıta wê paşê berê xwe da Dilberê got:

– Şıkır saxsılamete, wê çarşemê bê.

Dilberê razlıxi da pirıkê, derket çû. Hat roja çarşemê. Dilber qe jı derva nehate malê, hiviyê bû, weki wê rojê Şebabê bê Gele çarşem derbazbûn, lê Şebab nehat...

Wexta şer lı Şemdinanê kutabû, raste hıne malada şin-gıri hebûn, ê ku meriyê wan vi şerida hatıbûn kuştınê, lê hemû mirlıktiya Şemdinanê kêf û şahi bû, şadıbûn bona wê yekê, weki qetl û zulma Romê ser wan dane hıldanê. Gele hurmet eskerê Xanoyê Çengzêrinra kırın.

Mir Sadıq bı destê xwe qapûteki mirtiyê lı Hemze Çawış kır, çawa nişana mêrxasiyê.

Tevê zûda dabû, ro idi hatıbû wexta teştiya mirani. Beg û axa, serwêrêd eşira û qebila şêx û mısayq, zûda ber diwanxana Mir Sadıq sekıni bûn, hiviya Hemze Çawış bûn,

weki ew jı diwanxanê derkeve...

Wê sıvê ehlê bajarê Şemdinanê jın-zar, kal-pir zûda derketıbûne derva, hınek ber deriyê xaniyê xwe bûn, hıneke ser xaniya, hınek ser banêd bılınde duqati bûn, mêzedıkırın, weki mêvanêd eziz verêkın, berbı kela Dımdımê.

Lı sûka ber koşka mir Sadıq xêni bıneliyê bajarê Şemdinanê gele meri jı gund hatıbûn, hıneke jı olkê û gundêd dûrbûn, ewana ji hatıbûn, hım mêvana verêkırın- hım ji bı çevê Hemze Çawış bıvinın.

Mir Sadıq, şêx Zade, Ebdıl Rızaq komekdarê wi çend qumandarêd sedlıkê wi û gıregırêd Mirlıka Şemdinanê jı diwanxanê derketın. Ber derê koşka mir Sadıq cmaet usa hatıbû, weki te derzi bavita nedıkete erdê. Bavê şêx Zade, şêxê mirlıka Şemdinanê hate orta sûkê got:

– Lawêd mın, we em, kurdêd şemdinanê, xılas kırın, jı zulma û qetla padşê Romê, xwezla hemû mir, beg û axêd me kurda minani Xano bûna, minani we bûna, –şêx berê xwe Hemze Çawış û sereskerê wida kır, –herın, bêjne Xano ez zanım, weki wira dıbêjın Çengzêrin, dıxeyde, ew hıznake, lema ez dıvêm Xano. Herın bêjne Xano, em çûk û mezınêñ Şemdinanê tu cara birnakın vê qençuyê. Herın jı aliyê mir Sadıqda sılavê bıdne Xano, bêjne mir Sadıq vi şurê kal û bavêd xweyi qedimi, bı xelati dışine Xanora, eva şûra her layıqe ew bıde xevatê...

– Erê weleh, eşed-bıla, tu rast dıbêji, –mir Sadıq bı dengeki bılınd got.

Şêx şûr da destê Hemze Çawış. Şûreki ne ewqas mezın bû, lê şûreki kêr bû, qaba şûr gışk bı zêr nıqışandıbûn. Hemze Çawış şûr jı destê şêx gırt, got:

– Geli bırano, geli maqûlêd eşira Şemdinanê raste, vi şerida çend meri jı eskerê mın bırindar bûn, lê mın heyfa kevn û teze jı Romê hılda, dılê xwe rehet kır. Em jı we razine. Ez şame, weki em bı namûs vedıgerın, weki me Roma xayne dıjmınê kurda jı ser we hılda û hûn xılas kırın jı zulma Roma bêbext. Em bı dılşa dıçıne welatê xwe, çiyayê

Institut kurde de Paris

Dımdımê. Em gışke razine jı hurmeta we. Hemze Çawış bı qumandari hukım kır, got:

– Siyarbın, beled bıdne pêşiyê!

Esker ku leqiya mir Sadıq meclisa xweva, gıregırê eşira wi ji şiyarbûn û wanra rêketın, weki bıvın derbazkın. Wexta ewana kuçêd bajêrda dıhatın, mıxlûqet derketıbû derva, çûk û mezınê wi bajari dıgot:

– Bıra şûrê Xano tımê usa bıribe, bıra ew saxbe bona kurda, bıra emrê wi gelek dırêj be...

Lê gava hatne pırê bajêr, jıneke sereye porsıpi, reşe lı sêri bû, hate pêşiya esker got:

– Bırano ca xwedê hebinkın, kijan jı van Xanoyê Çengzêrine nişani mındın.

Şêx Zade gote wê: – Xanoyê Çengzêrin ne lı vıre, eva eskerê wiye, tu çı dıxwazi bêje?

– Ez tışteki naxwazım. Ez bûm, kurek bû, ew ji Romê vi şerida kuşt. Lê bıra ew kura qurbani Xanoyê Çengzêrinbe, bıra dumka wi dırêjbe, bona kurda, ewi em xılaskırın jı zulma padşê Romê. Belki dewleta padşê Romê velgere, ewi gele mêr kuştın, –gelek jın mane bi û gele zar ji etim kırın, nava van çend salada...

Mir Sadıq û cmaeta wi eskerê Xano derbaz kırın hetani serê sinorê xwe, paşê vegeryan...

Wexta Hemze Çawış jı Şemdinanê rêket, ewi ew kurdê ku dil gırtıbûn, Nebi, xwera ani kela Dımdımê. Ewi pak zanıbû Nebiyê kêri wan bê û xwexa xwera got:

– Xwe ew ne xayine, diwanê bı qanûnê û nızamê ew bırye, çawa minani wextekê ez bırım...

Wê evarê ku Hemçe Çawış hate kelê, Şebab şuna xwe nesekıni, destxweda çû kuca mala Dilberê. Ew çend sehetbûn lı kuça mala wan dıçû-dıhat, belki çevê wi Dilberê keve, lê ewi wi evarê Dilber nedit û vegerya hate mal. Ewi lava xûşkê kır:

– Nanê can, xûşka mıne delal, mın Dilber nedit. Tu sıbê meniya tışteki here mala wan û dızikava bêje wê: "Şe-



Institut kurde de Paris

bab dıxwaze te bıvine, kiderê dıldıke, weki em wıra rasti hev bên".

Nanê rojtıra dınê çû, mala bavê Dilberê. Wexta ewê deri vekır, hate oda jına, her diya Dilberê û cariyê wê bûn, Dilber ne wêderê bû. Diya Dilberê got:

– Nanê, lawo vê sıvê te xêre?

– Şıkır, xêre, meta Eyşê, ez hatıme bevşê xalıça bıvım, diya mın kardıke sıvê tevna xaliçê lêke, lê bevşeki me kême.

– E, çı dıbe, lao, bevşeki na du bevşa bıve. İsal em xaliça çênakın. Par Dilbera mın du xaliçe çêkırın, lê xaliçene çawa rındın. Hızdıki ez nişani te dım?

– Metê bine ez bıvinım, dıvek ez ji hema wi nexşi lı xaliça me kım.

Eyşê gote cariyê:

– Keçê, here jı stêrê xaliçêd teze lê danine, wan herdu xaliçêd Dilberê par çêkırın, wana bine, lê şaşneke, hıneke dınê meyne, tu tımê şaş dıki.

– Na, Eyşê xanım, ez şaşnakım, ezê hema wan xaliça binım.

Eyşê jı Nanê pırsi:

– Şebabê bırê te şıkır sax-sılamet hat?

– Erê meta Eyşê, Şebab sax-sılamet hat. Hemze Çawış zef payê mêraniya wi dıde vi şerida.

– E, çıma vi şeri tenêda, ne wan sala, wextê Şahê İranê ser gundêd meye deştêda gırtın, wi çaxi Şebabi hıla xılfin bû, hê berê sımêlê wi ji qe xûnedabûn, ewi wi çaxi disa mêranike rınd kır. Bıra xwedê xweyke.

Cariyê xaliçe anin ber Eyşê Xanımê danin. Ewê xaliçe raxıstın û nişani Nenê dan. Çevê Nenê ku nexşê xaliçêd kaw ket, ecêbmayi ma. Rasti ji xaliçê usa hê Nenê neditıbûn. Gakûvi çılape kırıbû dırevya, nêçirvan ji çok danibû erdê tir-kevan bavêje gakûvi... Nenê xûşka Şebab bû, ewe jı Şebab çend sala mezıntır bû. Diya Nenê karê cıhêzê wê dıkır, gerek xaliçe cıhêzê wêra çêkıra, lê ne minani

Institut kurde de Paris

van xaliça bûn. Nenê got:

– Meta Eyşê we ev nexş jı ku anine? Cem me hê nex-
şê wa tunene.

– Lao ev nexş tucarê Belûcistanê ku hatıbûn bajarê
me, ewana xaliçeke usa pêşkêşi Musayê xweyê xanê kırı-
bûn. Mêrê mın çû, lava kır, ani. Dilberê jı ber gırt. Lê wex-
ta Mûsa hat xaliçê xwe bıbe, got:

- Weleh, ev xaliçê ku keça te çêkıriye, jı ya mın çê-
tıre, ka vê xaliçê bıde mın ez bıvım. Xaliça mın ji bıra bı-
mine wera. Lê me nedayê

Ew çend seet bûn Nenê xwe egle dıkır, weki Dilberê
bıvine, lê Dilberê xuya nedıkır. Nenê bevşê tevnê hılda
derket, çû. Rêva hê lı kûça wanda ew rasti Dilberê hat,
got:

– Dilber eva çend sehete ez mala we bûn, hıviya te
bûm, tu kuda çûyi?

– Ez çûbûme mala xatya xwe. İro çende xatya mın
nexweşe.

- Jı kıdera gazınê xwe dıke?

– Dılê wê dêşe. Dılê wê zûda dêşya, lê guh ne dıda-
yê, icar usa bedhale, weki idi nava cida paldaye. Mın jêra
hıngıvê beyani bır. Hekim dıvên: "Her hıngıvê beyani ko-
mekê bıde wê, tışteki dınê tu karê nade".

– E, hûn çıma neçûne ser kocek Gulê. Dıvên kocek
Gulê û mella Şêx Qasımê, kesek mina wan meriya sax na-
kın. Ki dıçe ber ocaxa şêx Qasımê sılamet dıbe. Par na pê-
rar kırivê me nexweş ket, bavê mın ew bıre ocaxa şêx Qa-
sımê, mehek nekışand sılamet bû, çû mala xwe. Du zêr ber
ocaxê danin, pezek qurban şerjêkırın, yek ji hema usa sax
kırıne nav pezê wi.

– Mêrê hatye mın keceke, ne ji şêxa qebûl nake. Dı-
vê: "Her tışt jı rebıl-alemdane– jı xwedê dane, koçek û
şêx merine minani mının, ew çı karın ber xwedê bıkın, ew
derewa dıkın"...

– Dilber tu zani ez çıma hatıme?

Institut kurde de Paris

– Ez çı zanım, Nenê, tu seva çı hati?

– Şebab şevê dınê ku hat, hema evarda, vê kuça we hında dıkana û serê cena sekıni, weki te bıvine, heta teri kete erdê tu nediti. İro ez meniya bevşê xaliça hatıme mala we, weki te bıvinım.

Gava ku Nenê besa Şebab kır, Dilber soro-moro bû, rengeki kaw hate sûretê wê, devê wê heveki nív ken vebû, dıranêd wê mınani mırcana spi kırın, merıv heyran-hejmekar bû dı Dilberê hınhêrya, bın xırxalê wêda xuya dıkır, çawa dılê wê hat çû. Ewê dest bıre ber pışta neynık derxıst, xwe nıhêri, got:

– Ezê sıvê meniya kınc şûştınê herme gêli lı avgermkê, wêderê kese tune, her ez û carya meye. Bıra bê.

– Dilber, ewi dıgot, iro dıxwaze te bıvine, ka hetani sıvê dıkare bısekıne!

– İro, ez qe nızanım çawa bıkım, –Dilber heveki fıkıri paşê got: –de weki usane, ezê nivro şûnda disa qesta xatya xwe bıkım, herme taxa wana, bıra ew bê wêderê, ew dera xaliye, kese tune, emê hevdu bıvinın.

– Ezê çûm bêjmêda, bıra nivro şunda bê wêderê – Nenê got û çû... Hıla hê nivro nebıbû Şebab lı taxa qeleçya, kiderê xanyê xatya Dilberê bû, dıgerya; dıçû, dıhat. Ew geleki vi ali, wi ali gerya, ida dengê melle Reşit lı quba mecitê het, ewi eyan kır, weki idi wextê ebadetya xwedê bıkın. Lê Dilber hê xuya nedıkır. Şebab te qey dıgot serma zıvıstanê lêxıstye, dırıcıfi. Jı nivro gelek dageryabû. Nışkêva Dilber serê çena kuçê hat xuyanê. Şebab bezi pêşiyê da çû, Dilber gırt, ku hemêzke. Lê Dilber heveki revi, dora xwe nıhêri, got:

– Şebab, kuro tu bê ari ne şerme, xelqê me bıvine, wêda here!

– Çıma ezi bê arım, Dilber can, ne zûda mın tu nediti, çara mın...

– Ne xelqê me bıvine, ne şerme, dengê destxweda nav cmaetê belavbe, wê bêjın: "Dilbera keça Mexsût bê

namûse, hema lı kuça mêr dıgrın, paçdıkın. Were em herne guhêra deva, ew ji bajêr dûre, emê wêderê pak hevdu bıvinın "...

— Guhêrı deva kijane?

— E, tu çawa bajarvani, weki bajarê xwe pak nızani.

— Weleh, ez nızanım ew çı guhêra devane.

— Ew tu carê ku têne bajarê me, eşyayê xwe dıfroşın, devê wan rojê lı mêşeda dıçêrın, lê şevê tên lı wêderê dıminın, heta sıbê zelal dıbe, paşê deveçi disa deva dıvınê mêşe, weki bıçêrinın. Ezê herme wêderê, paşê tu ji pey mın were wêderê bıra kesek me nebine...

Gava ku hatne wêderê, Şebab disa kır ku Dilberê hemêzke, lê Dilberê nehişt, got:

— Lez mekeve, ew ji wê wexta xweda bê. Tu bêje, bavê te wê kengê xwezginiya bışine?

— Bavê mın dıvê: "Hetani ez Nenê nedıme mêr, ez xwezginiya naşinım mala Mexsûd. Me herêkırın jı devê Mexsûd idi stendiye, hetani em vi şuxulê xwe neqedinın, şuxulê dınê nakın".

— E, kengê wê Nenê bıdne mêr?

— Diya mın gote mın: "Lao vê payizê gerekê bên qelen bıdın û Nenê bıvın. Lê bavê te dıvê na. Ezê wi pezê qeleni hezê meti zıvıstanê çıva xweykım. Qelenê mın bıharê binın û bûka xwe ji bıbın".

Dilberê axineke kûr kışand got:

— Weki usane wê hetani saleke dın ji bıkşine?

— Were hema nıha ez te bırevinım, bıvım mala xalê xwe. Xalêd mın zani mêrxasın.

— Na, çıma usa dıvêji, bavê mın û bavê te bramekê hevın, tıştê usa mera kırête. Te bıhist çend cara Qûrşûtê bazarbaşi xwezgini bı nişanêd pır gıranbıha şand, bavê mın ez nedame wi, hê herêkırın da bavê te...

Wextê Dilberê usa hêsa Şebabra xeber dıda, Şebab lı Dilberê dınhêri. Ewê çolê zêrê mecidiyê Romê dabû ber enya xwe. Fınoyê serê wê ser hevda dıravê ziv bûn. Qotıka

Institut kurde de Paris

reş hatıbû ser sûretê wêyi sor, jı aliyê rastê dalıqyabû bercênikê wêye Helebi *) bûn, jı qulançka rastê û çepêva hatıbû pevxıstınê û dıhat dıkete ser xevava wêye xale lê û çilê-qerqaş. Xızemeke qaşkıri çûke Bexdayê** bêfla wêda bû, şırıka xızêmê dıhat dıkete ber pışta wê. Mori-mırcanê stuyê wêda ber tevê dıbırıqin. Guharê guhê wêda zêre gupıkkıri bûn. Lı destê çepê gustileke bı qaşê sor tıliya wê dabû. Dilberê tu cara çev burıyê xwe bı kıllê Sıphanê kılnedıdan, çımki porê wê, çev buriyê. Wê usa reş bûn, meriyê xerib dıditın ecêbmayi dıman...

İro wextê Dilberê xeverdıda, lêvê wêye sure ne ewqas qalın dıçûn dıhatın. Merıv heyran, hıjmekar bû, lê bınhêriya. Xeberdanêda carna ewê çevê xwe dıgırt û paşê disa vedıkır. Bêvıla wêye heveki kumusi sûretê wêra merıv tırê qale cengın. Şebab nehışt Dilber gırt, weki paçke, lê Dilberê xwe bakır, disa jı destê wi derket, revi. Şebab da pey. Paşê Dilber sekıni, wextê ew hat nêzik bû, ewê got:

– Herkê tu dıxwazi em tımê hev bıbinın, pey mın nıha neyê, weki tu gura mın neki, bêy, ez "Dara mırazakım", ez idi dernakevım, nayême cem te.

– Dilber, "Dara mırazakım" ez pey te naême bajar, lê bıhêle ez te têr paçkım...

Şebab, weleh, tu temam bê ari, heveki jı hış sıvıki. Kuro, vi ci, weki yek me bıvine, wê çı gılya derxın jı bo mın, tu zani?

– Lı çıma bındarûkê te hışt ez bême rûyê te?

– Lı bındarûkê kesek tu qılê pêra navine û ew yek idi bûye edet. Lema cahıl serfınyazi dıçıne bındarûkê, weki hev bıvinın. Xêni wê yekê lı bındarûkê xwe xortek û keçek nine, lı wêderê sedi zêtır cahıl topdıbın. Lê ez tu tenê hatıne vıra, ki me bıvine wê gele gılya pey me xın.

Dilberê ev gıliyê xwe gotın û revi çû. Şebab sekıni,

---

*) Bercênikê Helebê, dêmek lı bajarê Helebê çêkırıne.

*) Xızêma Bexdayê, lı Bexdayê çêkırıne.



Institut kurde de Paris

zûr bû lı bejna kewa xwe mêze dıkır, hetani ew çû ber çevê wi undabû. Ew fıkıri, fıkra xweda got:

"Gıliyê Dilberê rastın, weki yeki xerib me bıvine, çıka çıqas tıştê netê pey me gırêdın, ya mın hıla tıştek nake, ez xortım, lê bona wê keçıkê, ew keçe desteteke".

Heveki dın ji sekıni, ew ji çû, lê rêke dınêda çû...

## SERÊ HEYŞTA QULİ XAN

İdi ketıbû payizê. Koçer zûda jı zozana serê çiyayêd bılınd, jı belekiyêd berfa, dageryabûne gundêd xwe û çûne qıjla bona pezêd xwe axılê zıvıstanê çêkın. Hıneka holıkê teze çêdıkırın, hıneka ji holıkêd mezın bı çaber bona şıvana çêdıkırın, hıneka ji holıkêd kevn teze dıkırın bona sursерma û barana zıvıstanê zırarê nede heywan, hıneka kozêd berxa paqıjdıkırın yanê ji kozê teze çêdıkırın, weki bıharê, wextê serê pêz dıkeve-dızê, bona berxêd vırni kozêd germ hazırbın...

Lê van deşta da berf qet nakeve, herke carna ji berf dıre destxweda dıhele. Û jı payizê hetani bıharê pez hema usa dıçêre, qe têle giha naxwe û herro têre, çımki ku bıhara ku berf dıhelya, lı qontara çiya şênkaya teze şindıbû, lı deştê ji germ dıqıjıline. Pez ida nıkare bıçêre, wi çaxi kurd pezê xwe bere-bere dıbıne nêziki berfê, ciyê hênik û ciyê çêrê xweş. Ew qıjle hema usa jı bıharê hetani payizê vala dımine, qet pêki heywaneki pênakeve, heta payizê çêre bol lê şin dıbe. Wextekê ser van qıjla û zozana gele cara şêr û dew dıqewımi, hetani mêr ji dıhatın kuştınê. Gele xûn dırêjya. Çêrê rınd, hergê qıjla rınd, yanê ji zozanbe zevtdıkır ew meri, mêrê kê zef bûn, qewata kê bol bû... Ew yek dıqewımi, wextê şahê İranê mezınati lı vır dıkır. Lê nıha hıngi Xano mezıntiyê lı vê derê dıke, idi tıştê wusa naqewımın. Raste nıha ji carna qırka hev dıgrın, lê ne minani berê seri bışkên, mıla bıfırinın, yanê meriya bıkû-

Institut kurde de Paris

jın, xûnê bırêjın. Tıştê usa tune. Xano nahêle yek zorê bıde yeki...

Gava hınek nıha ji qırka hev dıgrın, Xano tıştê usa hıznake dıbêje wan:

– Heyran, xwe hûn ji nebûne şahê İranê, yanê padşê Romê, zorê erdê jı hevdu bıstinın. Ez tıştê usa qebûl nakım, şıkır xwedê erdi zefe, her bıparêzın weki şahi İranê û padişê Romê neyê jı we nestine. Kê jı we rehet û pak nesekıne, ezê wi jı eşirê derxım, kuda dıxwazın herın. Hûn pak zanın kurdên ku berdanê jı eşirê yanê qebilê derxıstın, paşê tu eşir, tu qebilêd Kurda wi hılnadın nav xwe. Ez dıvêjme we: kê rehet nesekıne, paşê hûnê xwexa poşmambın...

Rasti ji hergê kurdek jı eşira derxın, ida keseki ew hılnedıda nav xwe...

Hıngi Hemze Çawış jı Şemdinanê ku vegerya bû, hatıbû, ewi disa cahıl top dıkırın û hini telimê dıkırın. Ew û Cewzo çıbûne qezêd duri kelê, bona teşkilkırına cahıla û hinbûna telimê. Ew xortê ku berê cem Hemze Çawış pak hini telimê bıbûn û telim kuta kırıbûn, wan lı wan qeza dersa telimê dıda cahıla. Xêni wê yekê ew xortê kurda ku lı Şemdinanê dil gırtıbûn, navê wi Nebibû, ew dışandne lı wan qeza teseli dıkır, çawa hini telimê dıkın, herkê kiderê lazımbûya, ew çend roja dıma hin dıkır, paşê dıhate kelê, çımki ew ji dı nav eskerê Romê ew ders hin dıbû, gihıştıbû rutba onbaşi û eskerêd teze hati lı wêderê dıda telimê.

Rojekê Xano lı qezekê rasti Nebi û hinkırına cahıla hat. Ew hinkırına wiye bı dıl û bı can geleki lı Xano xweş hat, ewi gazi wi kır, bıre ciki xewle, gotê:

– Lawê mın, tu zani, weleh hemû Kurdıstan serê Hemze Çawış sond dıxun, çımki ew hatye qulıxi mıletê xwe dıke, qulıxi welatê xwe dıke.

Nebi pêş Xanova sekınibû pak guh dabû ser temiyê wi, paşê got:



Institut kurde de Paris

– Ez xulam, ez jı çiyayê Mûsılême, rasti tera bêjım, weki mezınêd me kurda gışk minani te bûna, wê serê gelê mêrê minani te û minani Hemze Çawış sond bıxwarana û em ji ne hêsirya usada bûna, lê ez çı bêjım, bıra xwedê mala xayinê mılet xıravke.

Xano femkır, ev xorti ne rıjye û jê pırsi:

– Le çawa bû, tu çûyi eskeriya Romê dıkır?

– Ez çı jı te veşêrım çı jı xwedê ez ber nızamê ketım, lê jı nızamê revim çûme deşta Bışêriyê lı wêderê qaymeqaymê Romê ez gırtım, disa şandıme eskeriyê, mın dit nabe, ez mam hetani ketme dil nav eskerê te, lê ez şadıvım, weki ez qulıxi mıletê xwe dıkım...

– Eferım, lawê mın, weki tu usa kurda hızdıki. Wê salê mıxlûqet qe xwe nehesya çawa zıvıstan nışkêva serda hat. Nışkêva bû serma, heveki baran bari, lê paşê kıre berf û baran û berfeke gumreh bari, erd nıxamt, idi qe nehelya hema usa ma. Salêd usa tımê dıbûn lı vi çiyayi...

Vê havina çûyi nan lı nav ela Berodera rınd hat, gışka zûda nanê xwe kutabûn, kırıbûne çela, gışka zûda zımêrê zıvıstanê ji lı aş hêrabûn, kırıbûne têra û kilerê xweda danibûn...

Pey şerê Şemdinanê padşê Romê şahê İranêra nıvisi:

"Şah Abas, tu çı dıki? Ne me Kurdıstan nav hevdu parevekır, weki tu aliyê xweda lêxi, ez ji aliyê xweda lêxım, belki em vi welatê xêr û bereket jı destê van beyaniyan zevtkın. Mın bı bıryara wê peymana ku nava meda gırêdayi, eskerê xwe şande ser Şemdinanê şer. Lê Xanoyê Çengzêrin, dıvên jı welatê teye, jı çiyayê Dımdımêye, eskerê xwe hılda hat, komek da mirê Şemdinanê, nehişt weki ez wê mirtiyê zevtkım. Ka tu çı dıki, çıma peymanê naqedini?"

Şah Abas ku ev kaxêz stend û xwend, fırşkê wi rabûn, gote xulama:

– Zu gazi Quli xan kın.

Xulama ku ditın ew fırştengiya wi, çımki wana zanıbû ew meriki hêrse, bezin çûn gazi Quli xan kırın. Quli xan ku hate diwanxanê, ewi dit, weki disa tenê şah Abas pêgırtıne, çımki ewi tep-tepi bû. Sê cara temene bû, got:

— Şahê şah saxbe, ez lı hızûra te hazırım, çı hukm dıki?

Şah Abas gote ber destiyê xwe:

- Wê kaxêza Romê bıde Quli xan, bıra bıxûne!...

Quli xan ew kaxêz hılda xwend, şaş-metal ma, serê xwe hejand, got:

— Şah saxbe, eva çend sale ew qe xerc ji nade û olama ji nake. Destûrê bıde ez vê payizê herım, ser wida bıgrım, ew nıha arxayine, fıkırnake, weki nıha wê ser wida bıgrın. Ezê kela wi xıravkım, wi ji dil bıgrım, binım, weki kurdêd mayin ji bıtırsın, bêne rayê, têkevne bın destê te...

Şah Abas kenya, got:

— Weleh, serê hızret Eli*, ev gıliyê te pakın, hema van roja here, serda bıgre, de idi here, zû karê xwe bıke û esker hılde here!...

Raste, Quli-xan ev gıli gotın, lê paşê ew ku derket poşmam bû, neçû ser kelê şêr, ewi fıkır kır, weki şah Abas birbıke... Lê mehek ji derbaz nebû, rojekê Şah Abas gazi Quli xan kır û bı eks got:

— Kanê Xanoyê kurd te dil gırt ani? Bine çıka ez ji bıvinım ew çı gurê wan çiyane. Ez dıvêm te kela wi ji xırav kır?

Quli-xan ku bihıst ev gıliyêd şah Abas jı tırsana lerızi, ewi têderxıst, weki şah Abas van gıliya bı eks dıvêje. Ewi usa ji pak zanıbû; şah Abas gıliyê usa ciyê bela sebab navêje û serê geleka lêxıstye yanê ji lı ser sêpiyê xenıqandiye. Wê deqê ber çevê Quli-xan bû tari û mıj-dûman, lê paşê zû xwe berevkır, got:

---

*) İran sıhine - ewana pey Mehmet pêxamber hesav dıkın pêxember û wi dıhebinın.



Institut Kurde de Paris

– Şah saxbe, van roja mın karê xwe dıkır, çımki dıvek lı wi çiyayi nıha berf ketıbe, ezê idi sıvê zû rêkevım...

Hêrsa şah Abas heveki dani, got:

– De, weki usane sıvê zû rêkeve. Ez hukm dıkım, weki tu heri kelê xıravki û wi Xanoyê kurd ji, yan sax dil bıgri bini, yan ji serê wê jêki mıra bini. Lê tu ji minani Sılêman xan neki. Wextekê mın ew şande ser Xano, çawa te dışinım, ew vegerya hat, got:

– Xanoyê kurd dıvêje: "Pırtıke erde lı ser vi çiyayê bêwa, me xwera avakıriye, çıma erdê şah hındıke? Em kurd tu zırarê nadne wi". Ewi usa hişt vegerya hat. Weki wi çaxi ewi pak dorberê keleyê cihê lêxıstınê hinbûya û bıhata bıgote me, meyê wi çaxi zora wi bıbıra, ewi wi çaxi hıla kela ji pak çênekırıbû û qewata wi ji hıla ewqas tunebû. Nıha dıvên: "Jı hemû çiya û welata kurd hatıne gihıştıne wi". Nıha ji tu dıvini çı listıka dıke? Rê zevtkıriye nahêle em herne kûraya Kurdıstanê.

Quli-xan disa temene bû, derket. Ew ku derket, çû zûtırê karê xwe kır. Rojtıra dınê ehlê Têhranê hê xewa şirinda bûn, lê Quli-xan du hezar esker hılda, berê xwe da kela Dımdımê çû...

Ew çend roj bûn Quli-xan eskerê xweva rê dıhatın, ev esker gışk bı şûr, mertal, bı tir kevan bûn. Mertalê vi eskerê İranê gışke kevane mezın bûn, heveki minani teştê ku jın pê hevir dıkın, bere xwar bûn, lê bê kevi bûn. Gava ku şerkar ew mertal dıda ber xwe, ewi xwe dıparast jı hemû derbêd dıjmın, minani dergeki ew mertal meri xweydıkırın, usa mezın dıbûn...

Nava rojê bû, wextê ewana gihıştne çiya, vıra germ kêm bû, heveki bû hênkayê. Jı van bılındaya bineke hênık lı sûretê esker xıst. Ewana idi jı deşta İranê raste-dûz derketın. Vıra cina minani deşta İranê raste-dûzbûn, lê cina ji geliyê kûrbûn. Evder ida ciyê deştêd kurda bûn.

Kurda ku ev esker ditın, rengê wan spiçolki minani meriyê tayê keti, sûretê wani mûr, papaxê wane dırêj, ev

mertal û şûrê wane pene kın destxweda nas kırın, weki ev eskerê İranêye, lê kuda dıçe ev eskerê gıran keseki nızanbû. Pêşiya esker meriki qırnte bû. Rûyê wi usa henekıri bû, weki cina ji reş dıkır. Rûdana wi usa dırêj bû, dıhat dıkete ser singê wi û dıghişte qayişa pışta wi. Papaxê serê wi ne minani papaxê esker bû. Kurişkêd papaxê wi kawe kınd bûn, zerdıkırın, te qey dıgot ew rasti zêre, usa ber tavê dıbırıqi. Şûreki piyê wida bû, du pişto ber pıştêda bûn, qewzêd wan piştoya spidıkırın. Lê ev xwe ne minani eskerê zereneki bû. Sûretê wi tıji bû, zıkê wi usa mezın bû, merıv tırê meşke pıfdabû. Ser zinda heveki hatbû. Xuya bû ku ev sereskerê wane. Rex wida yeki dın ji hebû, jı wi cahıltır bû, ew yeki jarık bû, çevıne hûre lê bûn. Gava ewi pış xweva dınhêri, dest dıda ber enya xwe, paşê dınhêri, te qey dıgot dıke si. Lê tev ji tunebû.

Ev esker ku jı gujme jorda hatıne xarê, rasti keri pezê kurda hatın. Mezınê wan hukmkır, çend meri çûn ew pez cıvandın, weki bıvın. Wextê esker pez cıvandın, kelbêd şıvanaye gurêx xwe avitne wana, wana ew kelb destxweda kuştın. Şıvan kıre qirin, got:

– Hûn çıma vi pezi dıvın? Ne ev pezê mıne!...

Esker qe guh neda qirinya wi, pez bırın. Şıvan bezi çû, pêşiya seresker şıkyatê xwe kır.

– Ev eskerê te, kerê pezê mın zorê dıbın.

Serkar got:

– Pez ji ê meye, erd ji ê meye..

Şıvan dit mezın ji şıkyatê wi napırse, hema çomaxê xwe hılda, çû pêşiya pêz, vegerand, nehişt ew pêz bıvın. Quli-xan hukmi ser eskera kır:

– Herın, wi kûçıki ji bıkujın, hûn dıvinın pêz nade...

Du eskera ajotne ser şıvan, dane ber şûra kuştın û pez ji bırın. Gava, Quli-xan bı eskerê xweva heveki dın ji pêşta hat, ewi dit, ev newal û geli tıji kurdın û keri-suriyê pezê wanın. Ewi hukm kır:

– Zu van kerêd pêz bıcıvinın. Ev pez bo xwarına es-

kera lazıme...

Xweyêd pêz û şıvana pezê xwe nedan, bû şerê kurda û eskerê Quli-xan, e, çı karıbûn bıkırana wan kurda lı hemberi ewi eskerê gırani bı silahva. Quli-xan hukm kır:

-- Kê pez neda, lêxın, bıkujın!

Gelek kurd hatne kuştınê. Ew qewmandın zû nava qıjlêd kurdada belabû. Hıneka hewari bırın dane Xano, weki eskerê İranêye gıran berbı kelê tê, çı rasti wi tê talan dıke, dıve û meriya ji dıkuje. Xano gazi Cewzoyê sereskerê xwe kır, got:

– Cab hatye disa eskereki İranêyi gıran berbı me tê. Bıra eskerê me hazırbe. Çend siyara ji zû bışine qıjla, bıra pak pêbıhesın ew çı hewale? Çı eskere? Kuda rê gırtye dıçe? Û zû cabê mera bine. Em gerekê qe nehêlın ew jı deştê derkevne van çiyayêd me.

Xano jı diwanxanê derket, ewi bıhist pış kelêva qalme-qalma cahılane, dıkenın. Xano berbı wi dengi çû. Ew ku derkete hêlanê sûra kelê, ewi dit wê besta pış sûrê cahıl hini telimê dıbın. Cot bı cot hevra dıdıne cırida, rıkêvi hevdu, şıngin jê tê meriv tırê, eva ne telime, şere, wê hevdu bıkujın. Carna ji çend heva rıkêvi yeki dıkırın û wana hevra şûr davitne wi, weki lêxın, lê ewi usa rınd û cida mertal dıda ber riya xwe, qe nedihışt derbek ji bıghêje wi. Hemze Çawış ji dûr sekınibû ferman dıda, carna ji dogot hıneka, navê wan hıldıda:

– Keleş, Rostem, usa nave, usa nepake...

Xano ku ev telima han dit, weki cahıl usa bı dıl û bı can, geleki lı wi xweş hat, weki eskerê wi usa telima xwe dıstine, ewi dı fıkra xweda got:

– Ez dıvinım, destê we dıxurın û şiqiniya we cahılane, xuna we dıkele. Hûn şer dıxwazın, her yek jı we dıxwaze mêraniya xwe bıcêrıbine. Tışteki nake emê van roja rasti dıjmın bên, wi çaxi ezê mêraniya we, lawêd kurda bıvinım.

Xano vegerya hate diwanxanê. Kete tefekûrya vê cabê û xwexa xwera got:



Institut kurde de Paris

"Gelo dıvek şah Abas disa esker şand. Ev çı dıxwaze jı me?.. Weleh, tu wê yekê nabini. Tu dıxwazi eşira me minani eşira lûra têki bın destê xwe. Weleh û bileh hetani Xano saxbe, tu wê yekê navini".

Bı van fıkrava Xano kete nava çiya û raza. Wê sıbê Xano dereng rabû. Ew ku hışyar bû, tevê pencerêra dabû nava oda ciyê razana wi. Jınê destşo ani ber gırt, av lı desta kır, got:

– Zûda sê siyar jı deştê hatıne hiviya tene.

Xano jı jınê hêrs bû, got:

– Lê te çıma ez hışyar nekırım, de zû avê lı destê mıke!

– E, mın çı deyni te kıra, tu kêm radzêyi, şev û ro lı ser lıngani, mal ava bûyo!

– Ka ew siyar lı kune?

– Wane dıwanxanê cem diwanbaşi rûnıştıne. Xano lez ser çevê cankır û çû diwanxanê. Ew ku hate diwanxanê, gışk ber wiva rabûn, ewi sılav da wana, got:

– Sıva we xêr.

– Ser çeva hati maqûl.

– Hûn zûda hatıne?

– Weleh eva xêlek heye...

– Tu dıvini Gewrê*) ez ranekırım...

– De, bêjın, we çı dit û çı pêhesyan?

– Maqûl, tomeriya wan kes nızane çıqase, lı kıvşe çend hezarın, hınek rêda tên, hınek ji hema kese kese ketıne wan newala tên. Hında kaniya tırş em rasti wan hatın, wana ku em ditın dane pey me, lê hespê wan ne minani hespê mene, wana xwe mera negıhand.

– Gışke siyarın, yan peya ji hene?

– Me her siyar ditın, peya me neditın, lê kıvşe gışk siyarın, çımki ew kurdêd deştê dıminın, me ditın. Wana got, weki siyarêd wan gundêd meye jêrın şerdıkın, lê çı

---

*) Gewrê – navê jına Xanoye.

karın wana bıkın, esker geleke, wana tu payê qıjla talan kırın, her mane ew qıjleçi, ê ku revin xwe dane serê çiyê û ciyê hasê...

Xano lı mıclısa xwe, nıhêri got:

— Hûn çı dıvêjın? Şah Abas esker şandiye meriyê me dıkujın, talan dıkın.

Gışkê ker bûn, deng jı keseki nehat, lê paşê celalê mezınê qebila Mesixura got:

— Were em bıhêlın, bıra bêne vi çiyayê me, paşê emê wana lı vıra qırkın.

Ev gıliyê Celal lı Xano xweş nehat. Raste, Celal meriki dewleti bû, lema ew bıbû mezınê qebila xwe, lê ew ne mêrxasbû, ne ji karıbû şereki pak bıkıra. Tımê ewi xwe jı şerda paşda dıda, sepedıkır. Xano zûda ew yek zanıbû. Dengê xwe nedıkır. Lema ji ewi guman nedıkır, weki rojên tengda ew kêr bê û mêrani şerda bısekıne.

Paşê jı qebila malerında Posto xeberda. Ewi got:

— Heyran, ez nızanım van gıliyêd Celal. Dıjmın eşirêd me qırdıkın, mala talan dıkın, ew dıvê: "Were em bısekının, bıra ew bêne ci çiyayê me", ne ew heta bênevıra nivê cmaeta me wê qırbe. Weki nıvê cmaetê çû, emê ji herın, paşê em ida çıranın? Ev çend sale şah Abas esker dışine ser me şer, lê em nahêlın, ew lıngê xwe bavê erdê me. Emê hema nıha ji herın, lı deştê lêxın...

Xano qe idi nehişt keseki dınê xeberde, ewi got:

— Ev gıliyê Posto rastın, hûn çı dıvêjın?

Keseki dengê xwe nekır. Her kaleki got:

— Maqûl, heta nıha te em xweykırıne û rê bırıne, tu çı bıki, em karın bêjın na, çımki tu bona me dıki.

Mıclısê hevra got:

— Weleh, kalê rast dıvêjne, eşed-bılah, tu me xweydıki, çawa dıxwazi hema usa ji bıke. Em gışke amadene weki gıliyê te bıqedinın.

— De weki hûn qayilın. Weleh ez ji qayilım. Paşê gote Cewzo:

Institut Kurde de Paris

— Tu pensıd siyari mıra hazırke. Ezê sıvê rêkevım.

Jı cmaetê hıneka got:

— Maqûl tu çı dıki?

— Çawa çı dıkım? Ez karê xwe dıkım, herme şêr...

— Ne dıvên: "eskerê wan çend hezar mêre" tuyê pensıd mêriva çı bıki?

— Ev pensıd mêr besi mının! —Paşê disa gote Cewzo,— — Tu Mırazê Sazbend bı def-zurne û tulumê mıra dayne. Jı mezınê qebila bıra Esoyê Lakan mınra bê...

Tımê wexta mıclısa Xano dıcıvya, wi çaxi lı diwanxanê bo hurmetê nanê mıclısê dıdan. İro ji çend pez hatın şerjêkırınê, cara pêşın dan kıvavêd şişa, paşê tas kıvav, pey wana qeliya sêlê bı sire mastê bolme û sıni tıji lı ser texta beladıkırın. Şerbet hemi bı gumguma xulama beladıkır. Nan xwarın kuta bû. Xano hukm kır, weki ser qubêd bılınd qerewıla zêdekın, hışyarbın û kelê pak bıparêzın. Bı hukmê Xano gazi hostê topa kırın. Navê wi Xaço bû, lê Xano jêra dıgot Xêço. Ew ku hat, Xano pırsi:

— Xêço te bihistiye, weki şah Abas disa esker şandiye ser me. Herkê wan salêd berê te hıla top çênekırıbûn, raste me zora wan dıbır, dırevin, lê nıha mın guman heye deh tope hazırın.

— Na, maqûl her neh tope hazırın.

— Lê topa deha çawa bû, ne me wê rojê cêrband.

— Wextê tu jı cem mın çûyi, mın dina xwe dayê, hıne kêmasi wê topêda hene, gerekê ez çêkım.

— E, çı kêmasi têda hene?

— Ew cihê pılta biso agır dıdıme ser, ewe kêmasiya we topê ezê zû çêkım... Xano hukm kır, weki top ji bıra hazırbın. Ewi temi da mıclısê, bıra gışk haj xwe hebın, paşê got:

— Hûn hemûşk baş zanın şahê İranê gele cara kurdê xayine cesûsi şandıne nav me, weki hemû surêd me pêbıhese. Lê eva çend care mıxlûqetê me zû tıştê usa pêdıhese û eyan dıke...

Institut Kurde de Paris

Ew du roj bûn ew meriyê ku Xano şandıbûn, hê venegeryabûn. Rojekê Xano du siyar hıldan çû derkete pış sûra kelê û gelek erd ji çû. Ewi hesp jı rê derxıstın, paşê jı hespê peyabû, çend gava nav berfêda çû, hat paşê hespê xwe siyar bû, got:

-- Mın got qey berf usa gele ketye, weki lı van dera bıve şer, dıvek hesp nexevıtın, lê berf hındıke, hesp pak dıxevıtın.

Xano ku hate mal, ew meriyê, ku ewi şandıbûn, vegeryabûn û hiviya wi bûn. Xano jı wan pırsi:

— Bêjın qe çawane?

-- Maqûl wê çawa be, eskereki gırane, ewana wêderê ketıne gunda û mala meriya dıkujın û talan dıkın. Gundi hûrmûrê xwe dıhêlın, zarê xwe dırevinın-dıvıne mêşa, merıv ku nav mêşada tê, dıbhê gıriyê zara, hıneka em ditın revin ketne geliyê kûr û şkevta, xwe veşartın.

— Gelek vırda hatıne?

— Na, hıla ûn gihıştıne wan gundêd jêrın.

-- İdi sekınandın nabe, gerekê em işev rêkevın.

Ro pış çiyava qulıbi bû, tariyê minani dızeki hêdika û fesal erd dınıxımand, mıclıs ji bela bû, çûne malêd xwe. Man her Xano û Esoyê Lakan. Wana şêwr kır, wê çawa, çı tehri, herın pêşiya dıjmın. İdi dengê nivê şevê dıhat, Xano derkete derva, ezman tıji steyrk bûn. Usa ker bû, te tırê gışk razane, lê rasti ne usabû, keseke ranezabû. Ehlê kelê bihıstıbû bo hatına eskerê İranê, seva wê yekê xew lı çevê keseki neket, xêni zarêd çûk û êd ber bıstan. Lê wextê pênsıd siyar bı serkariya Xano jı kelê hêdi û fesal rêketın, çûn, ehlê kelê derketbûne derva, lı kuça, ser banê xaniya, dıgotın:

— Belki textê şahê İranê welgere!..

Esker usa fesal û ker dıhat, qe deng jı keseki nedıhat, merıv tırê vê şevê, vê riya kela Dımdımê jı vê hêsiya bılındda kesek nayê xwarê, usa kerbû. Her carna fırxıniya hespa bû... Gava Xano jı kelê dûrket, ewi hukm kır esker

hespa zengûkın, lezandın.

Xano usa lez dıhat, weki ew nava ro û danekida gihıştıne wêderê, kiderê dıjmın hatıbû ketıbû sinorê kurda.

Cesûsa cab da Xano, lı kiderê eskerê İranê hêwırye. Lê Xano xwexa derkete serê zınareki bılınd û lê nıhêri. Ewi ku jorda lı eskerê İranê nıhêri şaş ma, lı van dera ser kaniya, bın darêd mezın, lı newala û besta kûrmêd agıran lêkırıne, jı pezê kurda talankırıne kıvava çêdıkın. Cina ji yek pez temam ser darava kırıne û kıvava çêdıkın. Cina sitlêd kurda anine qeliyê çêdıkın, dû tıji nav mêşebûye...

Jêrê, gelek dûr, hında qax, şerki gumreh dıçe. Xweyêd qıjla çend eskerê İranê lı zınara hasêkırıbûn, lêdıxıstın û jorda zınarêd mezın ser wanda holdıkırın. Gava Xano ev tıştên ku anibûne serê eşira wi dit, kızın jı dılê wi hat û dılê xweda got:

– Vana çı aniye serê eşira mın!...

Ewi jı vırada kıvşkır, wê ki ali lı dıjmınxe. Paşê ew jı zınêr peyabû, mezınêd sedlıka cıvand û got:

– Emê sê aliyava dıjmınxın, jı aliyê rastê, jı aliyê çepê û hema jı vıra eniyê ji. Her aliki sed mêr, lê jı eniyê sed pênci mêr, çımki qewata wiye gıran lı vıre. Tu Eziz, sed mêrê xweva here aliyê çepê. Lê ezê hema lı vıra eniyêxım. Bıra cahıl xêni şûr-mertala û rıma, werısêd xerboqe hazırkın, bavêne stuyê wan kaşkın. Hemze Çawış ew yek hûn pak telimkırıne. Gava ku hûn meriyê sax kaşkın, ev yekê wê tırseke mezın têke nav dılê wan.

Jı nava esker dengê ken hat, yeki jı wan got:

– Bı wan werısava lı Şemdinanê me tırseke usa kırıbû nav dılê eskerê Romê weki carna wana hespê xwe dihıştın, dırevin.

Xêni wê yekê Xano got:

– Kesek jı we hıcûmê wan nekın, hetani hûn nebhên dengê def û zurna Mıraz. Wextê def û zurnê pak lı we diyarbû, paşê lê beletevın û tu fıtê nedne wan. Jı vıra ji hûn, gerekê usa herne ciyê xwe, weki cıvik jı we nevinın. De



Institut kurde de Paris

herın, oxırbe wera..

Wextê Eziz û İbrahim çûn, Xano nêziki Esoyê Lakan bû, got:

– Ez qe nızanım çı bêjme te, tu neyê şiretani. Eva çendık-çend carın rojêd gıran me hevra ditıne û derbaz ji kırıne û tımê tu bı namûs wan şerada derketi. Lema mın tu xwera ani vıra. Ezê jı vıra herme hıcûmê.

– Maqûl, tu vır bısekıne, ez herım, tuyê jı vıra bızanbi çı bıki...

– Na, Eso can, ezê herım. Tu vi sed pênci siyariva lı vıra bımine, xwexa ji jı serê vi zınarê bılınd dina te lêbe, te ku dit, kiderê dıjmın zorê dıde eskerê me û çetıne, pênci mêri lez wi alida bışine. Xwexa jı ciyê xwe neleqe, hema usa dina te lêbe. Lê te ku dit ida lap bû tengasi, wi çaxi tu ji rêkeve. Mın guman heye emê bı namûs zora dıjmın bıbın.

Xano ku ev gıliyêd xwe Esoyê Lakanra kuta kır, ewi sed pênci siyar hıldan, jı wêderê dûrket, heveki pêşta hat, sazbend ji xwera bırın. Û hêdika hat lı pêşiya eniya eskerê wan, ciyê Quli-xan çadır vegırtıbû telya.

İdi ber evar bû. Tavê hê erd germdıkır, lê sıngê çiyayêd berbı roavayê si ketıbû berê darê mêşe Xano gote Mıraz "De idi lêxın". Nışkêva dengê defa Mıraz hat. Dengê vê defê û zurnê ku ketne berê van zınara, geliya û çiya, te qey dıgot eva ne defeke û ne ji zurneke, lê sed-dusıd def û zurnene lêdıxın. Quli-xan wi çaxê jı parxana berxa kıvav çêkıri destdabû dıxwar, gava ewi bihıst gırme-gırma defê û zurnê ew şaş ma, got:

– Dıvek ev kurdêd beyani ewqas def û zurne topkırıne û dewatê dıkın.

Mıraz mıqamê zelûliyê quhaste ser mıqamê hewarê û heveki zelal kır. Eskerê xweykırınê Quli-xan hatne çadırê gotnê: "Han saxbe, eskerê meyi aliyê rastê rev pêket dıreve.."

Quli-xan kıvaveke dınê jı kurte parsiya berxa hılda kıre devê xwe, disa cab danê, weki eskerê aliyê çepê ji rev

Institut Kurde de Paris

pêket, hêşka ewi femkır, weki tıştek lı vır heye. Quli-xan kıvavê destê xwe hışt û jı çadırê derket. Xano eskerê wi ser hevda ani lı çadıra Quli-xan hasê kır. Quli-xan ancax lı hespa siyarbû. Ew hıcûma Xano pergala eskerê İranê şkênand û tırseke usa kıre nav wan, weki hınek jı wana hespê xwe hiştın revin. Kurdêd wan gundêd jêrin û qıjla pêhesyan Xano lı Quli-xan xıst, wana ji hındava xwe da lêxıst.

Ew du roj bû lı dorberê çiyayê Dımdımê, nava mêşê sıx, şerê Xano û eskerê İranê bû. Roja sısya berê Xano û Quli-xan ketne hevdu. Xano kınc rıhalê Quli-xan ditın, destxweda femkır, weki eva mezınê wane. Xano lê kıre gazi:

-- Tu çıma hati me talan dıki û meriya dıkuji? Çıma tu nızani eva ela Beroderane, eva ciyê Kurdane?

Quli-xan ku çev Xano ket, qıdûmê wi şkest govıdê Xanoyi mezın dit, nıqıti dılê wi: "Evê mın bıkuje..." Xano rıkêvi wi kır û şurek ani lêxıst, lê tıştek lı Quli-xan nekır. Xano hespê xwe heveki paşda da, paşê hesp zengû kır û bı bezê hespê şûrê xweyi terıki jorda ani Quli-xan. Şûr lı mılê wi ket, lê disa tıştek pênekır. Quli-xan hahanga pişto jı ber xwe kışand û kuta eniya Xano, lê para Esoyê Lakan rım paşya stukıra wira kır. Pişto jı dest Quli-xan kete erdê, paşê agırbû. Wextê lı erdê lı cınyazê wi nıhêrin, ditın, zıri bûn, lema derbê Xano tıştek wi nedıkırın.

Hevtekê zêdetır bû Xano bı eskerê xweva û kurdê qıjla eskerê Quli-xan lı wan mêşa û geliya tiş-tişi kırıbûn û lê balete bıbûn qırdıkırın lê wexta ku Xano vegerya hat, yanzde mêrê wi şêrda hatne kuştınê, pênc bırindar bûn.

Mehekê zêdetır bû hıngi Quli-xan bı du hezar eskerva çıbû ser kela Dımdımê şer. Şah Abas ro hesab dıkır û xwexa xwera dıgot:

Quli-xan idi gihiştiye çiyayê Dımdımê, gerekê ew wê kelê xıravke û wi kurdi ji dil bıgre bine. Riya me wê berbı Kurdıstanê vebe...

Ew bona wê yekê ser vê gumanê bû, çımki Quli-xan

mêrxaseki wi eyan bû, ew çıbû çıqas şera, ew jı hemû şerada bı serfırazi derketıbû, şerêd hemberi Hındıstanê, Eraba û Romê. Hê tunebû şer, weki; Quli-xan serfıraz nebe. Lê carna ji şah Abas dıkete mıtala, ewi pak zanıbû, weki Xano mêreki zore, şerada ji delke, kare tışteki bine serê Quli xan û esker. Ewi kar dıkır alikarikê Quli-xanra bışine. Lê ki ali bışine, kê rê Quli-xan esker bır, ewi nızanbû, lema ewi alikari nedıkır.

Wan roja mızgin dane şah Abas, weki kurek jêra bû. Qet ewledê wi tunebûn. Bona wê, bê ewlediyê ew zewıci keça şahê Afganê ani, disa zarêd peyneket, lê vê mızginê şabûneke nediti kıre dılê şah Abas. Ew çend roj bû şah Abas kêfêda bû...

Wezirêd wi, xanêd mezınêd olka, dewleti û tucar dıhatıne çevronkaya wi. Tucareki dewleti, hê Fayze xanım du halabû, çolangeke bır zêr lı bajarê Bexdayê dabû çêkırınê û anibû mala xwe danibû. Wexta ku deng belabû, weki kulfeta şah welıdiye, kurek şah Abasra bûye, ewi tucari ew çolan çawa bı xelati çevronkaya şah Abasra anibû. Şah û mêvanê xweva wê çolana zêrin û çêkırına wê dınhêrin. Xulama cab dane şah Abas, weki sê siyarê Quli-xan hatıne û itmazdıkın bêne hızûra wi...

Ew şabûna ku ketıbû dılê şah Abas, çımki çawa şahêşah zûda ketıbû wê tefekuriyê, weki zureta wi tune, lê kurê ku jêra bıbû, idane xema wi bû, weki esker jı cem Quli-xan hatıne. Mala wi tıji mêvan bûn, kêf û şabûneke usa bû, hê şahêd İranê kêf û şabûneke usa lı dergê xwe neditıbûn. Ew çend roj bûn bı sedi jı şeherêd mayin û olka dıhatın û dıçûn.

Ewi gote xulama:

– Bıra sıvê na, dusıvê bên.

Hersê siyar çûn, lê roja ku şah Abas gotıbû, ewana disa hatın, ber derge. Lê mala şah Abasda rıngin bû, kêf bû, eşq bû, ewi disa nehişt ew hersê siyar bên cem wi. Lê wan roja lı dorberê çiyayê Dımdımê eskerê kurda bı serkariya

Xano mêşeda eskerê İranê pırti-pırti kırıbû qırdıkır. Ew kurdêd deştê û gundên jêrın mina nêçirvana pey eskerê İranê ketıbûn, dıgırtın dıkuştın. Wexta mêvan çûn, ew kêf, eşq heveki sekınibû, paşê şah Abas destûr da, weki ew sê esker bêne hızura wi. Ew ku hatıne diwanxanê, şah Abas qe nehışt ew temene ji bıvın, pırsi:

– Bêjın, we kela xırav kır, ew kurd sax gırt, yan ji serê wi ani?

– Şahê şah saxbe, Xanoyê Çengzêrin eskerê me qırkır. Jı bın her kevıreki derdıketın, jı bın her darekê wana minani pılınga xwe davitıne me, me qe nızanbû, jı ku ew derdıkevın. Esker gışk tur-tela kırıne lı wan newala, mêşe û geliya.

– Lê Quli-xan kanê?

– Quli-xan ji şerda kuştın...

Evê cabê usa hukmi ser fırşkê şah Abas kır, weki jı hêrsana sûretê wi heveki xwarbû, ewi kır ku tışteki bêje, lê qulıxçiya cab danê:

– Şahê Afgana hatye çevronkaya te...

– Bıhêlın, bıra şahê Afgan bê. Lê hûn bıcehmın derkevın. Kurdne biyani hûn tur-tela kırın.

Hersê siyar por-poşman derketın, çûn.

Şah Abas disa kete kêf, eşqa, ne xezûrê wi hatıbû, ew ji şahê dewletekê bû. Bı eşqa xezûrê xwe, ewi çend karêd xezala kedikıri baxê wida hebûn, da şerjêkırınê. Usa şah Abas kêf û eşqêda bûn, hetani çılê kur temam bû.

## SERÊ NEHA

## HUSÊYN XAN

Gava çıl rojê kur derbazbûn. Kulfeta wi ji, çewa edetê wan, jı çılê derketıda eşq ji xılas bû. Şah Abas fıkırkır, weki wê heyfê Xanoyê kurdra bernede. Ewi şande pey Husêyn xan. Gerekê bê gotınê, Husêyn xan xezûrê şah

Abas bû, lê şah xezûrê xwe hıznedıkır, kêm gazi wi dıkır. Carekê ji, çawa paşê eyan bû, şah Abas xwestıbû xezûrê xwe lı sêpiyêda bıxenıqine, kes nızane seva çı, her jına wi, Fayzê xanımê, gotıbû, weki tu tışteki bini serê bavê mın, ezê yanê xwe jerdadayi bıkım, yanê ji ezê xwe bıxeniqınım...

Lê gava icar xulamêd şah Abas hatın gotıne Husêyn xan, weki şah Abas gazi te dıke, ew rêda dıhat û ketıbû mıtala:

– Gelo, xêre, seva çı ewi gazi mın kırye? Nızam bona çı usa mın hıznake? Mın tışteki xırav ji nekıriye û xıraviyê ji wira naxwazım. E, ewi serê geleka jêkır, wan belengaza qe xıraviya wi nekırıbû.

Wan fıkrada Husêyn xan qe texminnekır çawa hate ber dergê şah. Qulıxdara derge vekırın û bê xeberdan Husêyn xan derbazkırın cem şah, çunki gışka zanıbû ew bavê Feyze xanımêye xezûrê şah Abase. Husêyn xan ku hate hundur diwanxanê, çawa lazım bû temene bû. Şah Abas icar bı şırınayi ci nişani wi da nêziki kursiyê xwe, ew çû rûnışt.

– Te bıhistiye! çı aniye serê eskerê mın wi kurdê beyani? –Husêyn xan ku bihist ev gıliyê şah Abas, seva çı ewi iro gazi wi kırye.

– Belki tımê nûra şahtiya te ser mebe, mın bihıstiye!

– Em nıkarın vi şuxuli usa bıhêlın, weki kurdeki beyani sılaha hılde hemberê şahê şah. Lê wextê Quli-xan çû wi şêr, ewi got: "Gerekê her zıvıstanê merıv here kela wi xıravke. Ew Kurd wi wexti bawernake, weki wê herne ser wi, şêr, tu zani Quli xan çı şerkareki zane bû...

– Hışê mın bıri, Quli-xan rast gotıbû. Pake merıv nıha ser wida bıgre, jı wê şunda, ewi ku eskerê Quli-xan zor lê bır, nıha ewi lap arxayine, nıha hemi berf wêderê ketye...

– De, weki tu ji wê fıkrê baş dıbini, were esker hılde here, tu ji Quli-xan ne kêmtıri, tu ji dı gelek şerada serketiyê...

Institut kurde de Paris

— Ez dıxwazım, weki tu çend roja wext bıdi mın, ezê xwexa bêm bêjme te.

Wextê ewi ev gıli gotın, şah Abas heveki fıkıri, paşê destûr da, weki çend roja şûnda ew bê. Huseyn xan disa temene bû û derket. Lı sıvderê rasti keça xwe Feyze hat. Ewê ku bav dit, xwe avite pêsira bavê, hemızkır û paçkır, got:

— Pey, pavo can, tu hati vıra, lê naxwazi Nebiyê xwe bıvini. —Ewê lı rengê bavê nıhêri, dit, weki bavi, lapi sıpiçolkiyê pırsi:

— Bavo lı mın porkurkırê, çı lı te qewımiye? Qe reng teva nemaye? Rast bêje tu serê hızret Eli ki?

— Qet, tıştê usa nebûye, lao. —Husêyn xan ne dıxwast bêje keçê, ew dılxuriya ku lı wi qewımiye.

— Na, bavo can, tu tışteki mın vedışêri. Çıma ewi gazi te kır. Rast bêje?..

Husêyn xan ker bû, bersiva keçê neda, Feyze xanım gırya, got:

— Kurê te tunene, te ez dewsa kuro mezın kırım û tu mın hızdıki, lê nıha naxwazi bêji mın, çıma ewi nepaki gazi te kırye û te çıma usa reng avitiye?

Ewi caba keçê neda, destê wê gırt û berbı herema wê çûn. Lı wêderê ewi keça xwe hemêz kır, singê xweva gıvaşt, paçkır, paşê çû, nêziki colana Nebiyê zêrin. Nebi razabû, sûretê wi vekırıbû. Nebi bedewiyê lı dê çûbû. Husêyn xan ser Nebida xwar bû. Hêdika got, weki Nebi jı xewê raneke:

— Ez jı xwedê xwe duaçime, tu sax-sılamet mezın bi, weki tu bıvi şahê İranê, lê...

Ewi fıkra xwe qedand, lê Feyzê femkır got:

— Lê ne minani bavê xwe bi...

Husêyn xan bı tırsê çevê keçê nıhêri, ya ku fıkra wi femkır. Ewi gote keçê:

— Delaliya dılê mın, te fıkra mın femkır...

Ew nêziki keçê bû, carke dınê ji keç hemêzkır, paç-



Institut kurde de Paris

kır û got:

– Te fıkra mın femkır, lao, xêni te idi tu ewladê mın tunene û çı jı te veşêrım, çı jı xwedê. Şah Abas gazi mın kır û gote mın, weki ez esker hıldım û herme ser wi kurdi şêr. Te bihıstiye, ewi kurdi eskerê Quli-xan qırkır. Quli-xan ji kuşt. Nıha lı wêderê zıvıstane. Çawa reng kare mında bımine, lao?

Husêyn xan zanıbû, weki keça wi ew xweykır jı zulma şah Abas, ewi usa ji pak zanıbû, weki hıngê şah Abas keça şahê Afgana çarde sali aniye ser wê, ewi ida usa şah Abas hıznake minani berê, Feyze gırya xwe avite pêsira bavê, got:

– Çara mın, bextê mın tune, weki bext hebya, nıha kureki teyê hebya, ê ku van wextêd çetın ber bavêda bıçûna şêr, yanê wê rabûna pışta kal-bavê xwe, bextê te tune!...

Feyzê serê xwe dani ser singê bavê û hêsır jı çevê wê minani baraneke bıharê jorda dıhate xwarê û bav jı hemêza xwe bernedıda, paşê got:

– Bavo can, ezê va herme cem wi û bıxwazım, weki ew te neşine.

– Pey, lao, tuyê bıdi xatırê xwedê û hızret Eli vê yekê neke, tuyê şuxul dıha xıravki, ewê bıfıkıre, weki mın qestana hatiye gotiye te, paşê ewê menike dınê bıvine û mın tehreki dınê bıkuje. Keça mın, lao vê yekê neke, ez herım nıha pake, xwedê rehme, dıvek ez sax-sılamet vegerım, bême mala xwe...

Husêyn xan jı cem keça xwe derket, ida ber evar bû, çû malê ..

Çiyayê Dımdımê ku eşira Berodera lı ci bıbû jı nava çiyayêd Kurdıstanê çiyaki pır mezınbû; aliki wi dıkete Musılê, lı Mezopotamiyê, aliki wi dıkete Romê berbı Wanê, aliyê dınê ji dıkete İranê. Ev çiya bı temami mêşe bû. Lı vıra geliyêd kur hebûn, gele ciyê rasti duz, kiderê xule-xula ava kaniyêd bûn mêrg û çıman bû. Ci-cina ji fêkiyêd baxa lê şindıbû. Cina golêd avê mezın hebûn. Nava adê wan go-



Institut kurde de Paris

lada yanê ji keviyêd wan tıji hêlınê werdeka, sûravêlka, qulınga, qaz-werdeka û teyrtûyêd mayin bûn. Wexta merıv ku dıhate keviya wan gola, qube-qube wan bû, merıv heyran hıjmekarê wan denga bû. Lê ku carna ji merıv dıhate qıraxê wan gola ji, te dınhêri werdekê, yanê sûravêlkê, yanê qazê, jı tırsana xwe davite golê, cûckê wane pey bûn. E, gelo, van cûçka çıma şaşnedıkır, çıma pey hıneka mayin nedıçûn, her yekê jı wana pey maka xwe sobekari dıkır dıçû dıgihışte maka xwe...

Eşira Berodera dıreşandın û dıçının, her bona xwarına xwe, lê wana xwey dıkır gele pez û dewar, çımki lı van çiya çêre pır bû, mêrg-zevi ji bêhesab bûn.

Jı payizê, hetani bıharê pezi tımê lı qıjlabû, bona dêwêr ji ewqas giha dıdrûtın, weki heta bıharê ji debr xılas nedıbû...

Kurda jı pêz kar dıdit ne ku tenê çawa yên kok: goşt, şir û rûn, wana kareke mezın ji dıstendın jı hırya pêz. Ew hiri dıhate frotanê, xêni frotanê wana jı wê hıriyê çêdıkırın xaliçêd xas, emeni, zili, lop, carcim, xurç, têr, çewal, werıs û tıştêd mayin. Xaliçêd Kurdıstanê lı Tehranê, Bexdayê Dumuşqê, Beyrûtê û Stenbolê zef bûha dıkırın. Lema hersal jı wan welata tucar dıhatın ne ku tenê hıriyê bıkırın, wana xaliçe, emeni, zili û tıştêd mayin dıkırin barê deva û qantıra dıbırın...

İdi payiz bû. Serê çiyayêd bılınd zûda berf ketıbû, lê lı deşta İranê te qey dıgot teze bıhare. Lı vıra salê du cara erd can dıbû, carekê ewlê bıharê, wextê darê emiş, baxçe, zevi û bostana rezê xwe dıdan, lı baxada ji cûre-cûre kulilk şindıbûn, carekê ji payiza dereng, wextê deşta İranê baxa belgêd xweye havinê ber tevê hışk bûyi davitın, belgê teze şindıbûn, lı baxada disa cûre-cûre kulilk vedıbûn û merıv heyr-hıjmekar bû lı wan bınhêre...

Lê lı vıra, lı kela Dımdımê, berf zûda ketıbû erdê, serma bû, roj ida kın dıbûn, şevê dırêj bûn. Ehlê eşira Berodera lı kelê û gundada ji gazi zıbala dıkırın, weki hêriyê veçı-



Institut kurde de Paris

rın, paqıjkın, şe bıkın û bırêsın. Hebûn malêd wusa, lı kelê, du heftê yanê sê heftê zıbarê malê wanda dıxevıtin. Mala Adi ji gazi zıbara kır. Nenê, xûşka Şebab, çûbû pey Dilberê, ewê gotıbû:

– Ezê bêm, tu here, hema çıra ku vêxıstın ezê bêm...

Şebabê kurê Adi lıngê wi erdê nedıket, şa dıbû, ber xwe nedıda, ewi xwexa xwera dıgot:

– Gelo kengê evara bê, weki Dilber bê, ez delalya dılê xwe bıvinım?...

Ew dıqacqıci, rehet nedısekıni, carna nêziki xuşkê dıbû dıgot:

– Nenê, ne te got, Dilberê gotye: "Tu here evarê ezê bêm", lê kanê çıma nehat?

Nenê dıkenya dıgot:

– Şebab, bırao çıma tu teze zıbara dıbini, çıma tu navini hela hê ronkaye, hema tari kete erdê, keçên berebere bên.

– E, çıma evarê tariyêda gerekê bıcıvın, ne par, pak tê bira mın sıvêda keç dıcıvın û hetani nêziki nivê şevê lı mala mebûn.

Nenê hêrs bû, van pırsêd bırê xwe, got:

– Weleh, bırao, tu meriki ecêbi. Ne iro roja ewlıne, roja ewlın çawa diyare, keç tımê heveki dereng tên, çımki wê evarê xweya malê, diya mın û te, wê bêje: çend keçêd ser veçırandına hıriyê bın, çend keçêd ser şekırınê bın û çend keçêd we bırêsın, lê roja dınê, wê ida herro sıvêda bên. Te femkır? De idi here jı mın dûrkeve, bıhêle ez şuxul bıkım...

Hê ronkayi bû. Şebab çû delekxanê temorya xwe û gulançıkê xwe da çêkırınê, sûretê wi hıla pergal nedıçûyê. Wextê ew jı delekxanê hat, dê û xûşkê ditın, dızikava dıkenyan, lê dê şaş dıbû, wi tayê tenêra. Dê û bavê Şebabê xwe hızdıkırın, ne ku çawa ewladê wan û tayê tenê; wana hızdıkırın bona wê yekê ji, ewi dı nava heval û hogırê xweda ciyê pêşin dıgırt, hergê nêçirbe, hergê xevatêva û

hergê şerdabe ji hemberi zevtçiya. Çend cara Xano xwexa nav cahıla gışkada payê mêraniya Şebab dabû...

İdi tari kete erdê, çıra ji vêxıstın. Keç bere-bere hatın, lê Dilber hê nehatıbû, Şebab ber xwe dıket. Ew dıhate wêderê, kiderê keç dıcıvyan, dıdit hê Dilber nehatiye, vegerya dıçû. Paşê disa dıhat cem keçıkê rûnışt. Dilber pey gışkara hat. Bedewê minani wê tunebûn, ne ku kelê tenê, nav hemû eşirê Berodera sûretê wê qerqaş bûn, minani berfa yekşevi. Buro-bıjanêd wê reşe qeytani bûn, ewê qe kıl çevê xwe nedıda, mina hıne keça, enya wê fırebû, sıfetê wê gulover bû, lêva wê heveki qalıne sorbû pozi heveki kumısi bû, lê rast bû, gurçıkê, sûretê wê sorbûn, lı gerdenê xalek hebû, ya ku bedewdike dıha dıha rınd dıda dêmê wê. Kıncê lê gışke teze û gıranbûha bûn. Bazınêd wê ne jı wan bazına bûn, ê ku lı hostexana kelêda çêdıkırın, ew bazınêd wê ê Bexdayê bûn, kondera lıngada ji Bexdayi bûn...

Wextê Dilber derda hat, Şebab nav keçıka rûnıştıbû, lê ewi ku Dilber dit, revi jı nav keça derket. Keçıka ew yek dexminkır, bû pırqiniya wan keniyan. Dilberê femkır seva çı ew dıkenın, keneki şırini sıvık hate ser lêvê wê ji.

Wexta Dilber revi çû sıvderê, keçeke bedev nes qestana bı dengeki bılınd pey wira got, weki ew ji bıbhê:

– Şebab revi çû, qe ne xorteki comerde, ne minani hıne xortane, ê bona keçê ku têne mala wan zıbare, dıçın çerez dıkırın tinın, weki keç pê mıjûlıya xwe bıkın, dıvek seva wê yekê revi çû?

Şebab hê sıvderê bû, ewi ew tenê bihıst, destxweda çû dıkana kırakos, sê hoqe kışmiş û nok kırı ani da xûşkê. Nenê ew çerez bır, ber keçıka dani, got:

– Wi ciyê bela-sebab jı bo bırê mın usa dıgot, hanê wera çerez ewi kıriye û wera şandiye.

Gava ewê keçıka bed çerez vekır, lê nıhêri, çevê wê noka ket, disa bû pırqiniya wê, pıştdostan xwarbû, kenya, keçêd mayin nızanbûn seva çı ew dıkenya, lê pırqin kete wan, ew ji kenyan. Paşê ewê got:

– Pey, ev çı tevane? Xwe em ne zarê çûke heft saline nok kırine, bıra xurme bıkırya baniya.

Dilber nesekıni, qorbetya wê û weki jı bo Şebabda usa qerf xeberdıdan, ewê got:

– Lê, lê weleh tu ecêbi, çıma nok bona çerez jı xurma û kışmiş ne çêtıre. Herkê tu zani bona çerez noka pakın, xurme û kışmiş şırinın. Çıqas malêd maqûla hene bona şev buhêriyê noka datine ser textê, weleh, ez noka hızdıkım.

Heta keça usa hevra laqırdi dıkırın, kevaniya malê hate cem keçıka, sılav da wana, got:

– Hûn ser çeva, ser sera hatıne, keçêd mıne delal, işev hûnê gışk tevayi hıriyê veçırinın, jı striya û kurçomê gıhê bıdıne paqıjkırınê, lê sıvê ev keçıkê hana,–ewê destê xwe dırêji wan kır,– wê her ser paqıjkırına hıriyê bın, lê evêd hana wê hıriyê şebıkın, lê evana ji wê ser rıstına hıriyê bın...

Ewê got û derket, çû...

Ew du hevtêbûn keçêd cinara mala Adida zıbare dıxevıtin, idi xevat ji nêziki kutabûnê bıbû.

Berêda bûbû edet: wexta zıbara xevata mala kê kuta dıkır, def û zurnê dıxıstın, cahıl dıketne govendê dılistın, kêf dıkırın heta nivê şevê, paşê kevaniya malê, mal avayi dıgote wan û cahıl bı def û zurne lêxıstınê kuça dıçûne malêd xwe.

Mala Adi ji wê rojê ku xevata mala wan xılaz bıbû, wana gazi sazbendeki navdar kırıbû, navê wi Mıraz bû. Mıraz xêni zurnê lı tulumê ji dıxıst. Cahıla ku bihıst gazi mırazê sazbend kırıne, gışk şabûn, çımki jı wi çêtır, nava wê eşirêda sazbend tunebûn. Nava cımaetêda dıgotın:

– Weleh Mıraz zurnê dıxe, mıriyê gorada ji dıreqısın, usa baş lêdıxe.

Rasti ji Mıraz usa rınd zurne û tulumê dıxıst, weki meriyê tu cara reqas ji nekırıbû, lê weki dıkete govendê û dengê zurnê, yanê tuluma wi dıbihıst xwexa dıreqısin. Ro



Institut kurde de Paris

hê gelek bılınd bû û idi dengê defê-zurna Mıraz lı mala Adi dıhat. Ew çend sehet bûn cahıla cûre-cûre qeydê govendê dılistın. Carna nışkêva dengê zurnê dıhate bırinê, Mıraz tulum hıldıda û qeydê "Gulê Nêrimê" nerm û fesal lêdıxıst, du keça û du xorta pêra dıstıran:

Gulê nêrimê hab nêrimê, gulê nêrimê ha nêrimê.
Gulê nêrya xınge-xınge, canê nêriya xınge-wınge.

Gava xort u qiza nerm û kaw ev qeydê "Gulê nêrimê" çend fıtla çûn hatın, disa nışkêva dengê tuluma Mıraz hate bırinê, wi çaxi ewi dest kıre pelenguşka xwe dıstra:

Kurdıstane, ha Kurdıstane, Kurdıstane
ha Kurdıstane,
Ciyê te çiya mêşe, deşt, mêrg û çımane.
Ciyê emra delal, kêf henekane,
Ciyê şaya cahılan, keç û xortane.
De bıra xwedê xıravke textê padişê Romê
û şahê İranê,
Her sal tê ser me şêr bı dewane.
Tımê şınginiya şûra, mertal û kosemısriyane...
Belki em kurd wanra bıvın destane.
(Lê ew yek qet tu cara nabe...)
Lema her sal ser me şınginya şûra û
kosemısriyane...
Wan gelek mal bırıne ber mıratane,
Lê wana hıla tu xêr neditıne jı wan şerane.
Kurdıstane, ha Kurdıstane, mıkenê kal
û bavê kurdane.

Weki ciki dıbû kêf û eşq bê Mırazê sazbend, çıqas bêji hurmet ji bıkırana, lê dıgotın:

– E, ew çı kêfe û eşqe, weki Mırazê sazbend bı tuluma xweva, yanê def û zurna xweva ne wêderêbe...

Lema cahıl uso iro eşq û şabûn, weki Mırazê vê şaya wan derbazke.

Nivê şevê zûda derbaz bıbû, cahıl tez jı mala Adi bı def û zurne derdıketın, lı beri dêri ji gelek koçeri lêxıstın,

paşê belabûn, herkes çûne malêd xwe...

Raste, eşira Berodera serfınyaz kêf û eşq derbaz dıkır van rojêd xweye zıvıstanê, lê Xano zanıbû pey kuştına Quli-xanra û tûr-telakırına eskerê İranê, şah Abas wi şuxuli usa rehet nahêle çı wexti hebe ji wê erhede eskereki dınê bışine ser kelê şêr. Bona wê yekê Xano çarsed mêr lı Lakan şandıbû wan gundêd jêrın, weki ewana herro serê wan riya qerewıliyê bıkın, herkê tıştek hebe şerkın û cabê bıdıne wi...

Dı wan roja ji lı bajarê Tehranê Husêyn xan karê xwe dıkır, here ser kela Dımdımê şêr. Ew dıfıkıri, weki Sûto begê kurd ji xwera bıve, çımki Sûto begê zanıbû rê û dırbêd wan çiya. Husêyn xan xulamê xwe şande pey wi. Wexta Sûto beg hat û ber Husêyn xan temene bû, Husêyn xan gote wi:

– Sûto beg, em pak zanın, weki tu helal qulıxi şahê İranê dıki. Bı hukmê wi, emê herne ser kela Dımdımê şêr, tu gerekê mıra bêy belediyê bıki, lı wan çiya em rê nebeledın.

Sûto begê got:

– Ser çevê mın, ez wan dera hemû riya zanım, ezê beledike rınd wera bıkım...

Hema wê rojê Husêyn xan jı Tehranê derket. Wexta Husêyn xan jı Tehranê derket, heva lı wêderê xweş bû, baxa belgê xweye kevne havinê avitıbûn, belgêd şin derxıstıbûn, te qey dıgot teze bıhare. Ew çend roj bûn Husêyn xan bı eskerê xweva rê dıhat berbı kela Dımdımê. Ewana idi gihıştıne wan çiya, lı kiderê berf bû. Lê Husêyn xan bı tırs dıhat, ewi jı çend eskerê Quli xan ku sılamet vegeryabûn, bıhistıbû; kurda çı şıpûk anibûne serê wan. Evarekê Husêyn xan gazi Sûto begê kır, got:

– Sûto beg, tu nıkari me jı vê riya cedê derxi, rêke kesera bıvi.

– Çıma nıkarım, ez xulam. Ezê sıvê te riya kesera bıvım...

Sıvetırê Sûto beg esker jı riya şedê derxıst, riya koçerara ani, ev rê hılbet jı ya cedê nêziktır bû. Rasti, Sûto beg ji çûyina riya cedê dıtırsya, ewi pak zanıbû: Hema ku ewana gihıştıne qışlêd kurda, destxweda wê hewariyê bıdne Xano û Xanoyê serê van riya wan qırke, qe nahêle ewana derkevne gunda ji. Û qe nahêle yek sax bımine. Lê weki em nışkêva ser kelêda bıgrın, Xano haj xwe tune, kelê bê stendınê, – bı wan fıkrava Sûto begê ew riya kesera anin...

İdi du roj bûn Sûto beg lı pêşiya esker bû, riya kesera dıhatın. Ev rê berf bû, lê hesp hê pak dıhatın, carna ji Sûto begê şaşdıkır, dıhat dıkete geliyêd kûr, paşê zorê jı geli derdıketın, çımki berfê rê xıtımandıbû û usa dıbû mıj-duman, weki riya koçera qe xuya nedıkır. Çarekê ji ewi esker ani nava geliki usa kûr, weki merıv berjêr dınhêri bınê gêli nedıhate xuyanê. Eskerê pêşiyê cab dane Husêyn xan jı bo wi geliyê kûr. Ewê ku cab anibû Husêyn xanra, dıgot:

– Vi gelida yek jı me nıkare sax derê, çımki çi ji tune, weki hesp lıngê xwe lê daynın...

Nıqıti dılê Husêyn xan: "Weki Sûto beg bı xayinti em vê rêda anin weki em qırbın". Ewi siyarek şande pey Sûto begê, weki ew bê cem wi, çımki Sûto begi lı pêşiyê bû. Wextê Sûto beg hate nêziki Husêyn xan ewi serê xwe heveki xwarkır çawa temene.

Husêyn xan got:

– Dıvek tu wi aqılê xweyi beyani kurd dıxwazi mın bıxapini û mın eskerva van geliya bıdi qırkırınê!

Ev gıliyê Husêyn xan Sûto beg dane tırsandınê, ew tırsya, dı fıkra xweda got:

"Evê ciyê bela-sebeb mın vıra bıkuje".

Sûto beg hema nava wê berfêda banzda erdê û nımzi erdê bû, got:

– Husêyn xan, eva erde eva ezmane, tışteki xapandınê vıra tune. Xan saxbe, tu zani eva çend sale, mın eşira xwe hıştiye û qebila xwe hıldaye hatıme gihiştıme şahê şah, ez şahra hela qalıx dıkım, tu çıma ciyê bela-sebab mın

gunekar dıki?

– De weki tu meriki usa helali, – Husêyn xan got,– here bıde pêşiya esker, me zû jı van geliya derxe, bıve ser riya kese, weki em zû bıghêjne kelê.

Sûto beg disa ajot, çû pêşiya esker û esker disa leqiya, çû. Mıj û dûmanê usa kırıbû tari, weki Sûto beg qe texmin nedıkır ew esker kuda dıve, ew ijar hat ciki usa xırav asê bû, weki qe nıkarıbû pêşta here. Lı pêşiyê çiyaki usa bılındi zınarbû, weki merıv lê dınhêri, kumê meriya jı serê meriya dıket, usa tiki bêhûde bılınd bû, aliyê çepê ji disa geleki usa kûr bû, weki bı bınê geli xuya nedıkır, her deng xûlê-xûla çêm bû, ê ku hê neqerımibû, bınê gêlida dıkışya dıçû. Sûto ber dora xwe nıhêri tırsya, ew usa tırsya, weki ber çevê wi bû mıj û dûman, dıha tari, ewi qe eskerê dora xwe ji nedit. Ewi pak zanıbû xanêd İranê gele kurd ciyê bela-sebeb kuştıne.

Eskerê pêşiyê disa cab dane Husêyn xan, weki ewi ew anine ciki usa, merıv nıkare, ne aliyê rastê here, ne ji aliyê çepê here, pêşiyê ji zınareki bılınde qe serê wi ji xuya nake. İcar Husêyn xan bawerkır ew fıkra xwe: "Weki ew kurd xayintiyê dıke" ewi hukm kır:

– Zû wi berazi binine cem mın!

Wextê esker çû pey Sûto begê, Husêyn xan gote xweykıriyêd xwe:

– Wexta mın pêra xeverda, kuta kır, ezê çev wera bıqurpinım, hûn lêxın vi kûçıki bıkujın. Zûda mesele dıvêje: "Çıqas tu gur xweyki, lê disa çevê wi lı mêşeye"..

Sûto beg ku hate cem Husêyn xan, xweykirê xan dora wi gırtın.

Sûto begê femkır bona çı wana usa kırın. Ew spiçolki bû, rıcaf kete nav dılê wi, dırıcıfi, dora xwe dınhêri... Husêyn xan got:

– Weki tu meriki usa helali, çawa tu xwexa dıvêji, lê kanê rê? Te çıma em anin vıra hasêkırın? Ne eva erdê teye, tu lı vıra mezınbûyi, her kevırek her newal û gelik teva

xuyaye.

Zarê Sûto begê nedıgerya, ewi nıkarıbû caba Husêyn xan bıde, her ewi got:

– Rê, rê, rê... zıman lı hev pıçıki, gıliyê devê xweda nıkarıbû temam kıra. Ewi jı hespê banzda erdê û xwe avite cem Husêyn xan û dev kırê zengûya wi got:

– Çıma tu ciyê bela-sebab mın dıkuji. Mın qestana nekıriye, tu çıma navini... Çı hewake mıj-dumane?...

Husêyn xan bı zenguya xwe lı dev-dıranê wi xıst, xûn jê hat, lê Sûto beg zenguya wi jı destê xwe berneda. Xweykıriyê Husêyn xan hatne nêzik, Sûto beg zengu berda şûr kışand, mertal da destê çepê û vi ali, wi ali dora xwe nıhêri. Husêyn xan lı xweykıriyêd xwe kıre gazi, qujin:

– Hûn çı vi kûçıki dınhêrın! Hûn navinın şûr kışand, lêxın!

Destxweda wan şûr anine serê wi. Lê Sûto begê usa mertal dıda ber rûyê xwe, weki qe derbek nedıghişte wi. Ew ku kêleka Husêyn xan bû, kêlekeke Sûto begê jı aliyê xan derb lê nedıxıstın, çımki esker newêr bû, dıtırsyan, weki derb lı xan nekeve. Husêyn xan ev yek texminkır, hespa xwe zengu kır, jı sûto begê dûrket, lê disa wana nıkarıbûn tıştek lı Sûto bege bıkırana. Sûto begê derbek lı şûrê yeki wan xıst, şûr lı destê wi ket. Sûto beg heveki jı ciyê xwe leqiya, dıxwast berbı gêli bıreve, lê ser kevırekida nıkısi, paşê lêxıstın kuştın...

Husêyn xan hukmkır:

– Serê wi kelbi jêkın têxıne xurcıkekê, emê bıvın, nişani şahê şah kın.

Eskerê Husêyn xan wê rêça ku têda hatıbû, bı wê rêçê vegerya, disa hatne ser riya cedê.

Ew mêrê ku Xano şandıbû serê sinorê, weki wan dera bıparêzın, ewana şev-ro lı lakanê ser berfêra dışımıtin her aliyada dıçûn, dıhatın. Eskerê Husêyn xan westiyayi rêda sêrek dırêj bûbû dıhat... Eskerê Xano nışkêva rasti wan siyarê pêşin hatın, destxweda wana bı tir-kevana çend si-

Institut kurde de Paris

yarê pêşin kuştın. Navbera eskerê Husêyn xan û kurdada şer destpêbû. Eskerê Husêyn xan rıkêvi kurda kırın, lê hespê wan jı rê ku derketın berfa kurda nık dıbûn, nıkarıbûn herın, lê lakanvanê Xano xema wan nin bû, ser berfêra dışımıtin dıçûn. Wana nêziki pênci mêre Husêyn xan kuştın.

Husêyn xan fıkıri ku vegere, çımki eskerê wi qe tıştek nıkarıbû bıke û nıkare xwe ji xweyke jı derbêd vana, ê ku minani mozêd havinê nışkêva merıv dıjenın û disa dıçın wunda dıbın. Vi şerida Şebab disa mêranike mezın nişanda, ewi werısê xerboqekıri avite stuyê zabıteki wan û kaşkır bır. Eva qewmandına kurda bıhıst, ê ku çend meh berê zulma İranê ditıbûn, ewana hıldan çek-sılahê xwe, ew ji hatın lı eskerê Husêyn xan xıstın. Ew reve-rev tenê jı destê kurda xılas bûn, çımki nışkêva jı nava mêşe yanê jı ber kevıra, darêd mêşe, derketın û eskerêd wi dıkuştın, lê Husêyn xan nıkarıbû, wê berfa kûr tıştek bıkra, hema usa pey wi dıhatın û derbêd xedar dıgihandıne eskerêd wi, hetani ewana derketıne reşayê, ciyê berf lê tunebû, paşê kurd vegeryan çûn.

Wexta Husêyn xan hate nav bajêr, ro hê neçûbû ava, lê idi ber êvarbû. Pencê tava berêvarêye tûj dabûne serê meçita û mınara, êd ku dıbırıqin minani zêr, Husêyn xan û xweykıriyêd xweva ajote ber dergê şah. Xulama cab da şah Abas, weki Husêyn xan jı şêr hat, şah Abas jı xulama pırsi:

— Husêyn xan tenêye, yan dil ji pêra hene?

— Na xêr, Husêyn xan û xweykırıyêd wine, dil pêra tunenın.

— Destûrê bıdın bıra bê...

Husêyn xan ku hate diwanxanê şah ser textê şahtiyê rûnıştıbû. Minani hergav Husêyn xan şahra temene bû.

Şah Abas ci nişani Husêyn xan da, ew çû rûnışt, şah pırsi:

— Bêje te çı kır?...

– Belki jiyina şahê dırêjbe, wextê em lı deştê dıçûn, pak bû, lê wexta ku em gihıştıne dorberê çiya, lı wêderê idi berf bû, berfê rê tıji kırıbû-xıtımandıbû. Me gele cara rê şaş dıkır, dıxalıfin. Me qe nızanbû em kuda dıçın. Mın xwera Sûto begê kurd bır.

– Weleh te zef baş kıriyê, ez dıvêm ewi alikarike rınd da te, ew kurd wêderê pak belede.

– Na, şahê şah saxbe, ewi mıxeneti kır.

– Çawa, Sûto begê mıxeneti kır? – Wa bı ecêbmayi şah Abas pırsi.

– Belê, ewi mera mıxeneti kır, lı nav wan çiya. Mın rojekê gazi kırê, gotê: "Sûto beg ev çiyayê tene, tu lı vıra mezınbûyi, hemû geli, newal û çiya tu zani, me riya kesera bıve, weki em zû bıghêjne kelê" ewi, got:

– Ser çevê mın, ezê wek rêke usara bıvım, weki em zû bıghijne kelê – û da pêşiya esker. Ewi qestana em dıbırne geli û newalêd usa, weki esker tenê jê derdıket. Mın çend cara gazi kırê, ewi dıgot: "Tu arxayinbe". Carekê ji ewi em anin ciki usa me nıkarıbû, ne aliyê çepê, ne jı aliyê rastê bıçûna, xayintiya wi zor bû...

Husêyn xan lı xurcıkê serê Sûto begê derxıst lı ber şah Abas dani. Sûretê Sûto begê tışteki nediti bû, çımki ewi kuştına xwe ber çevê xwe dit. Lema bıbû elawet; devê wi vekıri xar bıbû, çena wiye jêrın alikida xar bıbû. çend qilê wiye rızyayi dıhatın xuyanê, çevê wi belıqibûn, merıv lı serê wi dınhêri jı tırsana saw dıgırt, xêni wê yekê nav çend rojada bin ketıbûyê. Lê ew yek qet şah Abas neda kırêtkırınê û tırsandınê, çımki ewi gele serêd jêkıri ditıbû, ê ku bı hukmê wi hatıbûne kuştınê û ew seri ani bûn ser textê wi dani bûn, çawa şahde, weki hukmê wi qedandınê. Ewi qe kırêti ji nekır, serê Sûto begê hılda destê xwe, lênıhêri, her gote Husêyn xan:

– Te neheqê ev kuçka kuşt, ewê hê kêri me bıhata. Lê nevêjne kurê wi, weki we bavê wi kuştiye...

– Lê em çı bêjne kur?...



Institut kurde de Paris

– Bêjn, ew lı pêşiya esker dıçû, çawa beled hewa ji mıj-dûman, bager bû, ew jı zênêrda ket, emrê xwe da te.

Husêyn xan temene bû, can saxi şahra xwest û çû mala xwe.

Wê evarê şah Abas bıryar gırt, çı tehri hebe, erhede bıharê, esker bışine ser kela Dımdımê.

Raste, şah Abas zewıcibû û Zelêxa çardesali, keçıka şahê Afgana anibû mal, lê huba wi lı ser Feyzê xanım sarnebıbû. Ewi qesta ditına kurê xwe kır, çû hereme Feyzê. Wê gavê Feyzê bıstan dıda kur û serê wê ber wêda bû. Kurra şandıbû. Nışkêva derê hereme wê vebû û bı deveki keni hızkıri lı wê û kur dınhêre. Ewê qe dengê xwe nekır, minani berê, negot: "Tu ser çeva hati", her berva rabû, pışta xwe da wi.

Raste, şah Abas Zelêxe xanıma çardesali anibû ser jınê, lê Feyzê xanım disa şah Abas hızdıkır, çımki ew edet kal û bavada mabû. Mêra çend jın dıstendın. Lê wextê şah Abas bavê wêyi kal şandıbû ser kela Dımdımê şêr, dılê wê geleki jı şah Abas sar bıbû, ewê qe wira xebernedıda. Şah Abas zanıbû, weki dılê Feyzê xanımê jı wi maye. Bona bavê û qe wira xeber nedıda. Lê wexta dıvine ji tehreki xwe vedışêre. Şah Abas Feyze xanım pır hızdıkır, çı çev bırûyêd belek û jı huba wê qe têneddıbû. Ew çend meh bûn ewi Feyze pak nedıdit û xûlqê wêyi şırin nedıbihıst, geleki dıxwast, weki wê bıvine. İcar ji wextê ewi deri vekır, Feyzê xanımê disa berê xwe jê guhast. Ew yek dılê wida bû xışûşekê û ewi dılê xweda got: "Horiya ezmana, weleh ezi neheqım". Nêziki wê bû, destê xwe da ser herdu mılê wêye vekıri, paşya stukura wê paçkır, got:

– Ronahya çevê mın, ez zanım dılê te geleki jı mın maye bona bavê, lê bavê te şıkır sax-sılamet hat.

– Hewû, ez ne usa bextewarım, weki eze bextewar bûma, kureki wi wê hebûya, bavê kali-belengaz ewqasi belengazi nedıkşand. Kes nızane çı hate sêri, kiderê ew kurdêd beyani mınani Quli-xan kuştın, weki qe cınyazê wi ji

neditın. .

– Ezê serê hızret Eli kım, bavê te hema hêşka jı cem mın çû mal.

Feyzê ku bıhist bav sılamet hatye, ewê berê xwe aliyê wêda kır û bı lewzeki şırin û bı kubreke delal got:

– Lê te çıma negote mın, bıhatama bavê xwe bıdita.

– Ew hema hêşka jı riya dûr hat, westiya bû, mın destûr neda, ew çû mal.

– Weleh, mın ku Rostemê xwe têr kır, ezê herım bavê xwe bıvinım.

Şah Abas Feyze kurva hemêzkır û bı dıleki şirin paçkır, paşê ser kurda xwar bû, got:

– Lao mın guman heye tu minani Rostemi* Zal bi...

Wextê şah Abas ew xwastın gote kurê xwe, gıliyê bavê Feyzê ku, ser nebiyê xweda xwar bû gotıbû, kete bira wê:

"Bıra rebıl elam te mezınke, lê ne minani bavê xwebi".

Şah Abas çû. Feyzê ku kur têrkır, tıfal ber dılê dê û xewra çû. Ewê kurık zû kıre çolana zêrin, temi da carya pirık, lê xwexa çar cari dorê, çû ditına bavê xwe.

## SERÊ DEHA

## HICÛMA SER KELÊ

Eyda "Berodenaye" eziz, zûda derbaz bıbû gele wext derbazbıbû, hıngi keriyê pêz hatıbûne serê van çiyayêd bılınd, ciyê çêrê xweş, kiderê şinkayi ji usa bol gihıştıbû, weki ida davite çoka meriya. Ew berxêd çûke roja "Berodenê" ber maka hımangi dıbezyan, tenê rêda saskar dıbûn, iro idi birkırıbûn, her cara cahıla birdanin: çawa ewana wê roja ezize derbazbûyi govendada ketne destê delaliyê xwe

*) Rostem navê wi kurê şah Abas bû.

û çawa dızikava qewl-qrar dane hevdu, bona ku mezın nebıhên, weki hevdu birnekın hetani roja mırınê.

Meha havinêye ewlın idi xılasbûnebû. Mıxlûqetê vıra lezdıkır: zû gihê bıdrûn, debara zıvıstanê dewarê xwera. Mala Xano ji hezdıkır gihê bıdrûn. Pênc kurê wi û çıl xulamava lı çayira giha dıdrûtın, lê kurê mezın, Sêvdin tımê cem bavê bû, ew qe jı bavê nedıqetiya, rojêd qewmandınêd gıran û şera ji. Bavê ew hindıkır: hemû delk û fêlêd şera, çawa mezınatiyê lı eşira bıke, çawa yekıtiya eşiretê bıparêze, çawa mezınêd qebila û mıclısa rûspiya bıqefıline-mezıntiyê lê bıke çawa nepakiyên navbera qebila bıde hıldanê, weki qebil gışk hevrabın, çawa ji sıcûdê bıke. Xano carna dıgot:

— Lao, sıcûdekırın tışteki zef mezıne û çetıne, çımki tu cızê dıbıri, gerekê cızê tu usa rast, heqi bıbıri, weki ê ku gune kırıbe ji, bızanbe tu rınd, helal heqê wi hati der.

Lê Sêvdin ji jı wan her pênc bırêd xwe û jı wan cahılêd Berodera gışka, cahıleki jêhati û têgihışti bû, bavê ew dabû dıbıstana gund cem melle Reşit, ewi quran qedandıbû. Ewi farızi, zımanê ecema, xwendın zanıbû. Gele cara ketıbû nava şerêd gıran, wan şerada çend cara mêrxasi ji kırıbû. Nav eşira wan ew naskıribû, çawa cahıleki am û tam, bê tırs, bı dıl û ceger. Rûspiya dıgot:

– Şıkır Sêvdınê dewsa bavê bıgre.

Wan rojêd usa tava xweş giha ku dıdrûtın, ew gihayê dırûti destxweda hışk dıbû, gurz gırêdıdan û danine nêziki goma, tewla lod dıkırın...

Pez û dewar ji idi kok bıbû. Mıxlûqet kardıkır desbı fırotana heywanet bıke. Xano hersal vi çaxi kerıyêd pezê xwe dıbır welatêd dûr dıfrotın, lê wê salê çewdarêd bıkırçi jı welatê dereke xweva hatıbûn hogecê wi bıkırın. Xano karê xwe kır, weki wan bıkırçiyara here nava pêz, jorê lı çiya. Lê hema wê gavê cesûs jı bajarê Tehranê cab anın, weki şah Abas eskereki gıran dışine ser kela Dımdımê şêr. Ev caba nexêr mina bobeliskê nava cmaeta Berodera bela

bû. Kê pır-hındıki karıbû sılaha bıxebıtandına gışka karê xwe kır şerkın. Hê sıve bû. Qasıdêd Xano nava eşira gıran ketın, gazi meznêd çıl û çar qebila kırın. Mezınêd wan qebila bı silahe, tundurst û xulamêd xweva lı kela Dımdımê cıvyan. Wê rojê lı diwanxanê mıclıs kımkımi bû, usa tıji bûbûn, weki ci tunebû merıv lê rûnê. Hınek hema usa piya sekınibûn. Kêleka Xano runıştıbûn Cewzo, Esoyê Lakan, Hemze Çawış, Posto û mêrxasêd mayin. Xano lı mıclisê nıhêri got:

– Wa tırê mın gazi we kırye bona şuxulêd eşirê?

– Na maqûl, me ji bihıstiye, weki şah Abas disa eskereki gıran dışine ser me şêr, –ev gıliyana xorteki cahıl got:

– Par payizê we bı çevê xwe dit, –Xano got,– du cara ewi esker şande ser me şêr, lê me bı pışti xwedê struyê wi şkênandın, lı welatê xwe derxıst. Nıha ew disa esker dışine ser me şêr. Lê icar çawa cesûs dıvêjın, eskereki pır gırane û bı cebırxana mezıne. Dıvên ew icar dışine ne ku tenê eskerê siyari, ew icar gelek eskerê peya ji dışine.

Mıclısêda gışke kerbûn, guh dıdane ser gıliyêd Xano, lê teva femkır, weki ewana nıha aleki zef dıjwardane. Çımki xeberdana Xanora xuya dıkır, ewi her gıliki xwe fesal dıgot, dıwekıland û lı mıclisê dınhêri. Gışka idi xeysetê Xano zanıbû û fesala xeberdana wi ji hinbıbûn.

Wextê Xano gıliyê xwe kutakır, jı nav mıclisê yeki ka, got:

– Lı welatê Romê, wexta em lı wêderê bûn, hersal Romê esker dışande ser me şêr. Em hatne vıra, vıra ji şahê İranê usa tine serê me. Diyare ku ewana dıxwazın koka me binın, e, hazır em bımırın jı vi hali çêtıre, heta yek jı me saxbe gereki em şerkın...

Wê rojê lı çarşıya kela Dımdımê, meydana dewar frotanê, xanada, dıkanada, lı kuçêd hemû ciha pıste-pısta mıxlûqet bû, xeberdıdan jı bo eskerê İranêyi gıran, ê ku berbı

Institut kurde de Paris

kelê tê. Hıneka dıgot: "Meriya bı çevê xwe ditye, weki du roja jı Tehranê dıkışya derdıket, lê paşiya eskerê wi hıla jı bajêr xılaz nebıbû"...

İda nivro bû. Mıxlûqet hatıbû mecitê bona nımêja nivro. Melle Reşit jı minarê jorda hat, hıla nımêj despênekırıbû, got:

- Eva şera,-şerê dindıjmınêye, şah Abas dıxwaze me jı dinê heqiyê - suniyê derxe, bine ser dinê şıhya, kê vi şerida dinê xwe xweyke, şerke û vi şerida bê kuştınê, ewê here ziyaretê, ewê here cınetê û wê bıbe şeyid.

Çıqas meri lı wır hebûn, gışka sond xwar serê xwe bıdın jı bo dinê xwe, oxıra dinê sunya û oxra welatê kal û bava, erdê xwe xweykın jı dıjmına.

Xano pak zanıbû, pey van herdu şerêd payizê, qırbûna eskerê İranê û kuştına Quli-xan, şah Abas usa rehet nasekıne, wê erhede bê ser wi şer. Lema ewi hê payizê hukm kırıbû lı hostexanada lez çek-sılaha çêkın, necax, şûr, mertal, tir-kevan, kosemırsi, gurzkebend û pişto. Hostexana piştoya ew salek bû teze vekıribûn. Hostê piştoya kurdeki kali nêziki heftê-heyştê sali bû, jı Sıleymaniyê hatıbû, wextê Xano gazikırê û jêra qısekır çı dereca pêşiyê wan sekıniye, kalê soz da Xano, got:

— Ez ne xelilbım, weki ez herdu kurê xweva em despênekın û şev-ro nexevıtın piştoya bona eskerê te hazırnekın. Ez her jı te dıxwazım, tu çend zılama bıde mın, weki ewana ber destê mın bıxevıtın, alikariyê bıdıne mın û tu mınra hesın hazırke...

Bı hukmê Xano deh zılamêd jêhatiye rınd ber dest Hosta Xelil dıxebıti û hosta Xelil rojê û şevê pişto hazırdıkır...

Pey vê caba nexêr, çûk û mezınê ehlê eşira Berodera ketıbûn wê heyrê, weki xweykın welatê xwe û nehêlın dıjmın bê erdê wan zevtke. Hınek dıçûne cem hostê cûda xwera silah dıdane çêkırınê. Hostek zûda jı Diyarbekırê hatıbû navê wi Welo bû. Ewi zırine rınd çêdıkırın. Şebab

çû cem wi hosteyi got:

– Apê Welo, ez dıxwazım, weki tu zırike rınd mınra çêki.

Hoste Welo çû jı qutıyê sê hev zıri derxıst, ani ber Şebab dani. Şebab yek jı wana xwekır, bona canê wi nazıki-zıravık fıre bû, dılê wi negırt, ewi gote hostê.

– Apê Welo, ez dıxwazım tu zırike teze mınra çêki, anegori cendekê mın û bejna mın, tu dıvini eva zırya mınra zef fıreye.

Welo got:

– Ser çevê mın, xortê delal, çend roja şûnda were, zırya te wê hazırbe. Lê bısek ez çapa te hıldım...

Hıngê Hemçe Çawış hatıbû kela Dımdımê cem Xano, ewi ne ku esker hini telimê dıkır, ewi nava çend salada esker hinkırınêra tevayi esker teşkil kırıbû bı resmi eskerê Romê, bı vi tehri esker pareyedıbûn ser sedlıka, taxbûra, bêlûka û ordiya.

Ew çend rojbûn jı hemû çiya, qeza, gunda siyar û peya dıhatıne kela Dımdımê. Besta pêş kela Dımdımê mıxlûqet usa tıji bıbû, weki te derzi bavita erdê nedıket. Meri vıra dıman rojê ji, şevê ji hınek bê silah hatıbûn, wana lava dıkır, weki silaha bıdıne wan. Bı hukmê Xano silah dıdane wan, lê dıdane wan, ki bı mezınê qebila xweva hatıbûn.

Cûre-cûre silah dıdane wana, hıne qebil xara necax bûn, hınek bı tir-kevan, hınek bı şûr-mertal bûn, hınek ji bı rım bûn. Ev silaha ku teze jı cebırxana derxıstıbûn û belakırıbûn ber tavê kaw dıbırıqin. Xano gıregırê xweva dıcûne nav wan meriya lı kijana silah belakırıbûn, jı mezınêd wan dıpırsin: "Çıqas mêr jı qebila xwe anine?" Katıb dınıvisi çıqas silah û çı cûre silah lı wan bela kırıne.

Wextê Xano jı nava vi mexlûqetê ku jı gunda hatıbû derket berbı esker çû, ewi dit jêrê bınatara esker hafa gêli sekınibû taxbûreke jına, gışke bı tir-kevan kip sekınibûn. Çend gava dûri wan jıneke sere sekınibû. Te qey dıgot-ewan telima Hemze Çawış hinbûne. Ewê jınê lı Xano dınhêri, lı



Institut kurde de Paris

nılê wêyi rastê tir-kevan bû, kêleka çepêda şûreki kıni kaw dardakırıbû. Wextê Xano heveki nêziki wan bû berê ewê jınê paşê gışka hevra serê xwe berjêrkırın-temene bûn. Xano got:

– Eferım, eferım, keçêd mın, iro roja xiretêye, gerekê çûk-mezın silahê hıldın, bıparêzın welatê kal û bavê xwe jı dıjmına.

Cewzo ku dit Xano hate cem texbûra jına, ew lez pêşiya wida hat, temene bû, paşê bı telimi kip sekıni, got:

– Eskeri hazıre!...

Xano jı Cewzo pırsi:

– Cewzo ew jın kê usa rınd teşkil kırıne?

– Ez xulam, rasti bêjım, eva şuxula Hemze Çawış got, mın destûr da, teşkilkın. Eva du mezınatiyê lı wan dıke, jına hekimê meye, vê payiza derbazbûyi eskerê İranê mêrê wê û kurê wê kuştın. Berê ew jınık hate cem me, weki em wê hıldın nava esker, lê Hemze Çawış got:

– Wexta ez nav eskerê Romê bûm û me ku welatê dereke dıkıre şer, gela cara jın derdıketıne pêşiya me û şereki beter dıkırın, bıra ev jınık here jına teşkil bıke, bona vê yekê ji mın destûr da ku ev jınık here koma jına teşkilke.

– Eva tışteki zef başe. Gelo, karın tir-kevana bıdne xevatê? –Xano pırsi.

– Mın jı alikariya xwe yeki zane xuyakıriye, ew dıçe wana hini avitına tir-kevan dıke. Ez duh çûm mın telima wan mêzekır.

Gerekê bêjım ewana usa tir-kevana berdıdan û nişanê dıxıstın, merıv tırê evana telima eskeriyê derbazbûne. Mın pırsi:

"Hûn kiderê hinbûne?" Yekê jı wan got: "Brao ne em hê keçtiya xweda kurıkara dıketne hucetê, kijan jı me rınd nişanê dıgre. Em wi çaxida zanın çawa tir-kevana bıdne xevatê"...

Xano çû nêziki esker bû, dit ewana taxbûr-taxbûr û

Institut kurde de Paris

bêlûk-bêlûk sekınine. Pêşiya her taxburekê û bêlûkekê qumandanê wan, wa bı kubar sekınine. Xano ku pergala wan dit, got:

-- Bıra esker bê derbazbe, ez bıvinım!

Beri pêşın eskerê bı rım hat. Ew rım hema wê rojê jı cebırxanê derxıstıbûn û teze lı esker bela kırıbûn. Serê rımê wan ber tavê dıbırıqin, xêni wê yekê serê her rımekêva qotıka sore dardakırıbû û gava ku ewana heveki jı Xano dûrketın, jı dûrva te qey dıgot, xaşxaşkın lı mêrgada kulilk dane, usa sor dıkırın. E, gelo çıqas tıli-pêciyê keç û bûka şev-ro xevıtine ser van qotıka, weki kaw û delal çêkın. Pey wanra hatın eskerê bı tir-kevan, paşê şûr-mertal, paşê bı neçax paşê bı kosemırsi, peş gışkara hatın eskerê gurzkebendi. Eva gışke qırntebûn, defê spi ketıbûne sûretê hemûşka. Gelek jı wan gorzkebendçiya Xano pak nas dıkır, çımki gele cara ewi ew xwera bırıbû şerêd gıran. Jı wana qe yek jı van ji tunebû, weki derbê dıjmına lê tunebe. Evana bı qeydê siyarê kurda dıhatın, cêrgê wan duri hev bûn û gurzkebendê xwe çap û rast hıldıbırin û jorda danin, merıv tırê ewana ketıne nava dıjmın wi ali û vi ali dıjmın qırdıkın û derbaz dıbın. Kêfa Xano wanra hat, ewi lı Cewzo pırsi:

– Cewzo, çıma eskerê bı gurzkebend usa hındıke?

– Maqûl, ne te xwexa hê par na pêrar got: "Bıra dewsa gurzkebenda destbı çêkırına piştoya bıkın". Me ji kura te kır, me her vê payiza çûyi disa destbı çêkırına gurzkebenda kır. Ew ji kes tunebû van silaha gurzkebenda çêke. Yek hatye kurde jı Amadiyêye, ew ji yeki nexweşe, lê gurzkebendê ew çêdıke bê qusûre gışk dıvên: "Gurzkebendne zefe pakın çı keve hûrxaş dıke..."

-- Te cahıl dane ber destê wi, weki hini wê sınetê bın?

– Belê, mın çar xortêd femdare rınd dane ber destê wi. Ew hoste ji jı wan raziye, lê gerekê, ez bêjım cahılêd me gurzkebenda hıznakın...

– Çıma hıznakın?



Institut kurde de Paris

Ewana dıvên: "Bı vê silahê merıv kare her mıriyê gora bıkuje, mera lazıme, pişto, tir-kevan û şûr-mertal"...

Wê gavê lı jêrê hında depoxanêd silaha bû hêwerze, qırın dıhat, te qey dıgot lı wêderê hevdıxın. Deng dıhat: dew dıkırın, weki silahçi derê depoxanê weki û silaha bıde wan, lê xuyabû ku, ewi nedıda. Xorteki mezıni qalın berbı silahçi dıhat, bı destê xweye mezıne mina lepê hırça dıhejand, pêşta berbı silahçi dıçû, dıgot:

– Lê bona kê ev silah dane çêkırınê? Ne bona rojeke ha û bona me. Tu dıxwazi weki eskerê İranê minani par bê disa me qırke? Ez hatıme, xeki heyfa xwe jı eskerê İranê hıldın.

Kaleki nav wanda bû, ewi ew cahıl da sekınandınê got:

– Nepake, nava wi mıxlûqetê hezêmet em dıkıne qalmeqalın. Were em herne cem Xano, ewê silaha erhede bıde me.

Xano ku bihıst ew qalmeqali berbı wan hat. Wextê ew nêziki deboxanê bû, cahıl jı ber derê deboxanê paşta vekışyan, heveki dûr sekıni. Jı wan xorta yeki ne ewqas cahıl, şera dora kolozê wi usa kevn bıbû, weki pırtkê serêye kevn dewsa risya ser sûretê wida dıhatın. Ev heveki berbı Xano hat û usa ber Xano temene bû, te qey dıgot ew ber destê mir hakıma mezın bûye, Xano pırsi:

– Hûn dewa çı dıkın. Bêjın?

– Ez xulam şuxul ji ha dıvın? Ew gışk jı gundêd jêrının, eme bê silahe, vê payiza derbazbûyi eskerê İranê gele meri kuştın, ê kur kuştın, ê bav kuştın, gele şuxulê netê anine ser malê hıneka. Xulese tune mal, weki wana zırar negihandınê. Em hatıne, weki serê xwe ji bıdın, lê heyfa xwe hıldın. Eme destevalane lê silahçiyê te, tışteki nade me. Dıvê: "Wera lı vıra silah, tune". Ez xulam şuxul ji ha dıbın? Ne dıvên: "Dıjmın bê hesab tê ser me şêr?"

Ev gıliyê xweye paşın evi xorti ha bı teqıl û dılmayi got. Pey xeberdana vi xortira yeki dınê pêşta hat, pêçeke

Institut Kurde de Paris

mella dora kolozê wi bû, ewi hê cahıl bû, berê sımêlê wi teze xûdabûn. Ev xort qe temene ji nebû, hema zûzûka destbı xeberdanê kır got:

-- Mın par na pêrar medresa cem melle Rişit kutakır, quran xıtımkır. Ez nava van gundêd jêrın dıminım. Ez dıxwazım bêjım, ez xulam, xêni zevtkırına erdê me û kuştına meriyê me, şah Abas dıxwaze, weki em gışk dinê xweyi suniê terk bıdın û herne ser dinê wani xırav-şıhiyê.

Xano ku bihıst ev gıli, heveki fıkıri bû, pırsi:

— Tu jı ku zani van gıliyêd wan?

— Ez xulam, par payizê, wextê eskerê wan hat, mezınê wan Quli-xan, çend meriyê meye kal dil gırtıbûn, lê nekuştıbûn, berda û gotıbû wan: "Hûne kalın, gûnê mın we tê, ez we nakujım, herın bêjne kurdêd xwe: "Pey Mehmet pêxemberra, pêxember ne Omere, hızret Eliye. Herın bêjne kurda bıra bêne ser fıkra hızret Eli".

Xano lı meriyê dora xwe nıhêri got:

-- Hûn dıbhên, çı dıxwaze şah Abas. Xêni welat zevtkırınê, ew dıxwaze me gışka bıve ser dinê şıhya. Weleh, heta yek jı me saxbe wê yekê şah Abas navine.

Xano hukmi ser silahçi kır, weki tir-kevana jı wana belake. İdi evar bû, lê tav van rojêd havinêye ewlın dıqıjıland. Ew çend rojbûn sıvê berbangê hetani evarê Xano qe rûnedınıışt, hema usa nava mıxlûqet û eskerda bû. İro ji suretê wi xudanêda mewıcibû, zipıkêd xûdanê jı enya wi dılop dıkırın ewi destmal derxıst, xûdanê jı enya xwe û sûretê xwe paqıjkır. Jı nava wi mexluqeti derket berbı diwanxanê çû. Sê siyara ajotne pêşiya Xano, gelek dûr jı hespa banzdanê erdê. Duda hesp gırtın, yeki jı wana nêziki Xano bû temene bû, got:

— Maqûl, em gerekê bıçûna Tewrêzê bona şuxulê xwe, ew çend rojbûn eme rêdabûn. Lê em ku jı qıjlêd xwe derketın, idi ketıne sinorê İranê me eskereki usa gıran dit, weki ser û bınê wi nayê xuyanê, ew idi nêziki sinorê me dıbe...

Xano ku bihist, ev gıli destxweda femkır, weki dıjmın tên nêziki sinor dıbın. Ew çû diwanxanê şande ser pey sereskerêd xwe: Cewzo, Hemze Çawış, Esoyê Lakan, Posto êd mayin. Wextê ewana hatın, ewi gote wan qasıda, weki ew biwekılinın gıliyê xwe û ditınêd xwe. Wextê wana gıliyêd xwe wekıland û kutakır, Xano gote wan serkarêd xwe.

Em gerekê bılezinın lı deştê, serê sinorê me pêşiya dıjmın bıgrın û nehêlın lıngê wi bê erdê mekeve...

Bıra Cewzo zûtırê taxbûra Şebab bışine, lê beri çûyinê bıra Şebab bê, ez bıvinım...

Cewzo ku çû, hukmê Xano gote Şebab, ew lez çû cem hoste, zırya xwe xwekır û bezi çû cem Xano. Şebab ku hate diwanxanê, bı resmê eskeriyê kip temene bû û sekıni. Xano ku Şebab dit, wa bı deyeki ken lê nıhêri fıkra xweda got:

"Xwezla xortê minani te lı eşira mında gelek hebûna!" Xano zûda texminkırıbû, mêrxasiya Şebab, bêtırsiya wi û camêriya wi, lema ewi Şebab hızdıkır, gotê:

– Şebab, tu gerekê taxbûra xwe hıldi, hema nıhada lez rêkevi, heri pêşiya eskerê İranê. Nıha meri hatın û dıvên: "Ewana idi hatıne nêziki hıdudê me bûne". Lê tu gerekê ser neki, usa bıkın dıjmın we nevine, pak dina xwe bıdne wan, ki ali dıçın, çı silahê wan heye... Hema nıha here, riya kese here, riya koçera. Lê tu gerekê tımê bêj cem mın, mınra bêji te çı dit û çı eyankır...

Şebab disa temenebû, got: "Hukmê te, maqûl, ezê ser serê xwe bıqedinım. Destûrê bıde ez herım".

– Destûr tera.

Şebab jı diwanxanê derket. Çawa Xano hukm kırıbû, gerekê wê gavê esker hılda û rêketa, lê Dilber kete bira wi. Ewi dıxwast Dilber bıdita, çımki çend roj beri vê caba nexêr Dilberê gotıbû Nena xûşka wi, weki ewê cem melleki zane bazbend wira kıriye, çawa tılızme bıde Şebab, ew nıvıştê xweyke Şebab jı derbêd neyara. Şebab

Institut kurde de Paris

berbı wê çû, lê ewqas seva tılzımê, çıqas ewi bira Dilberê kırıbû, çımki zûda wena hevdu neditıbûn. Berê ew xwexa nedıçû mala wan, herkê dılê wi bıxwasta hevdu bıvinın, ewi xûşka xwe dışande pey wê, lê iro wexta wi tunebû here mal û xûşkê bışine, ew heveki sekıni fıkıri, weki xwexa here ber derê wan û gazi wêke. Ew lez bı wi alida bezya, hê negihıştıbû mala wan, kuçek mabû, Qurşût rasti wi hat. Ewi sılav da Şebab, lê Şebab caba sılava wi negırt û bı avrûne tûj lê nıhêri, dılê xweda got: "Xwezla tu vê bıharê lı qıjla rasti mın bıhatayi, wele mınê tu dıkırayi mêvanê erdê, lê bextê te bıri, ez te geryam û tu rasti mın nehati".

Qurşût bawerkır ew avrûyêd wi, qe dengê xwe nekır. Şebab ku hate nêziki xaniyê wan, ewi bırê Dilberê çûk dit, gazi kırê. Kurık hate bal Şebab. Ewi Şebab pak nas dıkır, wextê nêzik bû, pırsi:

-- Şebab, çı dıxwazi?

-- Kurêd delal, here mal, dızikava bêje Dilberê: bê Şebab gazi te dıke, ezê pera bıdıme te, tu xwera xurma bıkıri.

-- Ez perê te hılnadım, lê ezê gazi Dilberêkım,--kurık got. Û bezi çû malê, hê deqek nekışand Dilber derkete ber dêri, dora xwe nıhêri cıka kesek tune û nerm mina qaz werdeka berbı Şebab meşya, hê çend gav mabûn bıghije Şebab got:

-- Tu lı van dera, xêre?

-- Hazır bıvin, çıkır xêre. Mın dıxwast tu bıditayi, çımki ez nıha taxbûra xwe hıldım herım.

-- Tuyê kuda heri?

-- Ez gerekê pêşiya eskerê İranêda herım, hê ew negihiştiye sinorê me.

-- Belki xwedê textê wi welgerine, wi ji têke erdê. Disa ev çend rojın bajar lı ser hevra tê dıçe, xew çevê keseki nakeve.

Dilber heveki ker bû, paşê got:

-- Wey la por kurkırê, ne dıvên eskerê wi geleke, bê

hesave, tuyê taxbûrekêva çı bıki lı wi eskerê gıran?

— Ez naçım, weki şerkım, ezê herım teseliyê bıkım, bıvinım çıqas eskere çı silahê wan heye û kijan rê ew tên?..

— Lı vıra nav bajarda gele keç û bûk dıçûne nav taxbûra jına, weki şerkın, ez ji dıxwazım herım, lê dê û bavê mın nahêlın, dıvêjın: "Çar bırê te hene, ewê hernê şêr, tuyê kuda heri?

Şebab dıqacqıci, lê-lê bû Dilber hemêzkıra, ewi dora xwe nıhêri, meri kuçêda derbaz dıbın, turuş nekır wê yekê bıke. Nışkêva kete bira wi, hukmê Xano, ewi destûra xwe jı Dilberê xwest, got:

— Dema xatırê te.

— Pey tuyê hema usa zû heri.

— Ez nıkarım geleki bısekınım, gerekê ez zû jı bajêr derkevım, bona te ez hatım...

Hela Dilberê û Şebab hevra xeberdan, diya Dilberê derkete ber dêri, ewê Dilber û Şebab lı cem hev ditın. Şabû, ewê hızdıkır Şebab bıve zavê wan û berbı wan hat. Şebab minani keça soro-moro bû, kır ku bıreve here, lê diya Dilberê got: — Were mal, çıma tu vıra sekıni?

— Metê ezi lezım, gerekê ez nıha jı bajêr bı eskerê xweva derkevım...

— E, disa tuyê heri, lao, merıv usa nake. Were mal, çıma zarotiyêda tu hındık hati mala meta xwe, ez dıvinım tu mezınbûyi idi me birdıki.

— Na meta Eyşê, ez tucara te birnakım, lê xwedê ez nıkarım. Dema xatrê we.

Şebab gıli gotın û lez çû. Hıla çend gava jı wan dûrneketıbû, Dilberê lê kıre gazi, got: "Bısekıne, bısekıne, mın birkır, mın tera cem mellê ku jı Hekarê hatye, melleki gelek zaneye, tera nıvışt kırye, weki derba dıjmın tışteki lı te neke. Gışk dıvên: "Nıvıştê ku ev melle dıke tılzımeke usane, weki ne tir-kevan, ne şûr û ne ji rım nıkarın tışteki pê bıkın, weki ew nıvışta lı bazbenda mılê wi mêri gırêdaybe"...

Institut kurde de Paris

Dilber bezi çû xêni, tılzıma nıqışandi bazbendê da dırûyi ani. Weki bın kıncê Şebab da gırêde, wextê Şebab mılê xweyi çepê jı oyme derxıst, ewê zıri bın oymê Şebabda dit, şabû got:

– Şıkır xwedê, xêni bazbendê zıri ji lı teye. Wextê ewê bazbend gırêdıda, Şebab destê wê bıre ser dılê xwe gıvaşt, diya Dilberê ew yek texminkır, Şebab şermana revi çû. Eyşê dılê xweda got:

"Lao, xwedê te xweyke, here, lê belki ayka ayka kurda şahê İranêra û padşê Romêra nemine. Belki textê wan welgere û erdêda here xwarê.

Zûda nivê şevê derbaz bıbû, lê hê şêwra mıclısa Xano û serkarê eskerê wi, xılas nebıbû. Wana mısilet dıkır: "Çawa bıkın nehêlın dıjmın bê erdê wan, bê welatê wan zevtke". Evarda geleka xeberda. Paşê Xano got:

– Hûn nızanın şah Abas çı dıxwaze? Weki hûn nızanın ezê wera bêjım: Şah Abas dıvê: "Ezê erdê te zevtkım, xerc û xeracê hunê bıdın, olama mınra bıkın, dinê xwe sunya bıhêlın, werın ser dinê me şahya. Werın bona mın herın şerkın, welata zevtkın". We femkır, çı dıxwaze?–Wa bı hêrs kutakır Xano gıliyê xwe.

Wê evarê pey gışkara xeberda Hemze Çawış, ewi got:

– Hûn pak bızanbın meremê şahê İranê. Ev eskerê ku tê, ewê hukmê şah Abas bıqedine, eva çend salın û çend carın ew esker dışine ser me şêr, lê tu karê navine, hıla serda sereskereki minani Quli-xan hatye kuştınê. Hışê mıni bıri femdarye dandına vi eskerê gıran. Bı vi tehri ev esker tê, weki koka me bine–me gışka qır bıke, erdê me zevtke, erz û jınê me têke dilê xwe û bê namûske. Pey van yekara idi em çıma sax lı dınê dıgerın?... Mın gele şerê vi tehri ditıne, wextê ez nav eskerê Romêda dıxebıtim. Ewana bê ruh û merhemata wan tune, her şerê hemberi wan dıkare, sênca wan bışkêne.

Wê evarê qarkırın, weki sıvê zû herne pêşiya eskerê İranê bıgrın, nehêlın ew bê welatê me.

Institut Kurde de Paris

Sıvetırê pencê şevê tavê teze dabû belekiyêd berfa çiyayêd bılınd û merıv ku lê dınhêri te qey dıgot zive zêr kıldane, usa kaw dıhate xuyanê. Vê sıbê Xano hespeki şınbozi siyarbû lı meydanê, fêza kelê, sekınibû. Esker ji lı wıra hazır sekınibû. Xano heveki hespê xwe berbı esker ajot. Wê gavê şêx Celat û melle Reşit berbı Xano hatın. Wextê ewana heveki nêziki Xano bûn, herduya sılav da Xano, ewi sılava wan vegırt, paşê şêx Celat got:

– Maqûl belki ocaxa mın oxıra terabe û te xweyke jı derbêd dıjmına. Belki şûrê te wanra bıve roja "heşer-neşerê"...

Xano hespa xwe zengûkır, pêşta çû, nêziki şêx Celat bû, got:

– Ez zef razime jı şêxê xwe, lê pak dıbû, weki tu û melle Reşit ji mera bıhatana şêr, bıra mıxlûqet û esker te û melle Reşit bıvine lı meydana şêr, wê pak bûya û gışkê wê fırnaqbûna...

Şêx Celat heveki fıkıri, lı melle nıhêri, got:

– Ser çevê mın.

Xulama hespê wan destkêşkırın anine cem wan, melle û şêx hespê xwe siyarbûn û kêleka Xano sekınin, Xano destê xwe hejande Cewzo, weki esker pey wi bıleqe û xwexa da pêşiya esker û rêket. Pey Xano çend zılama ala sor gırtıbûne destê xwe, dıhatın. Pey ala sor ra esker rêket. Berê bêlûka şûr-mertela, pey wanra bêlûka rımçiya, pey wanra dıhat bêlûka necexçiya, pey wanra dıhat bêlûka kosemırsiya, pey wan gışkara hatın gurzkebendçi. Pey wan gışkara bır tir-kevan bûn lê eva ew eskerbûn, ê ku jı cmaetê bı dılê xwe hatıbûn. Raste ewan telim hinnebıbûn, lê her yek jı wan gelek şera û gele oxırmêd gıran ditıbûn. Kêm nav wanda hebûn mêr, ê ku bırin lı bedana wan tunebûn.

Wê sıvê hetani nivro dagerya, esker qe ciki nesekıni, hema usa rê hat. Bınatara qubêd jêrın, jı kelê geleki dûr, serê kaniyê, Xano esker da sekınandınê. Ew jı hespê xwe peyabû, pey wira esker gışk peyabû. Gazi Cewzo kır, got:

Institut kurde de Paris

– Bınêrın, eskerê peya gelek paşta maye. Em dıçıne şer, gerekê em usa herın, weki ne hespê me bıweste, ne ji eskerê meyi peya, eskerê westyayi zû bındıkeve, ez dıvêm hûn gışk jı vê yekê femdıkın?

– Belê maqûl, gılıyê te bêşık rastın, eskerê westyayi ne şerkare, zû qels dıbe, –Hemze Çawış got:

Xano berbı kaniyê çû, ewi dit eskerek qurûti kaniyê dıbe, avê vedıxe, Xano çû nêziki wi, got:

– Xortê delal, merıv tırê tu ne kurdi, çıma tu nızani kurd avê bı çenga, yan bê kulma vedıxûn. Hıla bınêr.

Xano nêziki kaniyê bû, berê destê xwe şûşt, paşê bı çengê herdu desta av vexwar. Xort şermana sorbû, berbı hespa xwe çû.

Wextê Xano jı kaniyê dûrket, ewi bawer kır, siyarek riya deştêda usa zû tê, weki toz û duman jı ber sıma hespa wi quloz dıbe. Cahıla gote Xano: "Maqûl, ev siyarê usa bı lez tê Şebabe". Gava heveki nêzik bû, hespa wi xûdanêda mewıcibû, lê ew, xwexa ji tozêda gewr dıkır. Jı hespê banzda erdê, bı telima eskeriyê Xanora temene bû û lewzeki zû, got:

– Maqûl, raste, em hıla negihıştıne eskerê İranê, lê hınek gundêd eşira meye deştê dırevın, kulfetêd xwe dıvıne gundêd jorıne çiya. Ewana dıvên: "Hê me dı emrda ewqas esker neditiye".

Xano bı hêrs gote Şebab:

– Tu here bı çevê xwe bıvine paşê were bêje me, me tu neşandi, weki tu bêy gotına xelqê mera bêji.

Şebab ku bihist ev tenê Xano, serê xwe berjêr kır, hespê xwe siyar bû, çû. Hemze Çawış pêşiyêda hat, ew da sekınandınê got: "Mıra şerme tu xorteki usayi femdar û mêrxas, gılıyê ku tera gotıne tu pak neqedıni, çıma mın usa tu hinkıri?" Şebab qe dengê xwe nekır, çawa lez hat, hema usa ji bı wê lezê va çû, pış çiyava qulıbi. Cewzo hat cab da Xano:

– Eskerê me gelek paşta maye.

Institut kurde de Paris

– De bıra eskerê peya ji bıghêjne me, heveki rıhetbe, bina xwe bıstine, paşê disa emê rêkevın herın. Lê eskerê siyari bıra işev lı vıra bımine.

Çend seheta şûnda eskerê peya ku hat cem Xanora derbaz dıbû, ewi pırsi:

– Qe çawane xwe hûn newestyane?

– Weki nıha bıwestın, lê şerda i bez ji heye, lez ji heye, wê çawa bıkın?–Mezınê wan İskenderê kal got.

Xano ku çev bıriyêd sûretê kalê ket, destxweda ewi İskender naskır, kete bira wi: eva ew kale, ê ku gelek mêrxasi kırye hemberi Romê û zûda qebila xwe hıldabû hatıbû gihıştıbû wi. Wextê eskerê peya bınatara wanda hêwri rıhetbe. Xano hukım kır jı hespêd zêde anibûn, hespekê bıde İskender. Wextê komerdarêd Xano hesp bırın dane İskender, lê ew qayil nebû, got:

– Çıma ez jı vana çêtırım hespa siyarbım?

Xano lê hêrsbû, got:

– Xwe tu ne xorteki, evana cahılın, xortın, tuyê çend roja şûnda bıwesti, weki qe nıkarbi saskarbi, paşê kê dewsa te serkariyê lı van bıke, hıla bıde hışê xwe? Lê ne xana cahılane, tu zani ew nawestın.

İskender tu dıbêy, bı gune fıkıri, got:

– Maqûl, gıliyê te rastın, bıra hespekê mınra binın.

Hespeki zinkıri deskêşkırın anine ber İskender, ewi minani xorteki çarde sali banzda ser pışta hespê û du-sê meydana çû-hat, te qey dıgot derketiye cıridê û wi ali, vi ali şûrê xwe bır-ani. Cahıl kenyan, Xano gote cahıla:

– Hûn dıvinın ev kal qe hini telimê nebûye, lê çı ogıta ser pışta hespê dıke?

Wan rojêd havinêye rınd, hêwa xweşbû, ezmani sayibû, tevê pencê xwe dabû hemû ciya, lê ne ewqas germ bû. Erd xemılibû cûre-cûre kulilkada. Merıv heyran-hıjmekarbû, lê bınhêrya. Jı esker hıne cahıl ketne heneka topetaş listın, heneq-laqırdi dıkırın-dıkenyan. Yeki desmalek serê xwe alandıbû, bı dengê jına dıgot: "Pey la porkurkırê, kanê

kerê me". Cahıla dora wi dıkenyan, dıgotın: "Weleh, hema mina Ordiya dinıke, seva kerê dıvê: "Porê mın kurkıribe".

Cahıl ku usa eşq, şabûn, ne mırûzkıribûn; lê Xano xweş hat, dılê xweda got: "Şıkır hûne ne pormûjdene..." Ewi jı Cewzo pırsi:

– Cewzo, sazbendê bêlûka hatıne, yan na?

– Belê, maqûl, çawa dıbe bêlûk bê sazbend, her bêlûkek sazbendê wane pêranın, hıla hıne taxbûrada cahıla xwera anine tulum, yan bılûr, yan ji meya. Xêni wê yekê mın Mırazê sazbend ji bona me aniye.

– Eferım Cewzo, lê kanê Mırazê sazbend, ez qe navinım, lê kuye nay xuyanê?

– Maqûl, dıbû Mıraz rex te keta, mıne ewana heveki dûr dan sekınandınê...

– De weki usane bıra Mıraz lı tulumê xwe, bıra cahıl têkevne reqasê.

Cewzo çû gote Mıraz, ewi qeydê "Şerani" lêxıst, cahıla destê hevdu gırtın, ketne govendê, careki çep lêxıstın, du cara rast lêxıstın û qeme kışandın pêşta çûn, gotın: "Nave, nave, nave", paşê qeme lez dıkırne qılıfê wan, destê xwe lı hev dıxıstın, disa carekê çep lêxıstın, du cara rast, qeme disa kışandın pêşta dıçûn, gotın: "Nave, navê, nave". Cara sısya ku govend zıvıri du cara cep lêxıstın, lê wexta disa rast lêxıstın disa qeme kışandın sê cara hevra gotın: "Nave, nave, nave". Qemê xwe disa xıstın qılıfê xwe û govend gerandın. Wextê wana usa teqıl bı qemê tezi kıri destê wanda û pêşta dıçûn, te qey dıgot dıjmın pêş wanvaye. Xano ku dit ev listika wan û bihıst dengê wan: "Nave, nave, nave" dılê xweda got: "Eşed bıla, tu cara nave, weki em welatê xwe bıdne şah Abas-bıdne wan merıza.

Lı jorê nava mêşê jı darê merxê, bêlûka Esoyê Lakan bû, jı wêderê dıhat dengê zurnê, kıvş bû lı wêderê qeydê "Sêpêyi" sıvık lêdıxıstın. İdi berevar bû, ro çiya qulibıbû, si ketıbû berê zınara û darêd mêşe. Pey şiv xwarınê şûnda Xano siyarbû û esker gışk rêket. Pêşıkêşê esker ew qasek

hebû, lı pêşiya esker dıçûn. Tariyê idi erd nıxamtıbû, her lı ezmanê şin pêwr-mezın zelal dıhatne xuyanê. Esker nerm-fesal dıkışya, qe deng jı yeki dernedıket, her cara dıbû teqinya sımê hespa lı kevıra dıketın. Jı pêşikêşê esker yeki cab ani Xanora, weki ewana gihıştıne eskerê peya, Xano got, bêjne İskender:

– Bıra eskerê wi işev lı vıra şevbuhêrya xwe bıke û rıhetbe, sıvê berbanga sıvêra, rêkeve bê, lê ne lez, fesal û hêdi bê.

Wexta ew hukmê Xano qulıxkıra gotıne İskender, ewi got:

– Na, çıma em vıra bıminın. Weleh ezê herım Xano xwexa bıvinım.

Û hate cem Xano, wê tariyêda ew temene bû, got:

– Maqûl, bıbaxşine, te hukm kırye, weki eskerê mın işev lı vıra bımine, eskerê mın newestyaye, em fesal tên, çıma nepakbû, weki em ji hêdi wera bıhatana.

Xano şaş-metal ma, weki ev kalê heyştê sali vê şeva tari ew usa rınd dıvine, ewi caba wan pırsêd İskender da:

– Na, İskender, bıra peyayê te rıhetbın, eskerê westyayi tu xwe zani, ew ne eskere, ne ji şerkare. Lı pêşya me hıla gele rojêd çetın hene, tu gura mın bıke, bıra eskerê te pak hêsabe. Lê bıra parêzkarê te dora esker hebın, bê parêzkar esker tucara nabe...

Ev gıliyêd Xano jı bo parêzkarêd esker, dılê İskender nehat, ewi got:

– Maqûl, te tırê ez zarekım, çıma ez iro hatıme şer, ne mın lı welatê Romê usa kırıbû padşê Romê dıgot: "Hûn mınra İskender axa bıgrın, bese..."

Xano têderxıst, weki seva van temya, kalê xeyıdi, dıli wi ma. Ewi bı dengeki nerm got: – İskender, ez pak zanım ku tu kiyi û te çı kırye bona mıletê xwe, lê bawerke mın tışteki xırava negot. Tu dıvini iro çende em rê tên. Meriyê razayi çawa meriyê mıri. Çıma temi xıravın. De tu xwe bêje?...

İskender femkır, weki ciyê bela-sebeb hêrs dıve got: Şıvêta mıriye, bıbaxşin, mın tehreki dınê gıliyê te femkır..

İskender paşta vegerya, çû cem eskerê xwe. İskender siyari ji hema jı pış ciyava qulıbi. Te qey dıgot mêşe ji zanıbû şeve, lema usa ker seqıribû, qe belgek jı wan darêd mêşe nedıhejiya. Bona Xano xulama şiv ji hazırkırın. Sêvdınê kurê wi, hat gote bavê:

– Keko*) şive hazıre, were şivê buxwe, nete vêsbêda qe pari nan ji nekıriye devê xwe.

Wextê ew nêziki kon bû, lê hıla neçû hundurê kon, nışkêva Şebab nêziki wi bû, temene bû, got:

– Ez xulam, me iro eskerê İranê dil gırtıne.

– Lê ka lı kiderêne?

– Wane, eskerê mınê nıha binın, ez pêşiyi hatım...

– Pak mıqatbın, weki ew vê şevê jı dest we nerevın. Xano çû kon. Xulamek şande pey Cewzo û serkarêd eskerê mayin, weki bêne cem wi, beri gışka Cewzo hat, ew ku çev Şebab ket, got:

– Şebab, ez dıvinım ku tu qe me dûrnakevi, nızam tu çawa şuxulê ku spartıne te, dıqedini?

Xano ku ev tenê Cewzo bıhist, got:

– Cewzo, ji Şebab vegere, ewi iro disa mêrxasike rınd kırye. Ewi du eskerê İranê dil gırtıne anine.

– E, kanê dilê wi?

Qumandarê, ku hatıbûne kon, bihıstın ev gıli lı ser mêrxasiya Şebab û bı hubeke şırin lı Şebab nıhêrin. Sêvdin ji lı Şebab nıhêri, lê bı çevnebıri û fıkra xweda got:

"Ez dıvinım, bextê te rınd lêdıde, Dilbera bedew ji her te hızdıke, keseki mayin hıznake".

Şebab texminkır, weki Sêvdin bı çevnebari lı wi dınhêre. Kete bira wi, çawa carekê lı bındarûkê wextê Şebab ne lı wêderê bû, Sêvdin gıli lı ber Dilberêra avitıbûn. Wi

---

*) Nav kurdada edete, hene kur bavê xwera dıvên "Keko" ya "Ede".

çaxi ku Şebab bihıst ev gıli, ewi ev yek ber tışteki hesav nekır, lê ewi iro ku bı çevê xwe dit; çı teheri Sêvdin lı wi dınêre, dılê wida bû minani tışteki xuşûm.

Lı ber derê kon deng hat. Esker ew dil bı kutan anine kon. Xano ku dit kutan, hêrs bû, got: "Ev çı tevaye? Dil kutan ne şuxulê mêraniyêye. Dil merıv dıkare bıkuje ji, wextê dil tera ne raste, lê kutan ne şuxulê mêrxasane. Her Rom û İran tıştê usa hov dıkın!.

Ew eskerê ku ew dil anibûn, got:

– Ne wana vê sıbê berbangê em idi hal xıstıne, rıhet nasekının, xwe badıkın davêne erdê, nayên ilahi evi hani dırêji mezın. Hema ku Şebab jı me qetya çû, ewi disa xwe avite erdê nedıhat. Me kır wi bıkujın, lê sereskerê me, Şebab temi dabû me, weki em sax-sılamet bıghinıne te, maqûl, lema me nekuşt.

Yek jı wan jarıki telaşi dırêjbû, nışaneke fêza eniyêbû, ê dınê yeki nivçebû. Xano hukımkır dest û pê wan vekın. Ewi nivçe av xwast. Xano got weki tasê av bıdnê. Tasa avê ku dane destê wi, dest lê dırıcıfi. Xano zımanê İranê zanibû, jı wan pırsi:

– *Hûn jı kijan bêlûkêne û kijan ordiyêne?*

Qet yeki jı wan dengê xwe nekır. Xano pırsa xwe wekıland: Bêjın hûn jı kijan bêlûkêne û jı kijan ordiyêne. Lê disa yeki jı wan dengê xwe nekır. Xano got:

– Weki hûn xeverdın, wera wê pakbe, lê weki hûn xevernedın, wera wê xıravbe, em dıkarın devê we vekın û hûn mera xeverdın, lê ez dıxwazım devê we bı dılê we vebe, hûn xwexa caba mın paki, reheti û bê zêrandın bıdın. Em kurd ne minani wene. Xano careke dın ji pırsi:

– Hûn jı kijan bêlûkêne, kijan ordiyêne û hunê kuda herın?

Disa wana dengê xwe nekır. Xano bı zımanê İranê gote Cewzo:

– De, weki dıjmınê ku ketye destê me û naxwaze me kurdara xeverde, bıvın pış kon, vê sehetê herda ji bıkujın.

Institut kurde de Paris

Cewzo çevkıre du eskera, destxweda destê wan gırêdan. Wextê jı kon derxıstın Xano kurdi got:

– Ewê dırêj rıhetkın, kıvşe ew zabıte, ê dınê wê xwexa xeverde.

Gava bırıne pış kon, Esoyê Lakan bı gurzkebend carekê serê wi lêxıst, ewi qe dengê xwe ji nekır, danıkıli erdê. Ewê dınê lava kır, weki wi nekujın, got: "Hûn cı pırskın, ezê caba we bıdım, tek mın nekujın". Ew dil disa anine kon.

Wê evara dereng, çı lazımbû Xano dilê İranê pırsi, pê hesya hemû surêd wan, cebırxana wan û merema hatına wan.

Berbanga sıvê bû. Esker disa rêket. Wextê idi sıvê ronbû, ewana rasti koçêd gundê deştê hatın, ê ku jın-zar lı ga barkırıbûn û hevraz berbı çiyayêd bılınd dıçûn. Xano pırsi:

– Ev çı hewale, hûnê kuda herın?

Yeki jı wan Xano naskır, got:

– Maqûl çı hewale, me bihistye eskerê İranê disa tê. Em dıtırsın, ewi par payizê gele ecêb anine serê zar û kulfetê me, lema em nıhada kulfet dıbıne jorê, gundêd çiya, weki jı wan kafırêd zulmkar durkevın.

Xano ku hate wan gundêd deştê, ew gunde hesabke valabûn, te qey dıgot ev gunde bê şênine, kes tê tunebû. Ewi dit mexlûqet gıhayê xwe dırûye, xılas kırıne, ber malêd xwe lodkırıne. Nan ji idi hıne kal destpêkırıne dıdrûn, lê tek-tûk, çımki êd mayin silah hıldane çûne şer, yan ji kulfetê xwe dıbıne çiyayêd bılınd. Xano ku ev dit axin kışand...

Ew sê rojbûn û sê şev bûn eskerê Xano rê dıhat, her carna dıhêwıri rıhetbe. Roja çarabû. Jı nivro idi dageryabû, lı ezmanê şin serê çiyayê bılınd pılte ewr derket, ew ewr bere-bere zêdebû berbı esker dıhat, paşê ba rabû, bû gare-gura ewr bırûskê bırqveda, berê dılopêd baranê hatın, paşê baraneke sêrek bari. Bina hewayê xweşkır, baranê

bıri. Heveki bû hênkayê. Şebab cab ani, weki idi nêziki eskerê İranê bûne. Esker vıra sekıni. Şebab Xano bıre serê zınareki bılınd û jı wêderê ewi eskerê İranê nişanê Xano da. Jı wi gujmeyê bılınd eskerê İranê minani neynıkê, pak Xanova dıhate xuyanê. Ew ciyê eskerê İranê lê danıbû mêşeki sêrek hebû, nava wi mêşe da hêwıribû eskereki pır gıran. Kutabûna esker lı wê besta dûz hetani çeva dıbıri xuya nedıkır. Sehetek zêdetır hebû Xano dina xwe pak da eskerê İranê û hışê xwe da bıryar gırt:

"Ki ali û çawa lı vıra eskerê İranêxe?"

Paşê eskerek şande pey Hemze Çawış, Cewzo, Eskoyê Lakan, Posto û İskenderê kal. Ewana ku hatın û jorda lı eskerê İranê nıhêrin, Posto got:

– Ez çûme gele şera lı hemberi dıjmın, lê mın ewqas esker hê neditiye.

– Dıvek tu çev eskerê gıran keti tırsyayi? bı ken Esoyê Lakan gotê.

– Na çıma bıtırsım, mesela me kurda dıvêje: "Ê ku serê bı dûzanê kurdıke, idi ber tunçıkê nakeve".

Wana pak dina xwe dane Eskerê İranê. Van mêrxasê kurdaye navdar te qey dıgot vê kerbûna xweda çap dıkın: çawa dıjmınxın, weki mılet xılaskın jı van zulmkara.

Gışke kerbûn, lê Xano got:

– Hûn dıvinın, aliyê çepê, wê bestê esker reşdıke, gerekê yek here wır, –hıla Xano gıliyê xwe kutanekır û negot ki here. İskender got:

– Wana bıspêre mın, – Xano vegerya lı İskender nıhêri, lê tıştek negot.

– Vi eskerê aliyê çepê ez dıspêrım te, Hemze Çawış. Aliyê rastê bıra Esoyê Lakan here. Vıra lı ortê bıra Posto lêxe.

– Lê ez çıma hatme vıra? –Wa bı dıleki xeyidi İskenderê kal jı Xano pırsi. Xano dit, weki kalê disa xeyidi, ew hate nêziki kalê, got:

– İskender can, tuyê eskerê xweva wi çaxi heri şêr,

kengê ezê herın. Çıma tu navini dıjmın ewqas esker aniye, em gışk jın û zarê xweva, kal û pirê xweva, topbın, navne nıvê wan. Hıla oxırmêd lape gıran hene, tuyê kela dılê xwe hıla gele hıcûmada bırêji.

Ev gıliyêd Xano disa İskenderê kal dane arxayinkırınê, weki bı deveki şa got:

– Ez xulam, tu çawa bêji, ezê usa ji bıkım.

Paşê Xano heveki pışta lı eskerê xwe nıhêri got:

-- Em geleki hatıne nêzik, ketıne tora dıjmın. Weki erişek hebe, em jı vi eskerê gıran xılas navın, wê mera çetınbe zora dıjmın bıvın, ew jı me geleki zeftıre. Gerekê eskerê meyi hêvşandi paşta vekışe, here dûr. Hema nıhada bıra İskender wana hılde here hında kaniyêd tırs bısekıne. Ev eskerê me ku jı vıra paşta here, meydana şer wê fırebe, wi çaxi çawa mera destbıde, emê usa qeleçiyê xwe bıguhêzın, lê paşê disa erişê bıbne ser dıjmın, em hema sıvê gerekê berbangê lêxın, hıla ewana lı me nehısyane, hıla eskerê wiyi gıran negihiştiye hevdu, weki qewata wi bıbe yek, dıvek em pê nıkarbın. We ku sıvê lêxıst hûnê gelek eskerê wi qırkın, çımki ewe xwêdanın arxayinın. Gerekê paşê hûn jı ber wi bırevın, ewê bıde pey we. Hûn gerekê bên jı me derbazbın, hesêvaneki hûn jı haj me nının. Heta ew bêne lı vi çiyayê bılınd, wê gelek bıwestın. Ez û Cewzoyê nışkêva ber wi ravın û lêxın. Paşê hunê herın dur bıtelın. Wextê me ji gelek qırkır, ijar emê jı ber wi bırevın bên jı we derbazbın, em ku hatın jı we derbazbûn, hûnê lêxın, ew westyane, lêxıstına me hêsaye. An, bı vi tehri em gerekê lı van çiya ka wi binın. Em usa nekın, tu çarêd mayin tunene, hûn çı dıvên?

Gışka got: "Ev gotınêd te heqın, her bı wi teheri em vi eskerê hezêmeti karın bıtewinın"..

Tari zûda ketıbû erdê. Ezman sayibû. Xano lı nav hêşnayê û kulilkada heveki velezya, ewi destê xwe dane ber serê xwe û lı hewê dınıhêri. Ezman tıji steyrkbûn. Ew steyrk hıneki cot-coti bûn, hınek kom-komi bûn û hınek ji

Institut Kurde de Paris

tenê bûn. Te qey dıgot keçêd kurdanın, pey govenda bındarûkê bela bûne: ewê cot-cot -ew hevalın xwera cûda bûne û sura xwe hevra vedıkın û dıvêjın, ewê kom-kom bûne - ew navnûçıka hıneka dıkın û xeyba hıneka dıkın, lê ewê tek-tek ew ji minani wan keça, ê ku dê û bavê wan bê dılê wan nişankırıne bona qelenê pır, bıdne kalê heftê sali lema ewana cûda mılûk bûne û halê xweda ponıjine, idi tu gıliyê wan tunın hevalara bêjın...

Xulama bona Xano kon vegırtın, ci danin, weki ew bê razê. Sêvdin hate pey bavê. Xano wê deqê ketıbû xemxıyalne kûr. Ewi iro eskerê dıjmıni gıran dîtıbû, dıfıkıri: "Çı tehri mıxlûqetê xwe xılaske jı wê zulma ku minani xezevekê ser wanda hatye" ewi gumana xwe nedıbıri, weki zora wan bıbe, lê paşê disa fıkıri: "Gelo çıqas mıxlûqetê wi, wê bê qırê û wê çıqas sax bımine?" Ew vê fıkrêdabû. Sêvdin nêziki bavê bû, got:

– Keko, *xulama tera kon vegırtiye û nıvin ji danine,* were, heveki razê, tu van roja hındık radızêyi...

– Lao, Sêvdin, kê nıha nav nıvinada razê. Tu here belgiyê zınê hespê me bine, ezê daynım ber serê xwe, heveki xırmaşbım.

Sêvdin ku çû Xano disa kete wan xem-xıyala. Ewi dıdit, weki halê wan çetıne, lê tu rê mayin ewi nedit, xêni lêxıstınê xwe parastınê. Wê deqê kete bira wi ew çend begêd kurda, ê ku xayinti kırın mıletê xwera û çûbûn aliyê şah Abas. Carna fıkra wida dısêwıri, rıcalkara bışine bal adrbêcana. Ne eva çend care ew dıçû komek dıda wana, wextê wana şerdıkır şahê İranêra û ewana ji dıhatne hewariya wi. Tımê wana xûn berhevda rêtıne. Yanê qasıda bışine cem mirê Şemdinanê, komekê bıxwaze, lê paşê xwexa xwera dıgot: "Hê me şernekıriye nıhada komekê bıxwezın, ew ji ne tu şuxule û bona maqûla ji kırête".

Xanoyi hê van fıkrê kûrdabû, sêvdin belgiyê zin ani cem bavê, lê ewi dit bavi usa kur mıtaladane, qe dengê xwe nekır, zin hêdika kêleka bavê dani û paşta vegerya çû.

Xano usa ketıbû xem-xıyala, weki qe xwe nehesya çawa xewra çû. Çıqas Xano xewra çû nızanbû, lê hema ku steyrkêd sıvê derket, te qey dıgot stêyrka sıvê deyn lı Xano kır, got: "Rave, idi wexte, weki eskerê te lı dıjmınxe..."

Xano çevê xwe vekır, dora xwe nıhêri parêzkarê wi her yek lı ciki hespê wane dêstda dıçêrinın, lê ew ji dıhênıjın. Ew rabû hate cem kûr, Sêvdin nav şinkayê û kulilkada velezyabû, destê çepê dabû ber serê xwe, bı destê rastê şûr bı xurt gırtıbû. Xano ser kurda xwarbû, hêdika got:

– Sêvdin, delaliyê mın, rave idi wexte...

Dengê bavêra kur banzda ser xwe, kolos jı serê wi ket, gılozbû. Ewi kolos gırt kıre serê xwe. Wê gavê Şebab disa nışkêva nêziki Xano bû, temene kır, got:

- Ez xulam, mın şevê dınê du meri peya şandıne cem eskerê İranê. Ewana hema hêşka hatın.

– E, wana qe çı tıştê teze anin?

– Tıştê teze ewe, weki şevê dınê gele qantırê barkıri hatın gihıştne vi eskerê gıran.

- Hûn pêhesyan barê wan gantırada çı hebû?

– Pêhesyan, çawa pênehesyan, ewana dıvên "Barê qantıra qışka zexıreye". Lawkê me dıvên: "Ewana usa serfınyaz xewra çûne, weki qe pênehesyan, weki çawa lawkêd mın du qasık jı ber agırê wan hıldan anin".

Kewa sıvê hê teze minani xımamekê dabû rû erdê. Eskerê kurda, minani perana çend aliyava rıkêvi ser eskerê İranê kırın. Dıjmın hê arxayin hê xewa hıngorêdabûn. Beri pêşın Hemze Çawış bı eskerê xweva lêxıst. Aliyê dınê Esoyê Lakan lêxıst, ortê ji Posto lêxıst. Hetani pır-hındık sıve zelal bû, eskerê Xano cınyazê eskerê İranê gelek lı wêderê raxıst.

Ew lêxıstına nışkêva vê berbanga sıvê, eskerê İranê cına lêxıst, hıneka xwe şaşkır tırsyan, nızanbûn ev çı şıpûk bû ser wanda hat. Bû nele-nela bırindara, sıve idi pak zelal bıbû, Xano pak dıdit, Çawa Hemze Çawış xwe gihande çadırekê, kıvş bû, ew çadır jı ser wan meriyê têda razay avit,

Institut kurde de Paris

bı şûra, rıma û bın sımê hespada ew qırkırın.

Tavê teze pencê xwe jı pış çiyê avite wêderê, kiderê ew eskerê İranêyi gıran hêwıribû. Erişa eskerê kurda pak dıhat xuyanê Xano ew yek pak dıdit û şabûna dıgot:

– De, lêxın, xwedê vê sıva eziz mın qurbana weke, lêxın, heyrana weme, usa lêxın, weki ew tobeke idi berbı kurda neyê.

Ewê dit, çawa rev lı eskerê İranê ket. Lê eskerê İranêyi ku dûr hêwıri bû bı hêwêrza, qalme, qalmêra xwe hesya, destxweda cêreke mezın gırt û berbı eskerê kurda kiderê eriş dıkır, hat. Lê ewana usa fesal dıhatın û pey cêrga xwe fıre dıkır minani goveka û bere-bere minani xeleka zıncira dıkır bê hev, weki wi eskerê kurda têxne çerxê û bıgrın-qırkın. Vê sıvê zû, dengê qumandanê wi eskerê ku govek gırtıbû pak zelal Xano dıbihıst, ewi bı teqıl got:

– Tond, tond, tond (yanê; zû, zû, zû).

Wextê wana, usa dûr govek dıda û berbı eskerê kurda dıhatın, wanava pak xuyadıkır, çawa eskerê İranê qırdıkın, lema wana dılezand. Lê Xano destxweda tê derxıst ew fêla wan, got:

– Kıvşe, ewana dıxwazın eskerê me têkne çerxê, dorê lê bıgrın, lema ewana usa qestana dûr û tele-tel tên. Sêvdin lao, bılezine, tu vê newala bınya meda here, cabê bıde eskerê me, berê Hemze Çawış, ew geleki pêşta çû, bıra vekışe, bese, paşê bêje Eso û Posto.

Sêvdin hespa xwe siyarbû heveki berjêr çû, nışkêva Hemze Çawış eskerê xwe paşta vekışand, pey wira Esoyê Lakan, paşê Posto vekışya, lê usa vekışya te qey dıgot dıreve. Eskerê İranê da pey Xano gote Cewzo:

– De Cewzo, ez idi te dıvinım, mın guman heye, tu mêraniya xwe disa bıki. Tu here aliyê han, –Xano destê xwe dırêjkır nişani Cewzo da, – ez ji wê lı vıra bım...

Paşê Xano gote kur:

– Tu Sêvdin, sed xortê cahılva lı vıra gêlida bıtelinın, lê gava ku ewana hat derbazbûn, tu paşê kêlekêda lêxe. Lê usa bıke, weki tu nekevi orta wan.



Institut kurde de Paris

Gerekê bê gotınê: Cewzo mêrxasek usaye kêmasiya wi tune. Çend cara ew ketıbû tela eskerê İranê, lê wan tela tımê mêrxas derdıket, eskerê wan qırdıkır û ne dihışt tu derb bıghêjne wi, nedihışt eskerê wi qırbe. Mıxlûqet dıgot: "Lema Cewzo mêraniya usa dıke û derb wi nakevın, çımki ewi kapa gura bın kıncê xweva, ser kevçka dılê xweda durye".*

Xano ku ciyê Cewzo nişani wida, Cewzo çû, le xwexa ji wi ciyê bılınd qe peyanebû, hema jı wê hêsiyê dina xwe dıda şerê eskerê xwe. Wextê idi nêziki nivro bû, Xano dit; eskerê Esoyê Lakan û êd mayin hatın wê derbazbûn, paşê ew lı serê wi zınari peyabû û hate nav eskerê xwe û temi da wana. Eskerê İranê ku hatne tanga Xano, ew nışkêva bı eskerê xweva lı pêşiya wi derket. Cewzo ji aliyê dınê. Herdu lê qelıbin. Lê gava ku Sêvdin lı kêlekêda lı eskerê İranê xıstın, Serdar wan ecêbmayi bû. Ev lêxıstın jı hemû lêxıstına betertırbû. Ewi xwe xuroşi nav cêrgê wan lı kır û cınyazê wan danılıgande erdê. Xano ku ew derbêd kur ditın, dılê xweda got:

"Şıkır, wê dewsa mın bıgre".

Bû şereki usa, weki eskerê İranê xwe unda kır û paşta vekışya. Hespê wane westiyabûn nıkarıbûn jı ber eskerê Xano bırevın, xılas bın. Xano vê navrojê ewqas qırkır, weki gıliyê şêx Celat ku gotıbûne wi ketıne birê "Belki tu wana têki roja heşer-neşerê..." rast usa kır.

Cewzo govıdê xweva ne meriki ewqas gıri mezınbû, yeki ortê bû, emrda ji ewqas ne kal bû, lê gava ku ewi iro, disa minani berê, lı ser hespê, xwe nava bujyada dıteland rıkêvi dıjmın dıkır, te qey dıgot: ev hesp vala tê, siyar lê tune û keseki derbek nıkarıbû bıgihanda wi. Hespê bın wida ji hespeki ne ewqas gırbû, lê deqme hespêd kela Dımdımê karıbûn wira lêkevne cıridê. İro ji Cewzo wexta eske-

---

*) Lı eşira Berodera bawerek hebû; kê kapa gura ser kevçıka dılê xwe bıdrû, tu derb lı wi nakevın.

rê İranê bı çevê xweva dit, ewi heywani femkır idi wexte û minani teyra jı ciyê xwe pekya, sımê wi hımangi dıghiştne erdê û pêşiya wi çı hebû pêpes dıkır. Qe tu tışt nıkarıbû ew hesp bıda seknandınê. Cewzo hemberi van mêrxasêd Xanoye mayin cahılbû, lê ewi gele carada mıl dabû Xano û pêra mêrani kırıbû. Lema Xano ew kıvşkırıbû serkarê eskerê xwe. Ewi vi şerida dıha nişanda, weki ew hêjaye wê rutba xweye çawa mêreki hêja. Kijan ali Cewzo derdıket, ew ali minani gihayê dırûyi kêlendi navkeve, usa lı erdê danıxli... Lê çıqas Xano eskerê xweva, eskerê İranê qırdıkır, tıştek jı wana kêmnedıbû, hıla serda zêde dıbûn. Çımki şah Abas eskereki gıran şandıbû ser kela Dımdımê û herro eskerê teze dıhat nava wan.

Ro idi jı nivro dageryabû. Gava ku qewata eskerê İranê lı vıra gihışte hev, wana zor da Xano. Xano heveki dın ji berxweda, lê paşê ber wan sılıki çû. Xana da pey. Xano carna lê vedıgerya, berk lêdıxıst û disa dırevya. Ewi usa ew xapandın anine cem Hemze Çawış û eskerêd mayin. Wextê Xano rasti Esoyê Lakan hat, got:

– Ez nıha teslimi we dıkım.

Ber eskerê İranê disa kurêd kurda derketın. Hespê wane hêsa û xwexa ji newestyayi lı eskerê İranê qelıbin...

Sereskerê İranê şaş-metal dıma, te dıgot ew fıkra xweda dıbêje: "Ev kurdana jı bın erdê derdıkevın".

Tari kete erdê. Xulama cab da Xano: "Posto kuştın".. Wextê beytê wi ser darebestê, şereke reşe lê nıxamti, anin ber Xano danin, ewi got:

– Em gışk gerekê jiyina xwe minani Posto ha bıdın, lê nehêlın dıjmın bê welatê me jı me bıstine, erz û heyalê me bênamûske û me ji têke xulamê xwe, –paşê Xano nêziki derebestê bû, got:

– Mêrxaso, rehme lı teve, dılê te havêji me neve, bıra dılê me havêji teve, tu mêrxasi dıçi erdê sar...

Herçê esker lı wêderê ser meytê Posto hebû, gışka sond xwarın, weki emrê xwe bıdın, lê welatê xwe xwey-



Institut kurde de Paris

kın jı dıjmına û wekılandın gıliyê Xano:

"Mêrxaso rehme lı teve, dılê te havêji me neve, bıra dılê me havêji teve, tu mêrxasi dıçi erdê sar".

Vi şerê roja iroyinda sereskerê Iranê femkır, weki evana idi ne kurdêd berêne, ê ku wan şerêd ewlında hema heyani û zor eriş dıkırın. Nıha eskerê van kurda minani eskerê dewleteke xurt, bı telima nızamê, bı fêl, delk û zanina eskeriyê şer dıke. Seresker nêta xweda got: "Dıvek padışê Romê komekê bıde vana..."

Lê vi şerida Xano ji dit, weki şah Abas ijar eskereki pır gıran şandiyê ser wi şêr. Şerê icar, şereki zef çetıne, gele meriyê bêne qırê, lê ewi gumana xwe nedıbıri, weki ewê disa zora dıjmın bıve.

Carekê berevarê eskerê Iranê revi epêce paşta vekışyan, eskerê Xano da pey wana hetani tari kete erdê, hatne gundeki. Xano texminkır, weki ew ji bı delk paşta vekışyan. Ewi nehışt eskerê wi dû wan here. Lê wi gundi û gundêd dorê, te ku lê dınhêri, dılê merıv dışewıti, ew kal-pirê ku heyştê-nod sali mabûn malêd xwe û guman bûn, weki kesek destê xwe hılnade ser wana, ew gışk çit-çiti kırıbûn. Hınek ser sêri kırıbûne tendûra şewıtandıbûn, gele ecêbêd mayin anibûne serê wan. Eskerê kurda ku ditın ew tıştên wan, dıha hêrsbûn û dıha culeti kıre şer...

Wextê qasıda cab da Şah Abas: "Hê eskerê wan negihiştiye kela Dımdımê û çıqas eskerê wi hatiye qırkırınê". Ew şaş-metal ma, çımki ewi wê nêtêda bû: ew eskerê gıran ku ewi şandıbû ser kela Dımdımê, gerekê zûda kela zevtkırına. Pey vê cabêra Şah Abas eskereki dınê jı qızılbaşa şande alikariya eskerê xwe. Lê Xano mecal nedane wana, ewi lı wan newala, geliya û mêşada cınyazê eskerê Iranê tıji kırıbû. Carna Hemze Çawış dıgote Xano:

– Maqûl, ez nav eskerê Romê çûme gele şera, wextê Romê mıletê mayin bı zora şûr dıkıre bın bandûra xwe, lê keseki ewqas jı eskerê Romê qırnedıkır, weki her careki jı eskerê Romê ewqas qırkırana, welle padşê Romê pêşda nedıçû...

Institut kurde de Paris

Şer gihıştıbû wê derecê, weki herdu aliyava idi dil gırtın tunebû û fıta nedıdane hevdu. Eskerê İranê kurdê dil gırti dıkuşt, lê ewi serê wi eskerê kuşti jêdıkır û jı çiyayêd bılınd ser wanda holdıkır, gava ku ew serê meriyê kuşti, holdıbûn ser eskerê İranêra dıhatın û wana serê eskerê xweye kuşti diditın, saw dıgırtın, dıtırsyan, dubendi dıkete nava wan, dıgotın:

– Em nızanın, seva çı şahê şah tê ser vi çiyayi şêr. Lı vi çiyayi tışteki pak ji lê tune, weki em vi çiyayi zevtkın, gele şahê çı karê jı van kevıra û zınara bıvine?

Şah Abas ku qızılbaş şandın û dit gele eskerê wi tê qırê, tışteki nıkare bıke, ewi destbı delka kır: meriki xwe şande cem Xano, weki ew teslimi wi be. Şah Abas xwe bı sonda guranê soz dıda Xano, weki dengê xwe wira neke, wi sax bıhêle. Çawa mezınêd hemû kurdêd İranê, wi têke xan û her mehekê ji deh zêr mıwacıbê bıde wi. Eşira wira ji dengê xwe neke, her bıra Xano bıve destayê wi nas bıke şahê şah...

Wan roja bı hukmê Xano İskender eskerê xweva xweyi dıkır ew ali, jı kijan ali dıjmın dıkarıbû pışt eskerê kurda bıstenda û berbı kelê bıçûna. Pevgırêdana eskerê İskender û Xano texbûra Şebab dıkır. Her seet û her gav siyarêd Şebab û Şebab xwexa dıhatın û dıçûn. Rojekê sıve teze zelal bûbû. Hê xımama kewa sıvê, mina mıjekê lı erdê bû. Baki sıvık dıhat lı tumê gıhê û belgê dara dıxıst û dıhejand, xorteki jı eskerê İskender qelaçiyada rûnıştıbû û wi ali dınhêri, kijan ali texmindıkır weki dıjmın kare bê derbazbe. Ewi texmin kır bınatara wida, hında kaniya, tıştek wê nava mêşeda berbı wan tê û hılke-hılka wiye. Ewi eskeri fıkır kır, gelo: "Dıvek hırçbe". Xort zûtırê hate cem İskender, got: "Hında kaniya tıştek nav mêşeda berbı me tê". İskender nışkêva femkır, weki ev ne hırçe, dıve eva listıkeke İranêye dıkın. Ewi deh zılam hıldan û berbı wi ali çû. Hetani hatne wêderê idi ronkayibû û tavê ji dabû serê çiya, merıv hemû tışt pak dıdit. İskender gote eskerê xwe:

– Zutırê çarnıqali wan dumê hûr bıgrın û berebere nêziki wêderê bın, lê fesal herın. Ezê ji vi alida bêm.

Gava ewana nêziki keviya wê kaniyê bûn, merik jı nava mêşe derket berbı wan hat. Jê pırsi:

– Tu çı meriyi û tuyê kuda heri?

Ewi hezing kışand, xûdan jı enya xwe paqıjkır, got:

– Ez qasıdê Şah Abasım, ewi ez şandıme mezınê we, lê mın rê şaşkıriye û hatıme vıra...

Eskereki nişan gırt, tir kışand weki lêxe, İskender nehişt, got:

– Nekujın, hûn destê wi pış wiva gırêdın û emê wi bışinıne cem Xano, –Wê deqê Şebab ser wanda hat.

Ewi pırsi:

– Çı hewale?

İskender jêra gılikır.

Şebab got:

– Hûn çevê wi ji gırêdın, qanun usane, ezê bıvım. Çevê wi gırêdan û Şebab ew ani cem Xano. Wextê Şebab ew ani cem Xano, destê wi û çevê wi vekırın. Xano jê pırsi:

– Tu jı ku hati, kê tu şandi û seva çı hati?

Beri cabê, ew rabû, sê cara pêş Xanova nımzi erdê bû, got:

– Şıkır allah ez sılamet hatıme hızura te. Xan saxbe, şahê şah ez şandıme cem te, weki tu şerneki. Ew ji bı sonda quranê soz dıde, wê eskerê xwe paşta bıve, wê te bıke xanê Kurdıstana İranê. Dest nade te, nede eşirê te ji û her mehekê deh zêr, mıwacıbê bıde te, her tu bıve destayê şahê şah.

Ew meri disa nımzi erdê bû, got:

– Bona van gıliya şah Abas ez şandıme cem te û hiviya caba teye.

Wextê Xano wira xeverdıda Esoyê Lakan, Hemze Çawış û Cewzo ji wêderê hazırbûn. Xano ku bihist ev gıliyêd qasıdê şah Abas, hêrs bû, got:

– Here bêje şah Abas ez ne xanım, naxwazım bıvıme



Institut kurde de Paris

xan, lê navê mın Xano – navê kurdane, ez naxwazım rutba xantiyê, ez her dıxwazım, weki şah Abas jı me vegere, neyê ser me şer, vi pırti erdê kal û bavê me jı me nestine. Yekê ji ez ne ew kurdım, ê xayintiyê mıletê xwera dıke seva zêra. Bêje şah Abas, herkê ew van gıliyê mın qebul neke û jı me venegere, ezê şerkım û hetani meriki mın ji saxbe. Yekê ji bêje şah Abas: "Me gele cara sondê wi bihistıne, lê paşê ewi şuxulê bê insafi kırıne, em êdi sondê wi bawernakın".

Paşê Xano gote Cewzo: "Çevê wi gırêdın, bıspêrne Şebab, bıra ew wi bıbe usa derbazke, weki ew sax û sılamet here cem şah Abas û gıliyê mın bêje wi".

Wan roja lı deşta İranê germê hê dıqıjıland, lê lı van çiyayêd bılınd gerekê idi hênkayi despê bıkıra, lê vê salê ne minani wan salabû, hê usa germ bû te qey dıgot havin teze ketyê. Vi şerida hê eskerê Xano kêm hatıbû qırkırınê. Gava qasıdêd şah Abas vegerya hat û caba Xano wira qısekır, şah Abas hênca jı ciyê xwe rabû çû, hat, got:

– Çawa, dêmek kurdeki çiya ber mın danexwe û navê destayê mın. Ne mın eşirêd wana – Lûr û Bextiyar tewandıne, kırıne bın destê xwe û anine ser dınê rastiyê – şıhiyê, weleh ezê te ji bıtewinım.

Ewi hukmeki lez şande ser serkarê esker, wi hukmda nıvisibû:

"Gerekê, tu çawa hebe zûtırê kela Dımdımê zevtki, hıla zıvıstan nehatiye, weki zıvıstan bê, stendına qelê wê dıha çetınbe".

Wextê Sêyfale xan ew hukm stend û vekır xwend, cabeke ha şah Abasra nıvisi:

"Bıra şahê şah saxbe û tımê destê te ser meve, gerekê ez rasti bêjme te, weki Xano hesabke koka eskerê mın anye. Merıv qe nızane ewana jı kiderê tên û jı ku derdıkevın. Ez ne gumanım, weki van roja kelê zevtkım, nava van çend mehada ewi esker gışk zılıki kır"...

Ew kaxezê Sêyfûla xan ku anin, dane destê şah Abas,

ewi xwend, ew kaxez qelaşt, wezireki xwe bı lez şande pey Sêyfûla xan, weki ew lez bê hızûra wi. Wextê Wezir hate cem Sêyfûla xan û hukmê şah Abas gote wi, ewi dılê xweda got:

– Ez zanım, ewê mın bavê zindanê, lê weleh zindan jı vi hali çêtıre"...

Sêyfûla xan esker teslimi wezir kır û hespê xwe siyar bû, çû cem şah Abas. Ew ku gihişte Têhranê, ajote ber dergê şah. Lê şah Abas nehişt Sêyfûla xan bê rûyê wi keve, ewi hukm kırıbû: hema ku ew hat, bıgrın bavêne zindanê. Sêyfûla xan ku hate ber derge, xulama destxweda ew gırtın, destê wi kelemçê xıstın, lıngê wi qeyd-zıncir kırın û bırın avitne zindanê. Wextê xulama ber derge dıqedandın, ew hukmê, şah, wê navê cem şah Abas piya sekınibû Serdar xan û guh dıda ser xeberdana şah Abas. Gerekê bê gotınê Serdar xan yeki bejn dırêj bû, lê kê sıfatê wi dıdit, elbêra têderdıxıst, weki jı sûretê wi merıvi xûn dırıje, çevne mezıne şaşe lê, lı sûretê wi qe pırç lê şinnedıbû. Mêreki jêhatibû, wextê tışteki kar û xêr lı fıkra şah Abasda miyaser dıbû, ewi beri wezira gışka minani gura bina wê karê û xêrê hıldıda û dıqedand, bona van şuxula, zû ber çevê şah Abas ew hate xuyanê, çawa meriki bı hış, hışyar û culet bû. Bona cêrbandınê şah Abas gele cara şuxulêd gıran spartıne wi, ewi pak û zû dıqedand. Xêni wê yekê ew hate xuyanê ber çevê şah Abas wi çaxi, yextê şah Abas sparte wi, weki here wan eşirê kurda: Bextiyara, Lûra bınxe û têke bın bandûra İranê. Wi şerida ewi disa xwe xuyakır, çawa bê insafi xûnxar û bê fıta. Çımki wextê ewi ew eşir bınxıstın, ewi çıqas meriyê wane serpêsekıni û pır-hındıki nava cmaeta xweda hurmetbûn û mezınêd qebila bûn gışk qırkırın, qe yek jı wan sax nehışt. Û gele xûn ji ciyê belasebeb rêt, weki ewana cereke dınê idi nıkarıbın lı hemberi dewleta İranê şerkın. Lema şah Abas Serdar xan hızdıkır. İcar ji şah Abas dıgote wi:

– Ez te dışinım, weki tu minani vi seybsanê Sêyfûla



Institut kurde de Paris

xan neki! Çı teheri hebe tu zûtırê kela Dımdımê zevtki û xıravki. Wi kurdi ji sax bıgri bini...

Pey van texminara Serdar xan du-sê cara temene bû. Wan temenê wida şah Abas texminkır, weki her ewê hukmê wi bıqedine. Paşê şah Abas got:

– Ez çı tera bêjım, tu ne meriyê şiretani, şıkır jı xwedê te ew eşirêd kurda; Baxtiyar û Lûra usa bınxıst, idi bûne minani berxêd pey miya û salê gele hezar tûmenêd zêr, xerc dışinıne xezna mın. De here riya te vekıribe, kurê mın...

Ev gıliyêd şah Abas paşın lı Serdar xan geleki xweş hatın. Ew disa du-sê cara nımzi erdê bû, çawa temene bû, destê xwe da erdê, da enya xwe û ser çevê xwe, paşopê paşta vekışya û derket, çû. Serdar xan hema wê rojê hespê xwe siyarbû, çend xulam hıldan, berbı kela Dımdımê çû. Ew ku hate cepê, ewi dit eskeri çı haleki çetındane. Raste, eskerê İranê lı vıra zefe, lê kurda qurfeke usa kırye dılê wan, wextê dıvên kurd: tırs dıkeve nav dılê wan. Serdar xan evarekê gazi qumandarêd esker kır û jı wan pırsi:

– Rast bêjın: hûn çı halidanın, çı we kême. Dıvek xwarına we kême?

Nav wan qumandarada yek hebû, ê ku Serdar xan pak nas dıkır, pêra çûbû şerê ser eşirêd Bextiyara û Lûra. Ew qumandar jı ciyê xwe rabû, heveki pêşta hat nêziki Serdar bû, temena eskeriyê pêş wiva kır, got:

– Serdar xan saxbe, – ewi ku navê wi hılda qumandarêd mayin çevê hev nıhêrin, nola tışteki bêjın: "Ev wi nas dıke, weki navê wi hıldıde". Dewla xwe dê serê şahê şahbe, emrê wi dırêjbe û tımê destê wi ser serê meve, tıştek kêmasiya me tune, çı ku jı bo xwarınêye, ew ji me ewqas pez-dewar jı van kurda stendiye bê hesav. Lê tu were ev eşira kurda ne minani wan kurdêd Bextiyara û Lûra, ê ku xwexa dıgotın: "Eme kurdın". Maqûl, evana şıkûkın. Wextê dıve şer merıv qe nızane ewana jı ku derdıkevın, hema minani teyrokê ser meda tira dıbarinın û bı şûr-mertal

Institut kurde de Paris

lı me dıqelıbın. Serê eskerê meyi kuşti bı bara ser meda holdıkın. Weleh ez bı hızret Eli kım, hebûna roj weki geliyada xûna eskerê me minani avê kışyaye. A, qumandare gışke vıra hazırın bıra bêjın: "Ez rast dıvêm yan derewa dıkım". Merıv wan navine lı kune, weki bıvinın emê hıcûmbıkınê, lêxın, lê merıv qe paki wan navine...

Ewi ku besa Bextiyara û Lûra kır, Serdar xan pırsi:

– Tu jı ku zani Bextiyar û Lûr kurdın?

– Ez xulam wextê te ew qırdıkırın, wi çaxi ez nav eskerê teda taxbûr qumandarbûm, lê nıha ez bêlukqumandarım.

Serdar xan pê hesya, ev kurdana ne minani wan eşirêd kurdaye Bextiyar û Lûrane. Ev şerkarın. Ew usa ji pê hesya, weki Sêyfûla xan hetani nıha ev eskerê gıran temam hevra nedaye xevatê hıştye bona şerê ser kelê. Lê weki ev eskerê hezêmeti hevra bavita şêr, ev tırs nedıkete dılê wi eskeri.

Hıngi Serdar xan hatıbû vıra, ew çend rojbûn erişên eskerê İranê kêm bıbûn. Şer qe te dıgot temıribû. Xano gote Cewzo:

– Ev çı hewale, qe deng jı we nayê. Bê seqıriyêda kıvşe ewana karê tışteki dıkın, çıka wê çı delka û fêla bıkın. Em gerekê hazırbın. Ewana karın pıştê jı me bıstinın û me têne xelekê. Çımki eskerê wan geleke...

Xano xwexa çû hemû qelaçiyê eskera gerya, ber dılê eskerda hat. Ewi gurzkebendçi anine pêşya şêr dane sekınandınê û qumandariya wan Xano hılda ser xwe...

Wextê Cınyazê Posto anin lı kelê hedkırın, Zadıne xanıma jına wi û qebila wi ser gora wi sond xwarın, weki herne şêr û tol bıgrın. Heft roj ku derbazbûn pey defnkırına Postora, Zadıne xanım destxweda jı qebila xwe, Malerında, hezar mêr bıjartın bı çek û silaha, xwexwe ji bû serkarê wan, hespa xwe siyarbûn û berbı şêr çû.

Kewa sıvê teze ketıbû, gewraê hımangi dabû rû erdê. Teze wite-wit ketıbû nav çıvika. Qerewıleki Hemze Çawış



Institut kurde de Paris

texminkır, weki eskereki gıran berbı wan tê. Ew hahanga çû, got: "Maqûl, jı aliyê kela me, vê tariyêda, eskereki gıran berbı me tê..."

– Rêda tên, yanê bala tên?– Hemze Çawış pırsi.

– Belê, hema rêda tên.

Hemze Çawış gote eskerê xwe hazırbın. Wextê pêşiya eskerê Zadınê xanımê hate tanga wan, Hemze Çawış tele-tel çû nêziki wan û dit, ev eskeri gışki bı kolose û hêdika kurdi hevra xeverdıdın. Wê deqê ewi nêta xweda got:

"Dıvek şah Abas, ew qebilêd kurdaye xayin şandiye, ku pıştê jı me bıstinın û me têxne çerxê".

Ewi bı dengeki nerm pırsi:

– Hûn kine? Hûnê kuda herın?

– Em jı qela Dımdımêne, jı qebila Malerındanın, emê berbı Xano herın, komekê bıdne wi.

Ev dengê jına Hemze Çawış lap meşqûl kır, ew jı nav mêşe derket hate cem wan. Zadine xanımê destxweda Hemze Çawış nas kır, got:

– Bırê Hemze Çawış, çı jı te veşêrım. Wextê malxırav* kuştın, mın sond xwar, ez hertım dewsa wi herım şêr.

Hemze Çawış ji Zadıne xanım nas kır, çımki ew gele cara mala wan bıbû mêvan. Ewi got:

– Here xûşka mın, navê jına kurda lı te helal be, wera oxırbe...

Xulama cab da Xano, Zadinê xanım bı eskerva hatiye, dıxwaze bê hızûra wi. Xano fıkıri weki birbine kiye Zadine xanım? Ew çend deqebûn ew kerbû bir neani. Paşê gote xulama:

---

*) Nav kurdada ne edete, weki jın navê mêrê xwe bêje. Mêr ji navê jına xwe navêje. Wextê jın meriki dınêra derheqa mêrê xweda xeverdıde, dıvê "bırê te". Mêr ji dıvê: "Xuşka te", "malxırav"– vıra çawa mıri derbaz dıbe.

Institut kurde de Paris

– Ca xwedê hebinın, destûrê bıdnê bıra bê çadırê, çıka ew jı kijan eşirêye?...

Sêvdinê kurê wi, got:

– Keko, ne Zadine xanıme, jına Postoye, jı qebila Malerındaye... Wextê kurê gote bavê, wê gavê kete bira wi:

– Vır çend salê, wextê eşira Şıkaka şah Abas hinkır û şandne ser wana şêr, wi çaxi Zadine xanıme hê cahıl bû, mêrxasike usa kır, degme mêra karıbû bıkra. Ewê sê cariyê xweva beri si mêrê Şıkaka dan, du mêrê wan kuştın û keri pezê wana bıri jı wan stendın ani".

Wextê destûr dan û Zadine xanım hate çadırê, ewê usa mêrani ber Xano temene bû, te qey dıgot sereskereki tame, paşê got:

– Bavo, tu bavê me hemûşkani, rûyê mıne te reşe, bıborine, weki ez tera xevernadım. Tu zani kurê malxırav tunene, weki dewsa bavê bê şer. Ewi welatê xwe pır hızdıkır û emrê xweda bona erdê kal û bavê xwe şer kır. Mın ser gora wi sond xwar, weki ez dewsa wi herıme lı hemberi dıjmın şêr. Hezar mêr, mın jı qebila me bı çek-silah anine hewariya we.

Zadine xanım yeke bejın bılınde gırbû. Porê wê çûreçeqelbûn, minani kareke filık. Ewê porê xwe vegırtıbûn, du guliyê qalıne dırêj û serxweda berdabûn; suretê wê ber tava havinê heveki qemılibû, gurcıkê suretê wê minani seva sordıkırın. Çeve gıre sûte lêbûn. Gava ewê bı wan çeva meriya dınhêri, te qey dıgot ew çev tire – jı kevan berdane, merıva dıhıngêve. Lêvne heveki tenıke sor lêbûn, wan lêva kawike rınd dıda dewê wê. Xızêm jı bêvıla derxıstıbûn, çawa dılşkesti, lê dewsa xızêmê kıvşdıkır. Dêreki bisırbırçimi lêbû, ewê dawa dêrê xwe dırêj hıldabûn, pış xweva daçıkandıbû, bona ku bıkarbe hespê siyarbe. Şalıkeke fıreye dûzmekıri berbû, ewi ji disa bona hêsa lı hespê siyarbe û peyabe. Çawa dılşkesti bı şereke reş kofya xwe nıxamtıbû.



Institut kurde de Paris

Wextê Zadıne xanımê gıliyê xwe kutakır, çend gava paşta vekışya. Xano got:

– Keça mın, te şuxuleki welathızi kırye. Rasti ji em haleki zef dıjwardane. Lê em bawerdıkın, weki emê erdê xwe xweykın jı van kafıra, ew şirê welıda te, daye te, lı te helalbe û tu ser çeva hati...

Gava Serdar xan ji nava çend roja da pak pêhesya, seva çı ew nıkarın kela Dımdımê zevtkın, ewi rojekê gazi hemû qumandara kır, got:

– Emê sıvê erişi ser kurda kın, gerekê eskerê me gışk hevra lêxe, lê em sıvê zû lênaxın. Emê lêxın, wextê tavê da, çımki eskerê me, lı vi mêşeye, geliya û kevıra şevê nıkare şerke. Eskerê İranêra şerme, weki ev eskerê gıran nıkare zora van çend kurda bıbe. De idi herkes bıra here nav eskerê xwe, sıvê ez we dıvinım.

Sıvebû. Lê tavê zûda dabû. Baki sıvık nermi xweş jı çiyayêd bılınd dıhat, ewi bayi xwera jı kulilkêd çiya dani bın-bugzeke xweş. Merıv jê têr nedıbû. Hıngi ser usa sekınibû. Xano garzkobendçi anibûne cem xwe. Ew sıvê çû cem wana, sılav da wana û destpêkır wanra xeverde, nışkêva eskerê İranê erişi ser wan kır. Xano û eskerê xwe xurt rawestan lı hemberi vi eskerê gıran. Ewi gurzkebendçiyava xarûşi İraniya kırın, ewana revin, wê gavê Serdar xan lı eskerê revi usa kıre qûjin, weki dengê wi kete berê zınara. Hemze Çawış dit ku eskerê İranê tırsya heveki vekışya, ewi ji xwe xurûşi İraniya kır. Zadine xanımê ji rıkêvi wan kır. Ewê bı dengeki kawi rındi jınayi vê sıbê qiriya, got:

Carekê lı me qewımiye ser kela Dımdımê van beyara.

Qanekê lı kurda qewımiye berê van zınara.

Ezê dıvinım cınyazê eskerê İranê û nele-nele bırindara.

Weleh nabe, bıleh nabe, alçaxiya kurda şah Abasra qe nabe.

Bırano lêxın, hevra lêxın, heyfa Postoê sımêl hûn jê derxın...

Bıra bû şereki usa, çawa dıvên: "Dê ewledê xwe avit", – cınyazê eskerê İranê serhev dadınıxılıne erdê. Lê çıqas Xano eskerê İranê qırdıkır, tu cara nedıbû, eskerê İranê

her zêdedıbû, dıhat, çımki, zefbû. Raste vi şerida eskerê İranê gele hate qırkırınê, çımki kurd lı wan çiya mezın bıbûn û beled bûn, lê şerê van çend rojada gele eskerê Xano ji qırbû.

Evarekê Xano tıxminkır: eskerê İranê xurtbûna xwe minani govekê beladıke, belki kurda têke orta xwe. Hema ku tari kete erdê, Xano eskerê xweva paşta vekışya. Eskerê xwe da gujmêd bılınd. Ewi hukm kır, bıra ew hemû rê û dırbê berbı kelê tên, pak bıgrın. Şıverêyê koçeṛa ji bıparêzın. Xwexwa çû kelê.

İdi evareke dereng bû, wextê ew fıkıri: "gazi şêwra mıclisa xweke". Xano temi da diwanbaşi, weki ew bı lez gazi hemûyan bıke. Diwanbaşi xulam şandın û xwexa ji çû. Xano kete mıtaleke kûr. Ewi dıdit, weki eskerê dıjmın bê hesab zefe, mina steyrkê ezmana, çıqas qırdıke qe kêm nabe, hıla disa tên û zêde dıvın. Jı eskerê wi jı gelek hatın kuştınê. Ewi nêta xweda got: "Ezê têkevme hesarê, lê navme destayê wan". Xano van fıkrada bû, diwanbaşi deri vekır, hate hundur, got:

-- Maqûl me şêwra mıclisê gote hemûyan, kesek nema, her mezınê qebila malarında tune, ew ji, –Xano nehişt diwanbaşi gıliyê xwe kutake, got:

- Erheda bışina pey Zadine xanımê, ewa nıha dewsa mêrê xwe mezına qebila xweye. Du xulam siyari lez çûne pey Zadine xanımê.

Gerekê bê gotınê Zadınêra dıgotın: "Xanım", çımki ewe rasti ji keça bega bû. Hê keçti dılê wê û nêçirvanê navdari mêrxas, Posto, ketıbû hevdu, lê dê û bavê wê nedıxwastın keça xwe bıdne xorteki beytûyi nêçirvan, ê ku zıvıstan post xwe dıke. Lê nav dengê Posto ne ku tenê nav kurdê İranê belabıbû, çawa nêçirvanê culeti bê tırs û mêrxas, nav-dengê wi lı Kurdıstanê hemûşka belabıbû. Gava meri dıçû oda wi, meri şaş-metal dıma, çımki lı oda wida serê hemû deba hebûn.

Nava mıxlûqetda qıse dıkırın:



Institut kurde de Paris

"Posto Zadıne xanıma çev-buru belek havinê revand, lı zozana. Dê û bavê wê pêhesyan, weki keça wan wi nêçirvani revand. Şekır begê, bavê Zadine xanımê bist xulam siyarkırın, pey Posto şandın û gote wana:

– Hûn wi kûçıki bıkujın, porê keça mın ji jêkın û wê binıne cem mın".

Şekır beg jı welatê Romê bû, ew havina dıhate çiyayê Dımdımê zozana. Posto lı wêderê rasti Zadine xanımê hatıbû, wana hevdu ditıbûn, dılê wan ketıbû hevdu û soz dabûne hevdu, weki emrê xwe ji bıdın, lê bıghijne hevdu. Ew du-sê havin bûn, Posto pey wê gerya, weki bırevine, lê mecal nedıkete destê wi, weki bırevine. Havina çara Posto ew revand. Wextê Posto dit ew bist siyar hındık maye xwe bıghine wi. Ewi Zadine xanım mêşeda veşart û minani pılınga rıkêvi wan kır. Ewi du siyar kuştın, yek ji bırindar kır, ê dınê ji bı revê jı destê wi xılas bûn...

Wextê Zadine xanım ji hat, Xano despêkır, got:

– Hûn gışk pak zanın eva idi ne ew eskerê İranêyi berêye, wextê çend hezar mêr dıhatne ser me şêr. Me beri wan dıda û jı erdê xwe derdıxıst, nıha hatye sed hezar mêr. Vê evarê em gerekê bıryareki bıgrın: "Yan emê xwe bıdın dest dıjmın, erdê xwe bıdne wi, weki ew erdê kal-bavê me zevtke û erz-heyalê me ji bıve dil û bê namûske, yan ji em xwe nadın dest, têkevne hesarê, şerkın û bımırın, lê em xwe nedın dest"...

Xano ku ev gıliyê xwe kutakır, jı kursya xweye bılınd minani teyreki atmece lı mıclisa xwe nıhêri: çıka ki çı dıvêje?

Pey van gıliyê Xanora gışka ber erd û ezman sondxwarın, bı qesemê mêrê berêva, serê xwe bıdın, lê erdê xwe nadne keseki...

Bı vê bıryarê mıclis belabû, idi nêziki nivê şevê bû. Lê kela kete hesarê...

Hema wê şevê bı hukmê Xano hemû tıvdarekê kelê ditın, weki têkevne hesarê: top gele ciha danin, derxıstın

Institut kurde de Paris

serê sûra kelê ji çend çiya ciwarkırın. Hemû rê û dırbêd kelê û ew ciyên ku dıjmın dıkarıbû têra bıhata, meri dane ser. Rojtıra dınê bı hukmê Xano jı gundêd nêzik kelê jın, zar, kal û pir anine kelê. Çarsiya kelê, dıkana û xanada tıji mıxlûqet bû. Xano hukmi ser Qurşûtê bazarbaşi kır, weki ew pergela wi mıxlûqeti bıparêze, ê ku gund anibûne kelê. Bı hukmê Xano esker gışk hate kelê. Êla Berodera, ew çend roj bûn hesarêda bûn.

Nava rojê bû. Nenê rasti Dilberê hat, got:

– Lê-lê, te bihistiye Qurşûtê alçax van rojêd çetın we çı bıke?

– Na, xwedê mın nebihistiye. Wê çı bıke?

– Dıvên, Xano spartiye wi, weki ew pergela bajêr bıparêze, çımki jı gunda ji gelek merıv tıji bajêr bûne...

– De, cehnıma wi kıri, – Dilberê got,– tuyê bıdi xatırê xwedê, qe besa wi kûçıki neke, weki ew meribûya, ew erdê serkeve, wê bıçûya şêr. Ew ne meriye!

Beri vi şeri lı kela Dımdımê lı hemû çiya, qawexanada, çarsiyê, meydana dewar fırotanê, lı odêda jı tımê şahi bû, saz lêdıxıstın, beyt, kılam dıgotın. Carna lı qawexanada, kalê du gelek cara şerkırıbûn lı hemberi şahê İranê û padşê Romê, qıse dıkırın, çawa kurda mêrxasi şer dıkır dıji zevtçiya...

Hınek ciya dıhat dengê zurnê û tulumê, lı wêderê cahıla govend dıgırtın dılistın bı şabûn derbaz dıkır. Lı dıkana bang dıkırın:

– Ha werın, ha werın, ha werın malê rındi xas xılas bû...

Rojêd havina û zıvıstana herro şayi û eşqbû. Hetani tari dıkete erdê Carna karvanêd tucarê welatêd dereke jı Bexdayê, Besrê, Beyrûtê, Şamê Helebê yanê jı Stenbolê dıhate kelê, şınge-şınga zengılê stuyê deva bû, dıkışyan dahatne kelê. Vıra geleki bı hurmet dıhatne qebûlkırınê dengbêjê kurdaye teze hati jı Hekarê, Diyarbekırê, Sılêmaniyê, Cızira-Bota û ciyêd dın. Wextê dengbêjê rınde

hosta, berê xwe dıdane hevdu, hevra dıketne hucetê û laqırdiya, kılamne qerf davitne ser hevdu, lê dılê wan jı hevdu ne dıma, yeki dıgot:

Te lı bejnê bejın çende,
Mina stûna lı ezmên bende.
Te lı dev minani kari,
Wextê tu dıstêyi devi xari.

dıbû pırqiniya guhdara dıkenyan.

Hevalê dınê dıgot:

Ez te hevali nav dıkım Uzo,
Kuro bejna te kuzo.
Tu ku dıstrêy mina tejya — kuze-kuzo...

Disa dıbû pırqiniya guhdara dıkenyan.

Lê nıha te qey dıgot eva ne ew kela eşq û kêfane. Nedıhat, ne dengê sazbenda, ne dengê zurnê û tulumê, ne ji dengê wan dengbêja, ê ku qırandına wanra dengê wani ziz dıkete berê zınara û çiya dıwekıli, merıv tırê sed dengbêjın dıstrên. Nıha gışk temıribû, her carna dıhat hêdika dengê lûbe-lûba nıhe jına, weki kesek nebıhên, şermbû, çımki edetbû, ê ku serê xwe dıda bona erdê xwe dıhate hesabê, çawa mêrxas û gışka rehmeti jêra dıxwast... Sıvekê hetani evarê tari kete erdê, Serdar xan eskerê xweva berbı kelê dıhat, lê pêşiya eskerê wi kesek tunebû, idi ew erişi bêfersenge ji nedıqewımin, ê ku kurda dıkır, eskerê wi dıkuştın, tırs ji dıkırne nav dılê wan. Ewi gote komekdarê xwe:

– Ev çı ecêbe, kurd tunenın, evana kuda undabûn?...

Sıvetırê, wextê kela Dımdımê hate xuyanê, hêşka Serdar xan femkır, weki kurd ketıne hesarê. Lê gava ku ew bere-bere pêşta hatın û kela ber çevê wi pak hate xuyanê, ew şaş ma, çımki ev kela ne minani wan kela bû, ê ku ewi ditıbû heta nıha û zevt ji kırıbû. Ev kela hatıbû avakırınê serê çiyaki bılınd. Serê wi çiyayi te qey dıgot tebiyetê qestana fıre çêkıriye bona vê kelê. Lê eva ne minani hemû kelêd mayin bû, eva xên ji kelê, mina bajareki mezınbû. Jı seriki kelê hetani serê dınê meydana çend seheta siyari bû.

Institut Kurde de Paris

Dupayê kelê kêleka xwe dabû geliyê kûr, aliki kelê dınê pala xwe dabû çiyayê Dımdımê.

Serdar xan dina xwe da wan zınarêd bêhûdeye, mezıne bılınd, hınek jı wan zınara usa dalıqyabûn, te qey dıgot, wê nıha bıhedımın û çı ber wan keve wê bıhıncırinın û têkne bın xwe. Cina mêşeki usa sıxbû, weki merıv bı çetıni têda rê dıçû. Lı vıra, serê van çiyayêd bılınde bêwa, kê karıbû hımê avayê xwe çêke û bıji nava gura, hırça, keftara û gakûviya? – Her kurd...

Jı dûrva Serdar xan nedit rê ki aliva dıçe kelê. Wextê ew pêşta hat û pak dina xwe dayê, ewi du rê ditın, ê ku jı gêli, pêş wiva berbı kelê bûn. Vi gelida dıkışya çemeki kûr û gure-gureke usa jê dıhat, merıv tırê hırça hare.

Jı vıra Serdar xan pak dıdit gundêd kurda, ê ku nêziki kelê bûn, dora wan gunda xıyadıkırın zeviyêd kurda, ew zevi idi zer dıkırın, zûda wexta wane dırûnêbû. Serdar xan fıqra xweda got: "Me nehışt ew gundêd jêrıne deştê nan bıdrûn, em gerekê nehêlın evana ji nan bıdrûn, weki em vê mevalê bıdne wan, ewana nan bıdrûn, ewê disa qewat bıgrın, û nayêne rayê". Wextê Serdar xan van fıkrada bû, qe texmin nekır, çawa hate newaleke kûr, nava darêd sêva û hurmiya, heveki dınê ji pêşta çû, ber wi cêrgek darêd gûza bûn. Nêta xwe va bı deng got:

– Xêni nan çandi, vıra emiş ji şindıbû, dêmek van newalada germe, weki emiş lê şindıbe...

Wextê ewi usa bı deng got, xulameki wi nêziki wi bû, ewi ji cab da, got:

– Belê ez xulam, bınê van geliyêd kurda germe, lema emiş lê şindıbe.

– Kıvşe, halê gışka xweşe, dewletine?...

– Belê, ez xulam, çıma ne dewletibın. Ne xerca dıdın, ne ji olamê dıkın, eva çendık-çend sale hema usa terxan dijin, helbet wê dewletibın...

– Tu bısek, ezê nıha wan ji mina Bextiyar û Lûra bıtewinım, têkme bın lıngê şahê-şah.

Serdar xan du-sê roja esker da hêsakırınê. Wana pak bina xwe stend, têr razan, çımki ew çend mehbûn qe hêsa nedıbûn, hema pey eskerê Xano ketıbûn. Lê Xano ji ew dıxapandın kaşi newala, geliya dıkırın û ew qırdıkırın. Roja cara wextê ku tavê da, Serdar xan hukmkır, eskerê wi gışk rıkêvi kelê kır. Xano nehışt topa agırkın hetani ewana jı çêm derbazbın. Lê gava ewana jı çêm derbazbûn, Xano got:

– De heyrana weme lêxın!

– Nışkêva bû gure-gura topa ser wanda gulle barin.

Ev guriniya çend topa hevra lı van çiya, merıv tırê dınya welgerya, çiyayê Dımdımê ser wanda hedımi. Dengê van topa kete berê zınara û çiya, ew çend wextbû ew gırmin hema dıwekıli. Lê wextê rûyê topa bela bû, Serdar dit, weki cınyazê eskerê wi bınya kelê ser hevda nıxline. Hıne cınyaz ji pêlêd ava gur daye ber xwe dıbe. Herçê eskerê wi sax ma paşta revi. Serdar xan şaşma û got:

– Serê vi çiyayi, top? Kê ev top dane kurda? Hevetuneve eva kırına padşê Romêye. Ew zûva dıxwaze Kurdıstanê gışki zevtke...

Ewi wê rojê tap nekır, disa erişi kelê kır, disa bû gırminya topa û vızinya tira, esker nıxıli erdê. Rojtıra dınê ewi helan da eskerê xwe û rıkêvi kelê kır, lê disa cınyazê eskerê Îranê nıxêli erdê. Ew mehekê zêdetır bû, weki jı kelê qe venegerya. Carna ewi sê aliyava rıkêvi kelê dıkır. Wan roja qûjıniya Xano bû, dıçû wi ali kelê, dıhat vi ali kelê. Wextê eskerê Îranê nêziki sûra kelê dıbûn, jına wi qoçaxi tir ser wanda berdıdan, ew eskerê Îranê ku dıhate erişê, Xano dıgot: "Bıra bêne nêzik, yek jı wan sax namine".

Serdar xan ku dit eskerê wi bê hesav qırdıbe û nıkare kelê zevtke, ewi eskerê xwe paşta vekışand. Çarnıkalê kelê çend cêrga hêwıri, çadır vegırt û sekıni, got:

– Weleh, ezê xelaêva zora we bıbım, arxayinbın.

Eskerê Îranê ku usa çarnıkali kelê gırt, paşê dest bı talankırına gunda kır, çımki geleka pez dewarê xwe gunda-

da hıştıbûn, hıneka ji hema usa nan bêderada hıştıbûn. Eskerê İranê destxweda pez, dewar talan kırın, paşê ketne mala. Nanêd bêderada ji dane hespê xwe, lê sap şewıtandın. Xano jı wan venedıgerya. Ewi carna sevê esker hıldıda, dıgot: "Em herne nêçirê". Û her carê ku ew dıçûn, ewi erhede eskerê İranê qırdıkır. Şevê ji tırsa kurda ketıbû dılê wan.

Ew çend mehbûn mıxlûqetê hezêmeti, jın, zar, kal, pir ketıbûn hesara kelê. Nan nav wanda idi xılas dıbû, bırçibûn kete nava wan. Xano carna nav kelêda dıçû, ewi dıdit, weki meri bırçina usa sıstbûne, tenê dıkarın rê herın. Lê ewi devê keseki jı wan nebihist, weki bêjın: "Were em teslimbın".

Ew çend şev bû qe xew lı çevê Xano neketıbû. Sıvekê ewi hınde topçiya heveki serê xwe çend deqa dani, hênıji, paşê hışyar bû, gote Cewzo:

– Tu mıra zû gazi zılamêd başke, bine cem mın. Gerekê bışinıne hewarê jı Hekarê, jı Şemdinanê, an jı Azrbêcanê bıxwezın. Cewzo destxweda gazi du xorta kır, yek jı wan Şebab bû, Xano nexwest Şebab bışine, çımki ewi zanıbû mêrxasiya wi û kêrhatına wi lı kelê lazımbe. Xano ew herdu bırın xewle kırın û gote Şebab:

– Ez gerekê we bışinım çawa qasıd cem kurdêd Hekarê, an Şemdinanê, an Azrbêcanê, weki ewana bêne hewariya me, lê tu, – ewi gote Şebab,– vıra ji rınd kêri me têy, du dıxwazi heri?

– Na, ez xulam, ez naxwazım şer bıhêlım herım... Xano gote, Cewzo:

– Tu meriki dınê bine em bışinın.

Wê gavê kurê Xano Sêvdin, got:

– Keko, iznê bıde, ez herım.

– Erê, lao, tu here. De hûn herın, karê xwe bıkın û werın diwanxanê razên, hema dıki nivê şevê bang dan, hûn ravın, ezê bêm, we rêkım.

Nivê şevê idi bıbû, lê kela Dımdımê nedıhat dengê

dika, çımki ne dik, ne pez, ne ji dewar mabûn, ehlê kelê zûda ew gışk şerjêkırıbûn û xwarıbûn. Lê Xano bê dengê dika dı wextêda rabû. Şeve reşe tari bû. Xano dılê xweda got: "Çı wexteke pake". Ewi hate diwanxanê herdu hışyar kırın, berbı dergê Mûşılê bır. Wextê ew heveki nêziki derge bûn, deng jı qerewıla hat, pırsin: "Ew kiye?" Xano bı dengê xweyi kubır kûr, got:

-- Ezım, Xanome.

Ew hate ber derge, jı qerewıla kılit xwest, dergê Mûsılê hesın ber wi vekır, wanra gelek erd çû. Paşê herdu ramûsan, oxır wanra xwest û vegerya hat...

Serdar xan bı wi eskerê xweyi gıranya dıkır-nedıkır Xano nedıhate rayê. Ewi despêkır, şevê eskerê xwe dışand, belki ew tehreki kelê zevtke. Lê disa nıkarıbû tıştek bıkıra. Paşê ewi jı derê mêse nerdewanêd bılınd da çêkırınê, belki bı nerdewanava hılkışe têkeve kelê. Ew çend carbûn eskerê kurda ew yek tıxminkırıbûn. Lema eskerê Xano her şev pış sûrê qerewılya berk dıkırın. Carna ew qerewılya pış şûrê jına dıkır, weki mêr heveki hêsabın, çımki ew çend mehbûn mêrê gışke şev û ro şerda bûn.

Serkarê jına gote Dilberê û Nenê, çımki ewe tımê cem hevbûn û hevra dıçûn, dıhatın: " İşev gerekê qerewılya pış sûrê Dilber û Nenê bıkın. Lê keçno, ez çı bêjım hûn dıvinın çı wexte, hûn gerekê ber mêra namûsa jına kurda nexın erdê". Wan herduya qe dengê xwe nekır, lê wext tari kete erdê, Dilber û Nenê silah hıldan çûne pış sûra kelê, ew gele wextbû ewana hêdika û ker dıgeryan. Hiv hıla derneketıbû. Ezmani sayi tıji steyrk bûn. Dilberê hêdika gote Nenê:

-- Ez texmin dıkım idi sıve nêzike?

-- Hılbet nêzike, çıma tu navini pêwr-mêzin idi jı rû ezman tunene, dêmek sıveye nêzike...

Herdu keçka texminkır; merik wê erdêra çalepiya tê. Wana xwe teland hetani ew hate kete orta wan. Nenê tele-tel nêziki wi bû, kevırek jı erdê hılda, lı serê wi xıst,



Institut Kurde de Paris

ew gêjkır. Wana ew meri dil gırtın, anine kelê. Wextê ew anine diwanxanê û çevê Xano lı wi ket, got:

Pey, ewi jı meye, we jı ku ani?

– İşev qerewılê pış sûrê jının,– Cewzo got.– Du keçıka–gırtın anin...

– Eferım keçêd kurda...

· Belê, ezi jı weme, ez kurdım,– dil got.

– De weki tu rasti ji kurdi û jı meyi, bêje: "Qe çı heye nava askerê İranê fıkra wan çiye? Çı dıxwazın bıkın?"

Çı lazımbû, Xano yeko-yeko pêhesya derheqa eskerê İranê. Paşê ewi dili serda zêdekır, got:

– Eva meheke zêdetır heye du eskerê weye cahıl gırtın anine cem Serdar xan. Xano pırsi:

– Serdar xan kiye?

– Serdar xan serkarê eskere.

– Ne serkarê eskerê İranê Sêyfûla xane?

– Belê, berê Sêyfûla xan bû, lê paşê şah Abas gazi wi kır, ew bıre Tehranê, dewsa wi Serdar xan şand.

– Ew herdu cahılê me nıha lı kune?

– Ew herdu ji Serdar xan bı cıza kuştın, çımki çıqas pırsin û kırın-nekırın, wan tu tışt jı bo kelê negotın, qe surek xuya nekırın...

Heşka Xano pêhesya, çıma ewqas wexte hewari nehat. Ew usa ji pêhesya, weki Sêvdinê kurê wi bı curet jiyina xwe da, lê sura kelê wanra nişan nekır.

– Weki tu kurdi, tu xwexa dıvêji, lê çawa te silah hıldaye û hati ser mıletê xwe şêr? Çawa dılê te hıldıda tu mıletê xwe dıkuji?

Dil serê xwe berjêr kır û caba pırsêd Xano nıkarıbû bıda...

Xano gote Cewzo:

– Vi kûçıki bıvın nav bajêr bıgerinın, nişani mıxlûqet kın. Bıra mıxlûqet bızanbe xayinê wan kine? Û bıra xwexa ji ceza wi bıdın.

Bı hukmê Xano ew dil anin nav çarşiyê gerandın, telakeki ji dıkıre gazi, dıgot:

Institut kurde de Paris

Werın, ha werın, ha werın! Xano yeki dil gırti şandiye nav me, weki hûn xwexa ceza wi bıdnê, ew kurde, xayinti kırye, çûye pışta şahê Ecema, silah hıldaye, hatye me bıkuje...

Bû qûjinya mıxlûqet topi ser wi bûn. Berê ewlın jıneke pir jı nav gışka xwe gihande wi û tûkırê sûretê wi, got:

– Bêje, bı çıqasi te dınê xwe fırotiye şahê İranê.

Mıxlûqet, idi mecal nedane wi, avitıne erdê, kê bı kevıra, kê bı dara, kê bı pıhina ew hıncırandın û erdêra kaş kırın, lı kuça gerandın, kuştın...

Rojek derbaz bû paşê jına Xano pê hesya, weki kurê wêyi lapi mezın Sêvdin, kuştıne. Bu qiriniya wê, ser çevê xwe qelaşt, porê xwe verût, hate diwanxanê û dılûband:

-- Lao, lao, lao mın ne diyo.
Kes nızane cınyazê te lı ku mao...

Xano lê hılat– pêra kıre şer, got:

– Tu şermnaki! Ne gerekê tu şabi weki kurê me bı mêrani jiyina xwe da bona erdê kal û bavê xwe, bona mılet, tu gerekê kubarvi kurê usara...

Ew çend meh bû Serdar xan dora kelê gırtıbû. Ew ji idi gele rê û şıverêye kese nav zınarda û geliyada raçevkırıbû. Ewi rojekê, ro teze hatıbû wextê nivro, ehlê kelê ketıbûn derdê hesara xwe û halê bırçibûna xwe, çımki nan bona mıxlûqet idi xılas dıbû, a, vi wextida ewi erişi ser kelê kır, lê usa bı delk esker şanda bınya sûra kelê, weki têketana bın sûra kelê, şerê dıjwarbûya bona kurda. Ciki ji Xano dit idi pêpelıgêd bılınd erdêra kaş dıkırın, berbı sûra kelê danin. Xano ku dit ew yek, qirandê: "Gıdino, lêxın, dıjmınê têkeve kelê!" Wi dengê Xanora icar, ne ku tenê top, tir-kevan, pişto icar hemû mıxlûqetê kelê leqiya, xevıti çûk, mezın, kal û pir, jın û zar, hetani kevkani ji dane xevatê. Te qey dıgot teyroka mezıne ser wanda barandın. Serdar xan sekınibû wi beri gêli, pak dina xwe dıda erişa eskerê xwe. Ewi bı çevê xwe dit, çawa jınêd kurda mêzere wana tıji kevır, ser eskerê wida barandın. Ewi icar ji cınyazê eskerê xwe bın kelêda hışt û paşta vekışya...

Institut kurde de Paris

Vê erişa paşında Mehmûdê Merekani* dit weki dor hatye, ew heyfa xwe veke û hıla serda ji jı şah Abas dewletekê xwera destxe.

Gerekê bê gotınê Mehmudê Merekani jı qebila vırışika bû. Meriki netebıti bû. Cinarê xwera rê nedıçû, hergav şer û dew bû. Gele cara cinara şıkyatê wi kırıbûn ber mezıne qebila xwe, lê tıştek nıkarıbûn pê bıkırana. Herkê dıbû şer ji keseki wi nıkarıbû û derba wi lı kê keta ber wê derbê tu kes nıkare bısekıne. Jı bo wê nepakya wi Xano bihıstıbû, lê tıştek wi nedıkır, çımki hesab dıkır ew şuxulê nav qebilêye. Wexta gıregırêd qebila şıkyatê wi anine ber Xano û dew lê kırın, weki wi jı qebila lap derxın. Lê Xano ew ceza lape mezın** neda Mehmudê Merekani, çımki ew meriki culet bû, bı dıl û bı ceger bû. Çend cara Xano ew tenê şandıbû ciyê dûr, û şuxulêd çetın, ewi qedandıbû û hatıbû. Xano her erdê wi jı destê wi gırt, da gundiya û ew ji bajarê kelê, lê Mehmûd nedıxwast jı gund derkeve. Xano bı hesaveki zor ew jı gund derxıst, ani kelê. Lı kelêda Mehmûd nexevıti, qewaxanada dest bı listıka xumarê kır. Herçi hebûna wi hebû ew xumarêda derda. Gele cara ewi eşkera dıgot:

– Xano mala mın xırav kır, erdê mın jı destê mın gırt, ez ji xwey mal bûm, xwey erd bûm, iro ji ketıme vê rojê...

Paşê çû bû aşvan, ew çend sal bûn, şev û ro lı aş dıxevıti. Lema vê sıvê Mehmûdê Merekani ku berbı aş çû geli, keseki dengê xwe wira nekır, ehlê kelê çûk û mezına Mehmûdê Merekani nasdıkırın, weki ew aşvane.

---

*) Bı gotına kal û pira Mehmûd hê lı welatê Romê mereka kaêda jı diya xwe bıbû, lema jêra dıgotın Mehmudê Merekani ne ku melekani. Eş jı eşira vırışika bû, zûda hatıbû gihiştıbû Xano lı çiyayê Dımdımê. Jı şırovekırına beyta Sebıri Kıbir (Nıviskar).

**) Bı qeydê eşira kurda kê jı qebila derdıxın, ew cezaki zef çetıne û eşirêd dınê wi hılnadın nav xwe.



Institut kurde de Paris

Wextê ew usa berbı çêm çû, esker cab da Serdar xan, weki merik jı kelê, berbı çêm tê. Serdar xan tırê ew meri tê bêje, weki kela dıxwaze teslimbe. Ewi hukım kır, weki kesek dengê xwe wira neke. Ew ku hate ber kewiya çêm, kaxezek nıvisi mezınê eskerê İranêra:

"Herkê hûn dıxwazın kelê destxın, herın fêza kelê, hında guşmê tûj, hûnê quçêd kevıra bı cêrge pey hev bıvinın. Bın wan kevırada karêza avê tê kelê, weku av bıri, kelê xwexa teslimi we bıve, bı tehreki dınê hûn nıkarın kelê zevtkın. Mehmûdê Merekani".

Ewi ew kaxez serê tirêva gırêda û berda wi beri çêm. Esker kaxez bır da Serdar xan. Ewi ku ew kaxez xwend, şa bû. Wê sehetê esker hılda û çû. Lı wi ci ku Mehmûd Merekani nıvisibû, ewana qûçêd kevıraye dû hev rêzkıri ditın û despêkırın kolan, wextê kolan, kevırê ser karêzê nıxamti hıldan, ditın aveke pır mezıne zelal, karêzêda xule-xula wêye berbı kelê dıkışe-dıçe. Ewi av da bırinê û bı dıleki şa vegeriya hat...

Sıvekê av hındık hate kelê, lê wextê ro hate teştıya mirani, av lap hate bırinê. Mıxlûqet tırsya bı hewz kelêda hebûn berbı wan bezin û despêkırın av bı meşka elba xwera bırın. Hetani êvarê çıqas hewz kelêda hebûn, ava wan gışka bırın û hewz zıha kırın. Serdar xan wê gûmanê bû, weki mıxlûqetê kelê xwexa bêje: "Ez teslim". Lê pey av bırinêra heft roj ji derbaz bûn, kela nehate rayê, hê serda her şev Xano minani pılıng, eskerê wi dızikava dıkuşt.

– Ew çawane,– dıgot Serdar xan,– me av ji ser wana bıri, lê hê ev kurd qe xema wan nine, dıvek ava wiye bın erd ji heye?

Lê idi hêwarze ketıbû nava mıxlûqet, devê gışka zıha bıbû, idi tûk ji tunebû daqurtandana, hersal vi çaxi van rojêd payizaye paşın, – lı van çiyayê Dımdımê xuşiniya baranê û berfê bû, lê tu were tele-bextra baharda qe baraneke pak nebariye, herro saye, tav, *dıqıjiline*, *tu qey dıvêji teze* ketye havinê?

Institut kurde de Paris

Xano ku dit, mıxlûqetê wi bê av ah û zar dıçe, ewi hukm kır:

– Zûtırê bı meşka, eyara û hevana avê jı çêm binın bona mıxlûqet...

Ber evarbû, nêziki sêsıd mêri meşk, eyar û hevan hıldan, bı sılahe daketne gêli. Lê icar Serdar xan kıre delki. Gawa ewi dit talde mêr berbı çêm tên, ewi femkır, evana tên bona avê. Ewi hukm kır:

– Xwe bıtelinın, usa bıkın, weki jı wek yek xuyaneke, bıra ewana bêne hetani qeraxê çêm. Hema ku hatne ber çêm, nehêlın avê bıbın, tir-kevana bıreşinın. Usa bıkın: yek ji wana sax nemine...

Hema usa ji kırın. Eskerê Xano ku hatne qıraxê çêm, eskerê İranê usa tir ser wanda reşandın, weki qe yek jı wana sax nema, her yeki çend tir canê wanda nıçıkibûn, ew tirêd jerdayi qe nehışt axin jı yeki bê, yanê têke nele-nel. Lê tibûnê usa zor jı wan kırıbû, weki mırın idi ber çevê wan nedıhat, lema çend cara usa eskerê Xano dıçû, lê qırdıbû, wana qe dılope av ji xwexa venedıxwarın.

Xano ku dit, eskerê wi bê av sıstbûye, qe nıkare dıjmınra şerke, ewi disa gazi mıclisa xwe kır. Lê icar ku hate şêwra meclisi, nivê diwanxanê vala bû, tunebûn gele mêrxasêd wi: Esoyê Lakan, Hemze Çawış, İskenderê Kal, Şebabê hê xortini cahıl, melle Reşit, Şêx Celat, Zadine Xanım û gelekêd mayin. Ev car idi gazikırına paşın bû. Xano disa lı ciyê xwe, ser dika bılınd, minani hergav rûnıştıbû û meclisê dınhêri, ewi got:

– Ez jı we gışka razime, we sozê dabû ku cmaetê, weki hûnê şerkın, we bı namûs qedand û mêrxasi şerkır, hûn dıvinın, – ewi dora xwe nıhêri,– geleka emrê xwe da bona erdê kal bava, bona din û namûsê. Lê icar ji ez teslim nabım. Em gerekê barûtê têne bın kelê û bıteqinın. Hûn dıvinın kesek jı me bê av taqet nake şerke. Herkê ki jı we dıxwaze here teslimi dıjmın be, hema işev herın. Lê ez teslim navım, ezê kelê hılşinım. Bıra nebêjın: Xanoyê kurd tesli-



Institut kurde de Paris

mi dıjmın bû, erdê xwe da şahê İranê, erz heyalê xwe ji bê namûs kır.

– Hûn çı dıvêjın?

Xano ku ev gıliyê xwe kutakırın, disa minani teyreki atmece jı ciyê xwe mıclisê nıhêri û hiviya caba wan bû.

Jı mıclisê qe yeki negot: em teslimbın,– gışka, qe tey dıgot, wê karbûna xweva dıvêje:

"Weleh em ji qayilın, jiyina xwe bıdne bona erdê kalbava û bona namûsê".

Ev fıkıra van gışka idi Xanora xuyabû, weki mıclisa wi ser sozê wiye. Ewi destxweda got:

De, gıdino, bıkın bılezinın,
Barûtê zû jı çela derinın.
Kela Dımdımê hemû bıhedinın,
Bıra dıjmın bıvinın teslima me tuninın...

Zû kırın û lezandın,
Barût jı çela derandın.
Kela Dımdımê teqandın.
Hemû Kurdıstanê nişandın...

Miyasera şah Abas nebû,
Xano jı dınê xwe dernebû.
Teslimi şah Abas ji nebû
Ew lı hemû dınê eyanbû..

Bıra hemû kurd bızanbın,
Herkê xayin nav wanda peydabın.
Ewê hergav bê erd û bê warbın.
Hergav ji stuxarbın, wê bın destadabın..

Sê ciya barût kırıne bın himê kelê û teqandın... Agır lı kelê ket. Ew çend rojbûn kela Dımdımê dışewıti bı mıxlûqetê xweva. Dûki usa reş lı kelê ketıbû, rûyê ezmin hate gırtınê. Carna ew dû ba lêdıxıst beladıkır. Bina biso û kuzûra ew geli û newal tıji kırıbû çend roja şûnda ew dûyê usa berk heveki sekınibû, lê Serdar xan hê newêrbû here kelê, ewi dılê xweda dıgot:



Institut kurde de Paris

"Dıvek Xanoyê kurd bı delka-qestana kela teqand, weki ez herme kelê, mın ji minani Quli xan bıkuje". Qurfa tırsa mêrxasiya Xano ketıbû dılê Serdar xan ji.

Serdar xan rojekê sed mêrê qızılbaş şand, weki bızanbın qe çı kelê heye. Ewana ku hatne kelê ditın: qe merik û ruhberek ji lı kelê sax nemaye. Lê kela tıji xışır, embaret û malê gıranbıha bû. Wan qızılbaşa lı kelê çev van hûr-mûra ketın, dest bı topkırına malê hêja kırın. Ew çend seet bû Serdar xan hiviya wan bû, lê ewana venegeryan. Serdar xan fıkıri: "Dıvek qızılbaş çûn kurdara bûne yek", çımki gelek cara berê qızılbaş kurdara dıbûne yek û lı hemberi şahê İranê şerdıkırın. Paşê ewi hezar eskerê dınê şand. Ewana ku çûn ditın: ade-merik lı kelê sax nemaye, lê qızılbaş ketıne dıkana û hostexanêd zivkıri, zêr û ziv topdıkın, cab dane Serdar xan, weki qızılbaş ketıne dıkana û mala, tıştê hêja top dıkın. Ewi hukm kır:

-- Zûtırê wan qızılbaşa binıne bal mın!

Wextê qızılbaş anine bal Serdar xan, ew çêltêd wane bona tiro tıji dewısandıbûn. Wextê valakırın, Serdar xan şaş ma. E, çı tunebû lı vıra, zêrêd İranê, Romê, Afganistanê, Hındistanê hetanê zêrê Romayê ji hebûn. Ewi serê xwe hejand, got:

Weleh evi minani şah û padşa derbaz dıkır, kırin û fırotana wi ewqas dewletera hebû...

Ew çû nav bajêr. Ewi dit, dora, hewzeki mezın çend jına çok dane ser kevya hewzê mermeri, tas destê wanda bûn, merıv tırê wê avê bıbın, lê hewzi mıçıqi bû, av têda tunebû. Serdar xan ku nêziki wan bû, ewi dit ev jın gışke mırine. Ew şaş-metal ma, fıkra xweda got:

-- Çı mıxlûqeteki berke, ev çetıni hatıbû serê wan, lê disa teslim nedıbûn"...

Ew lı vıra sekıni, çûkûraya bajêr, derkete meydaneke fıreye mezın. Lı vıra darêd şine mezın hebûn. Siya du cêrge dara dıkete kûça, dıkıre si. Herdu aliyava cew hebûn. Raste cewa nıha mıçıqibûn, lê xuyaye wextêda van cewada tıji



Institut kurde de Paris

ava zelale çiya dıkışya. Paşê Serdar xan çû nav bajêr, lı sûka fıre xaniki mezıni du qati hebû. Ser banê wi xani du qube hebûn. Wan qubada pencerê gulover hebûn. Serdar xan vırd-wêda nıhêri, bı pêpelıngava hılkışiya çû kete wan quba, jı wan qubêd bılınd ewi çarnıkali kelê dit. Jı quba peyabû, deri vekır, çû kete diwanxaneke mezıne fıre. Lı erdê vê diwanxanê xaliçeki mezıni lê raxıstıbûn. Vi xaliçêda hebûn nexşê gakuviya, karêd xezala û debayêd mayin. Lı diwarê diwanxanê sılahe dardakırıbûn: bıgre kevrêd berêye lepeka, ê ku wextê zûda pê şer dıkırın û bıgre jı kevkaniya çerm û hetani piştoyê barûtê dardakın hebûn. Serdar xan şaş-metal ma, wextê ewi dit serê diwanxanêyi jorın dıkeke heveki bılınd hebû, doşekek lê raxıstıbû û çend belgiyê purta mırişka bona berpala danibûne wêderê. Ew vegerya ser sereskereki xwe got:

– Ewi kûçıki minani şah derbaz kırye. Mın mirê lûra gırt û kuşt, lê dem û dezgê wi ne minani ê vi bûn...

Ew dukete kuçê here, lê sereskerê ku pêra bûn, got:

– Ez xulam jı vê eywanê pêpelıng berjêr dıvıne bın erdê.

Ewana pêpelıngava daketne kurayê bınê erdê, heveki bû tari, lê eskerêr pêşiyê dıçûn gotın: "Jêrê disa ronkaye". Gava geleki çûne bın erdê, wêderê ronkayi bû, minani derva. Lı vıra nava zınara, bın erdê kûr, ewqas şkevt û kiler çêkırıbûn mina bajareki çûk, ev der ciyê zexira nanê eskerê wi bû, hê gelek genım û ar bona eskerê wi hebû. Serdar xan got:

– Weleh, weki me av ser wana nebırya, ev nanê geleki têra eskerê wi bıkra, dıvek me isal ji zora wi nebıra. Lı serê vi çiyayê bılınd, ciyê sar-serma bagera û hışkaya, halê meyê çetınbûya.

Serdar xan jı wêderê derket disa çû nava bajarê kelê gerya, ew çû hetani qeraxê bajêr, ber pala çiyayê Dımdımê, lı vıra sûra kelê idi xılas dıbû, lê vıra dereki hesın hebû. Du meri hema usa ber derge mırıbûn, lê çevê wana vekırı-

bûn, merıv tırê qestana xwe telandıne. Yeki jı wan por kuriskibû, minani erebê mısırê. Serdar xan askerê dora xweva jı derge derbaz bû, pêş wiva lı zınarê çiya şkevteke mezın hebû. Serdar xan duz çû wê şkeftê. Beri ewi dit gele komır lı wıra rokırıne û hesın ji lı wıra heye. Ew ku heveki dın ji pêşta çû, ewi dit ku curnê hesın têda dıhelinın, kêleka wi curni lı erdê qabeke topa ku têda rokıri hebû. Heveki dınê ji ew pêşta çû, ew rasti dezgeki mezın hat. Serê wi dezgeyi cûre-cûre hacet hebûn. Meriki wê serê xwe danye lı ser wan haceta mırye. eskerê Serdar xan bı serê sûr nıcande wi, ew ser pıştê kete erdê. Singê wi vekırıbû. Xaçeki stuyê wida bû. Serdar xan têderxıst, weki ev meri fêleye.

Wê rojê Serdar xan geleki lı kelê gerya, idi westiya û tibûnê ji zor wi kır, ew kuçekêda berjêr hat here gêli, weki jı kaniyê avê vexwe. Lı xılasbûna kuçê, berê derê xaniki ne ewqas mezın, lı dareke guzêda keçıkekê şereke reşe mezın avitıbû stuyê xwe û xwe xenıqandıbû. Serdar xan ku pak lê nıhêri, ewi emrê xweda, iro ji lı vê kelê, gele cınyazê mêr û jınên mıri û dardakıri ditıbûn, lê ewa ku ewi vê deqê dit huriya usa-- hê ne ditıbû. Lema ew şaş ma. Wextê ew û çend parêzkarê wi nêziki wê bûn, gışka axın kışand, te dıgot ewê qestana çevê xwe gırtıbûn, weki buru û bıjanêd wêye reş û sûretê spi çili-qerqaş pak bêne xuyanê. Lıngê wêda xırxe bûn, lê ew xırxe ne mina hemû xırxê lınga bûn, eve minani bazınê zenda pene û ber bûn, jı zivê xas bûn, çend qaşê sore kaw xıreda bûn. Qoleki zêra ber eniyê bû, qotıkeke reşe dırêj ber sûretê rastêda dalıqyabû, serê qotıkê jı çenê heveki derbaz bıbû. Fınoyê wê gışki dıravkıribû. Qerefıleki bêvla wêda bû, ew ji zêr bû û qaşeke sore lê bû. Devê wê heveki vekırıbû, merıv tırê wê nıha bıkene. Kıncê wêye mayin ji teze û hêja bûn, te qey dıgot ewê xwekıriye, wê here dewatê, usa cûre-cûre dêrêd xase etlez, qenawız bı kobekê nıqışandı lê bûn, porê wê donzde guliyêd dırêj ser pışta wê vegırtıbûn. Nava guliyê wêda kespıkê bera û nıvışteke tılzımê têda dardakırıbû, weki çevê



Institut kurde de Paris

xırav lê nekevın. Tora stuyê wê karbarêd qıçık (zer) bûn û mırcanêd sor tev hev bûn... Bınya sûretê wê, lı xevavê, xaleke lê bû...

Serdar xan ku heveki dın ji hat nêziki wê bû û pak lê nıhêri, got:

– Ya rebıl elem, te çawa ew hori nav van çiya û beyaniyada xulıqand.

Ew çend deqebûn Serdar xan û parêzkarê xweva zûr bıbûn lı wê dınhêrın. Devê wê heveki hevıribû, te qey dıgot ew dıxwaze tışteki bêje... Eşkerê nêziki wê bû, kır ku gustila zêrin jı tıliya wêye çepê derxe. Serdar xan lê hılat, got:

– Xwadê hebinakın tışteki jı bejna vê mılyaketê dernexın, bıra hema usa bımine, eve erhede ziyaretiye, merıv tırê saxe, qestana çevê xwe gırtıne. Ax xwezla tu saxbûyayi, weleh tuyê bıbûyayi gula herema mın.

Ro idi jı nivro daqerya bû. Serdar xan karkır qasıd bışine cem şah Abas. Ewi nıvisi:

"Bıra şahê-şah minani şemsıl qember (tevê) tımê pencê xwe bıde ser me, bıra tirêja wi bıde hemû dınê. Ew hukmê ku te da ser mın, jı bo kurda, mın qedand. Kela Dımdımê xırav kır. Kurd gışk mın qırkırın.

Serdar xan".

Institut kurde de Paris

## EPİLOG

Saltıra dınê bıhar disa hate kela Dımdımê. Lı kuçêo kela Dımdımê idi tunebûn: qawexane û xwarınxane, weki minani beri vi bajari hergav sazbend, kêf û eşqbûya. Lı kuça idi xuyanedıkır Qurşûtê bazarbaşi, ê ku bona paqıjiya bajêr û pergalê dıhat hukmdıkır.

Te qey dıgot ne lı kela Dımdımê, lê hemû vi çiyayi kurd qe neman, koka gışka hat. Lê rasti ne usabû, kurd gelek mabûn, lı serê çiyayêd bılınd û olkêd dûri. Wexta bıhar ku hat, ewana disa pezê xwe anine dolga lı geliyê kûr, weki mina bızeynının...

Lı van dolga kela qısedıkırın jı bo wi şerê efati ku Xanoyê Çengzêrin kırıbû. Dengbêja kılam dıgotın, beytoga beyt derdıxıstın, ser vi şerê efati bona azaya kurda. Ew şer vala neçû, wexteke ne zefe dûr, disa despêkır şer bona azaya kurda. İcar serkari lı vi şeri kır Talorik. Lema ji navê wi şeri kurda dani "Şerê Talorik".

Pey wira şerkırın: Bedır-xan, Ezdinşir, Şêx Ebdûla, Şey Ubeydullah û Şeyx Mehmûd Berzenci jı bo azadi û serbestiya welatê xwe.

Institut kurde de Paris

## SERECEM

Pêşxeber..........................................................5

Serê ewlin, Çarsû..................................................9
Serê duda, Çêkırına meçitê......................................23
Serê sısya, Hemze Çawış ........................................28
Serê çara, Dewrêşê sêrê .........................................40
Serê pênca, Dewet ...................................................51
Serê şeşa, Qsa Xano ................................................61
Serê hevta, Qasdêd Şemdinanê ..................................79
Serê heyşta, Quli xan ...............................................118
Serê neha, Huseyn xan, ............................................133
Serê deha, Hıcûma kelê ...........................................149
Êpilog ....................................................................205

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Himdarê romanê kurdi, şoreşgerê mezın, mamoste Erebê Şemo, sala 1897' a lı bajarê Qersê, lı nehıya Sazûkê hatıye dınê. Zarokatıya wi dı nav feqiri û belengazıyê de derbas bûye. Ew lı aliki dıçe xwendınê, lı aliki ji lı cem xwedimala dıxebıte. 17 sali, xwendına xwe ya pêşın sala 1914' a lı gundê Aleksandrovki dıqedine. Sala 1918' a tevi şoreşa Oktobırê dıbe û dı nav xebatkarên kurd de karê partıyê dımeşine. Wana dıjê axa û bega organize dıke.

Erebê Şemo sala 1924' a lı Erivanê dıkeve Instituta Lazerevski û wek rojhılatnas Institutê dıqedine. Sala 1931' ê dıçe Leningradê û dı Akademıya Zanısti, beşa Asya' de doktora xwe dıde.

Gelek xızmetên hêja yên Erebê Şemo gihıştıne gelê meyê bındest. Wi dı edebyeta kurdi de rêçeke nû vekırıye. Cara pêşın wi destpêkırıye û roman bı kurdi nıvisandıye. Saya afırandınên Erebê Şemo, gelek zımanên cihanê, weki rusi, frensızi, almani, ermeni, azeri, gurci, tırki, û asûri bı edebyeta kurdi re bûne nas.

Himdarê romanê kurdi, şoreşgerê mezın, mamoste Erebê Şemo heya çûna dılovanıya xwe, sala 1978' a, gelek afırandınên gıranbıha jı mere hiştıye: Şıvanê Kurd - 1930, Jina Bextewar - 1959, Dımdım - 1966 û Hopo 1969 çend jı afırandınên wi yên bı nav û deng ın.

Institut kurde de Paris

**WEŞANÊN ROJA NU**